# KÊŞEYA KURDÎ YA HERÊMÎ YA DINYAYA KUREWÎ: *ZÊHNIYET, SIYASET Û DÎNAMÎKÊN JEOPOLÎTÎK*

YASİN SUNCA

HAFIZA MERKEZİ
HAKİKAT ADALET HAFIZA MERKEZİ

# KÊŞEYA KURDÎ YA HERÊMÎ YA DINYAYA KUREWÎ: *ZÊHNIYET, SIYASET Û DÎNAMÎKÊN JEOPOLÎTÎK*

YASİN SUNCA

WERGERA JI TIRKÎ: ZANA FARQÎNÎ

HAKİKAT ADALET HAFIZA MERKEZİ

HAFIZA MERKEZİ

**TRUTH JUSTICE MEMORY CENTER**
Ömer Avni Mahallesi
İnönü Caddesi Akar Palas No:14 Kat:1
Beyoğlu, 34427, İstanbul
T: +90 212 243 32 27
info@hafiza-merkezi.org
www.hakikatadalethafiza.org

**NİVÎSKAR**
Yasin Sunca

**WERGÊR**
Zana Farqînî

**DÎZAYN**
Ekin Sanaç

© Hakikat Adalet Hafıza Çalışmaları Derneği Yayınları (Truth Justice and Memory Studies Association Publications) 2022

OLOF PALME INTERNATIONAL CENTER

Hafıza Merkezi spasiyê li Olof Palme International Centerê dike ji bo alikariya wan a bo çapkirina vê reportê.

OAK FOUNDATION

SIGRID RAUSING TRUST

Em spasiyê li Weqfa Oakê û li Weqfa the Sigrid Rausing Trustê dikin bo alikariya wan a ku li saziyê kirine.

6
**DESTPÊK**
12
**BEŞA YEKEM**
**KÊŞEYA KURDÎ YA HERÊMÎ, DERKETINA HOLÊ YA QADA SIYASÎ YA KURDÎ Û DÎNAMÎKÊN WÊ**
13
Kêşeya kurdî çi ye?
15
Qada siyasî ya kurdî çi pênase dike?
17
Pêkhatina qada siyasî ya kurdî
17
*Sînor*
21
*Zêhniyet*
24
*Têkoşînên Cihkî*
28
Dînamîkên sereke yên civakî û jeopolîtîk ên qada siyasî ya kurdî
28
*Ji aliyê aktorên siyasî yên kurdan ve*
30
*Ji aliyê dewletan ve*
31
*Ji aliyê têkoşînên jeopolîtên ên kurewî ve*
32
Bi destpêkirina sedsala 21'ê re aktorên siyasî yên kurdan
35
Encam
37
**BEŞA DUYEM**
**LI SALÊN 2000'Î KÊŞEYA KURDÎ**
39
Veguherînên kurewî: Piştî Şerê sar serxweşiya serkeftinê ya lîberal
44
Veguherînên herêmî: Li Rojhilata Navîn avabûna (dîrokî ya) awarteparêziyê (ya rabêjî) û midaxele
49
*Midaxeleya li Iraqê*

52
Veguherînên li qada siyasî ya kurdî
52
*Dewlet û siyasetên wan ên li ser kurdan*
57
*Veguherînên li qada siyasî ya kurdî*
65
Encam
70
**BEŞA SÊYEM**
**LI SALÊN 2010'AN KÊŞEYA KURDÎ**
71
Veguherînên kurewî: Qeyrana pergala cîhana lîberal
73
*Qeyrana hegemonîk a navxweyî*
75
*Qeyrana hegemonîk a derveyî*
77
*Hegemonyaya dijber*
79
*Encamên qeyranê*
82
Veguherînên herêmî: Serhildanên ereban û jê wêdetir
83
*Encamên herêmî yên serhildanên ereban*
87
*Piştî serhildanên ereban şekilgirtina jeopolîtîk*
88
Qada siyasî ya kurdî: Rejîmên ku qels dikevin û derfetên dîrokî
88
*Dewlet û siyasetên kurdan*
94
*Veguherînên li qada siyasî ya kurdan*
113
Encam
116
**ENCAM Û PÊŞNIYAZ**
130
Çavkanî
139
Veser û Nexşe

# Destpêk

Beyî giringiya bê ka em bi kîjan perspektîfê li kêşeya kurdî dinêrin, tevî ku ew kêşeyeke herêmî ye, ew tim bi awayekî bêawarte wek meseleyeke navxweyî ya dewletan hat dîtin. Di hewldanên ji bo daxilkirina dînamîkên herêmî de jî, ew kêşeya ku der barê wê de fikir li ser hatiye ajotin, bi "tesîra derve ya li hundirû" sînordar ma. Li gel vê, ji derî xebatên aştiyê yên serwer/serdest ku ew dixwazin bi piranî wan aktoran hilde navendê da ku çareseriyên siyasî peyda bikin, wan beşên civakê yên ku lihevxistin di nav wan bi xwe de diqewimin ew wek beşên ku divê bên entegrekirin dibîne û di vê çarçoveyê de wan şertên civakî û dîrokî jî ne wek diyarkerê hemû van pêvajoyan lê belê wek faktorên ku tesîrê lê dikin hildide dest, loma wisan dixuye ku hewce bipêşxistina perspektîfeke din heye. Lîteratura xebatên aştiyê yên rexneyî û analîza lihevxistinê ya rexneyî, bi hereketkirina ji vê kêmasiyê gihîştiye pêkanîna çavkaniyeke giring. Wek paralelî van ranêzikiyên rexneyî, ev xebat jî wek bersiva li berfirehkirina perspektîfê û pêwîstiya kûrkirina wê, ji bo çareseriyên mayîndetir bi hedefa kirina analîzeke hîn kûrtir hat kirin. Çendî nîqaşa "pêkvejiyana di nav aştiyê de", yek ji nîqaşên sereke yên têkiliyên navneteweyî be jî, ji perspektîfa çareserkirina meseleyê ya nav sîstemê tê kirin ku ew li perspektîfê serwer e. Lê Fanon di pirtûka xwe ya bi navê "The Damned of the Eart" (Lanetiyên Ser Rûyê Erdê) de, bi kirina pênaseya aştiyê ya balkêş a ku li ser feraseta aştiya li asta cihanî serwer e, ji me re der heqê vê mijarê de çarçoveyeke nû pêşkêş dike: Şideteke meşrûkirî û ya ku bi awayekî pergalî li ser civakên mêtingeh hatiye bicihkirin. Cextkirina Fanon, ne li ser aştiyê, lê belê li ser şêweyên nû yên şidetê ye ku forma pêkvejiyana aştiyane ya serwer ew rewa kiriye. Şopandina li çarçoveyeke aştiyê ya rexneyî ya wiha, dike ku feraseta me ya aştiyê ya serdest bi awayekî hîn kûrtir problematîk bike. Îdîaya sereke ya xebatê ya di vê çarçoveyê de ew e ku ji ber ew metodên hanê kêşeya kurdî ji wan dînamîkên dîrokî-sîstemîk ên ku di nav wan de çêbûye razber dikin û wê di nav wan dewletan de teko teko diheşirîn da ku jê fehm bikin û der barê çareserkirinê de fikir biajon, ku tim kêm mane (û dibe ku kêm bimînin), loma ya rast ne ji bo çareserkirina kêşeyê -bi awayê ji niyetên ferdan an jî ji yên aktorên civakî serbixwe- lê ji bo tevkarîkirina li berdewamiya wê ye.

Ev xebat çarçoveya pêkvejiyanê ya di nav aştiyê de, bi perspektîfeke ku kêşeya kurdî bi awayekî kûrane di sê rehendan de nîqaş dike, pêşniyaz dike. Y ayekem, dîrokîbûna kêşeyê ye. Divê li vê kêşeyê, ku di kana wê de pêvajoyên avakirina netewe-dewletê û têkoşînên wê hene, tenê bi perspektîfeke wisan a ku ji bo xetayeke di dîrokê de sererast bike, neyê nihartin. Beravajî vê yekê, nexwe em dê qîm nekin bikarin êrîşên nijadperest ên ku di şertên aktuel de bi pêş dikevin, teşeyên wê yên minasebetê yên ku her

roj ji nû ve rabêjiyên wê yên serdest û hiyerarşiyên wê yên civakî û siyasî hildiberînin, tesbît bikin. Yanî, li şûna meseleya ku di raboriyê de carek çêbûye, divê ku em cextkirina dîrokîbûnê ya ku tim bi berdewamî tê hilberandin, derxin plana pêş. A duyem, eger mijar tenê wek kêşeya bajarekî, ya herêmeke cografî, ya dewletekê yan jî ya Rojhilata Navîn bê îdrakkirin û di nav vê çarçoveyê de pêşniyazên çareseriyê bên nîqaşkirin, dê ev yek bike ku têgihîştina minasebetiya jeopolîtîk têra xwe sînordar bike. Berevajî vê, divê derketina holê ya kêşeyê û veguherînên wê di nav astên minasebetiyên kurewî, herêmî û cihkî de bên îdrakkirin û hewce ye meşandina nîqaşên li ser çareseriyê jî di vê çarçoveyê de derxe pêş. A sêyem jî, eger kêşe tenê di asta aktorên siyasî de were îdrakkirin, îcar di warê têgihîştina asta veguherîna dînamîkên herêmî û perspektîfên çareseriyê de, dê bibe sedema redûksiyonîzmeke jeopolîtîk. Loma berevajî vê, ji bo îdrakkirin û têgihîkirina kûrahiya jeososyal û jeoekonomîk jî, ku ew dibin sedema bingeha pêvajoyên jeopolîtîk, ne tenê aktorên siyasî divê mirov di heman demê de teserifên civakî (social agency) jî derxe pêş. Ji bo çarçovekirina hemû nîqaşên mayî, perspektîfeke wiha, tiştekî bivênevê ye.

Tevî van yekan, ji bilî mijarên wekî hewsaleyên siyasî, dîrokî û civakî û texeyulên aktorên siyasî yên kurdî, bê ka çi dixwazin û ji bo vê çi dikin (an jî amade ne bê çi bikin), nîqaşên li ser meseleya kurdî, li gorî bê ka dewletên eleqedar an jî hikûmet çi dixwazin an jî ka çi qas destûr didin pêkanîna pergaleke demokratîk û xwedî bingeha wekheviyê, tên kirin. Demîngirtina vê ya di şertên reelde tiştekî fehmdariyê ye, ji lew re ya yekem eleqedarî dahatûyê ye ku mijara têkoşînê û xeyala wê tê kirin, a duyem jî bi wesîteya amrazên zorê yên siyasî ku di xizmeta wê de ne, mihafezekirina desthilatê û îmtiyazên civakî û siyasî ne ku desthilat wan mimkin dike. Lê belê divê binî bê xêzkirin ku her du perspektîf jî di nav têkoşîneke hêzê de tên pênasekirin û ku hev û din diyar dikin. Fehmkirina yekûna van têkoşînên hêzê ya di nav dîrokîbûnê de, li gelek perspektîfên cuda derî vedike û bi ser de jî ji tengahiya aştiya lîberal re, ku di çapana dinyayê de xebatên aştiyê nikarin ji navê derkevin, kanalên ramanî yên nû vedike. Loma, di vê xebatê de bi qasî aktorên ku desthilatê di dest xwe de digirin, avaniyên siyasî jî yên ku ji bilî (û jê jêrtir) ew ên di hevkêşeya têkoşînên hêzê de, lê îradeya siyasî ya teserifeke civakî temsîl dikin, li pêş çav tên girtin. Ev xebata ku dê di nav vê hevkêşeyê de bi pêş de biçe, tenê bi parkirina desthilatê nesînorkirî ye û bala xwe dide ser hilberandina encamên binyat navendî ya dagerîn û veguherîna têkiliyên desthilatê.

Gava rehendên dîrokî, sosyolojîk û kurewî yên mijarê tevî berxwedana li dijî têkoşînên hêzê yan jî tevî aktorên siyasî yên ku wek xwediyên desthilatê daxilî wê bûnê, were nirxandin, nîqaşkirina "qada siyasî ya kurdî" jî mecbûr dike. Nîqaşeke bi awayê hîn kûrane em ji beşa yekem re bihêlin û bibêjin ku "qada siyasî ya kurdî" ya ku di navenda

wê de kêşeya kurdî ya xwedî asta herêmî heye û ji ber şertên dîrokî, civakî û siyasî yên ew tê de ye dînamîkên navxweyî hildiberîne, loma minkin e ku mirov bikare wê wek jêrsîstemeke jeopolîtîk, jeososyal û jeoekonomîk pênase bike. Ev xebat, dawiya dawî bi mebesta ku dînamîkên navxweyî yê vê qada siyasî û paşxaneya kurewî û herêmî ya veguherîna van dînamîkên hanê yên di bîst salên dawî de analîz bike, bandora wê ya li ser îhtimalên çareseriya kêşeya kurdî ya xwedî asta herêmî xuyane bike, hatiye nivîsîn.

Perspektîva teorîk a vê xebatê, li ser bingeha herî sereke xwe dispêre du ranêzikiyên sosyal-teorîk. A yekem û ya herî sereke ekola modernîte/kolonyalîteyê ya binyad Amerîkaya Latînî ye (Grupo modernidad/colonialidad). Ev ranêzîkî, têkiliyên hêzê yên ku xwe dispêrin nijad, çîn û zayendê, têkiliyên dîrokî yên kolonyal ên ku di bingeha avakirina hiyerarşîk a têkiliyan de hene, problematîze dike û bi vî awayî hewl dide ku jê fehm bike (wek mînak. Dussel, 1994; Grosfoguel, 2011; Quijano, 1992). Ev perspektîfa binyad Amerîkaya Latînî, nemaze bi saya kapasîteya ji têgihîştina asta kurewî, li gelek cihan pêşwazî lê hat kirin. A duyem jî, ranêzikiya sosyolojiya dîrokî ya global (global historical sociology) e. Ev perspektîfa hanê ya ku lê dixebite dagerîn/veguherên siyasî yên kurewî di nav wateya wan a dîrokî û sosyolojîk de fehm bike, mimkin dike ku veguherîna têkiliya di navbera cihkî û asta global de bê watedarkirin (wek nimûne. Lawson, 2006; Rosenberg, 2006).

Metodolojiya sereke ya vê xebatê dîrokîkirin e, yanî bi awayekî kûrane danîna têkiliya wê ya bi çavkaniyên qewamên rojane re û ji ber ku ew perspektîf pêşkêş dike bê ka divê bi awayekî tam midaxele li ku dera wê bê kirin, analîzkirina nakokiyan bi awayê dîrokîkirinê ye. Rêbaza dîrokîkirinê, wekî li jorê hat behskirin, bi awayê ku bi ranêzikiyên analîtîk re ahengdar be, li ser watedarkirina veguherînên têkiliyên hêzê yên ku têkiliyên îroj mimkin dikin, tê avakirin. Metoda analîzê ya sereke ya vê xebatê, analîza hevpêwendî (correlation) û hevbandoriya (interaction) di navbera astan de ye. Li gorî vê, li ser analîza dîrokî ya hevbandoriya li hev a pêvajoyên global, herêmî (Rojhilata Navîn) û cihkî (qada siyasî ya kurdî), hewl tê dayîn ku hevpêwendiya van astan derxe holê. Ji bo derxistina holê ya binyadên sereke yên civakî û siyasî yên di asta global û herêmî de, ku qada siyasî ya kurdî di nav wan de tev digere, serî li çavkaniyên duyemkî hatiye xistin. Ev çavkanî, ji nav xebatên paralelî çarçoveya teorîk hatine derxistin ku li jorê hatine diyarkirin. Pêvajoyên ku qada siyasî ya kurdî di nav xwe de di wan re derbas bûne û analîzên hevtesîriya wan a bi pêvajoyên di asta kurewî û herêmî re jî, li ser pêkanîna wan hevdîtinên/milaqetên bingehîn hatine kirin.

Daneyên ku di xebatê de hatine bikaranîn, xwe dispêrin hevdîtinên nîvbinyadkirî (semi-structured) û kûrane (in-depth) ku 5 jê bi taybetî yên ji bo vê xebatê, tevî hev

36'ên yek bi yek in. Dê navên kesên ku bi wan re hevdîtin hatine kirin veşarî bê hiştin da ku hem ewletiya lêkoler hem saziya ku dê vê xebatê biweşîne, hem jî ya kesên ku milaqet bi wan re hatine kirin nekeve talûkeyê. Kesên bi wan re hevdîtin hatine kirin, dikare wek kesên xebatkarên/temsîlkarên saziya civaka sivîl, niwînerên/sempatîzanên partiya siyasî, akademîsyenên ku der barê mijarê de xebat dikin, televîzyonkar an jî rojnamegerên ku di organên weşanê yên cur bi cur de dixebitin, kesên ku di dewrên krîtîk de ketine nav siyasetê yan jî şoreşgerî kirine lê êdî siyasetê nakirin, werin pênasekirin. Xala hevpar a wan kesên min bi wan re çavpêketin kir ew bû ku ya nêzî tevgereke siyasî ya kurdî yan jî endamên wan bûn. Hevdîtin bi zimanên kurdî (bersivên bi kurmancî û soranî ku pirs bi kurmancî bûn), tirkî û îngilîzî hatine kirin. Kesên min bi wan re hevdîtin pêk anî, min ji nav wan kesan hilbijartin ku bi awayekî kêm an zêde bikarin hem çar parçeyên Kurdistanê hem jî meylên/partiyên siyasî yên li her parçeyî temsîl bikin. Hevdîtin bi giranî li Ewrûpayê (Bruksel, Parîs, Hambûrg, Berlîn, Bîelefeld, Londra) û Başûrê Kurdistanê (Hewlêr, Silêmanî), ku piraniya wan jî di bihar û havîna 2019'an de û qisimek jê jî di payîza 2021'ê de hatin kirin. Li gel van, li ser konfransên vîdeoyî û axaftinên bi rêya telefonê, bi aktorên siyasî yên aktîf ên li çar parçeyî, bi wesîteya dansûstandineke timî, wexta ku hewce pê çêdibû, zanyariyên cuda cuda hatin teyîdkirin.

Di analîza van hevdîtinan de, bi alîkariya nivîsbariya bi navê NVIVO'yê, metoda analîza naverokê hat bikaranîn. Hevdîtin, li perspektîfa analîtîk a vê xebatê bi awayê ku bersiv bidin pirsên "Aktorên siyasî yên kurdî, pêvajoyên civakî û siyasî yên di asta global û herêmî de çawan berhêl kirin?" û "ew bi xwe di van pêvajoyan de çawan veguherîn", hatine daxilkirin. Bi taybetî li nîqaşên der barê qada siyasî ya kurdî de, encamên analîzên ku bi vê rêbazê hatine kirin, hatin vebeyandin. Li gorî vê, her sernavê ku di wexta hevdîtinan de, di warê kirina nîqaşên eleqedarî mijarê de derketine pêş, bi awayê ku tevahiyekê pêk bîne hatin şirovekirin û hevtesîra van a bi veguherînên/daguherînên di asta herêmî û global re hat nîqaşkirin. Li gel vê yekê, li cihê ku hewce pê çêbû, rasterast referans bi van hevdîtinan hat dayîn.
Beşa pêşî ya vê xebatê, li ser sehîkirina lîteratûrê çarçoveyeke dîrokî û teorîk xêz dike. Di beşên duyem û sêyem de jî bi dorê di salên 2000 û 2010'an de, pêşî bi sehîkirina lîteratûrê ya li ser analîza binyadên civakî û siyasî yên ku di astên kurewî û herêmî de derketibûn holê, hat sekinandin û di analîzên qada siyasî ya kurdî de jî encamên hevdîtinan hatin şirovekirin. Di vê xebatê de, têgihîştina ji hemû detayên pêvajoyan û nîqaşkirina wan, bi awayekî siruştî li gorî îmkanan ne gengaz e. Ango li vir, ew îdîaya behskirina ji her qada kêşeyê ya jeopolîtîk an jî daxilkirina li analîzê ya her nîqaşê nîn e. Detayên dîrokî yên van hemû pêvajoyan jî ne mimkin e ku di nav şopana kronolojîk de bên nîqaşkirin. Ji vî aliyî ve, somdariya xebatê di esasê xwe de xwedî wê hewla sînorkirî ye ku nîşan bide pêvajoyên kurewî û herêmî yên sereke pêkhateyên bingehîn

ên projeya pêkvejiyana di nav aştiyekê de ye. Gava em vê bikin jî em mecbûr in ku tenê qîma xwe bi nîqaşkirin û pênasekirina şikestinên jeopolîtîk, serûbinbûnên civakî yên ku di encama pêvajoyên kurewî û herêmî de qewimîne, formên pêkvejiyanê yên ku di nav pêvajoyên polîtîk de tên mizakerekirin û ji nû ve tên pênasekirin û bi şêweyên xwebirêxistinkirinê yên ku teserifên siyasî wan diyar dikin, ku li dawiya van hatine holê, bînin.

Mebesta ji hilbijartina vê rêbaza metodolojîk û analîtîk ew e ku bi awayê paralelî vê perspektîfa dekolonyal a vê xebatê, em teserifên civakî û siyasî yên kurdan hildin navenda mijarê. Wekî ez dê di pey beşa yekem de hîn bi kitekit nîqaş bikim, dê li dijî feraseta serwer a ku kurdan tenê mîna "mexdûrên jeopolîtîkaya kurewî û herêmî" kod dikin, beşdariya aktîf a binyadên/rêxistinên siyasî û civakî yên kurdî ya li hemû pêvajoyan û kapasîteyên wan ên ku van pêvajoyan dadigerînin li holê bên danîn, dê kurd ne tenê yek bi yek wek kesên tên bandordarkirin lê belê ew wek kirdeyên/bikerên ku xwe dispêrin teserifên xwe û tesîr li pêvajoyan dikin, bên niştekirin. Analîzên têkildarî teserifên siyasî û civakî, ne hewce ye ku analîzên wisan bin da ku xwediyên teserifan erênî bike, wan rast bidêre yan jî wan mafdarî bike. berevajî vê, analîzên bi vî awayî, ji wê qebûlê hereket dike ku teşekulên siyasî yên li ser navê civak û grûpên civakî bi awayekî serbixwe tev digerin, bi yên baş û xerab her yek ji wan bi serê xwe kirdeyek e û li gorî palpiştiya vê kirdetiya civakî tevî pêvajoyan dibin. Ji ber vê yekê, analîza hevbandoriyê ne tenê wek xebitîna ji jor ber bi jêr ve, lê belê zemîneke dînamîk a ku her ast hev û din diyar dikin pêşkêş dike û bi vî awayî jî, bi gotina Spivak dike ku piçek be jî em bikarin "dengê yê bindest/madûn" bibihîzin.

Beşa pêşî ya vê xebatê, di bingeh de lê dixebite ku meseleya kurdî, avakirina qada siyasî ya kurdî, dînamîkên domînant ên jeopolîtîk, jeososyal û jeoekonomîk û kûrahiya sosyolojîk a dîrokî ya van hemûyan fehm bike. Analîza di vê beşê de, hewl dide hem kêşeya kurdî hem jî asta kurewî, herêmî û cihkî ya şertên dînamîkên ku di warê qada siyasî ya kurdî de derketina holê wekî dîrokî û civakî têkidarî hev bike. Nîqaşa ku di beşa pêşî de tê kirin, wekî dê paşê ji wan nîqaşên bên kirî re jî bibe hazirî, ya rast armanca wê ew e ku meseleya kurdî ya ku wek kêşeyeke herêmî ya li Tirkiyeyê bi awayekî sînordar nîqaşa wê tê kirin, dixwaze di nav perspektîfeke berfireh de bi cih bike û tevkariyê li vî warî bike. Beşên yekem û duyem jî bi van dînamîkên hanê re mijûl dibe ku bi wayekî dîrokî ew di nav pêvajoyên jeopolîtîk ên berbiçav de çêbûne û bê çawan veguherîn di wan de pêk hatine.

Bi vê kontekstê di beşên duyem û sêyem de, armanc ew e ku rola diyarker a hevbandoriya di navbera pêvajoyên kurewî, herêmî û cihkî de, ku ev xebat vê teza sereke diparêze, di qada siyasî ya kurdî de veguherîn û dagerîna ku çêkiriye di nav pêva-

joyên polîtîk de nîşan bide. Li gorî vê, beşa duyem hewl dide ku dînamîkên siyasî û civakî yên bi berdewamiya salên 2000'î hatine çavdêrîkirin, di nav pêvajoyên jeopolîtîk ên global de, ku ew piştî Şerê Sar çêbûne, bi cih bike. Di qada siyasî ya kurdî de, ku ew di nav hevkêşeya kevneşopiyeke berxwedana îslamî ya çi qas çûye radîkal bûye ew afirandiye şekilê xwe girtiye, ku ev berxwedana hanê jî li dijî midaxeleyên emperyalîst ên bi dirêjiya salên 1990 û 2000›î re li herêmê hatine kirin pêk hatiye, bi berdewamiya salên 2000›î re du xetên sereke yên îdeolojîk-siyasî xuyatir bûn: Xetên konfederala demokratîk û neteweperwera klasîk. Dînamîkên civakî û siyasî yên vê xwebirêxistinkirinê, di wan çavkaniya cudahiyan de cih digirtin ku ew di salên 2010'an de kûr û berfirehtir bûn.

Beşa sêyem jî bala xwe dide ser salên 2010'an û armanc dike ku analîza van dînamîkên dabeşbûnê yên ku kûr dibin, bike. Li gorî vê, qeyrana pergala dinyaya lîberal (liberal international order) a ku dest pê kiriye bi wê şideta li asta kurewî re bijî, qada siyasî ya kurdî ya ku di têketina çarçoveya hevbandoriya serhildanên ereban de yên li Rojhelata Navîn dageriyaye, ji aliyekî ve ku firsendên azadbûnê bi dest xistibû û ji aliyê din ve jî formên ku bi awayekî dîrokî ji ber dabeşbûna di navbera aktoran de qewimîbûn, tecrube dikirin. Her yek ji qeyranên pergala dinyaya lîberal ên hegemonîkên navxweyî, hegemonîkên derveyî û yên hegemonîkên dijber, ku ew hem li giştiya Rojhilata Navîn hem jî di qada siyasî ya kurdî de bi awayekî kûr qewimîbûn û ew dînamîkên ku di salên 2010'an de derketibûn holê, ji nûtiyan re kaoseke vekirî çêdike û hîn jî ev yeka hanê berdewam e.

Xebata li ber destê we, xwe dispêre van nîqaşan û hem bi rehendên global hem bi yên herêmî û hem jî bi yên cihkî dînamîkên vê kaosê hildide dest. Ev kaos, bi tena serê xwe rewşeke nû terîf dike. Îcar a nû, ne ku bi tenê di nava xwe de ya baş, xweş û ya exlaqî lê belê ya xerab, ya sik û ya neexlaqî jî hildigire ku bagaja wê ya dîrokî û civakî ew bi xwe re tîne. Beşa encamê di vê çarçoveyê de, di dewra pêşiya me de ji bo pêkvejiyaneke aştiyane hem derfetan hem jî gîrdan/heciran nîqaş dike.

BEŞA YEKEM

# KÊŞEYA KURDÎ YA HERÊMÎ, DERKETINA HOLÊ YA QADA SIYASÎ YA KURDÎ Û DÎNAMÎKÊN WÊ

# Kêşeya kurdî çi ye?

Kêşeya kurdî mimkin e ku bi awayên cuda bê pênasekirin. Ji aliyê dewletên ku ji ber kêşeya kurdî li nav wan lihevxistin qewimîne/diqewimin, ev dikare bi awayên wek terorîzm, dabeşkerî, kêmbipêşketîbûn/ bipaşvemayîtî, tevdana emperyalîzmê û hwd. bê pênasekirin.[1] Lê yek ji sedemên bingehîn ê kêşeya kurdî ku bûye kêşeyek, bi awayekî mihtemel eleqedarî redkirina hebûna vê meseleyê ye. Ev rewşa hanê gengaz e ku hem di asta global hem a herêmî û hem jî di asta aktorên siyasî yên cur bi cur ên li nav wan teko teko dewletên cografyaya Kurdistanê de bê çavdêrîkirin. Çendî hem bi awayekî dîrokî hem jî bi rehendên xwe yên diyar ve, di roja me ya îroj de ji aliyê çar dewletên cuda û bi astên ji hev cihê be jî, sedema redkirina hebûna vê meseleyê mimkin e ku wek çavkaniya sereke ya jeopolîtîka kêşeya kurdî were tesbîtkirin. Her çi qas ev kêşeya naskirinê ya di bin şertên aktuel de, nemaze di encama veguherîn, lihevxistin û nakokiyên di van çil salên dawî de bi awayekî de facto ji holê ranebûbe jî, wek nimûne bê li Tirkiyê naskirina vê meseleyê çi qas dem ajotiye bi xwe jî, der barê kûrahiya meseleyê de fikir dide mirov.

Derbasbûna wî aliyê rediyeya dewletan û pênasekirina bê kêşeya kurdî çi ye, bi bicihkirina pîvaneyê, yanî rasterast pênasekirina meseleya kurdî eleqedarî wê texeyulkirinê ye ku dê di nav kîjan rehendên dîrokî û mekanî de bê bicihkirin. Eger em xwe bispêrên aktorên siyasî yên kurdan ên cuda ku wan heta îroj têkoşîn kiriye, ji wateya berteng heta bi ya berfireh perspektîfkê çêkin, gengaz e ew wisan pê terîfkirin ku meseleya kurdî kêşeyeke çandî ye; meseleyeke xwebirêvebirinê ye; meseleyeke mêtingehkariyê ye û kêşeyeke wisan e ku modernîteya kapîtalîst ew afirandiye. Çêkirina kategorîzasyoneke wiha, ji ber ku her awayê pênasekirineke meseleyê li dawiya dawî mindemîcî eleqedarî wan perspektîfan e, bê ka ew dê çawan were çareserkirin, loma vê fikirîna der barê mijarê de hêsan dike.[2]

Bi çêkirina pîvaneyeke pir berteng mimkin e ku meseleya kurdî li kêşeya jiyîna çandekê yan jî jiyandina çandekê bê daxistin û li ruhiyeya wê perspektîfeke wekî perwerdehiya bi zimanê dayikê û bipêşxistina ziman û çandê ya azadane were bicihkirin. Ev pênasekirin, bi piranî cext li rehenda têkildarî mijara nasnameyê dike.

---

[1] Di vê xebatê de tebîra kêşeya kurdî tê tercîhkirin, lê bi taybetî di lîteratûra xebatên aştiyê de bi awayekî kêşedar û bêyî rexne lê bê girtin, tebîra "Kurdish conflict"ê rasterast bi awayê lihevxistina kurdî ya wergerandî tê bikaranîn ku ji ber ruhiya mijarê pênase nake, lê belê li şûna wê, ji ber vê kêşeyê encama ku derketiye holê terîf dike û ji ber ku aliyê(n) din ê(n) lihevxistinê nexuyane dike û kurdîtiyê jî bi şêweya kêşedar ji nû ve çêdike, nayê tercîhkirin.

[2] Li gel vê yekê, gengaz e ku kêşeya kurdî wek meseleya demokrasiyê/bêdemokrasîtiyê bê pênasekirin, lê belê ev pênasekirin ji faktorên dîrokî yên ku di bingeha meseleyê de hene wêdetir, ji bo ku cextê li şertên çareseriyê (demokratîkbûyîn) dike, di nav pênaseyan de yên ku li vir hatine kirin, nehatiye hesibandin.

Gengaz e ku kêşeya kurdî wek kêşeya îdarekirina xwe bi xwe jî were pênasekirin. Li vir faktora sereke ya diyarker ew e ku îdareya kurdan ji aliyê wan dewletan ve bi zor û şidetê tê meşandin ku ew ji aliyê gelên din ve hatine avakirin. Perspektîfa ku kêşeya kurdî wek kêşeya mêtingehkariyê terîf dike ku çendî dîrok û rêbazên wan çar dewletan ji hev cuda be jî, lê ji wê tesbîtê tev digere ku wan cografyaya Kurdistanê wek qadeke îstismarê ji xwe re ava kiriye. Li vir faktora sereke ya diyarker ew e ku ne tenê îdareyê di heman demê de bi awayekî tevahî îstismarkirina çavkaniyên siruştî û hêza mirovî û tevî vê yekê bi wesîteya asîmilasyonê bi zorê daxilkirina kurdîtiyê ya li nav wan nasnameyên navendî ye ku ew aliyê wan dewletan ve hatine çêkirin û avakirin. Nîqaşên li ser xwebirêvebirin û mêtingehkariyê çendî bi piranî ew nîqaşên wisan bin ku ketibin nava hev û din jî, li dawiya dawî her du jî li ser mafê tayînkirina qedera xwe cextê li ser mijarên birêvebirina xwebixwetiyê dikin. Em dikarin vê çarçoveyê, wek paralelî pêvajoyên bêmêtingehkirina (decolonisation) kurewî ya ku bi awayekî dîrokî em di rewşa sê pêlî de nimûneyên wê dibînin, bixwînin. Tevî van hemûyan, divê bal li perspektîfeke enternasyonalîst jî bê kişandin ku di nav warê siyasî ya kurdî de ew tim hebûye û di tehlîla herî fireh de meseleya kurdî di nav têkiliyên hegemonîk ên ku modernîteya kapîtalîst ew derxistine holê pênase dike. Ev perspektîf, bi wan îdîayan herekek dikin ku eger kêşeya kurdî ji ber taybetmendiya xwe bi tena serê xwe mîna têkoşîna rizgariya neteweyekê li dest bê hildan dibe ku ew têkiliyên siyasî, civakî, aborî, dîrokî û yên hêza global ên din ku ji kêşeyê re dibin bingeh an jî berdewamî pê didin, paşguh bike. Ji ber vê yekê loma ev perspektîfa hanê pêwîstiya xwendineke hîn bikitekit û ji bo ku di nav van hemû aloziya têkiliyan de bike ku berêtiyê/pêştiriyê bide femkirina kûrahiya meseleyê, di nav çarçoveyekê de çareseriyekê pêşkêş dike.

Bi palpiştiya vê nîqaşê, eger sê hêmanên sereke yên ku van hemû pênaseyên hanê dibire li vir were hejmartin, dê ev yek ji aliyê wesifê kêşeya kurdî ya di asta herêmî de zemîneke fehmbar pêşkêş bike: 1) Kêşeya kurdî meseleyeke nasnameyê ye: Nasnekirina hemû hêmanên çandî, dîrokî û yên têkildarî vîzyona dahatûyê yên ku nasname û avakirina nasnameyê mimkin dikin û mehrûmbûna bi temamî ya ji wan amûran e ku van hêmanan didin jiyandin an jî sînordarbûna pir a van derfetan; 2) kêşeya kurdî meseleyeke xwebirêvebirinê ye: şêweya wê, rayeyên wê, bingehên dîrokî yên ku xwe dispêrin wan pir cuda ne û tevî ew faktorên ku bikarin bibin mijara nîqaşên kûr û berfireh hebin jî, lê li encamê kurd nikarin xwe bi xwe bi rê ve bibin; 3) kêşeya kurdî meseleyeke navneteweyî ya naskirinê (recognition) ye: bi awayekî siyasî û qanûnî hem nasnekirina nasnameyê hem jî nasnekirina xwebirivebirinê ya li qada navneteweyî ye.

Li dawiyê pênasekirina vê meseleyê bi awayê ku ev meseleya tayînkirina qedera xwe bi destê xwe ye dê ne tiştekî şaş be. Lê belê diyarkirina qedera xwe hem di nav aktorên siyasî yên kurdî de meseleyek e ku gelek bergindên wê (carinan nakokiyên pê re) hene

hem jî ji aliyê wan dewletên hanê ve, ku wan ev mafê kurdan red kiriye, nakokiyeke sereke û damezirîner e. Mafê diyarkirina qedera xwe, wek zemîneke hevpar li vir cext hem li alternatîfên xweydewlet hem jî li yên derîdewletê dike. Li gel vê yekê, ji ber ku kêşeya kurdî bi gelek têkiliyên aborî, civakî û yên hêzê re ketiye nav hev û heta roja îroj hatiye, loma hewce ye ku çareseriya vê kêşeyê van hemû faktoran li pêş çav bigire. Ev rewşa rasterast bi avakirina qada siyasî ya kurdî ya dîrokî, civakî û siyasî ve pêwendîdar e.

## Qada siyasî ya kurdî çi pênase dike?

Qada siyasî ya kurdî, di bingeh de mimkin e ku wekî biyekbûna cografyaya kurdan a ku tê de dijîn, ya avanî û teşekulên wan ên civakî û siyasî yên ku bi awayekî dîrokî çêkirine, îrtibata van avaniyên hanê ya bi wan dewletan re ku li cografyaya Kurdistanê serweriya xwe ya siyasî û çandî çêkirine û bi awayekî tevahî, girêdaniya wan a bi jeopolîtîk, jeoekonomîk û jeososyal ên herêmî û global re were pênasekirin.[3] Ev têgihîkirina hanê ya ku ez dê li jêrê awayê wê yê hatina holê bi kitekit bikim, ruhiyeya xwe ji parçetiya dîrokî ya cografyaya Kurdistanê û ji bandora wê ya li ser kurdan, li ser herêmê û ya li ser pêvajoyên jeopolîtîk ên global werdigire. Ev têgih, di bingeha xwe de ji ber sedemeke analîtîk tê bikaranîn. Yanî mehneyeke siyasî, dîrokî yan jî ya civakî lê nayê barkirin.

Wek miheselayeke têgihîkirinê ya ku Agnew û Ferguson û Mansbach ew kiriye, watedarkirina “qada siyasî”, ji aliyê azadekirina wê ya ji konsepta terîtoryal (bejayî) a ku bi netewedewletê hatiye sînordarkirin, dê sûdwer be. Agnew (1994), ji têgihîkirina terîtoryal û binyadî wêdetir “qad”ekê (space) di konsepta wan tesîrên hanê de dinirxîne ku wan aşopiyên mekanî li ser pêvajoyên siyasî-aborî afirandine. Ferguson û Mansbach (2004: 67) jî, “qad”ê (ango qada siyasî) wek rêyên belavkirina nasname û sedaqetên girêdayî komên siyasî yên cuda pênase dikin û terîtoryalîtiyê jî tenê yek ji wan gelek formên hanê dibînin. Di pênasekirina yekem de, çendî di warê konsepta tesîra li ser pêvajoyên mekan de cexteke tenê hebe jî, lê di ya duyem de îcar girêdaniya nasname û aîdiyetê û cextkirina li hişmendiyeke komî derdikeve pêş. Di van her duyan de jî «qada siyasî» wî aliyê sînorên netewedewletê digire nava xwe. Bi vê konseptê, gengaz e ku qadeke siyasî dikare wek warekî wisan bê dîtin ku tê de pêvajoyên civakî, siyasî û

[3] Ev rewş ne tenê ji bo kurdan, hem ji bo wan nasnameyên etnîkî yên din ên ku li herêmê dijîn hem jî ji bo aîdiyetên dînî û hezhebî yên ku di nav van nasnameyan bi xwe de jî bûne xwedî cudahiyan, derbasdar e. Divê ku qada siyasî ya kurdî di nav vê konsepta fireh a etnîsîte, dîn/mezheb û cografyayê de were watedarkirin. Di vî warî de, ji bo du xarîtedarkirinên herî bipêşxistî bnr VESER 1 û VESER 2. Her wisan ji bo dabeşiya zaravayên kurdî yên li ser nexşeyê jî bnr VESER 4.

aborî pêk tên û sercema wan nasnameyan û aîdiyetan e ku ev pêvajo wan çêdikin.

Sînordarkirina qada siyasî (wekî di feraseta neteweya prîmordiyal de) bi demê yan jî (wekî di nimûneya netewedewletê de) bi mekan, ji ber ku bandor li wî aliyê sînorên diyar dike û di heman demê de têkiliyên wî aliyê sînor ên ku tesîr li wan dibe li derve dihêle, dike ku têgihîştina têkiliyan, avaniyan û pêvajoyan nemimkin bibe. Bi awayê hepskirina li nav sînorên netewedewletê nîqaşkirina hevbandoriyên civakî yên bi awayê spesîfîk, bi bikaranîna wan têgihan tê bikaranîn ku ew di lîteratûra zanistên civakî de mîna neteweperweriya metodolojîk (methodological nationalism) yan jî di lîteratûra têkiliyên navneteweyî de wekî analojiya navxweyî (domestic analogy) tê pênasekirin.[4] Têgih, tesbîta rexneyî ya bi awayî hesibandina heyî ya binyadeke civakî ya homojen a di nav netewedewletan de û tesbîta rexneyî li wê yekê digire ku zansitên civakî (û heta yên siruştî) di nav vî warî de li ser vê pratîkê dixebitin. Lê belê ji ber sînorên netewedewletê tekabulî mistewiyeke siyasî û ya çêkirî (artificial) dike ku ev a hanê ji ber vê yekê hatiye çêkirin, mistewiya analîtîk a ku neteweperweriya metodolojîk ew afirandiye, têra xwe di warê watedarkirina rasteqîniyên civakî de qîmnekir dimîne. Ev jî bi awayekî siruştî dike ku hem pêvajoyên siyasî-jeopolîtîk bên fehmkirin hem jî li ser awayê xebitîna wê rasterast tesîrekê dike. Bi palpiştiya vê nîqaşê mimkin e ku ev bê gotin: Di bingeha xwe de ji ber karakterê meseleya kurdî ya sînorbihur (trans-frontalière), ne mimkin e ku di nav terîtoryalîteya heyî de were fehmkirin.

Di nav vê çarçoveyê de, li şûna pênaseyên wekî Kurdistan an jî cografyaya Kurdistanê bikaranîna tebîra qada siyasî ya kurdî, gengaz e ku di çend rehendan de bê watedarkirin. Sedema herî sereke di heman demê de tesbîta bi awayê herî rasterast e: Nebûna wê rasteqîniya hanê ye ku dewleteke Kurdistanê ya xwedî şêweyeke diyar û ya ku îşaretî wan pratîkên siyasî, civakî û çandî nake, ku wê ew bi xwe çêkirine.Yanî meseleya kurdî ne eleqedarî nava dewleteke Kurdistanê ye, eleqedarî kêşeyên wan ên kolektîf in ku ew li li qadeke gelek berfireh dijîn û ev pirsgirêk li wan diqewimin. Bi vê palpiştiyê, rehenda duyem ew e ku dewletên meseleya wan a kurdî heye, wek ku teoriyên neteweperwerî û netewedewletê homojenîzasyonê pêşbînî dikin, di serî de ji ber têkoşîna kurdan a dîrokî, ji ber berxwedana komên xwedî nasnameyên cuda, wan nekariye ev yeka hanê pêk bînin. Yanî ew dewletên ku meseleya wan a kurdî heye, sirf ji ber hebûna vê kêşeyê neçar in ku hem bi hev û din re hem jî ji ber têkiliyên xwe yên bi hêzên herêmî û kurewî re, bi wan zorahiyên ku derketine holê û bi wan meydanxwastinan re bibilin (mijûl bibin). Rehenda sêyem jî, di nav kurdan de, li gel

[4] Ji bo nîqaşên li ser neteweperweriya metodolojîkî bnr Dumitru, 2014. Ji bo nîqaşa li ser analojiya navxweyî jî bnr Rosenberg, 2006: 308-9.

ku ew li welatên cuda dijîn û çendî sînordar be jî, hîn jî bi wan re hebûna heseteke piştgiriya navxweyî ye. Ev piştgiriya navxweyî, tevî ku tevgerên siyasî yên kurdî xwedî projeksiyonên îdeolojîk/polîtîk ên cuda ne û çêbûna rageşiyên wan ên bi hev û din re jî, wek tevahiyeke têkiliyên sînorbihur didome û ji gelek aliyan ve hem têkiliyên kurdan ên navxweyî hem jî têkiliyên wan ên ku bi hêzên herêmî û global re danîne, dişêwîne/dike ku şekil bigire. Ev rehendên hanê ku dînamîkên wan ên jêr jî hene, qadeke hevbandoriya siyasî tînin holê. Dîsan wek paralelî van, bi berdewamiya vê xebatê tebîrên Başûr, Bakur, Rojava û Rojhilat bi dorê ji bo pênasekirina wan herêmên ku kurd li Iraq, Tirkiye, Sûriye û Îranê bi awayekî gur li wan dijîn û bi awayekî siyasî meseleya kurdî di pileya yekem de hîkarî li wan dike, tên bikaranîn. Ev termînolojî, ji bo ku dînamîkên dîrokî, civakî, aborî û siyasî yên qada siyasî ya kurdî di nav konsepta xwe ya heyî de bên watedarkirin, ku dînamîk li gorî dewletan ji hev û din cuda dibin, hatiye tercîhkirin.

Eger em bi referansa Bozarslan (2013: 23) zelal bikin, mirov dikare têgiha "qada siyasî ya kurdî" ya ku di asta Rojhilata Navîn de hemû vebeyînên meseleya kurdî û hemû aloziyê wê li xwe digire, tercîh bike. Eger qada siyasî ya kurdî wek jêr-sîstemekê mirov aşopî bike ku li Rojhilata Navîn dînamîkên wê yên navxweyî hene û ew bi wesîteya van dînamîkan ji bilî bi yên herêmê û dinyayê re hevbandoriyê çêdike, dê bike ku ew nîqaşên ji niha bi şûn de bên kirin jî fehmbartir bibin.

## Pêkhatina qada siyasî ya kurdî

Me du pêkhateyên sereke yên qada siyasî ya kurdî, bi referansa cografyanasan diyar kiribûn. A yekem bandora mekan a li ser pêvajoyên siyasî, aborî û civakî; ya duyem jî di nav van pêvajoyan de çêbûna nasname, kartêkerî û aîdiyetan e. Çêbûna van a di nav qada siyasî ya kurdî de, gengaz e ku mirov bi wan sê rehendên hanê yên ku ketine nava hev û din bixwîne: Sînorên siyasî, zêhniyet û têkoşîn. Em bi diyarkirina wê yekê dest pê bikin ku sînorên siyasî li cografyaya kurdan a ku ew bi awayê dîrokî lê dijîn nekariye tesîra diyarker a mekanî bişikêne, lê belê li gel aîdiyetên wan ên cuda û nasnameyên wan ên parçedar, kiriye ku zêhniyetên mîna hev, bi hev re bikevin nav têkoşînên cur bi cur: Mecbûrîbûna pêkvejiyana di nav aştiyê de ya wek mekanî, zêhniyetên manendî hev û têkoşîna van a bi hev re, li dawiya dawî bi awayekî timî di bin gefê de ye.

### Sînor

Dîrokeke xulase ya kurdan, ku ew ji ber sînorên dewletan parçe bûne û bi awayekî

dîrokî bi pêwendiyeke lêzimiyê bi hev û din re girêdayî ne û ji ber ku bi heman zimanî diaxivin an jî heman çandê dijîn ev yeka hanê dike ku ew bi hev re xwedî piştgiriyeke navxweyî bin, loma ji aliyê watedarkirina dînamîkên îroj ve jî çavkaniyeke giring e.[5] Çêkirina sînoran bi awayekî dîrokî em dikarin di du merheleyan de hildin dest: Sînorên împaratorî û netewedewletan. Ev di heman demê de ji wan faktorên diyarker a yekem e ku kiriye qada siyasî ya kurdî di rewşa xwe ya îroj de konsolîde bibe.

Kurd demeke dirêj wek gelê sînorê du împaratoriyan jiyan. Sînorê pêşî yê di navbera nifûsa kurdan de jî, sînorê di navbera osmanî û sefewiyan de ye. Ev sînorê ku di encama Rêkeftina Qesra Şîrîna (1637) ya di navbera osmanî û sefewiyan de derketiye holê, guherdetiyeke pir zêde lê çênebûye. Çendî piraniya nifûsa kurdan û cografyaya Kurdistanê ya dîrokî li nav xaka osmanî mabû jî lê nifûseke ne kêm jî di bin kontrola sefewiyan de ma. Kurd di vê dewrê de wek gelên sînorên her du împaratoriyan, bi wesîteya mîrektiyên xweser ên ku bi awayê konfederasiyonên eşîran hatibûn avakirin, daxilî têkiliyên siyasî, leşkerî û aborî yên wan împaratoriyên hanê bûn ku di nav wan de dijiyan (McDowall, 1996: 27; van Bruinessen, 1992: 157–161). Ji bo împaratoriyan ev cografyaya ku kurd lê dijîn, qadeke dijwar bû da ku bikarin bi hêza zorê kontrol bikin, ji hêla din ve jî ji ber ku wê li dijî împaratoriya din pozîsyona stratejîk çêdikir îcar qadeke wisan bû ku diviya nehata windakirin. Ji ber van her du sedemên sereke, ev konfederasyonên eşîrî yên kurdan ku ew xwedî şêweyeke xweser bûn, ji bo împaratoriyan pir destdayî û guncayî bûn (van Bruinessen, 1992: 174). Ji aliyê kurdan ve jiyîna bi awayê parçeyê împaratoriyan, ji ber feraseta sînorên sist û têper kêşeyeke pir mezin çênedikir.[6] Di warê avakirina van her dînamîkên hanê de ku îroj hîn jî li qada siyasî ya kurdî serwer e bi awayekî rasterast tesîra vê rasteqîniyê heye. Ya yekem, bi bicihbûna kurdan a li herêmên bakurê silsileya çiyê ya Zagrosê ve eleqedar e ku ev yek jî pêkanîna avantaja parastinê ya stratejîk dide kurdan û binyadên wan ên siyasî. Ya duyem û ji aliyê kurdan ve rehenda ku dibe sedema dezavantajeke dîrokî û siyasî jî, ew xweseriya wan binyadên wan in ku wan bi xwe ew ava kirine û wekî berginda girêdayîmana bi împaratoriyan ve bi dest xistine, îcar nemaze di merheleya avakirina netewedewletan de ew bi xwe wek astengekê li pêşiya wan pêşengîtiyên neteweperwerên kurd xuya bûne ku wan têkoşîna serbixwebûnê dida. Ez dê vî qisimî li jêrê di çarçoveya zêhniyetan de bikim mijara nirxandineke berfireh. Çendî bi ketina rîska anakronîzmê be jî, di şertên siyasî yên îroj de ev avabûna dîrokî ya ku tevî veguherînên cuda lê qewimîbin jî, gengaz e ku mirov diyar bike hîn jî derbasdar

5 Tam li ser vê xalê, wekî ji terîfa Anderson (1991) a 'nêzikahiya xeyalî' (imagined affinity) ku ji bo avakirina neteweyê pênase kiribû yan jî ji 'forma pişgiriyê' ku Durkheim (2007) di pênasekirina civaka modern de ew aşopî kiribû, divê bi awayekî cuda binê wê piştgiriyeke navxweyî bê xêzkirin ku bi piranî aîdiyetên etnîk û pêwendiya xwînê ya şênber û têkiliyên xizmatiyê ew afirandiye ku di rewşa pêlan de digihîjin hev û din.

6 Ji bo nîqaşeke li ser împaratoriyan, sînorên sist û Rojhilata Navîn, bnr Ellis, 2015.

e. Dîtina nimûneyên vê, di du beşên piştî vê xebatê de dê minkin be ku bi taybetî veguherînên di bîst salên dawî de werin nirxandin.

Konsolîdasyona sînoran û bidestxistina mehneya xwe ya îroj, rasterast bi pêvajoyên avabûna netewedewletan ve têkildar e. Ew hevbandoriya di navbera wan dewletan de yên ku wan di pêlên dekolonazîsyonên duyem û sêyem de[7] serxwebûna siyasî bi dest xistiye û di ya wan civatan de ku li dawiya van pêvajoyên hanê wek xelkekî statuya wan nehatiye naskirin, çarçoveya herî fireh a meseleya kurdî ya li Rojhilata Navîn pêk tîne. Bi gotineke din, avabûna qada siyasî ya kurdî û veguherînên wê yên ku bi berdewamiya sedsalên 19'an û 20'î pê re çêbûne, pêvajoyên avabûna netewedewletan ku di çapana global de hîkariyê li dinyayê kiriye û têketina wê ya hevbandoriya bi binyadên civakî, siyasî û aborî re, ku li vê herêmê halê hazir ew hîn jî hene, dê bike ku rewş bêhtir fehmbar bibe. Ji vê dîrokê pê ve êdî em ne sînorên sist lê ji sînorên netewedewletan behs dikin ku çi qas diçe ew tên xurtkirin û li bin kontrolê tên hildan.

Eger di asta jenerîk de be jî hewce pê heye ku behs ji çêbûna van sînorên îro bê kirin.[8] Ew sînorê di navbera erdên berê yên osmanî de, Iraq û Îran jî tê de, ku îroj jî hîn serwer e, di destpêka sedsala 19'an de wek sînorên netewedewletan konsolîde bû. Sînorên Tirkiyeyê yên ku cografyaya Kurdistanê ji başûr ve birîn, di encama têkoşîna serxwebûnê de ku bi desteka kurdên di nav van sînoran de mayî pêk hatibû (Ji bilî nediyariya Iraq û Wilayeta Mûsilê - Sûriye û Xetayê), bi rêjeyeke zêde zelal bû. Sînorê di navbera Sûriye û Iraqê de, bi tesîra rasterast a Fransayê ku wê bi Rêkeftina SykesPicot (1916) a xwedî navê şuhreta xerab erdên osmanî yên Levantê wek warê xwe yê nifûzê diyar dikir û bi ya tesîra yekser a Îngiltereyê çêbû. Di encama têkoşîna wan a di navbera xwe de û ya bi hêzên cihkî re, daxwazên fransiz û îngilîzan çendî bi temamî pêk nehatibin jî, ev rêkeftin bû sedema dabeşbûna wan qadan ku îroj ew wek Rojava û Başûr tên zanîn.

Di nav van sînorên çêbûyî de navendîbûna pratîkên îdareyê, şideta dewletê û di pratîkên berxwedanê yên li dijî wê yên civakî û siyasî de, ku bi awayekî dîrokî qewimîne, ev yek diyarker in. Jixwe îdareyên qeçer û osmaniyan ku van du sed salên dawî li xwe digirin, pratîkên wan ên navendîkirinê hene (Matin, 2013). Ev

---

[7] Bi awayekî dîrokî minkin e ku ji sê pêlên dekolonîzasyonê bê behskirin. A yekem ew îlanên serxwebûnê ne ku li Parezemîna Amerîkayê di dawiya sedsala 18'an de dest bi çêbûna wan hatiye kirin, a duyem jî ew serxwebûn in ku di heyna Şerê Cîhanê yê Yekem de û piştî wê jî bi hilweşîna împaratoriyên rûs, alman, Habsbûrg û osmanî re ji erdên wan veqetiyane, ya sêyem jî ew serxwebûnên "dinyaya sêyem" in ku bi taybetî piştî Şerê Cîhanê yê Sêyem çêbûne (Kennedy, 2016).

[8] Li vir, ji ber ku bi piranî tê zanîn bê ew çi pêvajo bûn, loma dê bes be ku bi tenê ev yek were bibîrxistin û were îfadekirin ku bê ka ev mijara hanê di çêbûna qada siyasî ya kurdî de roleke çawan leyîstiye.

meyl li nav osmaniyan bi şêweya Fermana Tenzîmatê (1839), li nav qeçeran jî bi şêweya şoreşa Makeqanûnê (1906) û li dawiyê jî bi forma monarşî ya makeqanûnî çû serî û li Anadoliyê jî di sala 1923'yan de bi îlankirina komarê û îcar li Îranê jî bi derbeyeke desthilatê ket destê xanedaniya pehlewî û jê bi şûn de hewlên afirandina netewedewletê ya sekuler û homojen xurt bûn. Navendîbûneke mîna wê bi dorê dikare li Iraq û Sûriyeyê bi awayê merheleyî di pêvajoya bidestxistina serxwebûnê de bê dîtin ku ew di bin rejîmên mandeter ên Îngiltere û Fransayê de bûn. Ji aliyê qada siyasî ya kurdî ve encama rasterast a vê navendîbûnê ew e ku hem li derve hem jî li hundirû ji bo van dewletan hebûna kurdan wek gefekê hatiye dîtin û li wan warên ku bi sînoran hatine diyarkirin jî ew şidet ketiye destê hêza navendî ya pêkhatî ku bi awayekî rewa ew hatiye bikaranîn.[9]

Wek encam gengaz e ku ev bê diyarkirin: Wek dîrokî li gel hemû nakokiyên wê, binyada sereke ya ku jiyana bi hev re têk dide sînorên netewedewletan e ku di encama pratîkên navendîbûnê de berbiçav bûne. Ev yek ne tenê ji bo kurdan, lê rewşeke eleqedarî wan hemû gelan e ku li herêmê ne. Berhingariya li dijî pratîkên navendîbûnê yên dewletan, yek ji çavkaniyên sereke yên lihevxistinên demdirêj (protracted) in. Bi sînorên netewedewletan dabeşkirina wan qadên ku bi awayekî dîrokî mîna cografyaya Kurdistanê tên zanîn, divê ku ew di nav veguherînên hîn berfireh ên herêmî û kurewî de bên watedarkirin. Sînorên îroj di nav du merheleyan de çêbûn: A yekem dabeşbûna kurdan e ku ew gelê sînor ê du împaratoriyan bû; ya duyem jî li pey Şerê Cîhanê yê Yekem, piştî gelek împaratoriyan pêkhatina avakirina netewedewletan û li dijî hewldanên çêkirina qadên serweriyê yên hêzên emperyalîst ên Rojava jî bipêşketina berxwedanekê ye ku wê xwe dispart neteweperweriya serwer. Encama sereke ya ku vê ji bo qada siyasî ya kurdî derxistiye holê ew rasteqîniya kurdî ye, ku li dijî wan dewletên pawana şidetê di dest xwe de digirt, di rabêjiya hegemonîk de wek "asî" yan jî "hevkar" ji nû ve dihat avakirin.

---

[9] Li vir divê bi taybetî binî bê xêzkirin ku şideta dewletê ya berê xwe dide kurdan (û grûpên din ên civakî) ji aliyê elîtên siyasî ve dihat berhêlkirin û li gel kêşe û lihevxistinên cuda yên ku cih bi cih di navbera gelan de diqewimin jî, dîsan hevbandorî û pratîka pêkvejiyanê tim di nav wan de hebû. Tevî vê yekê, dîsan divê cext lê bê kirin ku di konsepta siyasî û îdeolojîk de, wek nimûne di nav kurdên komunîst an jî îslamî û di nav gelên ereb, tirk an jî faris de, di nav wan kesan de yên ku heman îdeolojiyê dipejirînin, xwebirêxistinkirina hevpar an jî hevkariyên dewrî tim hebûn. Di vê çarçoveyê de, bi pratîkên dewletê yên dameziraweyîbûyî hewce ye ku di navbera têkiliyên din ên civakî û siyasî de serî li cudakirinekê bê xistin. Lê belê ev rewşa hanê ya ku bi awayê siyasî ji jor ve û bi pêşengiya elîtan tê diyarkirin, ji ber ku bi demê re ji grûpên civakî yên ji hev cuda re îmtiyazan dabîn dike, loma pêwîst e bal lê bê kişandin ku ev yek nijadperestiyeke dijberî kurdan xwedî dike. Bi taybetî ji bo analîzeke bi hûrgilî ya der barê vê xala dawî de bnr Ünlü, 2018.

## Zêhniyet

Neteweperwerî ku divê ew wek modeleke civakî, siyasî û îdeolojîk tiştekî siruştî û bivênevê be, bi piranî bi wesîteya pêşengîtiyên neteweperwer ji Ewrûpayê ji bo Rojhilata Navîn hat îtxalkirin û wek faktoreke sereke ya duyem dikare bê fehmkirin ku wê di avakirina qada siyasî ya kurdî de rol leyîstiye. Binyada netewedewletê û sînorên wê, çendî îskeleta damezirawey î ya vê îtxalatê diyar dikir jî, neteweperwerî wek formasyoneke îdeolojîk ji sedsala 17'an heta îroj bûye dînamoya sereke ya gelek dagerîn û veguherînan. Di dema împaratoriyan de, bi awayê girêdayî feraseta umetê ew pratîkên pêkvejiyanê bi berbelavbûna neteweperweriyê re parçedariyên nû hilberandin. Mantalîteya sereke ya li vir, di konsepta pratîkên afirandina neteweya homojen de, ew hemû nasname yan jî aîdiyetên ku li derveyî wê homojeniyê diman, an bi destê dewletê tunekirina/tehcîrkirina wan an xaricîkirina wan an jî asîmilekirina wan a bi zorê ye (Conversi, 2007; Miley, 2018).

Li vir, ji awayê hereketkirina wan a ji navê "miliyeta mixayel" cuda, divê ji pêşengiyeke şoreşger a oryantalîst û ji subjektîvîteya ku wê ew ava kiriye bê behskirin. Xwendina vê subjektîvîteyê ya bi awayê ku ew jê agahdar e ew xwedî subjektîvîteyeke feraseta avakirina navend-rojavayî ye, lê ji bo sepandina wê ya bi awayê zorê ji xwe re tu asteng û ziyanê nabîne û bi armanca ku bi şoreşekê civakan derxe "asta şaristaniyên nûjen" tev digere, ji bo têgihîştina ji çêbûna neteweperweriyên li herêmê zanyariyeke kilîdî ye. Bi bandora modernîzasyonê ya ku paradîgmaya serwer e, tunekirina hemû şopên eleqedarî cihkiyê û pratîka asîmilekirina rasteqîniya jeososyal ya di nav wê forma kodkirî de, ku ji ber ew a pêşketî ye (Maldonado-Torres, 2016: 14), wek îcrayeke pêşengiya şoreşger a oryantalîst a ku oryantalîze bûye derket pêş.[10] Bi gotineke din, ji bo vê pêşengiya şoreşger a ku bi oryantalîzmeke xwemalîkirî tev digere, tiştê cihkî amaje bi subjektîvîteyekê dike ku divê ew bê medenîkirin, sererastkirin an jî bê rayê (Soguk, 1993).

Mimkinbûna van îcraetan, rasterast bi çavkaniyên îdeolojîk ên neteweperweriyan

[10] Ev argumana postkolonyal a ku di ruhiyeya xwe de îşaret bi mafdariyeke dîrokî dike, divê bal lê bê kişandin ku li Tirkiyeyê di rabêjiya hikûmeta AKP'yê de û bi awayekî qismî li dinyaya Îran û ereban tekabulî mistewiyeke polîtîk dike ku têra xwe kêşedar e. Xala hevpar a di van her sêyan de (û di hemû rabêjiyên postkolonyal ên din de ku ji rexneya dewletê bi awayekî azade hatine aşopîkirin), xwe dananîna li nedîtina têkoşîna wan a ku bi ûcba pêkanîna xeyala hegemonyayên xwe bi hêzên serwer re kirine û di vê çarçoveyê de jî mexdûriyetên xwe di zemînên xwe yên siyasî û civakî de çêkirine û têkiliyên wan ên tehekûmê yên hiyerarşîk in. Ango ev mafdariya dîrokî, wek bersiva li hedefên wan fealiyetên çêkirina ji bo tehekûmên cur bi cur, mîna fonksiyonel tên aşopîkirin û şixulandin. Rabêjiya Erdogan a bi etifkirina Konseya Ewlehiyê ya NY'yê ku hema bibêje tim tîne ser ziman "Dinya ji pêncan mezintir e" yan jî li Îranê rabêjiya rejîmê ya nijada aryen a mezin, ji bo vê wek nimûne dikare bê dayîn.

ve têkildar e. Teşeya pêkvejiyana civakî ya pirneteweyî ku ji împaratoriyan mane, bi armanca bipêşketin û nûjenbûnê bi rojavabûyînê re rû bi rû ma ku ji jor ve ber bi jêr ve dihat sepandin. Ev pêvajo li tevahiya wan çar dewletên hanê piştî şoreşekê, yan jî di encameke wê şikestinê de pêk hat ku dinavbera xwe û ya kevn de xêzeke zelal dikişand (Azeez, 2016). Di pey vê şikestinê de, formeke neteweperest a vederker bû serwer ku ew bi destê dewletê dihat şixulandin. Wek girêdaniyeke bi pêla dekolonîzasyona duyem a di asta global de jî ew serbixwebûn (a tam) ku mîna "standarda medeniyetê" dihat pêşbînîkirin, li herî dawiyê wek prensîpeke sereke bi cih bû. Bi gotineke din, bi rehendên wê yê diyar re, ji bo serederîkirina bi problemên ku ji emperyalîzma Ewrûpayê diqewin, li dawiya dawî serî li gazîkirina erkê ya neteweperwerî û netewedewletê hat xistin ku ew çareseriyeke navend-ewrûpî ne.

Tercûmekirina vê zêhniyetê ya li qada siyasî ya kurdî ya bi awayê rasterast, siyaseta asîmilasyonê bû. Çendî pratîkên ku ji dewletekê li gorî dewleta din ji hev cuda dibin hebin jî, kurd di bin van mercan de wek komeke wisan hatin kodkirin ku divê ew di nav neteweya homojen de bên medenîkirin û hîna tevî wê bên kirin. Dînamîka herî sereke ya siyaseta asîmilasyonê xwe dispêre esasê ku kurdîtî ne grûpeke cuda ye. Di somdariya vê siyaseta hanê de ya ku li Tirkiye û Îranê hat sebandin, bi dorê ew fereziyeya ku kurd tirk û aryen in, bi zorê di jiyanê de hat pêkanîn. Li Tirkiyeyê ev siyaset heta salên 2000'î rasterast li ser înkara hebûna kurdan hat avakirin, lê belê di encama wan têkoşînan de ku li salan belav bûne û gelek rehendên wan hene û her wisan li dawiya bedêlan, ev rewş nekarî bi awayekî siyasî bê berdewamkirin. Li Îranê, li şûna siyaseta înkarkirina kurdan, siyaseta divê ku kurd ji nijada aryan bên hesibandin û di vê konseptê de hat armanckirin ku ew li Îranbûnê bên asîmilekirin.[11] Zimanê kurdî ku hatibû qedexekirin, ji ber lidarxistina çalakiyeke ji bo perwerdehiya bi wî zimanî yan jî ya ji bo mafên kurdan, cezayên giran ên heta bi îdamê jî hatin dayîn. Heman siyaset li Iraqê îcar wek daxilkirina kurdan li neteweya ereb, yanî her koma ku qedera wan bi dewleta ereb ve girêdayî ye (kurd, ermen an jî reşik), li ser esasê hesibandina wan a wek ereb hat îcrakirin (Bozarslan, 1997: 49). Pratîka dewletê ya li Sûriyeyê jî xwe dispêre ser bingeha xaricîkirina kurdan. Tercûmeya vê esasê ya li pratîkên siyasî ew e ku xistina ji welatîbûnê ya nêzikî 300 hezarî kurdî û li cografyaya kurdan a ku bi awayekî dîrokî lê dijiyan bicihkirina nifûsa ereban, ango bi pratîkên şêweya Kemera Erebî avakirina waran pêk hatiye (Tejel, 2009: 51).

Divê cext li wê heman zêhniyeta modernîst a ku ji têkoşînên siyasî re hiştiye ku ew dê di sedsala 21'ê de jî bidomin û li avaniyên din ên ku di serdema împaratoriyan de çêbûne, were kirin. Ji van a yekem, îslama siyasî ye ku dê demxeya xwe yekser

11 Wateya peyva "Îran"ê ya bi awayê "welatê aryanan", ji vî aliyî ve tiştekî hînker e.

li bîst salên dawî bixe ku înşaya wê ya esas wek şêweyeke berhingariya li dijî modernîzasyona lêferzker a ji jor ve bi pêş ketiye. Di van pêvajoyan de, li şûna sekuleriyeke ku dibe wek şertê pêşîn ê damezirandina komareke demokratîk bê hesibandin, laîktiyeke kêşedar bi destê dewletê hat avakirin. Ev forma laîktiyê ya ji jor ve ku bi awayekî herî aşkera li Tirkiye û Îranê dihat çavdêrîkirin, em dikarin heman siyasetê heta salên 1970'yî li hemû Rojhilata Navîn çavdêrî bikin.[12] Wek nimûne, prensîpên Ataturk ên ku wek doktrîneke modernîzasyonê hatine nivîsîn, bi awayekî pir hêsan dikarî ku li Misirê ji hêla Nasir an jî li Îranê ji hêla Rîza Şah ve jî bihatina nivîsîn; ji lew re heman ruhî vedibeyînin (Richards û yên din, 2008: 465). Ev rewş, bi hildana nav cendereyên dewletê ya wan teşekulên dînî tevî girêdaniyên terîqet û cemaetan ku tesîr li mûhrehkên civakî kiribûn, bi encam bû. Ew laîktiya ku bi zorê dihat xebitandin, yek ji wan faktorên sereke ye ku wan bandor li pêkhatina îslama siyasî dikir. Di dewra Şerê Sar de, ew desteka NATO'yê ku bi armanca dorpêçkirina Sovyetan dihat kirin, wê kir ku îslama siyasî givrik bibe û piştre jî ew midaxele û mieyîdeyên din ên ku di serî de ji aliyê DYA'yê ve li herêmê dihatin kirin, bû sedema radîkalbûna van hêzan û bi cîhadkeriya wan bi encam bû (Matin, 2018).

Mimkin e bi awayekî herî berfireh ji bandorên li qada siyasî ya kurdî yên hem rasterast hem jî neyekser ên siyaseta ku bi referansên îslamî tên kirin, were behskirin. A yekem ew e ku teşekulên siyasî yên kurdî, nemaze yên xwedî tewereya PDK'yî, ku heta salên 1970'yî hîn nêzî çepîtiyê û bi meylên rizgarixwaziya neteweyî tev digeriyan, bi salên 1980'yî re referansên nerîtparêz û îslamî zêde kirin (Bozarslan, 2003). A duyem jî hebûna beşeke civakî ye ku ew çendî bi hesasiyetên xwe yên dînî angajeyî rabêjiyên siyasî dibin jî lê belê cextê li nasnameya kurdî dikin. Ev yek, wekî li Tirkiyeyê, çawan ku ji wan partiyan re yên bi referansên îslamî siyasetê dikin, destekê çêdike, wê mimkin kiriye ku li Iraqê îcar rasterast partiyên siyasî jî bên damezirandin. A sêyem, tesîra rasterast a rehenda mezhebî ya dîndarîtiyê ya li ser dagerîn û veguherînên qada siyasî ya kurdî ye. Li vir dînamîka diyarker a sereke ew e ku tevgerên siyasî yên kurdî di nav kodên çandî de asê bûne ku bi piranî nifûsa kurdan a sunî ew xêz kiriye û avaniyeke wisan pêk aniye îcar şiî, elewî û êzdî yên xwedî rewşeke kêmarî ya dînî û mezhebî ne, veder kirine.[13] Ev yek bandorê li giştgirî û berfirehbûna tevgerên kurdî jî dike.[14] Em dikarin ji bo vê yekê wan nimûneyan bidin ku tevgerên rizgarîxwaz a neteweyî ya ku xwe dispêre sunîtî û soranan nekariye li Îranê kurdên şîê îqna bike yan jî li Tirkiyeyê

---

12 Her çendî wan xanedaniyên li Kendavê xeta modernîzasyoneke ku xwe dispêre nerîtparêziyê ava kiribe jî, lê li van deran tu car laîktî nebûye prensîpeke bingehîn.

13 Li ser dabeşiya dînî û mezhebî ya di qada siyasî ya kurdî de ya ji bo nexşedarkirineke bikitekit bnr VESER- 3.

14 Awarteya herî mezin a vê, wekî dê di berdewamiya vê hemû xebatê de bê nîqaşkirin, ev vekirîtiya îdeolojîk e ku feraseta konfederal a demokratîk ew bi pêş xistiye.

beşeke diyar a kurdên elewî ku nemaze li dijî pest û tehdeyên îslamî yên ku ji ber zêhniyeta kurdên ehlê sune diqewime û hîn jî di bîra wan de bi awayekî cidî ev heye, angajeyî rabêjiyên siyasî yên laîktiya kemalîst bûne ku ew wê li şûna wê bi cih dikin. Wek a dawî, ku dê di her du beşên dawî yên vê xebatê de bi kitekit bê nîqaşkirin, divê binê îmaja kurdan a ku li dijî cîhadkeriyê şer dikin were xêzkirin ku bê çawan tesîrên wê yên rasterast li ser veguherîna qada siyasî ya kurdî bûne.

Di nav nîqaşên li ser zêhniyetan de, divê cext li ser eşîretparêziyê bê kirin ku ew dînamîkeke din a civakî ya veguherîna qada siyasî ya kurdî ye. Eşîret ku bi awayekî dîrokî yek ji binyad û avaniyên civakî ne û wan kiriye kurdîtî tune nebe, îcar ev avaniya melez a ku di encama têketina hevbandoriya zêhniyeta modernîzasyonê de derketiye holê, dike ku ew ji aliyê tesewirên hegemonîk ve bikeve nav formeke bikarbar (van Bruinessen, 2019). Pêvajoyên avakirina neteweyê ya kurdan, ji aliyekî ve wekî dê li jêrê ew bê nîqaşkirin, di têkoşînên hêzê yên xwedî bingeha neteweperweriyê de serkeftî nebûn. Lê li hêla din, hin eşîretên din ên ku ji xwe re qada serweriyê ya sînordar çêkiriye û bi navêndên hêzê re ketine nav têkiliyan, îroj bûn yek ji çavkaniyên mîkro yên herî sereke yên rageşiyên/tengijeyê siyasî yên di navbera kurdan bi xwe de. Roleke sereke ya vê zêhniyeta modernîst a jakoben a der barê qada siyasî ya kurdî de û subjektîvîteya siyasî ya ku vê çêkiriye, heye. Divê careke din binî bê xêzkirin ku ev feraset bi tenê ne ya tirkan, farisan an jî ya eraban e, di heman demê de ew pêvajoyeke wisan e ku kurd jî di asta elîtan de tê re derbas dibin û ev yek şertên îroj jî diyar dike. Astengeke din a mezin a li ber pêkvejiyana di nav aştiyê de, eger mirov wê li nav zêhniyeta modernîsta ku xwe dispêre homojenasyonê, bigere dê ne tiştekî şaş be. Ev rêbaza herî sereke ya dewletê ye ku dixwaze navendî bibe. Lê belê bi awayekî dîrokî aktorên siyasî yên kurdî jî -li gel qebûl û giştgiriya dewrî û vekirîbûna rabêjiyê- ji pratîkên vê homojenîzasyonê ne azade ne.

## Têkoşînên Cihkî

Pêvajoya modernîzasyonê, ku li du sed salên dawî yên osmanî serwer e, wekî li jorê bi awayekî qismî hat nîqaşkirin, pêvajoyek e ku ne tenê gelên tirk, ereb, ermen, yûnan û yên din di heman demê de kurdan jî tê de cih girt. Yanî kurd jî di wê dewrê de ku ji împaratoriyan derbasîbûna netewedewletan diqewimî, di nav wê tevgera hanê de bûn ku xwe dispart neteweperweriya kurdî (van Bruinessen, 1992: 229). Eger bi referansa ku xwe dispêre Hroch (1985) em binirxînin, di merheleya A'yê ya modernîzasyona neteweperwer de pêşengên neteweperwerên kurd wek ramanekê kurdîtî têgihî kir. Lê belê kêşeya esasî di merheleya B'yê de, ango di merheleya berbelavekirina vê ya li nav gel, pêk hat. Ji ber vê yekê jî merheleya C'yê, yanî pêkanîna tevgereke neteweperwer a li nav girseyên berfireh di vê gihanekê de bi ser nehat xistin. Di roja me ya îroj de jî bê

ev çi qas hatiye pêkanîn, hîn jî mijara nîqaşê ye.

Gengazbûna rewşeka wiha, bi teraza du têkiliyên-nakokiyên sereke dikare bê ravekirin. A yekem, nakokiyên di navbera giregirên kurdan ên bajarî û modernbûyî û wan serokên eşîr û şêxan de ye ku binyadên wan ên nerîtî yên siyasî û civakî xwedî giranî ne. Ya duyem jî dîsan di heman dewrê de, têkiliyên vê tebeqeya elît a siyasî û civakî yên bi hev û din re û yên bi navên hêzê yên cuda re ye.

Di vê kontekstê de, eger mirov di meylên navendîbûnê yên împaratoriyan de li kok û rehên meseleya kurdî bigere dê ne tiştekî şaş be. Refleksa hevpar a osmanî û qeçeran, modernbûna defansîf bû, ku çi qas diçû ew li dijî wan dewletên li Ewrûpayê, yên ku di encama pratîkên kolonîzasyon û emperyal de li hundir zengîn dibûn û bi vê yekê re di asta kurewî de jî ew dibûn yek ji hêzên hegemonîk ên ku qels diketin (Anievas û Nişancioglu, 2015). Li gorî vê, împaratoriyên ku wan dest bi xurtkirina navendê, ji bo zêdekirina kapasîteya reqabetê bi nûkirina artêşê û di vê çarçoveyê de jî dest bi bipêşxistina têkiliyên bi Ewrûpayê re kir, îcar dest bi avêtina gavên navendîkirinê ya wan şêweyên birêvebirinê kir ku wan ew ji sedsalên berê dewr wergirtibûn. Yek ji encamên vê pêvajoyê ya rasterast, xerakirina binyadên siyasî bû ku wan xwe di nav mîrektiyên kudan ên xwedî formeke otonom de birêxistin kiribû. Di nîvê duyem ê sedsala 19'an de, mîrîtiyên Baton û Baban ku jixwe ji berê de têkiliyeke wan a kêşedar bi hev re hebû, wek encameke raserast a siyaseta navendîbûnê ya împaratoriyan ji hev parçe bûn (Bozarslan, 2013a; Matin, 2013). Mîrîtî li gel berhingarî û berxwedanên xwe jî li dijî pêvajoyên veguherînê qels man. Ev têkoşîna ewil a ku derketiye holê, eger wek têkoşîna ku qada siyasî ya kurdî ava kiriye bê pênasekirin, dê ne tiştekî şaş be.

Rola giring a ku mîrîtî di navbera navendên hêzê û gelê kurd de leyîstiye, piştî ev belav bûn îcar bû sedema valahiyeke hêzê û li Kurdistanê axa û şêxan dest pê kir ev valahî dagirt. Navendên hêzê yên cur bi cur (em dikarin van wek osmanî û hêzên emperyalîst ên ku hewl didan li herêmê serweriyê pêk bînin pênase bikin), parçebûna di navbera axa û şêxên kurdan de, bi armanca siyaseta parçe bike- îdare bike ev yeka hanê li dijî wan bi kar anî. Wek paralelî vê, mîrên kurdan ên ku li navenda osmanî di qedemeyên cur bi cur ên kargêrî, leşkerî û burokratîk de hatine erkdarkirin jî, mîna pêşengên gelên din ên ku li nav osmaniyan dijiyan dest bi kudirandina ajandeyeke neteweperwer kir. Lê belê têkiliya van mîrên hanê ya bi civaka li Kurdistanê re, têra xwe sînordar bûn. Di nav vê dînamîka dumend de axa û şêxên cihkî (mehelî) hîn bêhtir xwedî helwesta aliyê osmanî yanî li aliyê umet û împaratoriyê bûn, lê mîr û begên li bajaran bi qonaxa demê re tevî ku ew lê xebitîn xeta xwe ya neteweperweriyê xêz bikin jî lê ji ber têkiliyên wan ên bi kurdên li cihkî sînordar bûn, nekarîn vê hewla xwe girseyî bikin (Bajalan, 2016; Ozoglu, 2001). Çendî ev pêker (faktor) pêkereke navendî be

jî ya rast ev parçebûna hanê li ber avakirina neteweperweriya kurdî ne tek pêkerek e. Bandorên vê parçebûnê nemaze li roja îroj, bi dabeşbûn û parçebûnên modern ên din re ku bi demê re di nav kurdan de derketin holê bi yek bû û vê rewşê di avakirina qada siyasî ya kurdî û berdewamiya wê de, roleke giring leyîstiye.

Piştî qada siyasî ya kurdî bi sînorên netewedewletê parçe bû bi şûn de, gengaz e ew kevneşopiya têkoşîneke ku cudahî dibe û her diçe eksantrîk dibe, bi berdewamiya sedsala 20'î were çavdêrîkirin. Li vir ji aliyê aktorên siyasî yên kurdî ve dikare ji têkoşînên ku dînamîka wan a sereke ji du cudahiyan heta ji yên ku pirî caran hev dibirin, bê behskirin. Ji aliyekî ve kevneşopiyên/nerîtên têkoşînê yên Rojhilat û Başûr ji aliyê din ve jî yên Bakur û Rojava ku hevpar dibin, bi rêjeyeke zêde ji xetên siyasî yên îroj re jî çavkananîtiyê dikin. Nimûneyên vê yên ku herî zelal tên fehmkirin Komara Mehabadê û Rêxistinbûna Xoybûnê ye. Li Îranê di serî de îsyana Simko, çendî serhildanên kurdan ên li ser bingeha eşîrî yên ku di salên 1920'î de çêbûne negihîştibin encamê jî, di 1941'ê de piştî dagirkirina Sovyetan a bakurê Îranê derfeteke jeopolîtîk çêbû. Bi pêşengiya Qazî Mihemed ji vê dîrokê pê de Mehabad û derdora wê ya ku hikûmeta gelê kurd ew bi rê ve dibirin, di sala 1945'an de serbixwebûna xwe ragihand. Lê belê li dawiya pesta li dijî Sovyetan ku serî Îngiltere û DYA'yê dikişand da ku ew ji Îranê vekişe, Mehabad ku wek komarek ji maweya salekê kêmtir jiya, di sala 1946'an de hilweşiya. Yek ji sedemên sereke yê vê belavbûnê ew bû ku eşîrên veguherîn û dagerîna pêvajoyan dixwendin wan desteka xwe ji Qazî Mihemed kişand û li dawiya vê jî ew îhtimala hanê bû ku berxwedana li dijî leşkerê Îranê dibe bibûya sedema qetliamekê (Eagleton, 1963). Di vê dewrê de Mele Mistefa Barzanî ku wek fermandarê artêşa Komara Mehabadê li vir bû, berî ku Mehabad bipelişe avakirina PDK-Iraqê jî îlan kiribû. Barzanî piştî pelişîna Mehabadê bi hêzên di bin fermandetiya xwe de, tevî bi berxwedana li dijî leşkerê Îranê bi ser keft ku derbasî xakên Sovyetan bibe. Ji vê mêjûyê pê de, ya rast têkiliya di navbera van her du avaniyan de, bi îhanetên navxweyî û bi hevparîtiyan heta îroj hatin. Îroj sedemên bingehîn ên ku PDK-Îran û fraksiyonên cuda yên Komalayê li kampên Başûrê Kurdistanê hene, digihîje heta van dewran.

Xoybûn jî ew binyad e ku li Tirkiyeyê piştî îlana komarê bi şûn de komek giregirên kurdan ên ku di pey pêkhatina Serhildana Şêx Seîd de derbasî Rojava bûbûn û ji wîr jî çûbûn Şamê ew dameziradibû û paşê wê pêşewatî li Serhildana Agiriyê kiribû. Lê Serhildana Agiriyê bi şideteke mezin a dewletê, bi qetliama sivîlan hat serkutkirin ku li herî dawiyê jî ew wek Qetliama Geliyê Zîlan derbasî nav rûpelên dîrokê bû. Di salên 1937-38'an de li Dêrsimê, li dijî siyaseta dewletê ya navendî ku wê armanc dikir nasnameya kurdên elewî veguherîne û di rabêjiya dewletê de jî wek vebeyîna "medenîkirin" û "bipêşxistin"a herêmê xwe dida der, serhildaneke çêbû. Ev serhildan jî, ku dê piştre wek Qetliama (yan jî Jenosîda) Dêrsimê bê pênasekirin, bi şideteke

gelek mezin a dewletê bi dawî hat anîn. Piştî vê dîrokê, di nav sînorên Tirkiyeyê de heta salên 1950'yî tu liv û tevgerek çênebû. Her gavê ku di çarçoveya daxwazên siyasî yên kurdan de hat avêtin, bi tundiyeke pir mezin a dewletê hat tepeserkirin. Ji salên 1950'yî pê de, tevgera ku birêxistinkirina xwe bi derfeta vekirîtiya polîtîk a li Tirkiyeyê bi pêş ve dibir, li ser bingeha herî sereke ya ku xwe spart rewşenbîr û giregiran, karî ku bi pêş bikeve. Bi salên 1960'î re, tevgera kurdî ya ku bi taybetî di nav TÎP/Türkiye İşçi Partisi (Partiya Karkerên Tirkiyeyê) û derdora wê de xwe bi rêxistin kiribû, bi salên 1970'yî re bi pêşengiya ciwanên ku bi armanca têkoşîna çekdar tev digeriyan, çi qas ku çû radîkaltir bû. Li Tirkiyeyê hemen berî derbeya 1980'yî û piştî wê, rêxistinên ku di nav wan de tevgerên kurdan jî hebûn, çûn kampên Rêxistina Rizgariya Filîstînê yên li Bekaayê. PKK ku yek ji van bû, ji vê serdemê ve bi herêmên kurdan ên li Rojava re di nav hevbandoriyeke yekser de xebata xwebirêxistinkirinê jî domand. Têkiliyên di navbera Rojava ku jixwe pê re nêzikiyeke dîrokî û çandî hebû û Bakur de, bi awayekî hîn organîktir bi pêş de çûn.

Lê ji bilî vê, jixwe têkiliya di navbera aktorên siyasî yên her çar parçeyan de tim hebû. Ango têkiliyên di navbera Rojava - Bakur û Rojhilat - Başûr de hev veder nedikirin. Têkoşîna siyasî ya kurdî heta salên 1980'yî bi awayekî rêjeyî wek tevgereke rizgariya neteweyî ya xwedî meyla çepî domiya. Nemaze xeta têkoşînê ya li Rojhilat û Bakur, di vê çarçoveyê de geşe bi xwe da. Lê belê piştî 1975'an tevgera kurdî ya ku dê li Başûr veguheriya, di bingeha xwe de bi sedemên pratîk dê xwe li xeteke wisan bigirta ku çi qas diçû ew mihafezekar dibû (Bozarslan, 1997: 122–130). Di salên 1990 û 2000'î de, ku dê di beşên piştre de hîn bêhtir bi awayekî bikitekit bê nîşqaşkirin, di koka pêkhatina çetelîbûna îdeolojîk-polîtîk a qada siyasî ya kurdî de, ew dînamîkên ku di vê dewrê de çêbûne hene.[15] Ya rast ev her du çetelîbûnên hanê yên ku jê bi şûn de di kevneşopiya têkoşînê de xuya bûne, li ser rexnegirtina li Sovyetan avakirî bûn: Rexnekirina neteweperweriya kurdî ya adetî/nerîtî hîn bêhtir xwe dispart sedemên pragmatîk lê ya din li ser rexnegirtina enternasyonalîsat a sosyalîzma reel, xwedî armanca xêzkirina xeteke xwebirêxistinkirina îdeolojîk û polîtîk a nû bû.

Ji bo pêvajoya ku di derketina holê ya qada siyasî ya kurdî de diyarker e û ji bo her sê pêvajoyên diyarker -ev sînor, zêhniyet û têkoşînên hanê- ku di vê beşê de tevî avabûna dîrokî tên nîqaşkirin, wek encam mimkin e ku mirov vê bibêje: Di konteksta

---

[15] "veguherîna îdeolojîk-polîtîk" ku ez dê di beşên piştî vê de jî pirî caran bi kar bînim, wekî sepandina bêşert a xeteke qethî ya îdeolojîk ji zemîneke mitlaqiyetê zêdetir, elqedarî temsîliyetên serdemî/dewrî ya texeyula rizgariya nîhayî ye ku ew di nav pêvajoyên siyasî de vediguherin. Ji ber ev pênasekirin ji rêsaya/qaydeyê pragmatîzma rêxistinî ya "her rêya ku diçe armancê mibah e" heta bi awayên bikaranîna wê yên cuda gelek helwestan li xwe vedihewîne, loma dagerîna ku bi aktorên siyasî yên kurdî re çêbûne, dike ku rê li ber îrcakirina/daxistina wê ya li zemîneke bi tenê ya îdeolojîk an jî bi tenê ya polîtîk bigire.

zêhniyetên herêmî û têkoşînên cihkî de pêwîstiya hildana dest a çêbûna nasnameyên cuda û aîdiyetên ku bi sînorên siyasî nikarin bên sînordarkirin, ji bo her cure nîqaşên li ser aştiyê yên di şertên roja me ya îroj de, xwedî rêbazeke wisan a bivênevê ye. Di serî de li pêşiya pêkvejiyana di nav aştiyê de, ew sînor, zêhniyet û awayên têkoşînê hene ku li vir ez lê xebitiîn da wan xulase bikim. Watedarkirina veguherînên ku nemaze bi tevahî Rojhilata Navî û bi taybetî qada siyasî ya kurdî di van bîst salên dawî de di wan re bihurîne, di watedarkirina van dînamîkên dîrokî-sosyolojîk re derbas dibe ku ew çêbûna vê yekê mimkin dike. Bi gotineke din, bi armanca watedarkirina pêkvejiyana di nav aştiyê de ji analîzên aktorên siyasî yên xwedî navendparêz- ewrûpayî wêdetir hewce dike ku perspektîfeke analîtîk bê çêkirin û ew veguherîn û dagerînên ku di asta jeopolîtîk de pêk tên jî divê tevî rehendên wan ên dîrokî, civakî û global bên nîqaşkirin. Ew paşxaneyeya dîrokî-sosyolojîk a ku heta niha me ew çêkiriye, em dê di beşa piştî vê de nîqaş bikin bê ka çawan dikare li dînamîkên jeopolîtîk bê tercumekirin.

## Dînamîkên sereke yên civakî û jeopolîtîk ên qada siyasî ya kurdî

Wekî li jorê hat vegotin ew nakokiya sereke ya ku pêvajoya siyasî ew derxistiye holê û di çavkaniya qada siyasî ya kurdî de cih girtiye, mimkin e mirov wiha îfade bike: Li dijî têkoşîna kurdan a dabînkirina mafê diyarkirina qedera xwe, têkoşîna serkutkirina vê yekê ya dewletan a ji bo bekaya xwe. Tevî vê, lêgerîna çareseriyê ya kêşeye kurdî ne di asta herêmî de lê ya ji bo li welatan bi awayê teko teko û hildana dest a wekî ku ev bi tenê meseleya navxweyî ya wî welatî ye, bêçareseriyê ji nû ve çêdike. Di çavkaniya vê de, di dinyayeke netewedewletan de zemîneke rewatiyê (meşrûiyetê) ya ku li ser prensîpa serweriya neteweyî hatiye avakirin heye. Ev nakokiya damezirîner, hem ji bo aktorên siyasî û civakî yên kurdan hem ji bo dewletên ku li cografyaya Kurdistanê hatine avakirin hem jî ji aliyê veguherînên jeopolîtîk ên herêmî û kurewî ve gelek dînamîkên lihevxistinê çêdike. Ev dînamîk, faktorên herî sereke ne ku ew hem aştiya navxweyî ya kurdan hem jî şertên lihevaştbûnê yên aktorên siyasî yên bi dewletên eleqedar re, diyar dikin.

### Ji aliyê aktorên siyasî yên kurdan ve

Ji aliyê aktorên siyasî û civakî yên kurdan ve, gengaz e hêmana herî sereke di nav hevkêşeya berxwedan-asîmîlasyonê de bê pênasekirin. Wekî li jorê jî hat nîqaşkirin, yek ji nuqteyên herî sereke ya ku her çar dewlet li serê hevpar bûne û wan bi xwe jî berê di wexta xwe de di çarçoveya mafê tayînkirina qedera xwe de ji bo wê têkoşînek

kiriye, redkirina mafê diyarkirina qedera xwe ya kurdan e. Ev, ji aliyê aktorên siyasî û civakî yên kurdan ve dikare bi du awayî bê bersivandin. A yekem, nekirina tu tiştekî ye. Encama siruştî ya vê yekê, bişivîna/helîna li nav vegêraneke mezin a neteweyî ya xwedî çavkaniya dewletê û wê nasnameyê ye ku wê ew afirandiye. Vebijêrka duyem jî berxwedaneke siyasî yan jî civakî û di encama wê de bi awayekî dabînkirina mafê diyarkirina qedera xwe ye. Encama xwezayî ya vê alternatîfê jî, di her şekilî de tê mehneya hatina hemberî hev a bi wê dewletê re ku di nav de cih digirin. Gengaz e ev dînamîka hanê ya ku vê cendereya durehendî ew aniye holê, di temamî qada siyasî ya kurdî de bê çavdêrîkirin.

Ji aliyê aktorên siyasî yên kurdan ve mijareke (yan jî qelsiyeke) din a jeopolîtîk a giring jî nîqaşa «pêkneanîna yekîtiya neteweyî» ye. Bicihkirina parçebûna zêhnî ya li kana vê dê guncayî be. Çawan ku li jorê jî li serê nîqaş hat kirin, ji ber kurdan berî ew sînorên ku bi wan ji hev hatine parçekirin qayim/konsolîde bibin, hişmendiya nasnameya neteweyî tam cihgir nekiriye, nekarîn kartêkiriyekê çêkin. Vê, bi qonaxa demê re jiyîna sosyalîzasyona bi gelên din re yên ku bi wan re di nav heman dewletê de cih digirt, rasteqîniya ku bazirganiya xwe, perwerdehiya xwe, berxwedana xwe ya siyasî û hemû danûstandinên xwe yên din di nav sînorê vê dewletê de pêk dianîn destek kir û kir ku berdewam bibe. Ji aliyê qada siyasî ya kurdî ve encama rasterast a vê rewşê jî ew e ku ew meseleya kurdî ya her herêma Kurdistanê wek kêşeya xwe pênase dike û li dawiyê perspektîfa çareseriyê jî li gorî parçeyê ku tê de ye pêk tîne. Hafizeya kolektîf a ku di bin van mercan de çêbûye, bi dayîna referansa dîroka herêma têkildar mezin bû û kartêkeriyên/hestyariyên neteweyî jî maweyeke dirêj bi herêmên xwe ve sînorkirî man (Vali, 1998).

Perspektîfa çareseriyê ya di tevgerên rizgariya neteweyî de ku ew xwe dispêrên paşxaneyeke wiha, bi awayekî teorîk çendî tevahiya Kurdistanê ji xwe re bikin armanc jî, di pratîkê de bi piranî bi şêweya berêtîdayîna bi kêşeyên herêma ku ew tê de ne, pêk hat. Vê rewşê kir ku perde li ber wê rasteqîniyê bê kişandin ku diviya di asta herêmî de li çareseriya meseleya kurdî bihat gerandin û meseleya kurdî li nav teko teko dewletan bê hepskirin û ji ber ku navendîtiya dewletê ji nû ve hildiberîne û aktorekî siyasî jî berêtiyê dida kêşeya parçeyekî, ev jî bû sedema hilberandina dînamîkên jeopolîtîk ên ku wan dikir car caran ew bi tevgerên kurdî yên li parçeyên din re bên pêşberî hev û din.

A rast di navbera rêxistinên kurdan de rêkeftinên siyasî û kartêkiriyên hevpar ên civakî tim çêbûn. Ji aliyê siyasetê ve, wek nimûne, ya ku rê li ber PKK'yê vekir da li Qendîlê bi cih bibe ew rêkeftina di navbera Ocalan û Barzanî de ye. Mînakeke din jî (wek pêwendiya bi dînamîkên din re) dikare bê dayîn ku PDK-Îran û Komala hîn jî

li xakên di bin serweriya birêvebirina herêmî ya Kurdistana Iraqê de xwedî kamp û baregehan in. Li gel van yekan, Enfala wek kampanyaya jenosîdê ya Sedam Huseyn a di asta civakî de yan jî wek bûyerên berxwedana Kobaniyê ya li dijî DAÎŞ'ê ku bandorê li hemû kurdan kir jî, di asta civakî de ji bo kartêkiriyên hevpar wek mînak dikare bê dayîn (Guneş, 2019: 10). Lê belê hewldanên cur bi cur ên ku xwebirêxistinkirineke neteweyî armanc dikir û çendî dîrokeke diyar a van hewldanan hebe jî (bnr. Bajalan, 2009) lê vê parçetîbûnê zemînek afirandiye ku ew ji aliyê siyasî ve têra xwe ji bo bikaranîn û amrazîkirinê vekirî ye. Ez dê vê xalê di nav nîqaşa jeopolîtîkaya kurewî û herêmî de hîn bêhtir zelal û aşkera bikim.

## Ji aliyê dewletan ve

Ji aliyê siyaseta navxweyî ya wan dewletan ve yên ku nekarîne wê nifûsa kurdan a li nav xwe asîmîle bikin dînamîka sereke ya qada siyasî ya kurdî ew feraseta siyasî ye ku cudahiyên di nava xwe de bi meseleya xwe ya beqayê û wek îrtibata bi lêgerîna serweriya neteweyî ya bêşert re kêşeyîkirina wan e. Ya rast gava ev dewletên hanê li gel berxwedanên kurdan li dest bên hildan, dê bê dîtin ku vê rewşê kiriye ew ji dema avabûna xwe ve neçar bibin bi dînamîkeke navxweyî re mijûl bibin û rû bi rû bimînin.

Di nav qada siyasî ya kurdî de ev dewletên ku li hemberî hev pozîsyon hildane, ji aliyê hevkêşeya jeopolîtîk a herêmî ve jî dînamîkekê li xwe vedihewîne. Li dewleteke ku pirsgirêka wê ya kurdî heye di çarçoveya mafê kurdan an jî wek komeke nasnameyî di warê statuyê de gava başbûnek, dagerînek an jî guherînek çêdibe, ev yek dike ku yên din jî ji ber meseleya xwe ya kurdî bikevin nav rewşeke teyaqûzê û loma jî zemînek pêk tê da ku ew rasterast an jî nerasterast midaxele li vê bikin (Bozarslan, 1997: 45 û yên din). Ev jî dibe sedema pratîkeke wisan ku ew hewl dide li pêşiya bipêşketineke erênî ya eleqedarî kurdan a li parçeyekî din bend daîne. Em di sedsala 21'ê de têra xwe rastî nimûneyên herî berbiçav wekî vê yekê hatin. Wek mînak, hema bibêje bi awayekî koordîne lidijderketina Îran û Tirkiyeyê ya li referandûma serbixwebûnê ya birêvebirina herêmî ya Kurdistana Iraqê, yan jî bi çendî caran têketina Rojava ya leşkerên Tirkiyeyê ya bi awayê zorê, vê dînamîkê nimûnedar dike.

Dînamîka duyem a dikare bi vê re bê nirxandin jî, ew dewletên ku mesleyeke kurdî ya aîdî wan heye dikarin kêşeya kurdî ya li welatên din di konteksta berjewendiyên xwe yên jeopolîtîk de li dijî wan dewletên din bi kar bînin. Ev rewş dibe ku bi kêrî berjewendiyên aktorên kurdan ên siyasî û leşkerî were ku armanca wan ew e ji nakokiyên cografyaya ew tê de ne sûdmend bibin û ajandaya xwe bi pêş de bibin. Di nav nimûneyên vê yên herî berbiçav de, ew têkilî dikarin bên nîşandan ku Hafiz Esad bi navbeynkariya El Muxeberatê bi armanca ku bend li pêşiya berjewendî û

hedefên herêmî yên Tirkiyeyê yên cur bi cur bikêşe, têkilî bi Ocalan re danîbû. Wek a dawî ew dînamîka ku em dê jê behs bikin jî, ew hewldanên wan hêzên hem herêmî hem jî yên global in ku li nav qada siyasî ya kurdî di nav lêgerîneke serweriyê de dixwazin midaxele li karê navxweyî yê wan aktorên ku ji xwe zeîftir bikin an jî wan aktoran amrazî bikin. Bi dînamîkên wekî van re, hem aktorên siyasî yên kurdan hem jî dewletên herêmî rû bi rû dimînin. Ev dewletên hanê di vê çarçoveyê de aktorên siyasî yên kurdan ku ew bi wan re tê dikoşin, pirî caran wan bi awayê bûyîna pêleyîstokên destê emperyalîzmê yan jî yên hêzên derveyî sûcdar dikin.

## Ji aliyê têkoşînên jeopolîtên ên kurewî ve

Cografyaya Kurdistanê hem ji aliyê dîrokî ve hem jî di bin şertên aktuel de tam li nîveka gelek bendbendîbûnên jeopolîtîk û jeososyal de wek herêma tampon cih digire. Bi awayekî dîrokî mîna ku li jorê jî hat nîqaşkirin, ji ber ew gelê sînorê du împaratoriyan e yan jî ji ber ew li navenda wan waran in ku piştre îngilîz û fransizan xwast li wir nifûza xwe çêkin, loma ev rewşên wisan xwedî merhaleyên dirêj in ku bandora wan li îroj jî dibe. Em dikarin ji cografyeyeke Kurdistanê behs bikin ku ew di dewra Şerê Sar de, li bakur (berî şoreşê) bi wesîteya Îran û Tirkiyeyê û ji ber ku Sûriye û Iraq jî hîn bêhtir nêzî Sovyetan bûn, ew di navbera NATO û Pakta Waşowayê de mabû. Ji bilî vê, rewşa mayîna li navbera başûrê cografyaya Kurdistanê ku bi piranî ereb û ya bakurê wê jî ku bi piranî tirk û faris bûn, heye (Unver, 2016). Di bin mercên aktuel de jî qada siyasî ya kurdî yek ji wan warên jeopolîtîk e ku Rûsya û welatên Rojava li wir tên pêşberî hev. Di analîzên qada siyasî ya Kurdistanê de, divê li gel cografyaya kurdan a ku jixwe parçekirî ye û zêhniyetan, ev pozîsyona herêma tampon a jeopolîtîk û jeososyal li pêş çav bê girtin.

Ew dînamîka sereke ya ku dikare ji hêla rêzkirîbûnên jeopolîtîk ên kurewî ve bê nirxandin, dibe ku ji aliyê kurdan û wan dewletên hanê ve yên ku ew di nav wan de dijîn, bi du awayên cuda nirxandin li serê bê kirin. Ji aliyê kurdan ve, tevgerên siyasî yên kurdan ku qels in, bi berdewamiya dîrokê tûşî hewlên amrazîkirin û pratîkên hêzên emperyalîst ên derî herêmê bûne (Matin, 2020). Nimûneya herî dawî ya vê yekê, dikare wiha bê dîtin ku çawan DYA'yê li dijî DAÎŞ'ê destek da hêzên YPG û YPJ'yê (piştre bi tevlibûna yekîneyên din wek QSD'yê hat binavkirin) û piştî ku hebûna terîtoryal a DAÎŞ'ê ji holê rabû bi şûn de jî bê çawan bi awayekî vekirî ew ji midaxelekirinên artêşa Tirkiyeyê re hiştin.[16]

[16] Cexta li vir eleqedarî niyeta DYA'yê ye. Nexwe têkoşîna ku hêzên YPG û YPJ›yê ew ji bo parastina herêma xwe kiriye, jixwe bi tena serê xwe hewceyî asta mistewî û analîzeke din e.

Li gel vê yekê, hêzên kurewî tim xwastiye ku di qada siyasî ya kurdî de zeafên wan dewletan ên ji ber meseleya kurdî, bi kar bînin û di asta herêmî de jî li rêya bipêşxistina berjewendiyên xwe geriyane. Wek mînak, tevî ku Sedam Huseyn li ser bingeha desteka DYA'yê ew qas mezin bûbû û bi kampanyaya Enfalê jî ew di Qetliama Helebçeyê de bêdeng mabû jî (Chomsky, 2003), ew tiştên bi nufûsa kurdan hatine kirin, di çarçoveya mafên mirovan ên kozmopolîtan de, bûye yek ji sedemên midaxeleya sala 2003'yan a li Iraqê (Çubukçu, 2011).

Wek encam mimkin e ku ev bê diyarkirin: Di qada siyasî ya kurdî de, di nav aştiyê de jiyîna kurdan a bi gelên din re, di bingeha xwe de têkildarî dînamîka berxwedana li dijî asîmîlasyon û înkarê ye. Ev dînamîk rasterast hem aştiya navxweyî ya kurdan hem pêvajoyên jeopolîtîk ên herêmî hem jî hevbandoriya bi binyadên hegemonîk ên kurewî re diyar dike.

## Bi destpêkirina sedsala 21'ê re aktorên siyasî yên kurdan

Armanca sereke ya analîzên ku heta niha hatine kirin, wekî di destpêka xebatê de jî hat aşkerakirin ew e ku veguherînên di sedsala 21'ê de derketine holê bên watedarkirin û bi palpiştiya van analîzan jî îhtimalên jeopolîtîk ên hewlên çareseriyê yên li ser bingeha aştiyane û mizakereyê bên nirxandin. Di vê çarçoveyê de divê aktorên siyasî yên kurdan bi tevahî bên dîtin û hevbandoriya wan a bi aktorên din re yên di nav qada siyasî ya kurdî de, têkilîdanîna wan a bi wan hêzan re ku wan ji derve midaxele li herêmî kiriye û li herî dawiyê jî ev perspektîfên der barê têkilî û dînamîkên lihevxistinê de gelo dikarin bi çi awayî li vîzyona aştiyê bên kanalîzekirin divê bên şirovekirin. Di vê kontekstê de nêrîna li projeyên siyasî yên aktorên kurdî, ew bingehên civakî yên ku ev proje xwe dispêrin wan û nêrîna li têkiliyên ku di çarçoveya van projeyan de hatine danîn, dê bike ku watedarkirina me ya van pêvajoyên jeopolîtîk ên di her du dehên pêşî yên sedsala 21'ê de hêsantir bibin.

Kamran Matin (2020) ku di meqaleya xwe de wisatên jeopolîtîk ên kêşeya kurdî nîqaş dike, di bingeha herî esasî de ji sê projeyên siyasî behs dike: Neteweperweriya klasîk, sosyalîzma şoreşger û xwebirêvebirina îslamî. Martin, fikira konfederalîzma demokratîk jî, ku tevgera kurdî ya di pêşengiya PKK'yê de nemaze di van bîst salên dawî de ew têgihî kiriye û xistiye pratîkê, wek encameke vê sosyalîzma şoreşger dibîne. Çendî bi awayekî esasî îtiraz lê neke jî, lê ji ber ku bi taybetî di konteksteke dijberî neteweperweriyê de û li derveyî formên klasîk ên xwebirêvebirinê, pratîkeke din pêşbînî dike, loma ez xwedî wê qeneetê me ku ev forma hanê ya ku her diçe ji

tevgerên din cuda dibe, eger bi awayekî cihê bê nirxandin dê feydeyek tê de hebe. Taybetmendiya hemûyan bi awayekî xwebirêvebirina kurdan a bi xwe be jî ku der barê vê mijarê de bê ka ew dê çawan be, ji ber pozîsyonên îdeolojîk ên ku li dawiya pirtêkiliyan de ew pêk hatine, raman û pratîkên ji hev cuda hene.

Xeta neteweperweriya klasîk bi awayekî îdeolojîk çendî serxwebûnê ji xwe re bike armanc jî lê di nav siyaseta pratîk de xeteke ku armanca serxwebûnê bi awayê siyasî ji xwe re amrazî dike dişopîne. Ji bo vê xeta neteweperwer a klasîk mimkin e mirov mînakên PDK û PDK-Îranê bide. Tevî ev xet li Kurdistanê xwedî xeta herî dirêjkêş e jî, ew têra xwe nîqaşdar e û dîrokeke wê ya dirêj a bi xiyanetan tijî heye. Lê belê li gel vê, wê bi awayekî bandor li bipêşketina têkoşînên li parçeyên din jî kiriye. Pênasekirina vê beşa civakî ya ku ew xwe disipêrê, nemaze ji avabûna birêvebirina herêmî ya Kurdistanê pê de, ji ber beşdarbûna wan beşên civakî yên ji hev cuda ku dixwazin ji pastaya aborî ya ku zêde bûye para xwe hildin, çendî zor be jî lê mirov dikare ji binyadeke wisan behs bike ku wê li bingeha neteweperweriyê kurdîtiya sune bi cih kiriye.

Ev xeta siyasî, li her parçeyî bi awayekî tê temsîlkirin. Em dikarin ji vê palpişta wê ya herî sereke, halê hazir li Başûr, ji PDK'ya ku bi rêjeyeke zêde di bin kontrola binemala barzaniyan de ye behs bikin. Li Rojhilat, çendî çi qas ku diçe kêm bibe jî hêzeke PDK-Îranê heye. Ev xeta siyasî ku li Rojava neteweperweriyeke kurdî ya alternatîfa şoreşê taqîb dike, îcar li Bakur mirov dikare ji binyadeke wisan behs bike ku bandora wê ya pir sînorkirî heye. Xeta neteweperwer a nerîtî ya PDK'yê ya der barê mijarên jeopolîtîk ên herêmî de, em dikarin bibêjin hem ji ber pratîkên wê yên rojane hem jî ji ber pratîkên wê yên dîrokî têra xwe pragmatîk e. Wek nimûne, PDK ku ji sala 2007'an pê ve têkiliyên wê yên pir baş bi hikûmeta AKP'yê ya Tirkiyeyê re hene, bi taybetî di dema şerê Iraq û Îranê de ji Îranê destekeke zêde wergirtibû. Ev avaniya hanê ya ku der barê karîna pêkanîna şirîkatiyê de, bi hêzên kurewî re ku dikare ji wan destek bigire û bi wan aktorê wan ên ku li cihkiyê ew bi wan re hereket dikin, tecrubeyeke wê ya dîrokî heye. Mesela em dikarin ji binyadeke neteweperwer a klasîk a berdewam behs bikin ku li Iraqa di bin serokatiya General Qasim de ku wî bi awayekî zimnî desteka Sovyetan wergirtibû, bi berdewamiya salên 50 û 60'î ve piştî wê bi komunîstan re hereket kir bi şûn de, îcar bi salên 70'yî re ew di nav têkiliyên herêmî yên dageriyayî de rastgirî bû.

Meyla îdeolojîk a din jî, ku di şexsiyeta sosyalîst û hin rêxistinan de di nav xeteke şoreşger de tev digerin, dîsan di nav çarçoveya diyarkirina qedera xwe de, xeteke ku ji federasyonê heta bi serxwebûnê ew dikare biguhere, dişopîne. Pêşengiya siyasî, ya esas ew binyadên ku rastgirîbûna xeta neteweperwer û sernekeftîbûna leşkerî rexne

dikin, gengaz e mirov bikare di bin vî sernavî de nîqaş bike. Nimûneya vê ya herî serdest Komala ya ji Rojhilat e. Komala jî eynî wekî PDK-Îranê bi giranî xwe dispêre nifûsa soran a ehlê sune. Lê belê, nemaze di destpêka salên 2000'î de ev partiya ku tê de jihevcihêbûna sosyalîstan û sosyalîstên neteweperwer ên kurdî çêbû û bi rêjeyeke gelek zêde li kampên di bin kontrola Birêvebirina Herêmî ya Kurdistanê de dikare li ser lingê xwe bisekine, têra xwe qels ketiye. Li Başûr, çendî gengaz e mirov YNK'yê ji ber hemleya wê ya di sala 1975'an de ji vê xetê bihesibîne jî, lê bi taybetî di pey avabûna îderaya herêmî ya Kurdistanê re ew xeta ku ketiyê û ji ber meşandina bendên eşîrî û pratîkên dewletê yên rantyer ên herî kêm bi qasî PDK'yê, kiriye ku ew ji xeta sosyalîsta ku xwe dispêre veguherînê, bi dûr bikeve. Li Bakur, berî derbeya 1980'yî çendî gelek avaniyên ku di nav vê xetê de tev digeriyan hebûn jî, ji salên 80'yî heta bi yên 2000'î PKK'yê ev xet domandiye, lê piştre pê re dagerîn û veguherîneke radîkal çêbûye û rexneyên li xeta rizgarîxwaza neteweyî bi pêş xistine. Ev xet, her çi qas di qadekê de nebûbe hêzeke sereke jî, lê ji ber ku veguherînên wan ên navxweyî bi veguherînên siyasî yên dinya û kurdan re ketine nava hev û din, loma ji aliyê analîtîk ve gelek daneyan li xwe vedihewîne.

Xeta siyasî ya îslamî jî, ku birêvebirineke îslamî ya xwedî meyla îslamî pêşbînî dike, xeteke wisan e ku ew ji hev û din têra xwe cuda bûne û ew tu car nebûne hêzeke diyarker a sereke. Hêzên sereke yên vê xetê temsîl dikin dibe ku li Bakur Huda-Par û li Başûr jî Yekgirtûy Îslamî Kurdistan (Yekîtiya Îslamî ya Kurdistanê) be. Li Rojhilat kevneşopiyeke siyasî ya kurd û îslamî heye ku ew nebûye partî lê belê xwedî hêzeke diyar e. Ev xeta hanê ya ku bi awayekî giştî hesasiyetên îslamî dagerandine ser zemîneke rêxistinî, gengaz e mirov bikare wê di astên radîkaliyên cuda de çavdêrî bike. Wek mînak, Yekgirtûy Îslamî Kurdistan hîn bêhtir li ser xeteke Birayên Misliman e, lê Huda-Par di pozîsyoneke hîn radîkaltir de ye. Ev xeta hanê ku bi awayekî dîrokî bergindeke wê ya giring a civakî heye, di qada siyasî ya kurdî de tu car nekariye bibe xwedî rewşa yek ji wan aktorên sereke yên siyasetê.

Tevî vê yekê konfederalîzma demokratîk -li gel ku navê wê nehatiye danîn û nîqaşên li ser wê tên kirin xwe dispêrin salên 90'î jî- di salên 2000'î de wek îdeolojîk û di salên 2010'an de jî wek pratîk bûye xeteke xuyabar û berbiçav. Vê ramana ku bi şoreşa Rojava re qada sepandina pratîk bi dest xist, ji ber ew texeyuleke civakî ya wisan li xwe digire ku berêtiyê dide xeteke polîtîk a enternasyonalîst û jiyaneke hevpar a bi hev re, nemaze ji ber esasê wê yê dijberiya neteweperweriyê li xeta wê ya siyasî rexneyên cidî hatin girtin. Bi awayekî cuda ji xetên din ên neteweperwer û îslamî, ne tenê mafê diyarkirina qedera xwe ya kurdan, ji ber gelek mijarên din ên mîna jin, kdexwariya aborî û ekolojî di rojeva qada siyasî ya kurdî de bi cih kirin û dest bi rêxistinkirina binyadeke wisan kir ku wê bi rehendên cihê behs ji jiyana rojane ya mirovan jî dikir.

Ev rojevên hanê yên ku dikare di qada siyasî ya kurdî de wekî yên nû bên hesibandin, wek mînak li herêma Rojhilat ji ber wesîteya rabêjiyên pluralîst ên konfederalîzma demokratîk a ji partiyên siyasî bi awayekî cihê, zêdebûna sempatiyên kurdên şiî û yaresan ên ji têkoşîna kurdî re yan jî ji ber têkoşînên azadiya jinan ku hemen hemen li her parçeyî derket pêş, vê yekê kir ku encamên cidî çêbin. Bi awayekî puxteyî, ev veguherîna îdeolojîk, a ku li dawiya wan pêvajoyên hanê yên ku PKK di wan re derbas bûye, derketiye holê, Başûr ne tê de, di her warî de xwedî bingeheke civakî û kapasîteyeke veguherandinê ye. Gava salên 2000'î dest pê kir, ji vê rewşê derketina PKK'yê, ku ew ji ber sedema radestkirina Ocalan a li Tirkiyeyê qewimîbû bi kirîzeke cidî re rû bi rû bû, bi awayekî qismî ji ber vê veguherîna hanê pêk hat û bi şêweyeke merhelî jî di gelek waran de serweriya xwe dabîn kir. Lê belê di destpêka mîlenyûmê de, ew qeneeta ku PKK di qada siyasî ya kurdî de bi dawî bûye, hîn bêhtir serdest bû.

# Encam

Gava mirov tê salên 90'î, mirov aktorên îroj ên qada siyasî ya kurdî û repertuwarên wan ên têkoşînê dibîne. Di sedsala 19'an de, li şûna mîrekiyan rêxistineke ku xwe dispart eşîret û terîqetê cihê xwe girt ku ev yeka hanê jî ji ber meylên navendîbûnê yên dewletên ku li qada siyasî ya kurdî serwer bûn, pêk hat. Lê belê ne mîrekî ne jî binyadên ku xwe dispartin bingeha eşîret û terîqetan karîn rêxistiniyeke li gorî mercên dewrê dabîn bikin û serhildanên ku di vê serdemê de derketin holê jî bi şideteke gur a dewletê re rû bi rû man. Piştî wê, kurdan bi desteka ku Sovyetan bi awayekî qismî da wan, dest bi damezirandina tevgerên rizgariya neteweyî ya nû kirin; ji bilî Komara Mehabadê ya ku pêvajoyên jeopolîtîk ew mimkin kir û li Iraqê ew ahenga sala 1958'an a ku di navbera Mele Mistefa Barzanî û serokwezîrê Iraqê yê wê demê Ebdulkerîm Qasim de du salan ajot û wekî destkeftina rêkeftina xweseriyê ya li sala 1970'yî pê ve wan nekarî destkeftineke mezin bi dest bixin. Vê rewşê, bi bandora Sovyetan ku her diçû li herêmê lewaz dibû û bi avabûna ji nû ve ya herêmî ku li elehiya aktorên siyasî yên kurdan bû, li salên 1990'î çetelîbûnekê çêkir ku ew di bingeha xwe de li ser rexnegirtina li Sovyetan bû. Gava ji hêla dewletan ve lê bê nihartin, heta bi salên 1990'î jî tevî hemû pest û şideta dewletê, rasteqîniyeke kurdan hebû ku ew bi rêjeyeke mezin hîn jî dikarî li ser xwe raweste. Ango ne dewletan karîbû kurdan bi temamî serkut bikin ne jî xwebirêxistinkirina siyasî ya kurdan karîbû di çarçoveya mafê diyarkirina çarenûsa xwe de encameke mayînde bi dest bixe. Vê rewşê encamên siyasî yên wisan derdixistin holê ku hem dewletan nikarîbû bi nifûsa kurdan a li nav xwe û bi avaniyên wan re yên ku temsîla wan dikir hem bi kurdên li parçeyên din re û hem jî bi hev û din re rewşa pêkvejiyana di nav aştiyê de bijîn. Li gel vê yekê, rewşa dijberîtiya bi hev re ya kurdan û dewletên herêmê, ji bo hêzên emperyalîst an jî yên

xwedî niyeta hegemonîk ku siyaseta wan a herêmî ya xwedî navenda qada siyasî ya kurdan heye, sehayeke manewrayê ya qirase ya ku ji manîpuleyê re vekirî ye, pêşkêş dikir. Hin caran hevkêşeyên siyasî yên nû jî, ku bi teknolojiya aştiyê ya lîberal hatibûn avakirin an jî dihat xwastin ku bên avakirin, herî dawî dînamîkên civakî û siyasî yên ku dikarîbûn kanalên lihevxistinê xwedî bikin, hildiberandin. Salên 2000'î û yên 2010'an jî dê bi têkoşînên ku ev dînamîkên sereke aktîve bûn, derbas bibûna. Kaosa herêmî, ku rehendeke wê kêşeya kurdî çêdike, xwe dispêre paşxaneyeke wiha.

BEŞA DUYEM

# LI SALÊN 2000'Î KÊŞEYA KURDÎ

Nîqaşkirina kêşeya kurdî û qada siyasî ya kurdî ya di salên 2000'î de, dê bi watedarkirina ka kêşeya kurdî bi pêvajoyên jeopolîtîk ên global re dagerîneke çawan derbas kiriye, mimkin bibe. Bûyera herî sereke ya ku salên 2000'î şekilandiye, bêyî guman ew êrîşên hanê ne ku li Navenda Bazirganiyê ya Dinyayê ya li nav dilê DYA'yê ya ku hêzeke hegemonîk e hatine kirin û di pey re jî ew dagirkirinên Efxanistan û Iraqê ne. Ev, ji bo hemû dinyayê pêvajoyên wisan in ku encamên wan ên pir cidî hene ku lê belê di navenda wan de Rojhilata Navîn û Asyaya Rojava cih digirin. Ji lew re bi berdewamiya salên 1990›î re ew konsepta dijminê nû û nîqaşên li ser antî-terorê yên ku bi pêş ketine, dê li salên 2000›î, di pêvajoyên siyasî yên berbiçav de bibûna xwedî bergindiyê. Nîqaşa li ser van pêvajoyên ku di navenda wan de Rojhilata Navîn cih digire, bê ka li ser qada siyasî ya kurdî çi bandor çêkirine, bû xwedî rewşeke pir giring. Ji ber vê yekê, ev beş di serî de wê nîqaşa hevbandoriyê ya ji ber wan rûdanên ku di asta kurewî û herêmî de çêbûne û ya dînamîkên di qada siyasî ya kurdî de pêk hatiye, ji xwe re dike armanc.

Di vê çarçoveyê de ew vebûna jeopolîtîk (yan jî bi gotina Cuma Çîçek şikestina yekem a jeopolîtîk) a ku dê qada siyasî ya kurdî bi tevahî diyar bike, gengaz e kmirov ew wek encama nakokiyên rasterast ên wan pêvajoyên ku di asta kurewî de didomin û yên pêvajoyên jeopolîtîk ên herêmî bibîne. Ew midaxelekeriya li salên 2000'î, çawan nabe li derî kurewîbûna pergala lîberal a ku piştî Şerê Sar bi pêş ketiye bê xwendin, her wisan çawan ku hêzên emperyalîst ên hegemonîk jêrê diyar dikin, nabe di nav çarçoveyeke teng de jî bê xwendin. Ji vî aliyî ve, ew şêweyên berxwedanê yên ku li dijî pêvajoyên emperyalîst bi pêş ketine, divê li gel rengê îdeolojîk ên kesên xweragir/berxwedêr an jî pozîsyonên wan ên siyasî tevî vê nîqaşê bê kirin. Têkoşîna ku kurd bi dehan salan di asta herêmî de didin -li gel hemû kêmasî û şaşiyên wê- li cihekî wisan disekine ku wê kariye ji nav dînamîkên berxwedanê yên xwedî nakokiyên pêvajoyên hegemonîk xwe bifilitîne û kariye wî şansê ku ji vê rewşê diqewime ji bo xwe binirxîne. Ev rewş, di salên 2000'î de li Başûr ji bo Herêma Kurdistana Iraqê, wekî ez dê li beşa piştre bi kitekit wê nîqaş bikim, di salên 2010'an de jî ji bo Rojava derbasdar bû.

Li bin roniya vê destpêkê teza sereke ya ez dê di vê beşê de biparêzim, gengaz e ku di du merheleyan de bê vegotin. A yekem, qada siyasî ya kurdî, hema bibêje bêyî qutbûnê bi rewşa hevbandoriya bi pêvajoyên kurewî û herêmî re dagerînek pê re çêbû. Em dikarin vê li dijî awarteparêziya Rojhilata Navîn, di pozîsyona ji ber "awarteya awarteyê" de li salên 2000'î di konteksta Kurdistana Iraqê (Başûr) de derketiye holê, di rewşa destekkirina partiyên kurdan ên Başûr de bibînin. Li Bakur mimkin e heman rewş di hewla dîtina PKK'yê ya wek asteng û derxistina wê ya derveyî hevkêşeyê de bê dîtin. Ew dînamîkên di bin van şertan de derketine holê, wan kir ku dewlet pozîsyonên xwe biguherînin û nemaze kir ku Birêvebirina Herêmî ya Kurdistana Iraqê

jî bê naskirin. Ev bi xwe, rewşeke welê bû ku qada siyasî ya kurdî ji bingehê ve diyar dikir. Dîsan bi awayekî paralelî vê, PKK'yê jî karî xwe ji teşebusên derxistina wê ya ji hevkêşeyê bi veguherîneke cidî ya îdeolojîk-polîtîk derkeve û jê bi şûn de wê tesîr li qada siyasî ya kurdî kir ku ji bingeh ve wê diyar dike. Ya duyem jî, ev her du pêvajoyên paralel li hemberî xeta konfederala demokratîk a li nav qada siyasî ya kurdî dê xetên neteweperweriya kevneşopî zelal bike û xwelêbicihkirina jeopolîtîk a din a li herêmê jî dê li gorî vê bişêwanda.

Di vê beşê de piştî ku ez dê berê pêşîn midxeleyên nû û sosyolojiya siyasî ya awarteparêziya Rojhilata Navîn binirxînim bi şûn de, ez dê bandora wê ya li ser şêwandina Rojhilata Navîn nîqaş bikim. Li ser taybetmendiya Rojhilata Navîn, ez dê hewl bidim ku midaxeleya li Iraqê û encamên ku vê midaxeleyê ew afirandine bi analîzeke hîn bêhtir xwedî hûrgiliyan vebêjim. Bi palpiştiya vê, ez dê vebeyîna vê midaxelekeriya li qada siyasî ya kurdî, guherînên perspektîfên dewletan ên der barê kêşeya kurdî de, dagerîn û veguherînên aktorên siyasî yên kurdan û ka vê veguherîna hanê qada siyasî ya kurdî çawan şêwandiye nîqaş bikim. Li herî dawiyê ez dê encamên wan dînamîkên ku salên 2000'î ew derxistine holê jî di çarçoveya kurewî, herêmî û qada siyasî ya kurdî de xulase bikim û ez dê hewl bidim rewşê biresimînim bê ka têketina salên 2010'an di çi rewşê de pêk hatiye.

## Veguherînên kurewî: Piştî Şerê sar serxweşiya serkeftinê ya lîberal

Li salên 2000'î hem li dinyayê hem jî li Rojhilata Navîn, di serê wan faktorên herî sereke de yên ku pêvajoyên qewimîne amade kirine, pelişîna Dîwarê Berlînê û piştî wê jî hilweşîna Yekîtiya Sovyetan e. Em dikarin bandora vê ya li ser terazên jeopolît ên dinyayê, di wê somdariya hanê de nîqaş bikin ku êdî wek diyarkereke hegemonîk a dînamîkên Şerê Sar ji holê rabûne û li dinyayeke xwedî cemsera tek jî, şekilgirtina hegemonyayê rasterast bi serxweşiya serkeftina lîberal (triumphalism) re eleqedar e (Falk, 2010). Dinyaya piştî Şerê Sar, bû sedem ku ew dewlet û tevgerên civakî û siyasî yên xwe li gorî dinyaya du cemcerî organîze kiribûn, pozîsyonên xwe ji nû ve di ber çav re derbas bikin. Hêzên serwer ên di nav tek tek dewletan de, ku wan ji terazên di nav NATO û Pakta Warşovayê de pêk hatine sûd wergirtiye û berjewendiyên dewleta xwe bi pêş de birine, di pergala nû ya cîhanê de parêziyên xwe yên berjewendiyan endeksî hegemonyaya DYA›yê kirin û wan dest pê kir li gorî vê yekê ji xwe re pozîsyonên nû wergirtin. Tevgerên civakî û siyasî jî hem rasterast hem jî bi awayekî nerasterê tesîrdar bûn. Bi awayekî tesîrdarbûna rasterast, em dikarin behs ji

windakirina desteka tevgerên neteweyî yên ji Sovyetan qet nebe desteka gotinkî û di hin rewşan de jî desteka rasterast a madî û leşkerî bikin. Tesîrdarbûna neyekser jî, bi têgihîkirina Traverso (2016), dibe ku ew wek melankoliyeke çepgir bê dîtin: Li hemberî bloka kapîtalîst windakirina bloka sosyalîst, ji bo komên ku têkoşînên civakî dikin, biyekbûna bi nostaljiya raboriyê re ferasetek çep a melankolîk derdixist holê. Çendî ev rewş piştre ji xwebirêxistinên tîpên nû re bibe çavkanî jî, lê bandora vê melankoliyê di roja me ya îroj de dikare bê çavdêrîkirin.[17]

Eger li çavkaniya nakokiyên salên 2000'î, hewla sepandina bi zorê ya pergala dinyaya ku aqilê lîberal ew texeyul dike û dînamîkên bertekiyên ku li hemberî vê tên dayîn werin bicihkirin dê ne tiştekî şaş be. Pergala dinyaya lîberal a ku piştî Şerê Sar kurewî bûye, a rast li welatên bloka Rojava wek enternasyolîzma lîberal, bi Şerê Cîhanê yê Duyem re binyadeke wisan bû ku bilind dibû (berawirdî. Adler-Nissen û Zarakol, 2020). Lê belê bi hilweşîna bloka Rojhilat re astengên îdeolojîk û polîtîk li pêşiya vê pergalê rabûn ku ew bikare hegemonyayeke kurewî damezirîne, ji lew re em ji wan dewran behs dikin ku di wan de tezên dawiya dîrokê dihatin nivîsîn. Pêkhateyên sereke yên vê pergala dinyayê, ji aliyên alîgirên wê ve, ew wek bazara vekirî, dameziraweyên navneteweyî, ewlehiya li ser bingeha hevkariyê, civaka demokratîk, guherîna bipêşketinxwaz, çareserkirina kêşeyan a li ser bingeha hevkariyê, serweriya parevekirî û raseriya hiqûqê hat pênasekirin (Ikenberry, 2011: 2).[18] Li bendê hat sekinandin ku enternasyonalîzma lîberal a ku xwe dispêre van bingehan dê li dinyayê kêşe û arîşeyan çareser bike û bi vê hedefê pêvajoyekê dest pê kir ku wê di serî de qadên post-Sovyetan entegrasyona temamiya dinyayê ya li vê sîstemê pêşbînî dikir.

Lingên navendî yên vê pêvajoyê, mimkin e wek kurewîbûna ekonomîk a neolîberal a ku xwe dispêre maksîmîzasyona karê ya şirketên pirneteweyî, demokrasî (ya temsîlî) û mafên mirovan û civakparêziyeke sivîl a ku çavkaniya wê ya fonê Rojava ye, were terîfkirin. Vê pergalê xwe dispart hewla ku divê standardên aborî, teknolojîk, teknîk, leşkerî û siyasî di serî de ji DYA'yê, ji rojava ji bo rojhilat û başûr bên transferkirin û bi vê rêyê jî entegrasyona kurewî bê dabînkirin (Richmond, 2008). Lê belê ev prensîp ji bênakokiyê pir dûr bûn. Bi taybetî pêvajoya ku wek kurewîbûna neolîberal dihat binavkirin, bi têgihîkirina Harvey (2014), ew dikare wiha bê pênasekirin ku bi armanca

[17] Ji bo vê, dibe ji Tirkiyeyê mînaka herî zelal bê dayîn ku beşeke cidî ya wan mirovên berî derbeya 1980'yî têkoşîn meşandine, bê çawan têkiliyekê bi wê dewrê re û bi bîranîn û pratîkê têkoşînê yên wê dewrê re di nav van şertên em tê de ne datînin. Beşeke cidî ya van kesên hanê ku hîn jî siyasetê dikin, ji ber ku xala wan a referansê salên 70'yî ye, ji bo vê yekê nimûneyeke rasterast e (Milaqet, Almanya 19.07.2019).

[18] Li vir, ji bo ez bi tenê temelên wê vebêjim min ew bi rêz kirin, pergala dinyayê ya lîberal di pey beşa piştre dê tevî krîzên wê bi awayekî hîn bihûrgilî bê nîqaşkirin.

kara zêde û maliyeta hîn erzan, fînans kapîtal li tevahiya dinyayê bê îxrackirin. Qeyrana aborî ya li sala 2008'an, bi vî awayî lîmîtên navxweyî yên kurewîbûnê jî diyar kirin (Gills, 2010). Bi awayekî mîna vê, ew baweriya dê hilbijartinên azad û adil hemû pirsgirêkan çareser bike, lê ji ber demokrasî li hilbijartinan hatiye daxistin û ji ber qabiliyetên manîpulatîf ên elîtên siyasî li pêş çav negirtibûn, bihêlin ku ew ji kêşeyan re bibe çareserî, kir ku ew hîn bêhtir kûr kirin. Mînaka vê ya herî berbiçav, dikare di meseleya Iraqê de bê dîtin ku ew tim wek kêşe maye ku dê li jêrê ew bi berfirehî bibe mijara nîqaşê. Ew civakparêziya xwe dispart qebûla pêşî da ku dê civakparêziya sivîl a bi desteka DYA û YE'yê tîranîtiyan biqedîne, mirov ji zikmakî ve di nav xwastina azadiyekê de ne û ev azadî jî dê bi welatîtiyeke di foma DYA'yê de mimkin be, li herî dawiyê li avaniyeke wisan dageriya ku pir tesîr li wan civakên di nav wan de bû nekir û tenê ji xwe bi xwe re xizmet kir (Falk, 2010: 258- 260).

Nebûna hêzeke jeopolîtîk a kurewî ya ku bikare pergala dinyayê ya nû sînordar bike, ya rast kir ku kêşeya rewatiyê ya ji krîzên kûrbûyî diqewime û pêwîstiya afirandina dijbereke xwe ya ku di nav vê de rûdine, çêke. Ew tevgerên berxwedan û protestoyê bûn ku wan ev qeyrana rewatyê di asta kurewî de kûr kir û ji nîvê duyem ê salên 1990'î heta nîvê pêşî yê salên 2000'î jî tesîreke cidî çêkir. Tevgereke nû ya enternasyonalîst a ku ji berxwedana zapatîstan hêz stand, tecrubeyên Seattle û Porto Alegre û tevgerên dagirkirinê (occupy), formên sosyal ên dinyayê û gelek rêzebertekên dijberî sîstemê zêde û mezin bûn (Wallerstein, 2014). Ev pêvajoyên protestoyên global in ku rasterast li dijî êrîşkariya neolîberal wek bersiv xwe birêxistin kirine, ku ji ewlehiya xwerek, heta bi cureyên nû yên kolonyalîzmê û li dijî nijadperestiyê gelek zemînên berxwedanê gihandine hev û ew bi yek kirine. Ne mimkin e ev pêvajo ji mekanîzmayên mexdûriyet û berxwedanê yên ku sermayeya kurewî û burokrasiya netewedewletê ya ku di nav hevkariya wê de şekil girtiye ew derxistine holê, cuda bê fikirandin û nirxandin (Robinson, 2018).Vê meydanxwastina ku ji jêr ve mezin bûye, krîza rewatiyê ya li nav qadên navxweyî yên sîstemê kûr û zêde kir. Li aliyê din, dewletên ku li ber kûrewîbûna armanckirî dibûn asteng jî hebûn. Di serî de Lîbya, Îran, Irak û Koreya Bakur, şert bû ku diviya ev dewlet jî bihatina entegrekirin. Gelek pratîkên van dewletan, ku wan prensîba serweriyê mîna dilê wan çawan dixwaze ew dikarin wisan bi welatiyên xwe re reftarê bikin fehm dikin û ji teşebusên jenosîdê heta bi mişextkirinê, mafên mirovan ji binî ve tune dihesibandin, li hemberî pêla kurewî ya ku pergala dinyayê ya navend DYA'yî arezû dikir (ku têra xwe kêşedar e), bi rabêjiyeke antî-emperyalîst dibin asteng.

Kapîtalîzma kurewî û hevkariya burokrasiya dewletê, ji bo rewatiya xwe biafirînin dijberê xwe yê nava xwe bi rabêjiya antî-terorê ji nû va çêkir (Hardt û Negri, 2000; Robinson, 2014). Yanî dijminê nû (tevî ku tehdîdên carî hebûn jî), ya rast rewşeke wisan bû ku ji ber hewcetiya bêdijminiyê pêk dihat. Pergala dinyayê ya navend DYA'yî,

nemaze di vê pêvajoyê de gefa ku ji aktorên derî dewletan dihat bi desteka dewletan ve eleqedar kir û terîfa dewletên heydût ên destekkerên terorîzmê xist dewrê û texeyuleke dijmin a eleqedarî piştî Sovyetan afirand ku dibe çekên komkuj îcar bi destê van dewletan bê bikaranîn (Falk, 2010: 251). Ji aliyekî ve zemîn ji midaxeleyên nû yên emperyalîst re dihat xweş kirin, ji aliyê din ve jî pênasekirina dijminekî nû bi xwe re anî ku tesbîtkirina wê gelekî zor e. Îdrakkirina dijminê nû ku êdî ew hebûneke herikoyî ye ku dibe ew her tim li her derî be, bi xwe re wê ferasetê anî ku di vê têkoşîna bi dijmin re li her derê bi awayekî bêyî qutbûn bê kirin (Hardt û Negri, 2000). Di serê diyardeyên herî sereke yên sedemîkirina vê de ew êrîşên li bircên cêwî yên li Amerîkayê tên. Di serî de 11 Îlonê, êrîşên ku El Qaîde û komên din kirine, berevajî tiştê ku tê gumankirin, nîşan da ku aktorên derî dewletan dikarin çalakiyên wisan bikin ku bibin sedema gihandina ziyanên hîn mezintir. Ev pêvajoya ku tim paragdîgmayeke ewlekariyê û ya şer aktîve bike, kir ku di asta kurewî de kampanyayên antî-terorê mimkin bibin.

Yek ji encamên rasterast ên vê pêvajoyê ew e ku li her derê dinyayê hêzên tewereyê yên ji hev cuda, li gorî pêwîstiyê pênaseya terorîst dikin û hin koman jî wek terorîst radigihînin. Di vê çarçoveyê de ew îdraka antî-terorê ya ku bi cih bûye, ji dinatîkirina beşên diyar ên civakê û ji duçarbûna wan a li formên cuda yên şideta dewletê re hat sedemîkirin. Di nav pênaseyên besîd ên terorîzmê de aşopîkirina avaniyên siyasî yên ku gelek kanên wan ên aloz ên civakî û dîrokî hene û avêtina wan a li derî pêvajoyan, wisan kir ew roleke ku dînamîkên lihevxistinê kûr dike, bileyîze. Ji ber pênaseyên terorîzmê li ser bingeha awayê ku bersiv bide hewcehiyên dewletê hatine kirin, di asta civakî de nekarî nefrîn/hêrsê watedar bike û ji ber vê yekê jî dînamît xist bin îhtimal û derfetên aştbûna li ser bingeha mizakereyan.

Tam li vê nuqteyê divê cext li wan pêvajoyên çêkirina aştiyê bê kirin ku ew bi îdîaya çareserkirina lihevxitinên ku li van welatan qewimîne derketine holê lê îcar ji ber encamên ku qewimîne tenê karîne bi midaxeleyên ji jor ve civakên eleqedar entegreyî sîstema neolîberal a kurewî bikin. Em dikarin vê mijarê bi awayê pêwendiya bi teoriya şeran ve bixwînin. Ev teorî bi awayê esasî xwe dispêre wê tesbîtê ku êdî di navbera dewletan de şer nîn e (angaşta democratic peace), lê şer di navbera dewlet û wan koman de ye ku ew li dijî dewletan radibin. Lê li vir mijara ku di rewşa gîrobûnê de dimîne, di şertê nû yên piştî Şerê Sar de rewşa rojanebûnê wan çavkaniyên lihevxistinê ne ku jixwe hebûne (Malešević, 2008). A rast ew fikira ku dê bi demokratîkbûna sîstemên dewletê re ev lihevxistin bihatina çareserkirin, li salên 1990 û 2000'î berbelav bû. Lê belê rêbazên navend-ewrûpî, yên aştiya lîberal û teknîk û înşakirina dewletê, çendî encamên qismî hilberandibin jî lê nekariye ku zemînên lihevxistinê ji holê hilde. Mimkin e nimûneyên herî aşkera yên vê yekê di jenosîda

tamîlan a li Srî Lankayê de, di avaniyên siyasî û civakî yên ku li Iraqê bi temamî têk çûne û di wan encamên dramatîk de yên ku neolîberalîzmê li Afrîkaya Başûr afirandine, bên dîtin.

Faktoreke din jî ya ku li salên 2000'î midaxilekerî mimkin kir ew rewş bû ku di dewra neolîberalîzmê de ferasta mafên mirovan di asta kurewî de zemîneke kêşedar ji xwe re dît. Berî her tiştî divê bê diyarkirin ku ji ber mirovbûna xwe şexs kirdeyeke maf e û giringiya lêxwedîbûna li mafên xwe yên tênebihur û dewrnebar jî hem di asta kurewî hem jî di ya cihkî de ne tiştekî nîqaşbar e. Lê belê bê ka mafên mirovan çawan tê pênasekirin û bê kî li kategoriya mirovan tê daxilkirin, kî li derve tê hiştin jî ji normên razber pir wêdetir rewşên wisan in ku di nav pêvajoyên siyasî yên pratîk de tên diyarkirin (Mignolo, 2009). Ango nakokiya di navbera mistewiya teorîk a normatîf a mafên mirovan û di ya sepandina wê siyasî ya pratîk de, bi wê ranêzikiyê eleqedar e bê ka bi perspektîfeke çawan û ji ku ve rasterast li mijarê tê nihartin (Rao, 2010). Mînak, çendî welatiyekî Iraqê yê mîna penaber hatiye Ewrûpayê û iraqiyê di bin rejîma Sedam de diçewise, tevî ew xwedî heman subjektîvîteyê ne, di navbera rabêjiya dewleta îngilîz a ku dinatîkirina nijadperest a sîstematîk a ku penaberê iraqî duçarî wê bûye û ya di "têkoşîna mafên mirovan" a dewleta îngilîz de, ku wê bi sedema parastina mafên mirovan a iraqiyan midaxeleyî wê kiriye, nakokiyeke cidî ya etîk-polîtîk heye. Lê di her rewşê de hem ew midaxeleyên ku ji ber hildana bin garantiyê ya mafên mirovan ên gerdûnî tên kirin hem jî binpêkirina mafan ên bi awayên ji hev cuda ku dewlet xwe bi spartina prensîbên serweriyê li hundirû dijî welatiyên xwe dikin, her yek ji wan ketiye rewşa karîneya îhlala mafan bi xwe. Di van pêvajoyan de, ku Çubukçu (2011) wan bi "midaxeleyên kozmopolîtan" bi nav dike, bi awayekî zelal du encameke dumend derketiye holê: Ji aliyekî ve ji hêla welatiyê (n wek komekî) ku di bin rejîman de tê(n) perçiqandin midaxeleyên emperyalîst mîna çareseriyekê tê(n) dîtin, ji aliyê din ve jî elîtên desthilatê yên cur bi cur ji bo ku duçarî windabûna serweriyê nebin, xuyabûna wan a wek antî-emperyalîst e. Binpêkirinên mafên mirovan ên ku di nav van dewletan de bi hejmara sînorkirî hatine tesbîtkirin û di zemîna normatîf a heyî de wek tercîhkirî derketine pêş, dê ji bo midaxeleyên emperyalîst wek behane bihatina nîşandan.

Eger em bi awayekî puxteyî bibêjin, ji hilweşîna Sovyetan heta salên 2010'an em dikarin ji hin cure mekanîzma û pêvajoyên behs bikin ku ew di asta kurewî de hakim bûne û wan teko teko li herêman tesîra xwe nîşan daye: Serxweşiya serkeftina lîberal û pergala dinyayê ya nû ku DYA hêza hegemonîk a tek e; pergaleke ekonomîk a nû ku bi palpiştiya bazara vekirî derketiye holê û li herî dawiyê jî bi êrîşkariya neolîberal derketiye gopîtkê; feraseteke nû ya demokrasî û ya mafên mirovan a redûksiyonîst e û li encamê jî dinatiyan hildiberîne; tevgerên civakî û siyasî yên nû yên ku li dijî van li dar ketine; îdrakeke tehdîdê ya ku li hemberî van hatiye çêkirin û kampanyaya

antî-terorê; hewlên wan dewletên hanê, yên ku li nav wan ew lihevxitinên koka wan a dîrokî digihîje kûrahiyan diqewimin, ên ji bo bi seta têgihê ya tesîskirina aştiyê daxilkirina wan a li nav pêvajoyên neolîberal a kurewî ye. Li salên 1990'î lê hîn bêhtir li salên 2000'î, herêma ku zêdetir bi awayekî bêyî qutbûn duçarî van pêvajoya bû, Rojhilata Navîn bû.

## Dagerînên herêmî: Li Rojhilata Navîn avabûna (dîrokî ya) awarteparêziyê (ya rabêjî) û midaxele

Yek ji dînamîkên domînant ên ku li Rojhilata Navîn salên 1990'î û 2000'î diyar kirin awarteparêziya Rojhilata Navîn û midaxelekeriya emperyalîst a bi palpiştiya vê ye ku ew têgihîkirina rabêjiyî ya aqilê lîberal û oryantalîsta Rojava ne. Awarteparêziya Rojhilata Navîn, li ser wê îdîaya hatiye avakirin ku li gorî herêmên din ên dinyayê Rojhilata Navîn pê daye erdê da ku entegreyî pergala dinyayê ya lîberal nebe û li dijî daxilbûna vê jî xwedî berxwedaneke binyadî ye. Gelek bergindên vê yên kêşedar ên wekî li nav dinyaya rabêjiyî ya lîberal a Rojava ku "îslam ne dînekî li gorî demokrasiyê ye" û heta bi yên mîna ku "têkiliyên 'arkaîk' nahêlin bipêşketin çêbe û berhingariyê lê dikin" hene. Zemîna lihevxistinê ya li herêmê jî, bi rêjeyeke mezin bi dînamîkên wê yên dîrokî û siyasî ve tên girêdan ku ew ne aştixwaz e û rola emperyalîzmê ya di afirandina vê zemîna lihevxistinê de tê nexuyanekirin. Piştî ku lihevxistin kûr dibin bi şûn de rejîma aştiyê ya nû jî ku hewl tê dayîn ew bi zorê bê avakirin, dînamîkên lihevxistinê yên nû çêdike. Ev ferasta hanê ya ku ji perspektîfa hegemonyaya DYA'yê ew avanî û binyadên wekî demokratîkbûyîn, bazara serbest û mafên mirovan ên ku li jorê me ji wan behs kir, li Rojhilata Navîn bi cih nebûne bi pirsgirêkên binyadî ve dide girêdan, Rojhilata Navîn yekker dibîne û çeşîdiyeke civakî (social multiplicity) ya ku li nav wan qet ne li gorî îdrakên wan ên tevahiyê ye, ji nedîtî ve dibîne. Ev jî bi awayekî siruştî di navbera îdraka oryantalîst û şertên carî de yên ku bi awayekî dîrokî pêk hatine, qelîşteke mezin çêdike. Li gel vê yekê, ev feraset jî bi awayekî dîrokî nemaze wan dînamîkên ku bi midaxeleyan çêbûne xwe li wan nake xwedî û di vê çarçoveyê de, di vê rewşa Rojhilata Navîn de ya ku bûye mîna gilokeke gelşan, der barê hildana berpirsiyê de ya ku dikeve alî wê, bêyî dilê xwe tev digere (Agnew, 2005; Hazbun, 2011). Pêvajoyên kurewîbûnê ku li jorê li ser wan nîqaş hatin kirin - bazara vekirî, civaka sivîl, mafên mirovan, demokrasiya temsîlî û hwd- piştî Şerê Sar bi awayekî hîn êrîşok ji aliyê DYA›yê ve hewl hat dayîn ku li herêmê bên bicihkirin (Dodge 2006: 460). Di esasê xwe de, ji ber dînamîkên berxwedanê (ku ew bi xwe jî ew çend gelşdar in) yên li Rojhilata Navîn ku nekarîne Rojhilata Navîn daxilî rejîma aştiya hakim a dinyaya lîberal bikin, vê rewşê zemîna têgihîkirina awarteparêziya Rojhilata Navîn a ku midaxeleyên salên 1990 û 2000'î dikir xwedî sedemên pêwîstker, afirand.

Cexta ku divê li dijî vê têgihîkirina oryantalîst bê kirin ew e ku tevî reh û rîşalên wan ên dîrokî hîn bêhtir di kûr de ye, eleqedarî wan têkoşînên di navbera îslamîtî, neteweperweriya sekuler û komonîzmê yên di asta herêmî de ye ku wan kiriye Rojhilata Navîn bikeve vê rewşê û eleqedarî midxaleyên ji derve yên li van têkoşînan e. Di vê çarçoveyê de ji aliyekî ve li hemberî Sovyetan, bi desteka Rojava îslamîtî bi awayê xeteke siyasî mezin dibû, li aliyê din jî nemaze li warên mîna Iraq, Sûriye û Misirê bi destên rejîmên ku dikare wek sekuler bên hesibandin, komunîst hatin elîmînekirin. Dînamîkên berxwedanê yên li hemberî kurewîbûna lîberal a herêma ku mîna awarteparêziya Rojhilata navîn tê pênaskirin, ji çavkaniyeke wiha ya dîrokî, siyasî û civakî pêk tên.

A rast li Rojhilata Navîn Şerê Sar pêvajoyeke wisan bû ku hîn bi destpêka salên 1980›yî de qediyabû.[19] Bi awayê paralelî rewşa meylên dinyayê, faktora herî sereke ya ku li Rojhilata Navîn dînamîkên Şerê Sar diyar dikirin hebûna bendbendîbûneke jeopolîtîk a pêkhatî ya wan dewletan bû ku wan berjewendiyên xwe li berjewendiyên kampên Rojhilat û Rojava dianîn û wan bi vî awayê dixwast alîkariyên leşkerî û aborî wergirin. Mimkin e mirov dikare vê wek dewletên ereb ên mezin lê xizan ku wan li dijî alîgirên NATO'yê yên mîrekiyên ereb ên biçûk lê zengîn û Tirkiye, Îran û Îsraîlê ji Sovyetan destek distand, kod bike. Lê divê li vir, ji vebeyîna li jêrê ya li Rojhilata Navîn a sîstemeke ku li jorê blokan li gorî berjewendiyên xwe bi zorê pêk anîne bêhtir, ji bendîbendîbûneke jeopolîtîk a bipêşxistî bê behskirin ku li jêrê berjewendiyên xwe li berjewendiyên hegemonîk anîne (Halliday, 2005). Nuqteya esasî ya gelek kes li serê hevpar bûne, ew e ku ya rast ji destpêka salên 1980'î pê de, li Rojhilata Navîn Şerê Sar qediyaye (Bozarslan, 2011; Halliday, 2005). Dagirkirina Mekeyê nîşan dabû ku îslama sunî di her mercî de ne di bin xizmeta hêzên kurewî de ye. Şoreşa Îranê ji aliyekî ve rejîma Şah a destekkera Rojava ji holê hildabû lê ji aliyê din ve jî mixalefeta civakî bi destê ulemayên şiî ve pelçiqandibû. Li Tirkiyeyê bi derbeya 1980'yî re talûkeya komunîzmê ku "wek sîlîndirekê di ser de çûbû" ji holê hatibû rakirin. Di serî de li Iraq û Sûriyeyê, komunîst bi destê rejîman hatibûn elemînekirin.

Dagirkirina Efxanistanê ya ji aliyê Sovyetan ve, li hemû civakên misliman bi xurtbûna îslama cihadker bi encam bû. Di nav van hemûyan de, qewam û rûdana herî sereke ya di asta Rojhilata Navîn de naskirina Îsraîlê ya ji hêla Misirê bû ku Misir bi berdewamiya Şerê Sar dewleta herî sereke ya aksa berxwedanê ya li herêmê bû û di pozîsyona alahilgira neteweperweriya ereb a sekuler de bû. Lê belê rewşa

[19] Ji lew re, li herî dawiyê hildana li kokên dîrokî yên siyaseta dinyayê ya şoreşên 1989'an ên ku hilweşîna Sovyetan mercandin, feraseteke navend-ewrûpî û di tehlîla dawî de jî ya vederkirina dînamîkên cihkî ye (Saull, 2010: 181).

herêmî ya ku piştî Şerê Sar xuya bû, dê qada siyasî ya kurdî jî tê de, dînamîkên siyasî, civakî û aborî yên navxweyî yên herêmê diyar bikira. Ev yekên hanê dibe ku di bin sernavên wekî şekilgirtina siyaseta îslamî, pir qelsbûn an jî bi temamî rabûna ji holê ya netewepwerweriya sekuler û komunîzmê û li gorî pergala dinyaya yek cemserî jî organîzebûyîna terazên jeopolîtîk bên nîqaşkirin.

Îslamîtiya li herêmê li ser du xetan şekil girt: Îslama «Şoreşger» û «Mitedil».[20] Mimkin e bê behskirin her du formên Îslama Şoreşger bi palpiştiya dînamîkên Şerê Sar mezin bûne. Cîhadkeriya sunî, dînamîkên Şerê Sar nîşan dide ku El Qaîde ji nav wan micahîdan derket ku ew micahîd ji hêla Amerîkayê ve li dijî dagirkirina Efxanistanê ya ji aliyê Sovyetan ve dihatin destekkirin û piştî wê jî derketina holê ya îslama cîhadker e ku wê dê têkiliyên Rojhilata Navîn a bi Rojava re ji kûrahî ve tesîrdar bikira. Ev forma cîhadkeriyê bi midaxeleyan mezin û çeşîdar bû ku ji aliyekî ve dikir DYA li Iraqê berhingarî berxwedaneke cidî bibe û li aliyê din jî kan û çavkaniyên DAÎŞ'ê pêk dianî ku ew wek "şeytanê global" (global evil) dihat kodkirin. Rehên îslama şoreşger a şiî jî mimkin e di nimûneya Îranê de bê dîtin ku wê hem li dijî DYA'yê hem jî Sovyetan rabêjiyek bi pêş xistiye[21] (Matin, 2013; Saull, 2010: 195). Îslama mitedil jî, tevî ku qurmên wê hîn bêhtir di demên berê de ne, di rewşa dînamîkên Şerê Sar de zemîna lêbelavbûnê ji xwe re dît. Li dijî rojavayîbûn û zorlêkirina sekuleriya ji jor ve, nimûneya Birayên Misliman ku di serî de wek bertekeke civakî li Misirê peyda bû, dê bandorê li tevahiya Rojhilata Navîn bikira û li salên 2000'î jî dê hîmê esasî yê vê kevneşopiyê ku wek îslama mitedil dihat bibîranîn, pêk bianiya. Îslama mitedil ku dê ji gelek aliyan ve têkiliya xwe ya bi hêzên hegemonîk re kûr bikira, ji aliyê din ve hikûmeta AKP'yê ku bi awayekî xetên îdeolojîk ên diyar vê kevneşopiyê li Tirkiyeyê dide domandin, dê wek modeleke mihafezekarên domokratîk ew li cihên din ên herêmê destek bikira. Îslama şoreşger ku ji aliyekî ve li dijî hegemonyaya amerîkan wek teşeyeke berxwedanê bi pêş diket, îslama mitedil nemaze di salên 2000'î de li gel antî-emperyalîzmeke rabêjiyî dê di pratîkê de bi piranî tevî hegemonyaya DYA'yê tev bigeriya. Ev nakokiya di navbera rabêjiya "îslama mitedil" û pratîka wê de, ku ji aliyekî ve îslam ji hêla civatên misliman ên berfireh ve wek navenda berxwedanê ya li dijî hegemonyayê dihat terîfkirin dibû amrazeke siyasî, ji aliyê din ve mecbûr dima ku bi wê hegemonyayê re ku pêvajoyên

---

[20] Îslama "şoreşger" li vir, bi wê wateyê tê bikaranîn ku guhartina pergala heyî li gorî esasên îslamî ji xwe re dike armanc, lê îslama "mitedil" bi mehneya binyadên îslamî tê bikaranîn ku çendî nakokiyên wan bi awayekî hîmî bi pergala heyî re nîn in jî, lê di nav wê pergalê de wek armanc li dû avakarina desthilata xwe ne. Pênaseyên îslama "şoreşger" û "mitedil", tevî ku ez bi awayekî tevahî van pênaseyan napejirînim jî, lê ji ber li gorî sîstema siyasî û civakî ya Rojhilata Navîn pozîsyonên wan dike ku ew bên nîqaşkirin, loma min ew tercîhkirin.

[21] Gava li vir pênaseya îslama şoreşger bê kirin hewce ye ku balkêşiyek lê bê kişandin. A rast em ji îslameke şoreşger behs dikin ku wexta di asta civakî de li dijî hemû başkirin û xweşkirina radibe, di asta dewletan de berjewendiyên xwe diparêze û li ser vî esasî pergala lîberal a heyî qebûl nake.

reel polîtîk ew aniye hole, hevkariyê bikin.

Li gel vê neteweperweriya sekuler, bi taybetî ji destpêka sedsalê heta çaryeka wê ya sêyem çendî rolaya xwe ya diyarker a ku leyîstiye winda kiribe jî lê di siyasetê de wek meylekê hebûna xwe domand. Vê meylê di asta civakî de li nav beşên hîn sekuler de nostaljiya eleqedarî raboriyê û têkiliyîtiyeke ku îroj dîndaran paşverû dibîne afirandin. Wek paralelî vê, elemînebûna komunîstan a li asta herêmî jî dîsan kir ku zemîna siyaseta sekuler têra xwe qels bibe. Komunîst, bi qonaxa demê re ji aliyê rejîman ve yan bi tehde û çewisandinan hatine mişextkirin an ew li zindanan hatine hiştin da ku birizin û herî dawî têra xwe ew hatine qelsxistin û heta wextên salên 1980'î jî êdî bingeheke wan a civakî nemabû (Gerger, 2006). Bi ser de, îcar divê bal lê bê kişandin ku di nav şertên Şerê Sar de ev ji hêla rejîmên beasî ve hatine kirin ku ew di serî de ji aliyê Sovyetan ve dihatin destekkirin. Li gorî Saul (2010: 189) di serî de tecrubeyên Îran û beasî, li tevahiya Rojhilata Navîn ew cihê ku Şerê Sar bi awayekî tundî lê bi dawî bû Rojhilata Navîn bû ku teşekul û binyadên çepgirên sekuler bi rêjeyeke mezin ji navê hatin hildan. Li nav somdariya şerê bi Sovyetan re, mekanîzmayên berxwedanê yên civakî yên birêxistî yên heyî, wek mînak jihevbelavkirina wan a li cihên wek Efxanistan û Tirkiyeyê bi alîkariya DYA'yê û li welatên ereb jî bi destê rejîmên serwer ve, yek ji çavkaniyên sereke yên îslamparêzîbûna li salên 1990 û 2000'î ye.

Li vir nirxandina rabêjiyên antî-emperyalîst hem ên meylên siyasî yên îslamî hem jî yên sekuler dê bi kêr were. Ew meyla îslamparêzîbûne ya siyaseta ku ji nîvê duyem ê salên 1970'yî pê de dest bi bilindbûnê kiriye ji aliyekî ve gava derfetên bipêşketinê di wan waran de didît ku Rojava ew vekiribûn ji aliyê din ve jî neçar bû li cihkiyan rabêjiyeke antî-emperyalîst bi pêş bixe. Neteweperweriya sekuler jî, bi taybetî wek girêdaniya têkiliya ku sosyalîzma ereban û beasîtiya wan bi Sovyetan re daniye, li gel ku li dijî emperyalîzma Rojava bûne, di nav xwe de wek nimûne avaniyên komunîst elemîne kiribûn. Awarteya vê rewşê heta dereceyekê Îran e. Çendî rejîma Şah a ku dikare jê re bê gotin berî şoreşê ew neteweperweriyeke sekuler bû bi temamî bi Rojava re di nav koordînasyonê de bû jî, lê Îrana ku bi sala 1982'yan ve ket bin hakimiyeta ulemayên şiî yên ku bi pêş diketin, antî-emperyalîzmeke rabêjiyî da berdewamkirin. Lê wekî Bozarslan (2011: 104) dibêje, ev hemû cureyên antî-emperyalîzmê xwe dispêrên çêkirina kontrola mitlaq a dewletê ya li ser hemû kirdeyan/subjeyan. Ev jî di siyaseta dewletê de tê temsîlkirin ku ew her cure grupa etnîk û dînî û teşekulên siyasî yên mixalefetê yên ku li dijî dewletê bi çêkirina komployan tên sûcdarkirin an jî "averêbûyiyên LGBT"yê duçarî tehde û zorê dike. Ev rewş rasterast têkildarî wê antî-emperyalîzmê ye ku ew wek amrazeke siyasî tiştekî pir bikarbar e: Ev mekanîzmayeke îdeolojîk e ku di bingeha wê de neteweperweriyeke vederker heye û bêyî ku îslamparêz an jî sekuler be, li dijî komên civakî ya ku her grupê wekî yê din kod kiriye xwedî

ranêziyeke dewletê ya diyarker e. Mimkin e nimûneya vê yekê hem di dagirkirina Iraqê hem jî di şoreşa Rojava de çavdêrî bike ku di rabêjiyên antî-emperyalîst ên dewletparêz de serdest e.

Bi kurtasî, li heynên salên 1990'î mirov dikare ji aşopiyeke herêmî ya ku cur bi cur diyarkerên wê yên makro hene behs bike: Di nav mercên dinyaya ducemserî de hêzên mihraq ên herêmî ji bo ku xweseriyên xwe kûr bikin reqebeta di navbera her du hêzên super de bi kar dianîn, îcar ji bo di dinyaya yekcemserî de desteka hêzeke hegemonîk a kurewî wergirin dê bibiliyana (Hinnebush, 2013: 3). Bi vê ve girêdayî, di asta îdeolojîk de piştî Şerê Sar sosyalîzma erebî û neteweperweriya sekuler, bi awayekî hîn taybetmend marksîzm-lenînîzmê bi îslamîtî û neolîberalîzmê re cih guhart (Bozarslan, 2011: 107). Bi berdewamiya Şerê Sar re kêşeyên kêmaran (hindikahiyan) ku ew bûbûn mesele, nemaze di pey Şerê Sar re xwe bi awayekî hîn zelal û li dijî ferasetên neteweperweriyê yên ku ji hêla dewletê ve hatine çêkirin bi cih kir û qeyrana neteweperweriyê jî di nav mercên Rojhilata Navîn de hîn bêhtir kûr û zêde kir (Bozarslan, 2011: 105). Bi salên 1990'î re înşaya rabêjiyî ya awarteparêziya Rojhilata Navîn ku dê rê li ber midaxeleyên derve yên bi awayên cuda yên li herêmê veke, li ser wê îdrakê hat rûniştandin ku ev şertên ji Şerê Sar wek mîras mane nahêle herêm entegreyî dinyayê bibe.

Ev perspektîfa kêşedar, şîret dike ku eger hewce bike divê dînamîkên berxwdanê yên xwe disperên mekanîzmayên siyasî, civakî û dîrokî yên herêmê yên li hemberî pergala dinyaya lîberal, bi midaxeleyên eskerî û /yan jî bi zorê bên sererastkirin.[22] Mimkin e ev midaxelekerî bi du awayan bê xwendin. A yekem, para Pax-Americana ya li Rojhilata Navîn ku ew di salên 1990'î de di asta kurewî de dihat meşandin, a duyem jî midaxelekeriya rasterast a li salên 2000'î ye. Pax-Americana, tekabulî kurewîbûna dînamîkên aştiyê yên nû dikir ku di ruhiya xwe de di bin hegemonyaya DYA'yê de bi pêş diket (Wallerstein, 2003). Di vê çarçoveyê de, wek nimûne, bi berdewamiya Şerê Kendavê yê Duyem re, alîkariyên DYA'yê yên ji Kuweytê re, xwedî wê mebestê bû ku berxwedanên li dijî kurewîbûnê bişikîne (Hinnebush, 2013: 31). Lê ji ber ku Îran û Iraq wek "dewletên heydût" hatibûn îlankirin, tesîra têkiliyên di navbera DYA Û Îsraîlê de yên li ser tevahiya herêmê û meseleya Filistînê di serî de gelek nakokiyên jeopolîtîk ên binyadî rê neda ku Pax-Americana di asta herêmî de pêk were. Wek paralelî vê (çawan ku li jorê bi awayekî qismî jê hat behskirin) dijberîtiya ku rabêjiyên antî-emperyalîst ên neteweperweriya ereban û îslamîtiyê ew li hemberî Amerîkayê meşandibû jî dîsan

[22] Li vir divê binî bê xêzkirin ku ev ne ew nîqaş e bê ka kîjan baş an jî xerab e; yanî ez ji duyîleyeke wisan behs nakim ku mirov divê amerîkanparêz an jî nerîtparêz be. Ez balê dikişînim ser wan perspektîfên kêşedar, nijadperest û yên ji nû ve xizmetê ji çêkirina hegemonyayê re dikin ku gava nêzikahî di herêmê tê dan, ew tên wergirtin û bê çawan ew dibin sedemê kûrbûna kêşe û arîşeyên herêmê.

sedemeke giring e ku divê di nav vê hevkêşeyê de bê hiştin. Çendî Pax-Americana rasterast encam nedabe, berevajî vê lê ji ber atmosfereke siyasî ya nû afirandiye ku di serî de DYA, Rojava ji xwe re xistiye hedefê, herî dawî bi êrîşên bêrawestan ên îslama cîhadker û ji ber vê jî bi midaxeleya leşkerî ya rasterast li herêmê bi encam bû. Midaxeleyên li Efxanistan û Iraqê, li midaxeleyên emperyalîst dageriyan ku ew bi mebesta daxilkirina Rojhilata Navîn a li kurewîbûyîna neolîberal hatin kirin lê di encamê de vê yekê kir ku herêm bikeve nav setmeboreke hîn mezin. Şikestina ewil a jeopolîtîk a di qada siyasî ya kurdî de di nav mercên wiha de pêkan bû.

## Midaxeleya li Iraqê

Tevî ku midaxeleya li Iraqê kir rasterast qada siyasî ya kurdî dagerîne jî, lê ya rast bû sedem ku hem di asta herêmî de nakokî û têkilî ji nû ve bên sererastkirin hem jî bû sedema ku (wekî em dê di beşa sêyem de nîqaş bikin) di asta global de jî encamên mezin çêbin da veguherîna têkiliyan mimkin bike. Ew gavên pratîk ên midaxeleya li Iraqê ku em dikarin di nav konteksta berfireh de watedar bikin ku li jorê nîqaş li ser hatin kirin, a rast bi Şerê Kendavê yê Duyem re wek dewama mieyîdeyên siftkirî yên bi awayê qedemeyî bi midaxeleya DYA û Qraltiya Yekbûyî ya sala 2003'yan a pêkhatî, bêyî ku ew pesenda Neteweyên Yekbûyî wergirin, bi encam bû. Sedemîkirina midaxeleya li Iraqê mirov dikare di çar merheleyan de bixwîne. Ji van a yekem, êrîşa ku ji aliyê El Qaîdeyê ve di sala 2001'ê de li Bircên Cêwî yên New Yorkê hatiye kirin û derewa ku wek "dewleteke heydût" Iraq xwedî çekên komelkuj e, wek sedema midaxeleyê hatin nîşandan. Di wan deman de ku Sedam hîn jî wek hevkarê DYA'yê tev digeriya, bikaranîna wî ya çekên komelkuj (bi taybetî di çarçoveya şerê Îran û Iraqê de) ku wan deman DYA'yê ev ji xwe re nekiribû mesele di vê dewrê de îhtimala hebûna van çekan kiribû promlematîk (Chomsky, 2003). Bi qasî ku dîplomatê berê û wezîrê karên derveyî yê rûs Prîmakov (2009: 319) vegotibû, a rast Sedam Huseyn tu tiştê bikare veşêre tune bû, lê li hemberî yên mayî yên herêmê ku bi armanca wek kozekê û nîşandana hêzê bi kar bîne bi zanebûn dikir ku bi mirovan re tevliheviya hiş çêbe û gava ev dikir jî li gel hemû rabêjiyên DYA›yê ku ew dê dest bi herekateke bejahiyê bike qet bawer nekir. Di merheleya duyem de, li maweya navincî, ji ber ku DYA'yê binyada îdeolojîk û sazûmanî ya hegemonyaya xwe di asta kurewî de çênekiribû, kir ku wê dehf bide da bi zorê vê hegemonyaya xwe ava bike û Iraq jî bû qadeke wisan ku ev hewl di pratîkê de lê hat ceribandin (Dodge, 2006: 457). Merheleya sêyem jî eleqedarî hegemonyaya jeopolîtîk e: Rejîma dîktatoriyê ya Sedam bi Fransa û Çînê re rêkeftinên îmtiyazê yên cur bi cur îmza dikirin û DYA û Qraltiya Yekbûyî li derveyî van îmtiyazan dihiştin ku petrol li vir roleke sereke dileyîst (Hinnebush 2013: 32). Çarem û di merheleya normatîf de, DYA'yê sedema midaxeleya xwe ya li Iraqê spartibû wekî parastina mafên mirovan ên iraqiyên ku di bin rejîma Sedam de tûşî xesbkirina mafan dibûn (Çubukçu, 2018). Tevî

ku midaxelekirina leşkerî kurt ajotibû jî, îstiqrara li Iraqê ku mijara nîqaşê ya populer a salên 2000'î bû, bi vê midaxeleyê re, bi wateya di lîteratura têkiliyên navneteweyî de qest jê tê kirin, hema hema bi temamî ji holê rabû. Encamên midaxeleya li Iraqê di vê çarçoveyê de bi sê rehendên wê mimkin e mirov bixwînine: Binyadbûnên siyasî yên ku di nav Iraqê de derxistine holê, bereya berxwedanê ya li ser bingeha îslamî ya cîhadker a ku ji nû ve organîze bûye û her ku çûye radîkal bûye û di serî de qada siyasî ya kurdî tesîra van a giştî ya li ser herêmê.

Sedam bi berdewamiya salên 1980'yî re ku Partiya Beasê bi şêweyeke qedemeyî hildabû bin kontrolê, bi awayekî herî esas ji ber ji bandora ku dibe Îran li ser şiiyên Iraqî bike ditirsiya, şiiyên di Partiya Beasê de bi qedemeyî bi dûr xistibûn. Mîna vê yekê, kurdên li bakur jî ji ber pozîsyonên dîrokî û bêewletiya siyasî vederî siyasetê hatibûn hiştin. Di serî de ew mieyîdeyên ku DYA›yê pêşengiya wan dikir û bi berdewamiya salên 1990›î didomiyan, lewazbûna damezirawîbûna dewletê ya ji ber gelek sedeman, bi hewla Sedam a yêdekkirina eşîran bi Partiya Beasê ve, bi encam bû (Hinnebusch, 2016: 568). Yanî a rast, heta hatina dema dagirkirina sala 2003'yan ku jixwe ji ber rewşa xwe ya avabûnê Iraq ji yekkeriya xwe ya navxweyî dûr bû, ji ber polîtîka û mieyîdeyên Sedam, dabeşbûnên hîn zêde û kûr qewimîn. Nemaze bi makeqanûna 2005'an re ku hêza siyasî di navbera kurd, erebên şiî û sunî de dabeş bûye û bendewariya afirandina "entegrasyona demokratîk a ji vê (wekî ya li Libnanê), kir ku kêşe kûrtir bibin. Ji ber windakirina pozîsyon û îmtiyazan beşeke cidî ya erebên sunî meylî îslama cîhadker kir ku ew tevger her diçû tundrew dibû û erebên şiî jî her ku çû bûn xwedî dîmeneke wisan ku ew dikevin bin kontrola Îranê. Li herî dawiyê, ji ber Herêma Kurdistanê ya li bakur ku bi awayekî fermî hatiye naskirin û ji ber rasteqîneya ereban ku ew bi awayekî fiêlî li ser şiîtî û sunîtiyê ji kûr ve dabeş bûne, loma dikare ji sê Iraqa ku dabeşî ser sê parçeya bûye bê behskirin. Vê dabeşkirîbûnê, hem ji ber wan aktoran ku teko teko di asta herêmî de têkiliyan bi pêş dixin hem jî ji ber têkiliyên pêgirîbûnê ku di asta kurewî de berdewam e, kir ku rewşeke wisan derkeve holê ku derketina ji navê gelek zor e. Luizard (2015: 48), diparêze ku amerîkayiyan bi zanebûn piraniya demografîk bi piraniya demokratîk re têkilî nava hev kiriye û vê yekê jî dabeşbûna mezhebî û etnîk kûr kiriye: Kurdan dest pê kir ray da partiyên kurdan, şiiyan ray da temsîlkarên şiî û bi taybetî piştî boykota pêşî ya li sala 2005'an jî, suniyan ray da lîsteyên suniyan.

Ji bilî ku dabeşînên etnîk û mezhebî timî dibûn sedema krîza birêvebirinê/kargêriyê, nemaze ew qelîşteka kûr a di navbera şiiyan û bereya berxwedanê ya suniyan de yên ku li dijî hêzên dagirker ên amerîkanî xwe bi rêxistin dikirin, rê dida şideteke kor jî. Kana vê şidetê ji wê rewşê diqewimî ku di dewra Sedam de şiî di bin tehekûma suniyan de dijiyan (Luizard, 2015). A rast dagirkirina Iraqê ya ji aliyê Amerîkayê ve hem duçarî berxwedan û berhilistiya sunî hem jî ya şiiyan bû. Çîna navîn a suniyan ku pozîsyona

xwe winda kiribû û ji îmtiyazên xwe yên di dewra Sedam de bûbûn jî wan bi piranî bi rabêjiyên cîhadker dest pê kir pêşengî li berxwedanekê kir. Di nav van de qisimek ji fermandarên artêşa di dema Sedam de jî hebûn. Tevî ku elîtên şîî yên ji mişextiyên hatibûn anîn û li navendê hatibûn bicihkirin jî, Miqteda El Sadr bi perspektîfeke antî-emperyalîst bang li bajarên Necef û Kerbelayê kir da ku beşdarî berxwedanê bibin. Lê belê bi taybetî piştî hilbijartinên 2005'an ku şîî xurt kirin û sunî li derve dan hiştin, berxwedana îslamî ya li dijî dagirkirinê di nav Iraqê de li şerê mezhebî dageriya. Li gel vê yekê, bazara Iraqê ya ku li êrîşeke aborî ya neolîberal a rapir vebû, di esasê xwe de bi xizmeta ji bo hedefa îstiqrara sermayeya ku hatiye wê derê tev geriya. Di vê çarçoveyê de, nemaze li herêmên gundewar/çolter ji ber ku ku qadên hilberînê yên sînordar ên li ser bingeha çandiniya sînorkirî, bi rêjeyeke mezin hatin tunekirin, nifûseke ciwan a cidî neçar ma ku koçî bajaran bike. Ev binyadbûna sosyolojîk a ku vê yekê ew afirand, yek ji wan sedemên giring e ku bangewaziyên berxwedanê yên ku her diçû radîkal dibûn hem di nav ciwanên sunî hem jî di nav yên şîî de berginda wan a zêde çêbe. Şertên şerê navxweyî yên ku di nav van mercan de kûr bûn, kir ku qelîştekên civakî jî hîn kûrtir bibin (Hinnebush 2016, 569-570). Bi salên 2010'an re ew bêîstiqrariya ku hîn bêhtir zêde bû, dê bikira ku di sala 2013'an de sînorên Iraqê bi awayekî fiêlî ji holê rabin.

Di asta herêmî de jî, di serî de cîran ji bo hemû aktorên herêmî rewşa heyî ya Iraqê hem berjiwendiyên potansiyel hem jî rîsk li xwe vedihewandin. Em dê qisimê eleqedarî mijara kêşeya kurdî ya di asta herêmî de ji sernavê piştre bihêlin û di konteksta pêvajoyên jeostratejîk ên herêmî de ji bo rewşa ku bi awayekî giştî derketiye rastê mimkin e ev bê diyarkirin: Encamên ku dagirkirina Iraqê ew li hundir derxistin rastê dê bandora xwe li salên 2010'an de nîşan bida, ji lew re bandorên damezirewîtiyê yên dewleteke ku hilweşiyaye dê li herêmê wek cîhadkeriyê vebeyiya û dê gelek têkiliyan bi awayekî tesîrê rasterast diyar bikiraya. Lê belê bi berdewamiya salên 2000'î re çendî ku Îran û Sûriye ji bandora suniyan a li Iraqê ku kêmtir dibû memnûn bûn jî, li aliyê din ve ji ber bandorên rasterast û nerasterast ên şerê ku li Iraqê didomiya, ne rihet bûn. Wekî ez dê li jêrê hîn bêhtir bikitekit bikim, Tirkiye jî tevî endîşeyên xwe yên ewlehiyê li rê û dirbên wisan geriya da ku pêvajoyê li leha xwe dagerîne. Herî dawî mirov dikare ji xeta alîgirê Rojava ku li herêmê DYA û Siûdiyan pêşengî lê dikir û Misir û welatên Kendavê tevî wê bûbûn û ji "aksa berxedanê" ya ku Îranê pêşengiya wê dikir, Sûriye û Hîzbilah jî beşdarî wê bûbûn, behs bike. Tirkiye bi berdewamiya salên 2000'î, nemaze bi tesîra perspektîfa neo-osmanîtiyê hewl dida ku terazekê peyda bike (Hinnebush 2013; Hinnebush 2016: 574). Eger em midaxeleya li Iraqê ji perspektîfa pêkvejiyana di nav aştiyê de binirxînin, faktora herî sereke ya ku derketiye pêş ew e ku bêyî DYA têkiliyên hêzê yên ku reh û rîşalên wan ên dîrokî û civakî hene hilde pêş çav, teşebusa wê ya dabeşkirina hêzê ya ji nû ve ye. Vê rewşê kir ku pergala demokratîk a lîberal a bi awayê cîhana Rojava ku midaxelekeriya DYA'yê dixwast wê bi zorê bi

cih bike, di asta herêmî de tûşî binyadên îslamiyên radîkal bibe. Birêvebirina ku bi şêweyeke tercîhî dane şiiyan û xweseriyan ku dane kurdan, dibû sedema civariya hêrseke rovanşîst a di nav suniyan de û li dawiya dawî jî wek cîhadkerî diteqiya. Her du jî, li pêşiya pêkhatina pêkvejiyanê wek asteng xuya dibûn. Bi vî awayî hewla çêkirina seqamgiriya piştî pêkanîna midaxeleyê ku li herêmê terazeke jeopolîtîk a nû ava dikir, a rast rengên îdeolojîk ên tevgerên serhildanê jî ku dê di salên 2010'an de biqewimin, dişêwandin.

## Veguherînên li qada siyasî ya kurdî

Piştî me behs jê kir ku di qada siyasî ya kurdî de şikestina jeopolîtîk a yekem bi midaxekirina li Iraqê dest pê kiriye û wan dînamîkên herêmî û kurewî yên mimkin kiriye ev yek pêk were li jorê bi awayekî qismî cext jî li detayên wan kir û nîqaş kir bi şûn de, ez dê di vê beşê de li ser qada siyasî ya kurdî rawestim ku di bin van mercan de ew çawan xuya bûye bê çawan tesîr li van şertan kiriye. Piştî ez dê lê bikolim bê ka bi teko teko dewletan re çi veguherîn û dagerîn çêbûne û ji aliyê siyaseta wan a der barê kurdî de bê wateyên çawan li xwe digirin bi şûn de, îcar ez dê nîqaş bikim bê aktorên siyasî yên kurdan ev pêvajo çawan pêşwazî kirine û veguherînên çawan bi wan re çêbûne.

### Dewlet û siyasetên wan ên li ser kurdan

Ji ber avabûna dewleteke kurdî ya li Iraqê ya bi awayekî de facto, encamên wisan derketin holê ku wan rasterast tesîr li hemû aktorên qada siyasî ya kurdî kir. A rast, di sala 1991"ê de birêvebirina Kurdistana Iraqê ku bi îlankirina herêma qedexe ya li bakurê paralela 36'an a ji firînê re bi hin rehendên diyar otonomî bi dest xistibû, herêmeke wisan bû ku di navbera Barzanî û Talabanî de nakokî hebûn û ji ber lihevxistinên ku car carinan diqewimîn reqabeta polîtîk dibû sedema çêbûna kêşeyên cidî, di 1998'an de Serokê DYA'yê Clinton di navbera wan de navbeynkarî kiribû. Li gel vê rewşê, ne bernameyeke kurdan hebû ku ji Iraqê veqetin ne jî di asta cîhanî û herêmî de ji vê re destek hebû. Li gorî dîplomatê rûs Primakov (2009: 337-338) berî ku DYA bê merheleya kirina midaxeleya li Iraqê, li hemberî nakokiyekê rû bi rû bû: An dê destek bida cudahîxwaziya kurdan û Iraqê ji pêkhateyên wê cihê bikira yan jî dê Kurdistana Iraqê di çarçoveya berjewendiyên DYA'yê de bi kar bianiya. Mimkin e mirov bikare hewldanên lêgerînê yên ji bo pêkanîna lihevkirina di navbera Barzanî û Talabanî de bixwîne. Mehek piştî Rêkeftina Washingtonê ya ku di bin hamîtiya Clinton de li îlona 1998'an hatibû îmzakirin, kirina alîkariya li PDK û YNK'yê ku digîşt bi milyon dolaran, dîsan xwedî mebesta guhartina rejîmê ya ji hundir ve bû (Černy, 2014: 342–343).

Bi taybetî Parlamentoya Tirkiyeyê piştî memorandûma ku dê erdên Tirkiyeyê ji bikaranîna hêzên îşxalê re vedikirin red kir (tevî alternatîfên din), Herêma Kurdistanê ji bo DYA'yê bû xwedî giringiyeke cidî ya stratejîk. Ev rewşa hanê dikare wek vebeyîna pratîk a bûyîna "awarteya awarteyê" ya Kurdistana Iraqê bê dîtin. Li gel ku dewletên din ên di asta herêmî de û desthilatên mihraq berhingarî li demokrasiyeke bi awayê cîhana Rojava û bipêşketinê dikirin jî kurdan di sepana xwe ya pratîk de, çendî dijwariyên cidî hebin jî, dameziraweyîbûnâ demokratîk qet nebe bi awayekî şematîk qebûl kir. Tevî vê, "hêzên din bi DYA'yê re şer dikir, lê kurdan bi awayekî aşkera nîşan da ku ew alîgirên Rojava ne" (Milaqet, Silêmanî, 22.09.2019). Bi Makeqanûna 2005'an xweseriya ku jixwe di fiêliyatê de hebû, bi rayayên berfireh ên ku heta serxwebûn tê de, ji aliyê Dewleta Iraqê ve hat pejirandin. Vê rewşê li ser asta dewletên li herêmê bandorake cidî çêkir ku ew di nav xwe de bi pêvajoyeke derbasîbûyînê mijûl bûn.

Ji aliyê Îranê ve, li hêlekê hewla li dijî daxwazên veguherînê yên di nava xwe de dameziraweyîkirina rejîmê bi xwe, li hêla din jî, li derve hewla pêşwazîkirina rîskên jeopolîtîk li derveyî sînorên xwe, ji bo wê heta nîvê duyem ê salên 2010'an bûn yên diyarker. Ev meyla hanê mimkin e mirov hem di konteksta qada siyasî ya kurdî ya di asta herêmî de hem jî di têkiliyên wê de yên bi kurdên welatiyê wê re bibîne. Di hilbijartinên 1997'an de piştî ku nimînendeyê tevgera reformxwaz Xatemî wek serokkomar hat bijartin û di sala 2000'î de jî ku îcar mihafezekaran hilbijartinên parlamentoyê winda kir, li serî di nav kurdan de, bi beşên din ên li derveyî nifûsa farisan re bendewariyeke wisan çêkir ku dibe guherînên mezin ên siyasî pêk werin (Entessar, 2014: 214). Tevgera reformxwaz, nemaze ji aliyê azadiya derbirînê ve kir ku bendewariyên mezin çêbin (Guneş, 2019: 91). Lê zor li Xatemî hat ku bikare li dijî mihafezekarên rejîmê raweste. Wek nimûne, mihafezekaran destûr neda ku kurd an jî alîgirên Xatemî wek endamên meclisa bajêr bên hilbijartin (Entessar, 2014: 215). Ev rewş, bi wê rasteqîniyê ve eleqedar bû ku ya rast rejîma Îranê hîn di kûrahiyê de xwe li dora pêşewayên dînî bi rêxistin kiribû û şikestina serweriya wê jî tenê bi hilbijartinê ne mimkin bû ku wê hemû mekanîzmayên xwe yên birêvebirinê li serê ava kiribû. Ev dê nemaze di salên 2010'an de hîn aşkeratir bihata fehmkirin. Ahmedînejad ku di sala 2005'an de li dijî Rafsancanî yê reformxwaz di hilbijartinê de bi ser ketibû, kesekî wisan bû ku li salên 1980'yî otorîteya dewletê li ser cih û deverên kurdan sepandibû û di wan serdeman de jî wî bi xwe operasyonên leşkerî meşandibûn (Guneş, 2019: 92). Ji aliyekî ve sînorên ku rejîmê li dijî tevgera reformxwaz a ku kurdan bi awayekî cidî destekê dabûyê kişandibûn, li aliyê din jî ji ber Ahmedîjejad li ser îdareyê bû ku bi taybetî der barê mijara kêşeya kurdî de xwedî raboriyeke qirêjî ye, di qada siyasî ya kurdî de li leha mafên kurdan tu bipêşketinek çênebû. Tam berevajî wê, dikare ji şerê kêmgur ê ku heta 2011›an bi PJAK›ê re domiyabû û ji şideta dewletê ya li ser kurdan a bênavber bê behskirin. Gavên Ahmedînejad ên der barê nukleerê de, kir ku Rojava mieyîdeyên pêk

dianîn zêdetir bibin. Vê rewşê di destpêkê de kir ku rejîm yekîtiya xwe ya navxweyî pêk bîne û alîgirên tundiyê jî xurt bike (Ehteshami û yên din, 2013: 237). Li gel vê yekê, tevgerên protestoyî û yên îsyanê ku di bingehê de qewimîn û kurdî jî beşdarî wan bûn, bêrawstan domiyan. Ji ber laşê bêcan ê Şivan Qadirî li bajarê Merîwanê bi erdê re hatibû kaşkirin ku ew di protestoyeke sala 2005'an de hatibû kuştin, bû semboleke vê şideta dewletê. Sedema yekem a van protestoyan ew bû ku bedêla mieyîdeyên li dijî Îranê li gel dihat sepandin, a duyem jî ew bû ku nemaze di serdema Ahmedînejad de li welêt kesên ku ne şiî-faris bûn wisan bûbû ku bi awayê siyasî hema bibêje ne mimkin bû ew bikarin xwe îfade bikin. Ji aliyê kurdan ve bi taybetî daleqandina/bidardekirina siyasetkar û şeoreşgerên kurd jî kir ku hêrs û nefrîna kurdan zêde bibe û bi awayekî çalak beşdarî li protestoyan bikin (Guneş, 2019: 91). Ji sala 2009'an pê de protesto domiyan ku bi taybetî alîgirên reformê pêşengî li wan dikirin û ew li tevgera kesk dageriyan. Lê belê di her merheleya krîtîk de li gel rêbêjiyên pêşewayên dînî û midaxeleya bişidet a dewletê ji ber ku gavên têrî hildana sedemên siyaseta otorîter a rejîmê nehatine avêtin, vê yekê kir ku bi taybetî tevgera kesk û bi giştî jî reformxwaz li cem girseyan cazîbeya xwe winda bikin (Entessar, 2014: 219). Vebeyîna vê ya rasterast a li qada siyasî ya kurdî jî, ew zêdebûna şideta dewletê bû.

Tevgera reformxwaz ku hewl dida kanalên guherînê yên biçûk veke, nemaze di bin şertên jeopolîtîk ên salên 2000'î de ku dagirkirina Îraqê pêk hatibû û konsepta ewlehiyê jî têra xwe gur bûbû, hema bibêje bi temamî hat berevajîkirin (Sinkaya, 2018: 846). A rast eger herêma Kurdistanê bi şiiyên Iraqî re têkiliyên baş daniya dê di her halûkarî de binyadeke jeopolîtîk pêk bianiya ku ew bi kêrî rejîma Îranê bihata (Sinkaya, 2018: 853). Ji lew re wek rêya şikandina hewla DYA'yê ya ku wê polîtîkayeke dorpêçkirinê ya li dora Îranê dişopand, stratejiyeke Îranê ya heyvika şiiyan jî hebû ku Îranê dixwast wê pêk bîne. Li gel vê, stratejiyeke din a xwedî heman dereceyî ew bû ku tehdîdên li dijî Îranê li derveyî sînorên Îranê bihatina pêşwazîkirin. Bi taybetî ji bo pêkanîna lingê van stratejiyan ê li Sûriyeyê birêvebirina Herêmî ya Kurdistanê xwedî pozîsyoneke giring bû. Ji lew re -wekî ku dê li jêrê bi awayekî hîn kûrtir bê vekolan- têkiliya ku bi Yekîtiyê re daniye jî dikare di vê çarçoveyê de bê nirxandin. Dîsan di heman kontekstê de mijareke din jî ew e ku PDK-Î ku li Kurdistana Îranê aktîf e û Komala ji xwe re li ser axên îdareya herêmî ya Kurdistana Iraqê kamp ava kirine. Em dê nirxandina vê ya bêhtir bikitekit bihêlin jêrê û em dikarin bi kurtasî vê bibêjin. Îran wek destkeftiyeke têkiliya ku bi YNK û bi awayê qismî bi PDK'yê re bi pêş xistiye, memnûn bû ku partiyên bi awayekî dîrokî mixatebên kêşeya kurdî ya wê bûn, li herêmeke wisan diman ku dikaribû bi qismî be jî kontrola wê bike. Lê çêbûna aktîvîteyeke PJAK›ê ya di heman serdemê de, kir ku şerekî kêmgur mimkin be heta 2011›an bidome. Îran bi awayekî paralelî endîşeyên ewlehiyê ku îşxala amerîkan ew çêkiribû, nemaze ji bo ku hêza şerker a kurdan a ku PJAK'yê pêşengî lê dikir tepeser

bike dest bi sepandina şideteke ekstrem kir û gava ev yek kir jî di nav wan şertan de ku têkiliyên wê yên bi Tirkiyeyê re destûr dida li dijî PJAK û PKK'yê bi taybetî li herêma Qendîlê di sala 2007'an de avêtina topavêjên hevpar koordîne kirin.

Li Tirkiyeyê jî di siyaseta navxweyî de dagerîn û veguherînên wisan diqewimîn ku dikaribû bandor hem li meseleya kurdî hem li angajmanên herêmî hem jî li lêbicihbûna kurewî ya dinyayê bike (Insel, 2015). Di navbera pergala damezirandî ya kemalîst û hikûmeta AKP'yê de ku ew di 2002'yan de hatibû ser textê desthilatê, nakokiya siyaseta xwedî referansa îslamî û ya neteweperweriya sekuler hebû ku di çavkaniya wê de yek ji nakokiyên dîrokî yên sereke yên Rojhilata Navîn e. Mimkin e ev nakokî bi derbeya 1980'yî ya di dema mêjûya nû de û bi wê îslamîtiyê re ku di asta herêmî de bi pêş dikeve, di nav korelasyonekê de be. Di salên 2000'î û yên 2010'an de gelek faktor hebûn ku wan mimkin dikir hikûmeta AKP'yê artêşê ya ku di pozîsyona parêzkar û cihbicihkara mekanîzmayên îdeolojîk, polîtîk û pratîk ên pergala damezirandî ya kemalîst de ye û di serî de daraz hemû burokrasiya dewletê bi awayekî qedemeyî hilde bin serweriya xwe. Ji ber faktorên wekî sermayeyeke global a ku li bereka xwe digeriya û piraniya meclisa ku ji vê re vekirî bû, dikarîbû verastkirinên qanûnî û polîtîk bike; piştî ku Ocalan radestî Tirkiyeyê hatibû kirin bi şûn de, di nav PKK'yê de krîzek çêbûbû û hikûmeta AKP'yê ji ber vê karîbû salên xwe yên ewilî di nav rewşeke bêşer û pevçûn de bibihurîne; pergala kurewî ya hegemonîk a navend-DYA'yî ku bi wesîteya îslama mitedil a ku ji bo Rojhilata Navîn pêşbînî dikir kanalîzekirina wê ya nav kurewîbûna neolîberal, hikûmeta AKP'yê di nav vê atmosfera kurewî de ku bi kêrî berjewendiyên wê dihat, êdî heta bi salên 2010'an bi rêjeyeke mezin pergala kemalîst têk biribû. Li hundir jî terazên siyasî di çarçoveya berjewendiyên xwe yên ku bi vekirîbûna derve re di ahengê de bûn bi kar anîn û bi ser ket ku organîzasyona xwe ya siyasî xurt bike. Di vî warî de bi kadroyên cemaeta Fethulan Gulen ên di nav sîstema dewletê de bi cih bûbûn, ku ev cemaet heta sala 2013'an şirîka wê bû, li dijî pergala kemalîst li cem YE û DYA'yê bi amrazîkirina bendewariyên çareserî û demokratîkbûyînê yên der barê meseleya kurdî de û di encama çêbûna rihetiya ekonomîk a dewrî de ku ji ber hatina sermayeya li Tirkiyeyê pêk hatiye, bi çêkirina çîna xwe ya navîn û sermayedaran karî bi ser bikeve (Karataşli, 2015). Di bin van şertan de rabêjiya dewleta tirkî jî bi rêjeyeke cidî guherîbû (Yegen, 2007). Erdogan ev veguherîna hanê bi hilberandina osmanîtiya îdeolojîk û rabêjiyî ya ji nû ve û bi yekkirina îdeolojiya ku ka dê di dahatûyê de hêza tirk çawan bê şixulandin, pêk anî (Bozarslan, 2013a).

Dagirkirina Iraqê û li wir avabûna îdareyeke herêma Kurdistanê, di serî de bi taybetî ji ber lêferzkirinên qismî yên artêşa temsîlkara pergala kemalîst, ev yek ji aliyê hikûmeta AKP'yê ve bi teredudeke mezin hat pêşwazîkirin. Lê bi qonaxa demê re

hikûmeta AKP'yê ku nemaze ji pêwîstî û berjewendiyên îdareya li vir jî îstifade kir, bi Birêvebirina Herêmî ya Kurdistana Iraqê (BHKI) re têkiliyeke baş bi pêş xist. Qewimîna vê yekê ya wek xeta polîtîkaya derve, bi saya polîtîkaya bi cîranan re ya xwedî kêşeya sifir e ku osmanîtiya nû ruhiyeya vê pêk tîne, wek doktrîneke nû geşe pê tê dayîn û kodên îdeolojîk yên AKP'yê jî wê mimkin dikin. Di sala 2007'an de bi vebûna balyozxaneya Tirkiyeyê ya li li Hewlêrê, ya rast helwesteke wisan hat nîşandan ku ev bi temamî tersî kodên avabûna dewleta Tirkiyeyê ye û li warê siyaseta înkarê ya sedsalî ya di çarçoveya pratîkên siyasî de averêbûnek çêbû. Ji ber meseleya bi Sûriyeyê re piştî ku di sala 1998'an de Ocalan ji Sûriyeyê hat derxistin bi şûn de, ku destê hikûmeta AKP'yê piçek be jî rihet bû îcar dest pê kir Sûriyeyê wek vebûna deriyê li alema ereban bi kar bîne. Ji lew re osmanîtiya nû, ku welatê bi awayekî herî zelal lê dihat hiskirin û yê herî zêde proaktîf bû Sûriye bû (Hinnebush, 2013). Lê belê ji vê wêdetir, ji bo Tirkiyeyê Sûriye di pozîsyoneke giring de bû ku diviya ew di bin bandora Îranê de nehata hiştin (Kabalan, 2013: 36). Tirkiye û Sûriyeyê ji bilî têkiliyên aborî, mijara ku karîn herî hêsan li serê bibin hevpar kêşeya kurdî bû. Ji ber Tirkiye daxilî siyaseta DYA û Îsraîlê ya dorpêçkirina Sûriyeyê nebûbû, vê yekê hevkariya wan a di warên cuda de hêsan dikir.

Li Sûriyeyê desthilata ku ji Hafiz Esad dewrî lawê wî Beşar Esad hat kirin, hem li dijî gefên derve hem jî yên li hundir di nav hewldana hêvişandin û zexmkirinê de tev geriya. Eynî wekî berî dagirkirina amerîkiyan a li Iraqê, li Sûriyeyê jî mezhebparêzî ji aliyê rejîmê ve bi zanebûn li formeke bimaske hatibû bicihkirin (Luizard, 2015: 52). Lê çîna raser a sunî jî ji bo ku berjewendiyên xwe bi pêş bixin rayeyên leşkerî û siyasî bi kar dianîn, ji lew re şertê herî sereke yê dîktatoriya beas bîatkirina li Esad a bêşert bû (Daher, 2019). A rast gava Beşar cara pêşî hat ser desthilatê bendewariya ku dê di siyaseta navxweyî de guherîn û nermahî pêk were çêkiribû û ji vê rewşê re otorîteryanîzma modernker hatibû gotin ku dê şertên adaptekirina rejîmê ya li globalîzmê biafiranda. Lê belê di maweyeke kurt de hat fehmkirin ku rewş dê wisan bi pêş de neçe. Rejîm bi taybetî (ji ber ku qismen dagirkirina Iraqê destek nekiriye) serê pêşî ji ber mieyîdeyên DYA›yê û piştre jî ji ber ên Fransayê bi berdewamiya salên 2000›î ve di nav tengasiyê de bû. Serhildana Qamişloyê, ku ez dê li jêrê cext li ser kitekitên wê bikim, dabû nîşan ku mixalefeta kurdan xurt e û dagirkirina Iraqê dê bike ku ji gelek aliyan ve rejîmê di zorê de bihêle.

Li gel kêşeya kurdî ya Sûriyeyê, vebeyînên (eksên) kêşeya kurdî yên herêmî kir ku hem rejîma Sûriye ji ber tercîhên xwe yên siyasî hem jî ji ber dînamîkên derve bibe xwedî endîşeyên ewlehiyê. Wek nimûne, demeke dirêj hebûna PKK'yê ya li Sûriyeyê li dijî Tirkiyeyê amrazî kiribû ku ew jê bêhtir xwedî hêzeke hîn mezin a leşkerî û aborî bû. Tevî vê yekê, kêşeyên wê yên bi Tirkiyeyê re, ku Tirkiye gefan lê dixwar wê rewteka

ava Çemê Firêt kêm bike û midaxeleya leşkerî lê bike, di sala 1998'an de piştî ku Ocalan di pey Protokola Edeneyê re ji Sûriyeyê hat derxistin bi carekê çareser bûn (Kabalan, 2013: 29). Pirsgirêka avê ji bo wê demê wek kêşe ji holê rabû.[23] Ji ber nediyariyên ku li xwe vedihewandin û vebeyînên mihtemel ên li Sûriyeyê hem rejîm hem jî mixalefeta giştî ya li Sûriyeyê li dijî dagirkirina Irakê rabûbû (Ehteshami vd., 2013: 228). Sedemên sereke yên vê, dibe ku wekî îhtimala piştî îşxalê ew bi hikûmeteke Iraqê ya alîgirê Îsraîlê re rû bi rû bimînin, bandorên li ser kêşeya wan a kurdî ya navxweyî û qeyrana aborî ku dibe ji ber dagirkirinê biqewime, bên dîtin. Li bangewaziyên diyalogê yên timî yên rejîma Sûriyeyê, ku DYA (û Îsraîl) difikire ew bi aramanca ku dixwaze îzolasyona li dora wê çêbûye bişikêne tev digere, loma bersiv nedayê. Di bin van mercan de rejîma Sûriyeyê piştî dagiriyê ku ji aliyekî li dijî DYA û Îsraîlê hewl dida bi Ewrûpa û Tirkiyeyê re terazekê çêke, li aliyê din jî bi armanca ku vebijêrkên (opsiyonên) xwe zêde bike bi Îran, Hîzbilah, Hamas, Rûsya û Çînê re têkiliyên xwe bi pêş dixistin.

Ji aliyê bipêşketinên eleqedarî kêşeya kurdî ya li Iraqê, mirov dikare ji du meylên wisan behs bike ku li cem dewletan bi awayekî zelal derketine holê. Ya yekem, di merheleya pêşî de ji ber lîmîtên xwe yên dîrokî û cografî û ji ber pirsgirêka kêşeya wan a kurdî ye ku li dijî çêbûna vê herêmê û sazûmanîbûna wê pozîsyonekê werdigirin. Ev rewş di pêvajoyên ji bilî vê de, îşaret bi merhaleyeke siyaseta dewletan dike ku ew xwe bi piranî mîna endîşeya ewlehiya ontolojîk vedibeyîne. Yanî piştî midaxeleya li sala 2003'yan li dijî îhtimala mihtemel a Kurdistaneke serbixwe, di serî de Îran û Tirkiye dê dewletan li ser bingeha dijberîtiya serxwebûna kurdan bianiya cem hev. Lê ev rewş ji ber bêewletiya wan a beranberî hev a ku ji nifûza her du dewletan a li ser Iraqê dieqimî bi ser neket. A duyem jî, piştî li Iraqê îdareya herêma kurd a xweser, ketin nav wê hewldaneke wisan a ku ev yek bi awayekî ziyan negihîne berjewendiyên wan bi xwe. Ev pêvajo ji aliyê Tirkiyeyê ve wek zêdekirina hecma aborî û bi wesîteya vê, bi awayekî qismî be jî wek hildana bin kontrolê ya veguherînên li hundir bi pêş ket. Ji aliyê Îranê ve jî, ev yek wiha dikare bê dîtin ku partiyên kurdî yên dîrokî yên ku ew aktorên kêşeya wan a kurdî bûn, wisan bihêle da ew bi kapasîteyeke sînorkîrî ya di nav sînorên Iraqê de bimînin. Çendî ji aliyê Sûriyeyê ve ev yek rîskê çêke jî, ji ber têkiliyên wê yên bi Tirkiye û Îranê re, lê xebitî ku pêvajoyê hevsengî bike.

## Dagerînên li qada siyasî ya kurdî

Rûdan û qewamên ku li salên 2000'î çêbûn û ji gelek aliyan ve bandor li tevahiya herêmê kir, li herî dawiyê şertên wisan ên ku du xetên siyasî zelal kirin pêk anîn ku îroj

[23] Kêşeya avê di salên 2010›an de piştî şoreşa Rojava dê ji nû ve wek arîşeyekê xuya bibûya. Ev yek encama siyaseta Tirkiyeyê ye ku çavkaniyên avê ji xwe re dike wek çekekê.

jî ew hîn serwer in û hemû pêvajoyên li qada siyasî ya kurdî diyar dikin. Em dikarin van wek xetên konfederala demokratîk û netewepera klasîk bi nav bikin. Wan mercên ku kir ev her du xet derkevin meydanê, ne tenê pêvajoyên jeopolîtîk ên li herêmê yan jî ne ew pêvajo ne ku aktorên siyasî yên kurdan ew diyar kirine, bi hevbandoriya wan ev yek mimkin bû.

***Birêvebirina herêmî li Başûrê Kurdistanê***

Herêma Kurdistanê, ku ji sala 1991'ê ve bi awayê fiêlî, di pey midaxeleya 2003'yan re dest lê rihet bû û ji sala 2005'an pê de jî wek makeqanûnî hat naskirin, hem ji aliyê sosyolojiya dîrokî ya qada siyasî ya kurdî ve hem jî di nav dînamîkên Rojhilata Navîn de, têra xwe xwedî cihekî giring e. Mimkin e ev dînamîkên ku di hevpeyvînan de derketine pêş, di bin sê sernavên sereke de bên nîqaşkirin: Encamên ku di qada siyasî ya kurdî de derxistine holê, şekilgirtina desthilata dumendî ya li Başûr û wek jeopolîtîk jî asêbûna di bejahiyê de.

Eger ji aliyê qada siyasî ya kurdî ve lê bê nihartin, ji Komara Mehabadê ve cara pêşî ye ku em dikarin ji îdareyeke kurdan a naskirî behs bike. Li herêmeke biçûk be jî, ji ber ku kurdan naskirin bi dest xist, loma ji aliyê hemû qada siyasî ya kurdî ve vê yekê kir ku encamên bipêşketinekê bi xwe re çêke. Di destpêka van de xuyabûna wek modelekê ya wan partiyan heye ku wan azadbûyîneke qismî pêk anî. Ji bo vê yekê nimûneyeke baş veguherîna îdeolojîk a partiyên Rojhilat e ku ew ji otonomiyê ber bi çareseriya federal ve çûn (Milaqet-1, Almanya 28.06.2021). Li gel vê yekê, bi taybetî di nav wan binyadên hanê de ku PKK pêşengiya îdeolojîk ji wan re dike, tecrubeya Başûrê Kurdistanê wek nimûneya modeleke xerab a birêvebirinê tê dîtin. Ango hem ji aliyê dijberîtiyê hem jî ji aliyê alîgiriyê ve, modela Başûrê Kurdistanê wek nimûneyekê derpêş dike. Mijara duyem jî, hebûna beşeke cidî ya Başûrê Kurdistanê ye ku bi taybetî ji ber nêzikîtiyên ziman, çand û hwd. ew ji bo penahê yan bazirganiyê yan jî peydakirina kar çûne wir. Çîna sermayedar a her sê parçeyên din (çendî bisînor be jî) ku ji bo vekirina kanalên ticaretê timî diçin Hewlêr û Silêmaniyê û kurdên li parçeyên din ku bi keda xwe debara xwe dikin jî di serî de karên înşaetan û ji bo xebitîna di karên din de çûn nav axa Başûrê Kurdistanê. Ji aliyê leşkerî ve partiyên rojhilatî binyadên xwe yên leşkerî vekişandin kampên li Başûrê Kurdistanê ku ji bo wan hatibûn organîzekirin û vê jî bi awayekî qismî ji wan re ewlehî pêk anî. Lê ji ber ku raboriya hêza leşkerî ya PKK'yê hîn bêhtir kevn bû, ne mimkin e ji aliyê leşkerî ve ji bandora veguherîner a damezirandina îdareya Herêmî ya Kurdistana Iraqê bê behskirin. Bi kurtasî, midaxeleya DYA'yê ya li herêmê gelek pêkerên kurewî, dîrokî û sosyolojîk mimkin kirin. Encama raterast a ji bo qada siyasî ya kurdî ew e ku ji bo têkoşîna Kurdistanê kanalek vekiriye ku ev têkoşîn bi dehan sal e didome.

Lê avabûna birêvebirineke li Başûrê Kurdistanê, ji nakokiyên dîrokî, civakî û (jeo) polîtîk ne azade bû. Nakokiyên PDK û YNK'yê û binyadên eşîret û terîqetan ên ku çavkaniya wan jê ye, dê bi rêjeyeke mezin vebeyiyana qedemeyên birêvebirinê. Nemaze ji salên 1970'yan heta bi roja îroj, pêvajoyeke bajarîbûnê çêbû ku ev yek ji ber polîtîkayên dewleta Iraqê pêk hat. Pêşewayên eşîran ên klasîk, ev pêvajo li berjewendiyên xwe dagerandin û kanalîzeyî nav partiyên siyasî bûn. Ango ne tenê wek binyadên ku ji eşîretgeriya arkaîk mane, lê mimkin e ew wek binyadên civakî yên hiyerarşîk bên dîtin ku ew xwe entegreyî şertên nû dikin. Ji vî aliyî ve em dikarin sîstema birêvebirinê ya li Başûr wek sîstemeke melez/hîbrît bifikirin ku binyada eşîriyê û şêweya partiya modern aniye cem hev û din. Loma mimkin e mirov bikare rewşa kana sosyolojîk a dîrokî ya rasterast di vir de bibîne ku nifûsa li Başûr ne bi tenê wek pêgiriya siyasî ya bi partiyên siyasî re, lê wek aborî jî pêgirên wan in (Leezenberg, 2006). Nakokiyên di navbera PDK û YNK'yê de yên ku destûr nadin îdareyeke hevpar pêk were dîsan rasterast eleqedarî vê rewşê ye. PDK li derdora Hewlêr û Dihokê, li dora Binemala Barzanî û (çendî bi qasî berê xurt nebe jî) li derdora Terîqeta Neqşebendî xwe bi rê xistiye, lê YNK bi giranî li Silêmanî û dorhêla wê, di serî de Malbata Telabanî li dora gelek malbatên mezin û li gorî (berê) li dora Terîqeta Qadirî xwe bi rêxistin kir.[24] An jî bi gotina endamekî Tevgera Goran a ku Newşîrwan Mistefa pêşewatiyê lê dike û di salên 2010'an de em dê navê wî hîn aşkeratir bibihîzin, modela PDK'yê eger xanedanek be ku ji bo bi rantê hewl dide dahatê hilde bin kontrolê, YNK ji toreke dejenere ya birêveberan îbaret e ku ji bo pozîsyonên xwe bihêvişin lê dixebitrin her rehendên sîstema ekonomiyê bixin bin kontrola xwe (Azîz, 2017). Di bin van mercan de demokrasiya temsîlî jî geşe bi xwe nade. Wek mînak, çendî li ser kaxiz cihekî wê hebe jî "tu hîkariya parlamentoyê li ser îdareya herêmê nîn e, ji lew re hema bibêje kargêrî bi temamî di destê malbatên serdest de ye... mesela çendî navê giregirên wan partiya bi tawanbariya ji ber gendelî yan jî xiyanetê bê rojevê jî parêzbendiya wan heye, ne mimkin e ew ji ber sûcekî wek berpirs bên dîtin" (Milaqet, Silêmanî, 24.09.2019).

Di birêvebirina herêmî ya Başûrê Kurdistanê de, di nav şertên heyî de çendî du heb binyadên paralel nebin jî lê mimkin e ji du binyadên wisan bê behskirin ku ew xwe dispêrin sedeqeta dupartiyan ên ku bi temamî ji hev cuda bûne. Wek nimûne, wezareteke ku meaşên hêza pêşmergeyan dide hebe jî lê belê pêşmerge di nav zîncireya emir û fermanê ya dumend de tev digerin ku her yek ji wan sadiqî partiya xwe ne (Abbas Zadeh û Kirmanj, 2017). Li vir yek ji sedemên herî giring ku yekîtiyek

---

24 Tenê nimînendeyekî partiyeke siyasî fikireke aşkera daxuyand ku di hilbijartin û siyasetê de terîqet tu rolekê naleyîzin (Milaqet, Silêmanî, 22.09.2019). Li gel vê yekê hem li Silêmaniyê hem jî li Hewlerê gava min ji mirovên li kolanan pirsî wan xwe bi tu terîqetekê ve têkildar nîşan nedida lê pêwendiyeke wan hebû. Di her rewşê de çendî nasnameya terîqetê di veguherînên rojanede diyarker nebe jî eger mirov daxuyîne ku roleke wê ya damezirîner heye dê ne şaş be.

çênebûye ew e ku “her du partiyên herêmên xwe bi rê ve dibin, naxwazin desthilata xwe ji dest bidin” (Milaqet, Silêmanî, 24.09.2019). Dîsan di heman çarçoveyê de dikare ji westabûna desthilateke şoreşger bê behskirin ku binyadbûna desthilatê ya di navbera PDK û YNK’yê de hatiye dabeşkirin, bûye sedema vê yekê. Ev pozîsyonên van her du partiyan ên ku ji cih nayên hejandin, ku wan li Başûr pêşengî li azadbûyîneke qismî kiriye, bi qasî sîstema civakî û siyasî ya ku wan çêkirine, ji ber wê wefa û qebûla civakî ye ku pozîsyona wan partiyan a pêşengiya li şoreşê bûye sedema qewimîna vê rewşê. Ev rewş wek dînamîkeke wisan xuya dibe ku dibe sedema bincilkirina gelek nakokî û gelşên ku derdikevin pêş û ev jî dibe xwedî fonksiyoneyeke yek ji wan sedemên sereke yên ku nahêle desthilatî biguhere.

Di warê mistewiya jeopolîtîk de xisûsa sereke ya ku divê em binê wê xêz bikin jî ew e ku herêma Kurdistanê li herêmeke wisan e ku li deryayan venabe (land-locked) (Milaqet, Silêmanî, 22.09.2019). Ev rewş ji bo her cure çalakiyên wekî bazirganî, aborî, leşkerî û siyasî dike ku bi cîranên li derdorê re pêgirîtiyê çêke. Herêma Kurdistanê ku li bakur bi Tirkiyeyê re, li rojhilat bi Îranê re, li başûr bi hikûmeta navendî ya Iraqê û li rojava jî sînorekî wê yê biçûk bi Sûriyeyê re heye, di navbera çar hêzên herêmî yên cuda de cih digire ku ew bi awayekî dîrokî mafên kurdan înkar dikin. Ji ber vê yekê, li şûna tengijeke (tansiyoneke) timî, hewldana îdareya herêmî ya Kurdistanê ku dixwaze bi hêzên herêmî yên li vir re bikeve nav danûstandineke hevkariyê, rewşeke bivênevê derdixe holê. Vê rewşa hanê ku gava tevî binyada desthilata hîbrît a heyî bê fikirandin, berjewendiyên malbatên xwedî desthilatê kir ku bi birêvebirinên dewletên cîran re têkiliyeke pêgirîtiyê bê çêkirin. Ji bo vê wek mînak mimkin e têkiliya YNK’yê ya bi Îranê re ku xeteke dirêj a sînor di navbera wan de heye û ya PDK’yê jî bi AKP’yê re bide, ku li bakur ev demeke dirêj e (ku bi awayekî qismî beranberî hev) pêgirîtî bi pêş xistiye (Milaqet, Silêmanî, 24.09.2019). Tevî vê, vê rewşa hanê kir ku li leha tevgerên kurdan ên li parçeyên din lê bi piranî jî li dijî wan encaman hilberîne. Ji lew re têkiliyên ku birêvebirina herêmî ya Kurdistanê bi tevgerên kurdan ên din re bi pêş xistine, ji aliyê dewletên eleqedar ve wek endîşeyeke ewlehiyê tê îdrakkirin. Rola kargêriya herêmî ya hem ji bo navbeynkariyê ya têkildarî tevgerên kurdan ên li parçeyên din hem jî ew pozîsyonên wê yên ku li dijî van tevgeran vedigere, nemaze li salên 2010’an dê bi awayekî hîn zelal û aşkera derketa holê. Îroj di bin van mercên heyî de yek ji çavkaniyên tengija sereke ya di navbera PKK û PDK’yê de, ji vê rewşa hanê diqewime ku hepsî nav bejahiyê bûye.

Bi kurtasî ev dikare bê gotin: Li Başûrê Kurdistanê birêvebirinek hat avakirin ku ew xwe dispêre têkoşîna bi salan û rewşa jeopolîtîk a libar. Tesîra vê ya li her sê parçeyên din, ku mimkin e di maweya kurt û dirêj de bê çavdêrîkirin, lê binyada wê ya navxweyî ji ber binyada dîrokî û civakî ya qada siyasî ya kurdî, bi gelek nakokiyên hundirî re rû

bi rû ma. Vê rewşê hem encameke wisan hilberand ku xeta neteweperwer a kurdî ya ku bi armanca avakirina dewletê tev digeriya bi pêş dixist hem jî di heman demê de sînorên hundirî yên neteweperweriya kurdî ya ku di parçeyekî de asê bûye, diyar dikir.

***Vegerîna PKK'yê ya li têkoşîna çekdarî***

Yek ji rûdan û qewan giring ku dê qada siyasî ya kurdî bi tevahî diyar bike jî ew e ku PKK li têkoşîna çekdarî vegeriyaye. Giringiya vê mijarê di du pêvajoyan de dikare bê lêkolînkirin. A yekem kûrahiya pêvajoyên (jeo)polîtîk hem ên herêmî hem jî yên kurewî yên ku li pişt paşxaneya radestkirina Ocalan a li Tirkiyeyê heye û pêwendiya vê ya rasterast a bi kêşeya kurdî ve ye. Nîqaşkirina kûrahiya vê mijarê ya hem bi palpiştiya çavkaniyên PKK'yî yan jî yên nêzî PKK'yê (ku min bi xwe bi qismek wan re hevdîtin kir) hem jî bi palpiştiya kesên mîna Murat Yetkîn ku ew li korîdorên leşkerî û dîplomatîk xebitiye, dê bike ku mijar ronî bibe. Der barê rola DYA û dewletên herêmî de ya meseleya teslîmkirina Ocalan a li Tirkiyeyê, ji aliyê jeopolîtîk ve fikireke zelal dide mirov bê ka pergaleke kurewî ya hegemonîk a dinyaya tekcemserî çawan dixebite. Di midaxeleya Rojhilata Navîn a DYA'yê de, ku wek dîrokî cihekî giring ê Tirkiyeyê heye, daxilkirina wê ya li hewlên ji bo entegrekirina herêmê ya li globalîzmê, tiştekî cidî û giring e. Hebûna PKK'yê, li pêşiya guherandina polîtîkaya derve ya Tirkiyeyê astenga herî mezin bû. "Ji rêxistinên din ên kurdan bi awayekî cuda PKK, ne rêxistineke wisan bû ku pêgirê DYA'yê bû" (Milaqet, Almanya, 18.07.2019). Ev rewş rasterast eleqedarî wê yekê ye ku PKK tevgereke rizgariya neteweyî ya marksîst-lenînîst e. DYA'yê Ocalan radestî Tirkiyeyê kir ku hem Tirkiyeyê memnûn kir hem jî Ocalan derxist derveyî hevkêşeyê (Bila, 2007: 205). Paralelî vê, ji bo rayedarê wê demê yê Konseya Ewlehiya Neteweyî ya DYA'yê Richard Clarke girtina Ocalan dê terorîzma li Ewrûpayê qels bikira û DYA jî der barê vê mijarê de ji hevalbenda xwe Tirkiyeyê deyndar bû (Yetkin, 2004: 147). Wek têkildarî vê, pesteke hevpar li ser Sûriyeyê dest pê kir. Ji aliyê Sûriyeyê ve rewş her ku diçû zelaltir dibû. Gava Fermandarê Hêzên Bejahiyê Atîlla Ateş, li ser sînorê Sûriyeyê di 16 Îlon 1998'an de nîşandana xwe ya hêzê dikir di heman demê de keştiyên cengê yên girêdayî NATO'yê li nêzî peravên Sûriyeyê tetbîqat dikir. Şerkirina bi Tirkiyeyê re dê bihata mehneya şerkirina bi NATO'yê re. Ango "ya rast hêza ku Ocalan ji Sûriyeyê derxist ne Tirkiye ye... Eger bi tenê Tirkiye û Sûriye bûna, dibû ku belim ev pest û pêkutî bihata ragirtin. Li pişt Misir û Mubarek hebûn, mesaj dida Esed ku eger ew ji vir Ocalan dernexe dê Tirkiye û NATO êrîşî wî bike û ew dê wek cîhana ereban li pişt wî nesekinin. Misir jî wê gavê wek welat di nav Îtifaqa Rojava de bû" (Milaqet, Bruksel, 19.05.2019) (her wiha bnr. Yetkin, 2004). Piştî van yekan, Ocalan ji Sûriyeyê derket û piştî bi balafirê çû gelek welatên mîna Yûnanistan, Îtalya, Rûsya û Kenyayê, herî dawî li Naîrobiyê ew li Tirkiyeyê hat radestkirin. A rast ew rewş bi xwe, ji ber pêwendiyên jeopolîtîk ên kêşeya kurdî, her tim bi awayekî aşkera nîşan dide ku hem di nav bicihbûnên herêmî hem jî yên kurewî de cihekî wê yê giring

heye.

A duyem jî, ew encamên mezin in ku ji ber van yekan qewimîne. Mimkin e ev encam di nav wê kontekstê de ya li ser tesîsra li dînamîkên siyasî yên herêma kurdan a li Tirkiyeyê û wek herêmî pêkhatina tevgereke ji nû ve bên nirxandin. Ez encamên radestkirina Ocalan li Tirkiyeyê dîsan bi palpiştiya hevdîtinên ku min kirine di sê merheleyên demî de dixwînim. Encama yekem û ya lezgîn ew e ku PKK ketiye qeyraneke pir cidî ya îdeolojîk, polîtîk û rêxistinî (Milaqet, Bruksel, 17.05.2019). Wek rêxistinî, di encama nîqaşeke polîtîk a cidî ya navxweyî de bi qasî hezar û pênc sed gerîla û kadroyên ji pileya astbilind ji rêxistinê veqetiyan. Bi rastî ev bi awayekî polîtîk eleqedarî sînorên wê nuqteyê bû ku dikarî bi têkoşîna çekdarî bigihîjê û bi rêbazên têkoşîna demokratîk a nav sîstemê ya mihtemel ve têkildar bû. Lê belê ew diyardeya ku di bingeha vê yekê de heye û hewce pê heye bi awayekî hîn kûrane bê nirxandin jî, ew sînorên xeta tevgera rizgariya neteweyî ne. Nîqaşa îdeolojîk a berfireh ku di nav PKK'yê de eleqedarî xeta rizgariya neteweyî ya klasî hat kirin dê hem di nav PKK'yê de hem jî di nav qada siyasî ya kurdî de bibûya sedema qewimîna encamên cidî. A rast mimkin e mirov bikare veguherîna PKK'yê ya îdeolojîk heta destpêka salên 1990'î bibe. Ji lew re, ji wê dewrê pê de îdeolojiya rizgariya jinan, pratîkeke gerîlavaniyê ya ku bi siruştê re ahangdar e yan jî gelek rehendên ku xeta rizgariya neteweyî pirsyarî dike, jixwe mijarên wisan bûn ku hema bibêje dihatin nîqaşkirin. Di bingeha vê de ew rasteqîniya têkçûna sosyalîstiya reel hebû, ji lew re hewce pê hebû ku li dijî şertên nû yên kapîtalîzmê ku di asta kurewî de bi pêş diketin, diviya wek bersiv di pratîkên siyasî yên sosyalîzma nû de tişt bihatina hilberandin. Ji aliyê PKK'yê ve ev pratîka siyasî ya nû, di bin roniya raman û pêşniyazên Ocalan de ku wî di nav şertên girtîgehê de ew bi pêş xistibûn, mimkin bû ew binyada xwe ya rêxistinî biguherîne. Mirov dikare vê bibêje: PKK, piştî Ocalan radestî Tirkiyeyê hat kirin bi şûn de, ji nav wê krîza rêxistinî, siyasî û îdeolojîk a ku ketibûyê, karî bi îdeolojiyeke mezin û bi binyadeke rêxistinî ya guncayî vê derkeve (Akkaya û Jongerden, 2010; Saeed, 2014). Li salên 2000'î vê veguherîna îdeolojîk a ku karîbû pratîkên siyasî bi cih bike û bi awayekî qismî jî otonom bû û vê ji nû ve aşopî bike, îcar dê bi neteweperweriya ku di salên 2010'an de li tevahiya qada siyasî ya kurdî bilind dibû bihata pêşberî hev. Pratîkên ku otonom bûbûn, wan kir ku li Rojhilat PJAK, li Rojava PYD û li Başûr jî PÇKD çêbin û bi taybetî li Rojava û li Rojhilat jî bi awayekî cidî mezin bibin. Merheleya sêyem jî, piştî PKK'yê ji nû ve dest bi têkoşîna çekdarî kir bi şûn de, pêvajoyeke nû dest pê kir ku lihevxistin û ji 2005'an pê de jî hevdîtin pêk werin. Ji aliyekî ve ji ber wan şertên ku krîza PKK'yê çêkiriye pêşî li AKP'yê vebûbû da ku hêdî hêdî xwe ji aliyê siyasî ve li navendê bi cih bike, li aliyê din jî wek şertên berdewamkirina vê ew hewla wê ya xwedî dîmena demokratîkbûnê ya ku bi DYA û YE'yê re di nav ahengiya rabêjiyê de bû, ji sala 2005'an bi şûn de li hevdîtinên bi PKK'yê re veguherîn. Ev pêvajo, yek ji wan pirên girêder ên

silsileya hevdîtinên dirêj bû ku dê di 2013'an de careke din dest pê bikira û kana vê jî li destpêka salên 90'î bû.

Bi kurtasî, PKK piştî Ocalan ji Sûriyeyê hat derxistin û radestî Tirkiyeyê hat kirin bi şûn de wê veguherîna tê re bihurî, kir ku di warê zelalbûna wan nakokiyan de, ew ên ji ber xeta kevneşopî ya neteweperwer a kurdî ya ku qada siyasî ya kurdî di nav şertên heyî de diyar dikir û ya ji ber xeta konfederalîst a demokratîk ku li ser bingeha enternasyonalîst bi pêş diket, roleke kilîdî bileyîze. Lê divê li vir bal lê bê kişandin, ji wê faktora tek a ku wergirtina pozîsyona îdeolojîk-polîtîk diyar dike bêhtir, eger ew wek pêwîstiyeke ku ji nav pêvajoyên siyasî yên aloz derketiye bê dîtin dê rasttir be. Bi gotineke din, ji perspektîfeke ku li vir bi berçavka îdeolojî derdora xwe dişêwîne zêdetir divê ku binê wê hevbandoriya îdeolojiyê ya bi pêvajoyên siyasî re bê xêzkirin. Nimûneyên ku vê diselmînin, dê di beşeke pey re, bi siyaseta rêya sêyem a ku wê veguherînên hem li Sûriyeyê hem jî li Tirkiyeyê derxistine hole dê bi awayekî pêwendîdar bên nîqaşkirin.

***Serhildana Qamişloyê û PYD***

Bi awayekî adetî partiyên pêwendîdarê PDK û YNK'yê ku bi taybetî her tim li Qamişloya li bakurê rojhilat xurt û hêzdar bûn, berî derbeya sala 1980'yî ku Ocalan çûbû Sûriyeyê û ji wir jî ji bo kampên gerîla peyda bike derbasî Libnanê bûbû, tesîra wî û ya PKK'yê li derdora Efrîn û Kobaniyê çêbû. Bi berdewamiya maweya ku PKK li Libnan û Sûriyeyê çalak bû, xebata kadroyên wê yên birêxistinkirinê yên li bajarên kurdan domand. PKK ku heta 1998'an bi awayekî dîrokî bi giştî ne li dijî Sûriyeyê lê li dijî Tirkiyeyê kurdên Rojava bi awayekî girseyî rêxistin dikir, lê partiyên din bi piranî li gorî pêvajoyên siyasî dibûn xwedî pozîsyon û rêxistinên wisan bûn ku di asta girseyî de hîn kêmtir xebat dimeşandin (Tejel, 2009). Wek encama raserast a derxistina Ocalan ji Sûriyeyê, azadbûna PKK'yê ya ji têkiliyên wê yên bi Sûriyeyê re ye û ev rewş yek ji wan pêkerên sereke ye ku wê kiriye bereha siyasî ya kurdî li Sûriyeyê berfireh bibe (Tejel, 2017). Rewşa herî zelal a vê yekê ya derketiye hole, dikare di wê serhildanê de bê çavdêrîkirin ku di sala 2003'yan de li Qamişloyê qewimîbû û bi mirina 50 kesî, bi birîndabûna gelek kesan û bi girtina zêdetirî du hezar mirovî bi dawî bûbû. Serhildan li Qamişloyê piştî maçeke futbolê rûdabû û berbelavbûna wê ya li Efrîn û Kobaniyê rasterast bi hêza rêxistinî ya PDK'yê ve têkildar e ku ew di nav hewla avakirina xwe de bû. Li gel vê yekê, piştî çalakî û tepeserkirina wan a ji aliyê rejîmê bi şûn de, gelek partî li Qamişloyê pîrozbahiyên Newrozê yên sala 2004'an îptal kirin, lê PYD'yê ev yek nekir û vê tevî pest û tehdeyên rejîmê, hêza PYD'yê ya ziyanpêneketî (intact) jî nîşan da (Gauthier, 2005).

Li hundir ev tişt diqewimîn û rejîmê jî bi şideteke mezin bi ser serhildanê de diçû ku divê ez ji du sedemên sereke behs bikim ku di hevpeyvînan de derdiketin pêş. A yekem, mezinbûna PYD'ê dîktatoriya beasê nerihet dikir, ji lew re wê hingê ji bo da polîtîkayên îzolasyonê yên ku ji hêla DYA û Îsraîlê ve li dora wê dihatin danîn bişikêne Esad bi Tirkiyeyê re têkiliyên gelek baş bi pêş dixistin. Rejîm nedixwast ev ranêzikiya paradîgmaya bi cîranan re sifir kêşe ya Tirkiyeyê, ji ber sedema PKK'yê xera bibe. Rayedarekî YPG'yê yê wan deman wiha dinirxîne: "Ji ber me îdeolojiya Ocalan pejirandiye û ji ber ku di navbera rejîma Sûriyeyê û Tirkiyeyê de têkiliyên baş hene, ji hêla rejîmê ve herî zêde endamên me dihatin girtin û duçarî îşkenceyê dibûn" (Milaqet-2, Silêmanî 22.09.2019). Dikare bê gotin ku rejîm der barê PYD'yê de endîşeyeke taybetî ya ewlehiyê dike û di kana vê yekê de jî ew melekeya PYD'yê heye ku dikare girseyên berfireh mobîlîze bike (Kajo û Sinclair, 2011). Tevî vê rewşê, wek sedema duyem jî divê binî bê xêzkirin ku di wê demê de li Başûrê Kurdistanê wê herêma otonom a xwedî rayeyên berfireh, ku dibû bi awayekî misoger pêk were, hem di asta herêmî de hem jî di qada siyasî ya kurdî de livdariyeke cidî afirandibû. Rejîmê Serhildana Qamişloyê mîna encama vê nirxand (Sunca, 2021: 113). Ev rewş dikare wek vebeyîna wê endîşeyê bê xwendin û şirovekirin ku ya rast tirsa sereke ya hemû dewletên ku pirsgirêka wan a kurdî bi xwe heye, ji ber qewam û rûdanên li derve loma wisan difikirin dibe ew tesîr li kurdên wan bi xwe bike da ku rabin serî hildin.

***Rojhilat û qada siyasî ya kurdî ya veguherî***

Ji aliyê Rojhilat ve, bi palpiştiya hevpeyvînan mimkin e ji sê dînamîkên sereke yên vê dewrê bê behskirin. A yekem, bi rewşa berdewam wek qewimîna serhildanan, protesto û çalakiyan dikare bê zelalkirin. Ev rewşeke wisan bû ku bêhtir bi awayekî girseyî pêk dihat. (Nîqaşa eleqedarî vê li jorê, di beşa nîqaşkirina rewşa giştî ya Îranê de hat kirin.)

A duyem, a rast gava hîn Sedam li ser desthilatê bû, li Iraqê kampên partiyên Rojhilat hebûn. Li Başûr, avabûna birêvebirina Kurdistanê berdewam kir ku li vir ji bo PDK-Î û Komalayê qada ewledar dabîn bibe. Car carinan ji bilî wan teşebusên sînordar ên ku ji bo têkoşîna çekdarî ji nû ve bidin destpêkirin, kadroyên birêxistî û hêzên pêşmerge yên van partiyan bi rêjeyeke mezin hîn jî li Başûrê Kurdistanê dijîn (Milaqet-1, Almanya 28.06.2021). Van şertan çendî li dijî êrîşên Îranê, ku ew rejîmeke çewisîner a cidî ye, ewlehiyekê pêk anîbe jî lê têra xwe têkiliyên bi kurdên Rojhilat û yên bi asta girseyî re, sînordar kirine (Milaqet-2, Almanya 28.06.2021). Yanî teraza di navbera ewlehiya wan û çalakiyên wan ên siyasî de, nemaze bi gihîştina statuyeke siyasî ya Kurdistana Iraqê re, li dijî çalakiyên wan ên siyasî bi pêş dikeve. Hewl tê dayîn ku ev yek bi wesîteya televîzyon, medyaya civakî û bi weşana çapkirî ya xwedî hejmareke sînordar bê dabînkirin. Li gel vê, li dijî rabêjiyên PDK-Î û Komalayê yên otonomîst ên berê, dest pê kirin ku di van salên dawî de li Îraneke demokratîk a

federal Kurdistaneke federal biparêzin (Guneş, 2019: 86). Em dikarin ji rola rasterast a Kurdistana Iraqê ya li ser vê behs bikin, ku ew wek model xuya bûye. Di sala 2006'an de PDK-Îran û di sala 2007'an de jî Komala, ji ber nakokiyên di navbera wan komên ku dixwastin çalakiyên xwe yên siyasî û/yan jî leşkerî zêde bikin û kesên ku dixwastin rewşa heyî mihafeze bikin, di navbera xwe de (careke din) dabeş bûn. Mimkin e ev jî wek encama rasterast a wê rewşa hanê ya ku bêtesîrbûna siyasî bûye sedema wê bê dîtin. A rast vê rewşa van partiyên ku li Başûrê Kurdistanê hepsî wê bûne û bi awayekî cidî ku dibû sedema qelsketina wan, kir ku derfetên xurtkirina PJAK'ê hîn zêdetir bibin.

Mijara sêyem jî mezinbûna PJAK'ê ye. Ji ber ku çalakiyên partiyên din pir daketibûn asteke sînordar bi berdewamiya salên 2000'î re xuyabarî û kapasîteya siyasî ya PJAK'ê li nav kurdên Rojhilat zêde bû. Bi taybetî piştî bi PKK'yê re veguherîneke îdeolojîk çêbû bi şûn de, PJAK ku vekirîbûneke cidî ya rabêjiyê qefalt karî beşên cuda yên civakê wergire nava xwe û divê ji têkiliyên wê yên ku bi kurdên lor, kurmanc, şiî û yaresan re danîne bê behskirin ku ew li derveyî girseya kurdên soran-sunî yên adetî mabûn ku partiyên din xîtabî wan dikir (Milaqet-2, Almanya 28.06.2021).[25] PJAK ku di bin van mercan de bipêşketineke cidî nîşan da, ev rewş dibe wek yek ji bandorên rasterast a vekirîbûna îdeolojîk bê dîtin ku piştî bi PKK'yê re guherîneke îdeolojîk çêbû bi şûn de kir ku ew ji cudahiyan re vekirî be û bike şert da ew jî daxilî nava vê yekê bibin. PJAK heta agirbesta sala 2011'an ya ku li dijî Îranê ragihand karîbû ku li qada Rojhilat kartêgeriya xwe bidomîne û piştî vê bi şûn de jî dê bi sînorên cur bi cur re rû bi rû bimaya. Lê belê Îranê piştî 2011›an, ji ber ku ne bombardûmana xwe ya li dijî PJAK'ê ya li derveyî sînor ne jî siyaseta xwe ya cezakirinê ya li ser bingeha ewlehiyê ya li dijî kurdên li nav welêt sekinand, vê kir ku di salên 2010'an de li pêşiya mezinbûna PJAK'ê gîrdan (hecir) bên danîn.

# Encam

Di beşa vê xebatê de hewl tê dayîn ku ew veguherînên di salên 2000'î de li qada siyasî ya kurdî qewimîne bên watedarkirin, loma ez lê xebitîm bi detayên wê yên dîrokî nîqaş bikim bê ka ev qad li ku derê qewam û rûdanên ku di asta kurewî û herêmî de derketine holê, cih digirin. Salên 2000'î ku kir qada siyasî ya kurdî livdar bibe û di pêvajoyên herêmî de jî ku li herî dawiyê kurdan destkeftiyên diyar bi dest xistin û pozîsyona wê jî guherî, rasterast bandor li pêvajoyên di pey re jî kir. Bi gotineke din, ew binyadên civakî, siyasî û îdeolojîk ên ku di vê dewra deh salî de

---

[25] Ji bo lêbelavbûna zaravayên kurdî yên li ser nexşeyê *bnr* VESER-4

derketine holê, eger wek zemîna wan veguherîn, nakokî û lihevxistinên ku dê di salên 2010'an de biqewimin, werin pênasekirin dê ne şaş be. Ji lew re paşxaneya dîrokî ya şertên heyî û şêweya avabûna dînamîkan, dê ji niha bi şûn de bibûna diyarkera herî sereke ya pêvajoyan. Di vê kontekstê de sosyolojiya siyasî ya salên 2010'an, li navenda qewam û bipêşketinên kurewî û herêmî yên ku îro çêdibin, cih digire. Em dikarin van dagerînên li qada siyasî ya kurdî, di asta kurewî de li nav hewldanên midaxelekeriya nû û entegrasyona kurewîbûna neolîberal û di asta herêmî de jî li dijî berxwedana vê entegrasyonê ya li nav konteksta "awarteparêziya Rojhilata Navîn" a ku bi perspektîfeke Ewrûpa-navendparêz hatiye têgihîkirin, binirxînin. Wek encama rasterast a serxweşiya zafera lîberal a piştî Şerê Sar, hewldana daxilkirina li pergala lîberal a dinyayê ya beşê mayî ya cîhanê ku bi şertên kapîtala fînansê re bi yek bû, bû sedema rûxanên gelek cidî û vê jî berxwedaneke pirhêl bi xwe re anî. Midaxeleyên li Rojhilata Navîn di vê çarçoveyê de çêbûn. Lê belê encamên vê midaxeleyê li dawiya dawî hevkêşeyeke jeopolîtîk û civakî li dû xwe hişt ku derketina ji nav wê gelek zor e. Ji lew re midaxeleya li Iraqê ku ji aliyekî ve rûxan û wêraniyeke cidî çêdikir li aliyê din, a rast wekî ku em dê li salên 2010'an de bibînin jêrxaneya krîza global a enternasyonalîzma lîberal dihonand. Li gel vê, vê rewşê hanê di asta herêmî de jî gelek wergirtina pozîsyonên nû yên siyasî û civakî bi xwe re anî. Em dikarin bandora van a li qada siyasî ya kurdî, ku me li jorê bi awayekî kûrane analîz kiribû, di çend xalan de bicivînin.

Ji aliyê pêvajoyên hegemonîk ve pêwîstiya çêkirina dijminê nû û kampanyayên antî-terorê kir ku ji hêla dewletên herêmî yê têkildar ve encama nirxandina tevgerên kurdan di nav vê konseptê de derxe holê. Di sala 1997'an de ji aliyê DYA'yê û di sala 2002'an de jî ji hêla YE'yê ve hildana nav lîsteya rêxistinên terorê ya PKK'yê, encama vê ya yekser e. Eger em li pêş çav bigirin ku di sala 2014'an de PDK û YNK ji nav lîsteya rêxistinên terorê ya sinifa sêyem hatine derxistin, em dê bi awayekî hîn zelal û aşkera bibînin ku pênasekirina terorê ji aliyê çarçoveya qada siyasî ya kurdî û pêvajoyên hegemonîk ên kurewî ve, bê tê çi wateyê.

Hewldanên ji bo entegrekirina li sîstemê, li gel xwe tecrubeyên kirina aştiya lîberal jî anîbûn. Li salên 2000'î hatibû pêşbînîkirin ku PKK bê bêçekkirin û kêşeya kurdî ya li Tirkiyeyê bi vê teknolojiya aştiya lîberal bê çareserkirin. Bandorên vê, em dê li pêş bi pêvajoya çareseriyê re yên di salên 2010'an de bi awayekî hîn bikitekit nîqaş bikin, lê belê bi tunebûna feraseta kirina aştiyê ya ku di salên 1990 û 2010›an de bi pêş ketibû, dê ne pêvajoya Osloyê ne jî pêvajoya aştiyê ya ku dê di pey re pêk bihata, gengaz bibûya. Ji lew re pêvajoya avabûna dewletê ya li Iraqê jî dîsan berhema heman perspektîfê bû, lê belê bi awayekî mihtemel yek ji nimûneyên herî xerab bû ku di serî de ew dihat.

Li gorî pêvajoyên siyasî û jeopolîtîk berevajîkirina zemîna mafên mirovan a normatîf û parêziya wê, yek ji encamên herî yekser ên li qada siyasî ya kurdî dikare di ranêzikiyên tercîhkirî de bê dîtin ku ji aliyê emperyalîzmê ve tên sepandin. Awayên cur bi cur ên şideta dewletê yên ku dewleta Tirkiyeya endameke NATO'yê ye li dijî kurdan pêk tîne, çendî li cem Dadgeha Mafên Mirovan a Ewrûpayê encama mieyîdeyên hiqûqî yê sînorkirî pêk anîbe jî, lê ji bilî rabêjiyan hema bibêje tu mieyîdeyeke siyasî çênekir. Lê îcar ew teşebusên jenosîdê yên ku Iraqê bi berdewamiya salên 80 û 90›î pêk anîbûn (çendî ev bi rêjeyeke mezin bi desteka welatên Rojava bi awayê rasterast an jî nerasterast an jî bi çavpoşîkirina wan qewimîbin jî) di her zivirînokê de ew yek ji sedemên herî bingehîn ên midaxelekirinê hatin nîşandan. Li vir nîqaş jî bê ka kîjan dewletê çi qas û şideteke çawan bi kar aniyê bêhtir ew rewşa hanê ye ku kêşeya kurdî ne di nav wê çarçoveya prensîpa normatîf a gerdûnîtiya mafên mirovan de ya îdîakirî, lê li gorî tercîh û berêtiyên pergala siyasî li ser tê sekinandin.

Di perspektîfa wan dewletên herêmê de jî dibe ku nakokî hinekî bi awayekî aloz û têkilhev bixuyin. Ji lew re xala herî sereke ya ku ew her çar dewletên mijara dabaşê û binyadên desthilatê yên li vê derê li ser hevpar dibin, sekina li dijî serxwebûneke kurdan a mihtemel e. Ev rewş wek kêşeya ewlehiyeke ontolojîk a ku ji ber endîşeya dewlet û xerabûna hiyerarşiyên civakî yên avakirî diqewime, hat îdrakkirin. Lê dîsan wek paralelî vê, ew hewla dewletan a ji bo ku tevgerên kurdan li dijî hev û din bi kar bînin jî, bi berdewamiya salên 2000'î mîna hêmaneke endîşeyê hebû. Dîsan taybetmendiyeke din a ku dikare di heman perspektîfê de bê nirxandin jî, ew hewldana aktorên dewletên emperyalîst ên kurewî ye ku dixwazin tevgerên kurdan an elemîne bikin an jî destek bikin da ku dewletan bînin ser xeta xwe. Di vê çarçoveyê de radestkirina Ocalan li Tirkiyeyê û li dawiyê kaşkirina PKK'yê ya li nav qeyranekê, rasterast bi daxwaz û hewla DYA'yê re têkildar e ku ew dixwaze Tirkiyeyê bike parçeyekî lingê entegrasyona neolîberal a kurewî ya li Rojhilata Navîn. Dîsan ji hêla DYA'yê ve destekkirina PDK û YNK'yê jî amadehiyên wan teşebusan bûn ku dê li dijî rejîma Sedam bihatina kirin.

Vebeyîna awarteparêziya Rojhilata Navîn a li qada siyasî ya kurdî, eleqedarî pozîsyona kurdan a "awarteya awarteyê" bû. Bi taybetî li Iraqê, siyaseta kurdan ji ber ku li gorî komên din ên civakî û siyasî bêhtir xwedî binyadeke sekuler bû û qet nebe di asta rabejiyî de be jî wan demokrasî pejirandibû û ji ber vê yekê bi Rojava re di nav hevahengî û ahengê de bûn, loma ji hêla gelek rabêjiyên serwer ve wek dekeke emperyalîzmê hatin dîtin. Bi gotineke din, ji ber ku hewla bicihkirina aştiya lîberal bi pozîsyona kurdan a bi pratîkên siyasî yên di îdraka hegemonîk a "awarteya awarteyê" de bi yek bû, di nav wan dewletên li nav qada siyasî ya kurdî de, rê ji endîşeyeke ewlehiyê ya ontolojîk re vekir. Yanî ku kurd di îdrak û bîrbirina Rojava de "awarteya

awarteyê" bûn, lê îcar di nêrîna dewletan de xwedî pozîsyona "pêleyîstoka Rojava" yan jî "piyonê emperyalîzmê" bûn.Vê jî roleke wisan leyîst ku ne tenê di nezera rejîman de lê di nêrîna mixalîfên rejîmê de jî dînamîkên pêkvejiyanê problematîk kir. Lê divê binê vê yekê bi awayekî stûr bê xêzkirin ku hem ji aliyê Rojava ve "awarte" hem jî ji aliyê dewletên herêmî ve wek peyak (piyon) îdrakkirina wan, di pozîsyoneke hiyerarşîk de hatiye hilberandin û li gorî pozîsyona xwe ya siyasî ve jî esasên kognetîf in ku siyaseta kurdan nişte dike. Em dikarin bibêjin ku ev her du jî ne ji ber endîşeyeke fehmkirina ji qada siyasî ya kurdî lê bi armanca amrazîkirinê tev digerin. Nîqaşên mîna vê dê piştî şoreşa Rojava û di sala 2014'an de li dema parastina Kobaniyê ya li dijî DAÎŞ'ê jî bihatina kirin.

Piştî dagirkirina Iraqê vê îdrakê kir ku neteweperweriya ereban kurd wek "gelê ku xiyanetê dike" an jî "ji par re mirovan xencer dike" bê dîtin û ji ber vê jî ferasetên siyasî yên neteweperwer hîn bêhtir kûr bibin. Neteweperweriya kurdan a ku li dijî vê geşe bi xwe da jî, bi mebesta mafên xwe bi dest bixe neçar ma ku di nav hevkariya bi emperyalîzmê re tev bigere. Lê belê ev rewş wekî li jorê jî bi awayekî hûrgilî hat nîqaşkirin, ketina ber bayê duyîleya (dîlemaya) kîşedar a emperyalîzm û antî-emperyalîzmê, nakokiyan zêde û kûrtir dike. Ji lew re hem siyaseta kurdî hem jî dewlet û avaniyên mixalefetê, ji ber ku mecbûr in bi awayekî bi hêzên emperyalîst ên li herêmê re bibin mixetab. Di demên pêş de dê vebeyînên hîn mezintir ên vê yekê çêbin.

Wek dawî mimkin e li qada siyasî ya kurdî ji du veguherînên mezin bê behskirin: Têkoşînên rizgariya neteweyî yên kurdan li salên 1990 û 2000'î di asta civakî de, di navbera xeteke konfederala demokratîk a radîkal bûyî û xeteke neteweper a kurdî ya kevneşopîbûyî de hat ser terqerêyekê. Li Tirkiyeyê ji salên 1970'yî ve ew binyada rizgarîxwaza neteweyî ya xurt bû û enternasyonalîzm û sosyalîzm derdixist pêş, li salên 1990 û 2000'î bi awayekî qedemeyî li ser xeteke konfederala demokratîk bi cih bû û dest bi zêdekirina kartêkeriya xwe kir. Ev rewş berhemeke mekanîzmayên pêkutiyê yên ku pêvajoyên jeopolîtîk ên kurewî û herêmî bi xwe re anîbûn û ya mihesela vekirîbûna siyasî û têgihî ye ku veguherînên îdeolojîk ew afirandibûn da ku bi armanca berxwedana li dijî van pest û pêkutiyan çareseriyên hîn kûrane hilberîne. Xeta neteweperwer a ku li Iraqê tim hîn bêhtir serwer bû, bi berdewamiya salên 1990 û 2000'î di bin wan mercanê hanê de ku jê re qada serweriyê pêk dianî, têra xwe bi pêş ket û warê xwe yê kartêkeriya siyasî berfireh kir. Her du xetên ku gelek hêmanên arîşedar ên binyaddarbûna civakî ya kurdî bi argumanên îdeolojîk-polîtîk xerman kirin û ji nû ve hilberandin jî li salên 2010'an dê bûyîna xwe ya wek aktorên kilîdî yên qada siyasî ya kurdî bidomandina. Binyadên siyasî yên li Rojava û li Rojhilat, bi awayekî giştî di bin bandora van her du modelan de bûn. Lê belê nemaze bi salên 2000'î re, bi çêkirina wê bandora ku rêxistinên girseyî yên ku PKK'yê pêşengiya wan a

îdeolojîk û pratîk-polîtîk dikir, li salên 2010'an dagerîneke qewimî ku vê yekê kir xeta konfederala demokratîk a xurt bi awayekî hîn aşkeratir derkeve holê.

Ji bo rewşa nû ya ku vê ji aliyê dînamîkên pêkvejiyana aştiyane ve ew derxistiye holê bi awayekî kurtasî wiha dikare bê gotin: Bûyera herî aşkera bêyî guman ew e ku li Iraqê Herêma Kurdistanê di makeqanûnê de wek herêmeke federal a Iraqê hatiye naskirin. Ji ber tesîra ku vê ew çêkirine, hem bi aktorên herêmî re hem jî bi qada siyasî ya kurdî re gelek veguherînên mezin pêk hatin. Ji aliyê hikûmeta Tirkiyeyê ve li Hewlêrê vekirina konsolosxaneyê, bi awayekî dîrokî gava ew ranêzikiya Tirkiyeyê ya li hemberî kêşeya kurdî li pêş çav bê girtin, dê bê dîtin ku bi awayekî sembolîk ev mînak xwedî giringiyeke mezin e. Ev rewş îşaretek bû ku eger çareseriyên bi rêbazên federatîf pêk werin dê di asta herêmî de jî bên qebûlkirin û bi wesîteya elîtên siyasî yên kurdan ve ew wek metodeke bipêşxistina têkiliyên aştiyane ya bi dewletên eleqedar re derket pêş. Paralelî vê, li Tirkiyeyê radestkirina Ocalan jî rê ji veguherîna PKK'yê re vekiriye ku wê pêvajoya xwe temam bike û ji têkiliyên herêmî re terazeke nû aniye. Veguherîna ku bi PKK'yê re çêbûye û di encama vê de ew modelên xwebirêxistinê yên civakî ku dê li salên 2010'an derkevine holê û binyadên siyasî jî di navbera qisimên cuda yên civakê û temsîliyetên wan ên siyasî de minkin kir ku pratîka pêkvejiyanê ya ji jêr ve ya ku xwe dispêre çêkirina îtifaqê, pêk were. Yanî çareseriya federatîf a li Başûr dê bibûya nimûneyeke pergala aştiyê ya di asta dîplomatîk û elîta siyasî de, li Bakur şertên ku dagerîn û veguherîna PKK'yê ew mimkin kiribûn jî li jêr grûpên civakî û di asta wan a temsîliyetê de dê bibûya xwedî nimûneyeke pêkvejiyanê. Qada siyasî ya kurdî di bin wan mercan de derbasî salên 2010'an bû ku dê di wan salan de krîza pergala kurewî ya lîberal, serhildanên ereban û şoreşa Rojava çêbibûya.

BEŞA SÊYEM

# LI SALÊN 2010'AN KÊŞEYA KURDÎ

Ji bo watedarkirina veguherînên ku li salên 2010'an di qada siyasî ya kurdî de çêbûne, asta analîzê ya sereke ya ku divê lê bê nihartin ew hevbandoriyên hanê ne ku di navbera krîza pergala dinyaya lîberal a qewimî, encamên ku ji ber serhildanên ereban ên li herêmê rûdane û ya di navbera qada siyasî ya kurdî de pêk hatine. Krîz, bi pênasekirina Gramsci, wê navberê îfade dike ku ya kevn li ber mirinê ye lê ya nû jî hîn çênebûye (Gramsci, 1971). Ev navber gelek îhtimalên cuda jî li xwe vedihewîne (Stahl, 2019). Ev krîza ku pergala dinyaya lîberal tê re dibihure, ew ne tenê bi welatên lîberal-demokratîk sînorkirî ye, tam berevajî vê ev dewlet ji bo ku heta roja îroj serwer û hegemonîk in, krîzeke wisan e ku pir an hindik wê bandor li hemû dinyayê kiriye. Mimkin e ev krîz wisan bê xwendin ku ji ber ew aliyê civakan ve wek feraseta aştiya kolonyal a serwer hatiye redkirin û di encama wê de jî ew lihevxistin derketine holê. Yanî ji ber vebeyîna vê krîzê ya li dinyayê terazên siyasî û civakî hejikandine û ji ber bi herêmên cuda yên dinyayê re di nav hevbandoriyê de bûye divê ku di pîvaneyeke hîn berfireh de li dest bê hildan. Li gorî vê, mebesta beşa sêyem ew e ku li ser bingeha herî sereke di serî de qada siyasî ya kurdî, nîqaşkirina wan hevbandoriyanê hanê ye ku ew li Rojhilata Navîn bi dînamîkên lihevxistinê yên siyasî û civakî re ketine têkiliyê.

Teza sereke ya ku dê di vê beşê de bê parastin, wekî beşa berî vê ji bo salên 2000'î hatibû nîqaşkirin, di salên 2010'an de jî dînamîkên veguherînê yên sereke yên qada siyasî ya kurdî bi pêvajoyên herêmî û kurewî re ketine nava hev û din û bûne parçeyên hev ku ji hev venaqetin. Ez dê vê tezî di asta sê analîzan de biparêzim: A yekem, derketina holê ya krîza pergala dinyaya lîberal a bi rehendên hegemonîka navxweyî, hegemonîka derveyî û hegemonîka dijber û bi awayên cuda vebeyînên vê yên li dinyayê ye. A duyem, hevbandoriya vê krîza kurewî ya bi westabûna civakî-dîrokî ya li herêmê re û li dawiyê qewimîna serhildanên ereban û rewşa mizakerekirina ji nû ve ya tekiliyên hêzê ya ku vê yekê rê li ber vekiriye. A sêyem jî ew hevbandoriya hanê ye ku van pêvajoyên kurewî û herêmî bi dînamîkên xweserî qada siyasî ya kurdî re ketine têkiliyê û li dawiyê jî ew qewam û geşadan in ku derketine holê. Li gorî vê, li hemberî sîstema dewleteke ku di asta herêmî de qels dibe lê kariye re-konsolîdasyona xwe ya otorîter pêk bîne, li hêla din ew dînamîkên ku qadeke siyasî ya kurdî ji dewra nû re hiştine ku ew li ser bingeha herî sereke li dor du xeta îdeolojîk-polîtîk xwe bi rê xistiye û bi yek nebûye, mijara sereke ya nîqaşê ya vê beşê ne.

## Veguherînên kurewî: Qeyrana pergala cîhana lîberal

Di salên 2010'an de yek ji diyarkerên herî sereke yên veguherîna kurewî, qeyrana

pergala cîhana lîberal (liberal international order) e. Pêkhateyên sereke yên vê pergalê, ji aliyê alîgirên wê ve wek bazara vekirî, dameziraweyên navneteweyî, ewlehiya li ser bingeha hevkariyê, civaka demokratîk, guherîna bipêşketinxwaz, çareserkirina kêşeyan li ser bingeha hevkariyê, serweriya dabeşkirî û raseriya hiqûqê hatine pênasekirin (Ikenberry 2011: 2.). Di beşa berî vê de, me tesîrên serxweşiyeke zafera lîberal nîqaş kiribû ku ew li beşên din ên dinyayê bi zorê dihat sepandin ku li salên 1990 û 2000'î, nemaze bi hilweşîna Yekîtiya Sovyetan re, xuya bûbû. Ev pêvajoya ku li ser bingeha civakparêziya sivîl bi pêş diket lê hema bibêje qet cext li zordariya ekonomîk a neolîberal, ferasetеke kêşedar a mafên mirovan û demokrasiyê û pêvajoyên civakî nedikir, bi salên 2010'an re bi qeyraneke cidî re rû bi rû ma.

Em dikarin qeyrana pergala cîhana lîberal di nav dînamîkekê de bidin rûniştandin ku tê de gelek xwastina meydanê ya nav sîstemê û derveyî sîstemê tên çavdêrîkirin ku ew li dijî prensîpên hevkargêriya kurewî ya redûksiyonîst û di tehlîla dawî de sepandina wê ya bi awayê ku nakokiyên siyasî û civakî kûr bike, radibin. Bi nîqaşên ku bazara vekirî li êrîşeke neolîberal dageriyaye û civak li hemberî sermayeya kurewî bêparastin mane (Harvey, 2014); dameziraweyên navneteweyî di esasê xwe de di xizmeta hêzên hegemonîk de ne û ew li binyadên wisan dageriyane ku normên aborî û siyasî disepînin (wek nimûne Banka Dinyayê û sîstema wê ya dayîna krêdiyê) (Robinson, 2014); ewlehiya ku xwe dispêre hevkariyê li ewlehiya kurewî ya bakur hatiye daxistin û ku gelek qadên mayî dibin sedema bêewlehiya civakî, ekolojîk û aborî (wek mînak, nîqaşên li ser ewlehiya xwardemeniyê û bêhejmar rêxistinên cihkî yên ku di vê çarçoveyê de tev digerin); civaka demokratîk li pêvajoyên hilbijartina hatiye daxistin ku ji manîpulasyonê re vekiriye û meşrûiyeta wan dikare bê pirsyarîkirin (mînak, mafên "kêmar"an li temamî dinyayê bi rihetî tê binpêkirin û wek kêşeyekê di warên wekî nijad, zayend, çîn û hwd. de xwe bi awayekî cansoj dide hisandin); çareserkirina pirsgirêkan a li ser bingeha hevkariyê di asta elîtên siyasî û aborî de maye û berdêla krîzên şer û ekonomîk jî bi beşeke pir berfireh a gel tê dayîn; ji ber ku prensîpa serweriyê ji aliyekî ve di encama midaxeleya emperyalîst de bêmehne maye, ji aliyê din ve jî, ji hêla sîstemên dewletên otorîter ve vederhiştin, tunehesibandin an jî wek qarîneya kuştinê bikaranîna beşek ji welatiyên wan bi xwe (Çubukçu, 2018); û li herî dawiyê bê ka raseriya hiqûqê raseriya hiqûqa kê ye li pêvajokekê dageriyan ku ew nîqaş bêwate bûn.

Wek encam, mekanîzmayên herî sereke yên vê qeyranê ku dikare gelek qewam û rûdanên li dinyayê rasterast diyar bike û encamên ku dê li dawiyê derkevin holê mimkin e mirov di bin sê sernavan de vekole: Qeyrana hegemonîk a navxweyî, qeyrana hegemonîk a derveyî û dijberîtiya hegemonyayê.

## Qeyrana hegemonîk a navxweyî

Qeyrana hegemonîk, qeyrana navxweyî ya wan dewletan e ku pê re rû bi rû mane û ew dewlet di navenda hegemonyaya kurewî de cih digirin. Heta roja îroj ev dewletên ku dameziraweyîbûna pergala demokratîk a lîberal li nav wan herî bipêşketî ye, ji ber ferasetên neofaşîst ku sîstema neolîberal rê li ber mimkinbûna pêkhatina wan vekiriye, bi krîzeke navxweyî ya cidî re rû bi rû man (Robinson, 2019).[26] Vê rewşê hem nişteya hegemonîk a kurewî ya dewletên têkildar hincirand hem jî li hundir terazên navxweyî ya sîstemê belav kir û bû sedema çêbûna arîşeyan. Nîşandeya herî aşkera ya vê yekê ew e ku di serî de li DYA û Îngiltereyê, li gelek welatên Rojava wan siyasetkarên nijadperest û raserparêzên spî, bi rabêjiyên ajîtatîf-nijadperest popularîteyeke cidî bi dest xist. Li DYA›yê di 2016›an de li dijî Clinton karkirina hilbijartinê ya Trump, dîsan di 2016›an de hildana biryara ku Îngiltere ji Yekîtiya Ewrûpayê derkeve, li Fransayê derbasbûna Marine Le Pen a ji partiyên siyasî yên nerîtî yên li çep û rastê û di hilbijartina serokatiyê de mana wê ya li tûra duyem, li Ewrûpaya rojhilat bi serkeftina hilbijartinê mana kesên mîna Orban û hwd. a li desthilatê, nîşandeyên herî xuya yên vê veguherîna hundirîn e.[27]

Çavkaniyên vê qeyrana civakî û siyasî ya hundirîn, bi çend merheleyan dikare bê

[26] Li vir, "neo"ya di têgiha "neofaşîst" de, çendî di wesfê wê de cudahiyên cur bi cur hebin jî, di esas de ji "neo"yeke zemanî tê behskirin ku di bin şertên nû de rojaneyî bûye. Her wiha, dixwazim li şûna "populîst" bê min çima têgiha neofaşîst tercîh kiriye, notek daînim. "Populîzm" an jî "populîst", bi wateya ji alîbûna gel an jî bi wateya pejoratîf a di jargona çep de bi wateya "dana pey dûçika gel" e. Lê li vir qisimê ku bipirsgirêk e, li dijî her cure "populîzm"ê ya bi awayê serbixwe ya ji naverokê wê, bi referanseke pozîtîf bicihkirina pergala siyasî ya lîberal e. Li vir ferqa di navbera wan aliyan de ji holê radibe ku yek li ser mijarên birçîbûn, bêkarî, gihîştina mafên herî sereke yên perwerdehî û tenduristiyê, nijadperestî û zayendparêziyê tê dikoşe û wek takekes an jî kom wê di asta parlamenter an jî pêşengiya civakî de temsîl dike û ya din jî ew zêhniyeta siyasî ya zayendparêz, nijadperest û dijmina kedê ye ku krîzên sîstema raserparêz a spî ya lîberal ew afirandine ji bo damezirandina desthilata xwe bi kar tîne. Ango pozîsyona rexneyî ya li dijî kedxwariya sîstemî û pêkutiyê û pozîsyona nijadperest a ku di esasê xwe de meseleyeke wê bi kedxwariya sîstemî re nîn e, dike eynî. Ji bo ez nebim sedema vê tevliheviyê, di vê xebata xwe de ez li şûna têgiha populîst bikaranîna têgiha neofaşîst tercîh dikim.

[27] Divê bal lê bê kişandin ku ev pêleke neteweperwerbûna kurewî ye û hêza ku binyadên nijadperest ew bi dest xistiye hema bibêje li her aliyî bandora xwe nîşan dide. Em nikarin li Tirkiyeyê Erdogan an jî li Hindistanê Modî ji vê bi awayekî serbixwe hildin dest. Lê belê hin aliyên cuda yên vê neteweperweriya li derveyî Rojava hene. Li jêrê em dê wê vekolin.

xwendin. A yekem, bandora vê pergala neolîberal a kurewî ya li ser binyada civakî ya van dewletan e. Li dawiya hevkariya şirket û burokrasiyên dewletan barê bacê, windahiya dahatê û ji ber lêbelavkirina neyeksan a çavkanî û samanan xizanbûna gel a bi rêjeyeke cidî, nîşandeyên herî zelal û aşkera a vê rewşê ne. Encamên vê yên rasterast, di warên mîna bipaşdeketina di qada perwerdehiyê de, bêxanîbûn û bêkariyê dikare bê çavdêrîkirin. A duyem, eleqedarî windabûna îmtiyaz û raseriyê ye. Li van dewletan ên ku duçarî windabûna dahatê bûne û di nav xizaniyê de ne, di serî de ne yên spî, lê jin û LGBT+ ne, mimkin e ji xizanbûneke mîna wê were behskirin ku bi awayekî ji nasnameya wan azade, di tevahiya çînên jêr û navîn de heye (Yuval-Davis, 2015). Lê divê ji vê heman xizanbûnê bê behskirin ku wê di piraniya spiyan de windabûneke raseriyê/îmtiyazê çêkiriye ku di bingeha wê de nijadperestî heye. Ev feraset kan û çavkaniya bêkarîtiyê bi hatina koçberan, xizanîbûnê bi xuyabûna kesên ne spî yên ku her diçe zêde dibin ku berê wan ew di bin xwer e didîtin û bi derketina holê ya tevger û binyadên siyasî yên ku li ser navê wan tev digerin, eleqedar dike. Spîtiya (Whiteness) ku sîstemên dewletan û pergala damezirandî ew bi îmtiyazan techîzat kiribû, dest pê kiriye ji niha ve ji ber windabûna vê raseriyê/îmtiyazê bi sîstemê re rû bi rû maye. Wek a sêyem jî, parametreyên sereke yên sîstemê ku partiyên rast û çep ên navendê li serê li hev kirine, ji ber di heman demê de ew parametre bi xwe ne ku wan ji qeyrana heyî re rê vekiriye, loma cihêtiya rast û çep a adetî ya di siyaseta temsîlî de, her ku çûye bêmehne bûye (Cardoso Rosas û Rita Ferreira, 2013).

Ew binyadên siyasî yên neofaşîst ku xwe wek nimînendeyên "bera yên gel" tayîn kirine, her yek li navendên wisan dageriyan ku wan endîşe û hêrsa spiyan temsîl dikir û ew bi rê dixistin. Ev binyad li meydanên hilbijartinan bi rabêjiyên ku dê gel ji nû ve bibe serwer, li hemberî elîtên lîberal ên dejenerebûyî dê "li rojên xwe yên berê yên tijî refah" vegerin, nijadperestî û raserparêzî bazar kirin. Bi van rêbêjiyan bi gel re nasnameyîbûna pozîtîf afirandin û an bi ser keftin hatin ser desthilatê yan jî li binyadên sereke yên mixalefetê dageriyan (Adler-Nissen û Zarakol, 2020). Vê zêhniyeta siyasî ya neofaşîst ku bi anîna pêşniyazên gelek serkî yên manîpulatîf ên ji bo pirsgirêkên dêwasa ku hemen dikare mişterî ji wan re peyda bibe, kir ku qeyrana pergala lîberal hem li nav welêt hem jî di asta kurewî de hîn kûrtir bibe. Vê rewşê ji aliyekî ve beşên civakê yên şikestokî(kirî) dikirin hedef û bi dînamîkên protesto û îsyanan ew xwedî dikirin, li aliyê din pergala lîberal a ku li van welatan cihgir bûbû, ji hûndur ve bi awayekî nermenerm rizand.

Piştî Trump hilbijartinên 2020'î winda kirin û çendî Qraltiya Yekbûyî di serî de kêşeya Îrlandaya Bakur û bi xizanbûnê re bilî bibe jî, ji ber ku hêdî hêdî rêyek ji xwe re çêdike, ev yek nîşan dide ku pergala lîberal hewl dide da rewşa xwe baş bike. Lê belê, wek mînak trumpîtî nemiriye, berevajî vê zêdehiya rasteqîniya wê îhtimala ku di 2024'an

de Trump dê ji nû ve bê bilbijartin bi xwe jî, nîşandeya wê ye ku dê qeyran hîn kûrtir bibe. Bi taybetî gava em tevî wan krîzên hanê ku pergala dinyaya lîberal li qadên din dijî bifikirin, çendî ji aliyê pergala lîberal ve bi van dewletan re rûdanên erênî yên sînordar çêbibin jî, lê ew ji dayîna bersiva ji kûrahiya vê krîza heyî re dûr in. Ji lew re qeyrana hegemonîk a navxweyî bi awayekî aşkera nîşan dide ku bê ew çi qas di nav xwe de ji pêkvejiyaneke di nav aştiyê de dûr in û bi kedxwariya aborî, nijadperestî û zayendparêziyê re di nav hev û din de ne. Di vê çarçoveyê de, giringiya qeyrana hegemonîk a navxweyî ya ji bo vê xebatê ew e ku, pergala lîberal ji ber kêşeyên xwe yên navxweyî yên aborî, siyasî û civakî - nijadperestî, zayendparêzî, xizanîtiya bi awayê kûrane û bêedaletiya dahatê- kapasîteya xwe ya bûyîna model a ji bo dinyayê, bi awayekî merheleyî winda dike.

## Qeyrana hegemonîk a derveyî

Qeyrana hegemonîk a derveyî, çendî di bingeha xwe de ev pergala lîberal di nav xwe de bi gelek kêşe û arîşeyan re tê bikoşe jî îcar li derve ew rewşa wê ye ku bi xwastineke meydanê ya jeoekonomîk û jeopolîk re rû bi rû maye. Ew serxweşiya serkeftinê ya ku pergala dinyaya lîberal piştî Şerê Sar bi dest xistiye, bi hedefa ku tevahiya cîhanê biguhere bi şêweyeke pir azwerî sînorên li pêşiya aboriya kurewî hilda û hewl da ku ji bo şirketên pirneteweyî azadiyekê pêk bîne. Ango ji ber serweriya hegemonîk, li pêşiya bernameya aborî ya neolîberal tu astengek nebû. Lê belê di serî de Çîn, ew diyardeya welatên Asyaya Rojhilat ku bi binyada birêvebirinê ya otorîter kapasîteya hilberînê ya ku zêde dibe jî bi yek kiriye û mezinbûyîn pêk aniye, dê bibûya sedema tepîn û hilweşîna feraziyeyên neolîberal ên kurewî (Frank, 1998; Weiss û Wallace, 2021). Mimkin e rehendên pergala dinyaya lîberal ên hegemonîk ên derveyî, di kontekstên jeoekonomîk û jeopolîtîk de bên vekolan û tiwêjandin.

Li gel nakokiyên cur bi cur ên terîtoryal (Karataşli û Kumral, 2017), bilindbûna Çînê êdî ne mîtek e, diyardeyeke jeoekonomîk e ku rasterast bandor li çar hêlên dinyayê dike. Ji ber Çînê di serdema piştî Mao de dest bi transfera teknolojiyê kir û ji ber ew piyaseyeke kedê ya erzan a dêwasa ye, di pey Mao re faktorên wekî vekirîbûna ji dinyaya lîberal a Partiya Komunîst a Çînê (PKÇ) li pêkarên wisan dageriyan ku wan entegrasyona li sîstemê ya Çînê li hundir hêsan kir. Di vê dewrê de deregularizasyona neolîberal a aboriyê mimkin kir ku Çîn li gelek deveran ji bo xwe warê bazarê peyda bike û ji salên 1990'î pê de sermayeyê bikişîne nav xwe û di asta global de Çîn kişan pozîsyoneke reqabetkar (Rosenberg û Boyle, 2019). Nemaze wan pratîkên emperyalîst ên agresîf ku li Afrîkayê li qetliama siruştê vegeriyan, wan hemleyên wan ên jeopolîtîk ên li Asyayê da ku serweriya xwe çêkin û li Amerîkaya Başûr jî bi birêvebirina DYA'yê re wan têkiliyên ku bi rejîmên hîn li aliyê çepê ne danîne, yên ku

ew bi wan re di nav lihevxistinê de bûn, kir ku mezinbûna emperyalîst a Çînê pêk were. Tevî vê yekê, piyaseya keda erzan û kapasîteya veguhastin û ragihandinê ku her diçe bi pêş dikeve, gelek navendên hilberînê yên ku bi awayekî adetî li welatên diyar gur bûbûn di serî de li Çînê bi çûna wan a li welatên Asyayê bi encam bû. Du encamên rasterast ên van dagerîn û veguherînan ji aliyê pergala dinyaya lîberal hene. A yekem, meydanaxwastina Çînê ya li dijî hegemonyaya DYA'yê û di mercên heyî de diyarkirina wê ya têkiliyên hegemonîk ên kurewî ye. A duyem jî, di forma bêkariyê ya post-endustriyî de wek pêla ji binî ve veguherîna wan dewletên hanê ye ku ew di navenda kapîtalîzmê de cih digirin (Levett, 1994). Ji lew re li DYA'yê alîgirên Trump an jî li Qraltiya Yekbûyî alîgirên Brexitê, ew kesên spî ne ku bi piranî li van herêmên post-endustriyî gur û kom bûne.

Li gel vê, dikare ji windabûneke hegemonyaya jeopolîtîk a pozîsyona hegemonîk a kurewî y aqelsbûyî ya DYA'yê bê behskirin ku hem di çavkaniya wê de hem jî wek encamê wê, ew rûdan û qewamên li tevahiya Amerîkaya Başûr, Asya û Afrîkayê hene ku ew bi gurahiyên cuda qewimîne (Schoen û Kaylan, 2014). Lê ji ber ku dê ji bo nîqaşên piştre bibe çavkanî em dikarin vê veguherîna hegemonîk a derveyî li ser Rûsya û Rojhilata Navîn analîz bikin. Dewleta Rûsyayê, piştî Sovyet belav bûn bi şûn de bi qeyraneke cidî ya aborî, civakî û siyasî re rû bi rû ma, nemaze bi pêşengiya siyasetkarekî neteweperwer ê wekî Putîn, dest pê kir hêza xwe ji nû ve da hev. Aboriya vê jî, di serî de bi rejîmeke leşkerî ya ku li dora xwe civandibû, mimkin kir. Dewleta Rûsyayê, ya rast ku aboriya wê bi qasî welatekî Ewrûpayê ya asta navincî ye, bipêşxistina kompleksên leşkerî-aborî û bi wesîteya veberhênanên teknolojiyê yên li van waran da ku hem li dora xwe hem jî di serî de li Rojhilata Navîn li gelek waran bi armanca çêkirina hejmûnê (hegemonyayê), tev geriya. Wek mînak, li Ûkranya û Qirimê li dijî sîstema NATO'yê bi tevahî û Sûriye di serî de li Rojhilata Navîn wek aktoreke terazker a li hemberî DYA'yê roleke cidî leyîst.

Tam di vê nuqteyê de, di konteksta otorîteryanîzmê de feyde heye ku di navbera binyaddarbûna hegemonîk a otorîter a qeyrana navxweyî ya pergala lîberal û dewletên wekî Çîn û Rûsyayê de ku jê re meydan dixwazin, cudahiyek bê kirin. Ji lew re hem Çîn hem jî Rûsya dewletên wisan in ku li hundir têra xwe zorker û çewisîner in, her cure mixalefetê bêdeng dikin, azadiya derbirînê di serî de derbe li gelek azadiyan dixin, gel wek hêzeke erzan a kar dibînin û asteng dikin ku pirsgirêkên wan jî di asta dewletê de bên temsîlkirin. Em ji wan kargêrî û îdareyan behs dikin ku rexneyên li dijî wan di serî de mafên xwe yên serweriyê derpêş dikin û dişerikînin, lê li derve jî bedêla reqabeta aborî ya agresîf û bêrehm a ku kurewîbûna neoliberal bûye sedem bi gelên xwe didin dayîn û wisan mezin dibin. Pêvajoyên siyasî yên navxweyî yên dewletên wekî DYA'yê yên xwe dispêrn demokrasiya temsîlî ku ji manîpulasyonê re vekirî

ne û xurtbûna zêhniyeta neofaşîst mimkin dike, îcar ew zêhniyeta otorîter a li van dewletan li dijî wan binyadên siyasî yên ku dibe li hemberî wan rabin mafekî siyasî yan jî fîzîkî ji wan re nas nake, îtiraza gel an jî rîska ketina ji ser desthilatê, bi rêbazên ewlehî û leşkeriyê tepeser dike. Lê belê em dikarin ji bo hem kapîtalîzma lîberal a navend-Rojava hem jî kapîtalîzma otorîter a li hemberî wê ji xaleke hevpar behs bikin. Ew dagerînên ku di asta rêbazên birêvebirinan de hatine holê, nayê wê wateyê ku dê berjewendiyên gel bi vî yan jî bi wî awayî bê parastin an jî dê ji pirsgirêkên wan re bi awayekî rasterast çare bên peydakirin. Tam berevajî vê, divê di her du binyadan de jî ji lêgerîna wek hegemonyayekê ya di bin kontrola elîtên siyasî û aborî de bê behskirin. Ev her du binyadên aborî yên ku ji hev û din bi rehendên diyar cuda dibin, kir ku dînamîkên pêkvejiyanê yên di navbera civakan de jî dagerin. Ji lew re ev terazên jeopolîtîk ên nû yên ku derketine hole, ji aliyekî ve xwedî wê potansiyelê n e ku dikare lihevxistinan geş û gur bike li aliyê din jî rê ji wê yekê re vekir ku feraseteke aştiya nû serwer bike.

## Hegemonyaya dijber

Faktora sêyem a ku qeyrana pergala dinyaya lîberal amade kir jî ew tevgerên civakî bûn ku li salên 2010'an hema bibêje me ew li tevahiya dinyayê dîtin û hîn jî bi rehendên xwe yên diyar berdewam in. Mimkin e rehenda vê qeyranê wek qeyrana hegemonîk a dijber bê binavkirin, ji lew re di bingeha van tevgerên civakî de kedxwariya aborî û kedxwariya kurewî ya li ser binyada nasnameyê û pêvajoyên çalakiyî yên ku li dijî partiyên desthilatê yên li ser bingeha vederkirinan pêk tên, cih digirin. Lê belê divê ku em binî bi awayekî stûr xêz bikin ku berevajî wan nîşandanên di medyaya serwer û di nîqaşên rewteka sereke ya akademîk de, taybetmendiya ku tevgerên civakî pênase dike ne tenê ew dijberiya li krîza ekonomîk e, dijberiya li sîstemê ye ku vê qeyranê bi awayekî rêkûpêk ji nû ve çêdike; ne tenê ji bo mafên nasnameyê dijberiya li rejîma nasnameya kurewî ye ku hin nasnameyan tune dihesibîne û wan dinatî dike; ne tenê ji bo wekheviya jin û mêran dijberiya li rejîma zayendparêz a bavkanî (patriarcal) bi xwe ye ku ew ev newekhevî jî tê de gelek şêweyên vederkirin û pestandinê çêdike; ne tenê teko teko li dijî dîktatoran dijberiya li dîktatoriyê bi xwe ye (Álvarez û Chase-Dunn, 2019; Clement, 2016; Evans, 2012; Gago, 2020; Karataşli, 2019; Pham, 2018). Di her sehaya pratîkê ya pêla serhildanê/îsyanê ya sala 2010'an de ku li jêrê mînakên wê dê bên dayîn, ku yek ji van vederkirin û awayên kedxwariyê derdikeve pêş, lê hewce ye bê dîtin ku ev di yekûnê de tevahiyîtiyeke dijberiya hegemonyayê pêk tînin.

Di deh salên dawî de, em dikarin van pêvajoyên çalakiyî hema bibêje li tevahiya dinyayê çavdêrî bikin (Clement, 2016; Danewid, 2018; Jung, 2020; Karataşli, 2014). Li dijî siyaseta şidandina kemerê ew çalakî û berxwedanên ku hîn jî bi awayekî qisimî li

Îngiltere, Portekîz, Spanya, Yûnanistan û li gelek deverên din pêk tên, bi berdewamiya salên 2010'an domiyan. Bi taybetî li Îngiltereyê kesekî mîna Jeremy Corbyn ê hîn bêhtir ji aliyê çep ku ji bo pêşewatiya partiya karkeran hat hilbijartin, li DYA'yê ku tevgera Bernie Sanders gihîşt rêjeyeke pir cidî ya rayan, li Spanya û Yûnanistanê temsîliyeta siyasî ya tevgerên kuçe û kolanan ên ku li dijî krîza aboriyê xwe birêxistin kirine wek nimûneya Syrizayê ku hatiye ser desthilatê yan jî wek mînaka Podemos ku gihîştiye hêza mixalefeta sereke, ji bo vê mijarê dikare wek nimûneyên aşkera û zelal bên dayîn.

Tevî van, divê tevgera #BlackLivesMatter bi awayekî kûrane bê fehmkirin ku ew yek ji tevgerên herî kartêker ên li Amerîkaya Bakur û Ewrûpaya Rojava ye û li ser dijberiya nijadperestiyê xwe bi rêxistin kiriye. Ev tevgera ku demeke dirêj e li dijî şideta binyadî ya ku aqilê dewleta dameziraweyî li ser kesên ne spî disepîne tê dikoşe, piştî şideta dewletê ya li tax û herêmên wan gelên reşik, koçber, latîn û asyayî ku li wan dijiyan gur bûbû, li salên 2010'an hîn bêhtir xurt û leztir bû. Pirsyarîkirina li vir tenê bi protestokirina şideta rojane ya ku li ser kesên ne spî dihat sepandin sînorkirî nema, xerakirin û ziyanpêdana peykerên birêveberên berê yên dewleta kolonyal jî li xwe vehewand û kir ku kokên dîrokî yên meseleyê jî xuya bibin. Li gel van yekên hanê, ew tevgerên dagirkirinê (occupy) yên ku didomiyan, wek çalakiyên li Şîliyê ku mîna Payîza Şîliyê hatin pênasekirin û di serî de ji bo protestokirina zema li bihayê metroyan dest pê kiribû lê piştre li tevgereke giştî ya li dijî bihatiyê û şertên jiyanê yên giran dageriyan, tevgera protestokirin û berxwedanê ya li Hindistanê ku li dijî wan guhartinên qanûnî yên ku armanc dikir zeviyên cotkaran pêşkêşî şirketên mezin bike qewimîbûn û gelek protestoyên mezin û biçûk ku ji aliyê rêjeya xuyabariyê ve kêm bûn, mimkin e di nav konteksta aboriya neolîberal de bên xwendin. Ji bilî van nimûneyan ku ji bingeha xwe de ji ber sedemên aborî dest pê kiribûn, wek mînak li Rûsya, Ûkrayna, Romanya û Brezîlyayê ji gelek pêlên protestoyê yên li dijî mekanîzmayên dewletê yên otorîter dikare bê behskirin ku di kan û çavkaniya wan de serhildanek heye. Tevî van, nediyarîtiya siyasî ya li Brezîlya û Venezûelayê û protestoyên ku polîtîkayên dewletê bûbûn sedema çêbûna wan, li Meksîkayê Tevgera #YoSoy132 (Ez 132'yem im) ya di bin pêşengiya xwendekaran de, li Taywanê Tevgera Xwendekaran a Gula Berberoj, li Hongkongê Tevgera Sîwanê ku ciwanan pêşengî lê dikir û li dijî teknolojiya çavdêrîkirinê ya dewletê jî bi rêbazên gelek kartêker bi ser ketibû yan jî li Koreya Başûr tevgera demokrasiyê, dibe ku wek nimûneyên berxwedanê yên li dijî tehde û pêkutiya dewletê bên nîşandan. Li gel vê, dîsan ew nimûneyên herî berbiçav ên ku li Amerîkaya Latîn xuya bûbûn û livdarbûneke berfireh a jinan û LGBT+'yê ya mîna wê ku em li Rojhilata Navîn, Ewrûpa û Asyayê dibînin jî, mimkin e wek parçeyekî van serhildanên li dijî rejîma çewisîner a kurewî bê dîtin. Bi taybetî greva jinan a navneteweyî ya ku wek Paro Internacional de Mujeres tê zanîn, ew çalakiyên ku di serî de li Rojhilatê Ewrûpayê li gelek deran ji bo mafê

kurtajê tên kirin û nemaze li gel hemû tehde û tundiya di asta kurewî de çalakiyên hefteya rûmetê yên ku xuyabariya takekesên LGBT+'yê çêdike, rehenda dijberiya zayendparêziyê ya van tevgerên îsyanê yên kurewî nîşanî me dide (Gago, 2020). Tevî vê yekê, serhildanên ereban ku em dê li jêrê li gel sedem û encamên wan bi awayekî kûrane nîqaş bikin, a rast çendî di esasê xwe de wek pêleke serhildana li dijî pesta aborî û şidetê qewimîbin jî, ji ber gelek sedeman wan gelek beşên civakê yên meseleya wan bi dewlet û sîstemê re heye anîne cem hev û din.

Di bingeha van livdariyan de ku ew di asta kurewî de bi pêş dikevin, sîstema tehde û kedxwariyê ya ku pergala dinyaya lîberal ew ava kiriye heye. Êrîşkariya agresîf a neolîberal û mekanîzmayên ewlehiyê yên dewletê ku bi vê re bi awayekî entegre dixebitin, sîstemeke wisan aşopî dike ku kedxwariya aborî zêde dike û konsepta ewlehiyê di asta mîkro de ji nû ve organîze dike û dewleta polîsî xurt dike. Li dijî binyada nijadperest û zayendparêz a ku di asta sîstemî de xwe bi rê xistine, bipêşketina berxwedana wan komên civakî yên ku li hemberî dewletan û şirketan qels ketine, encamên wisan çêkirin ku li cih cihinan zor da desthilatan an jî guherandina siyaseta eleqedarî van mijaran. Lê belê li gel encamên qisimî û sererastkirinan, ji ber ku bi rêjeyeke mezin rejîmên vederker û kedxwar, aborî, çandî û zayendparêz hebûna xwe dihêvişînin, nerihetiya civakî mihtemel bi qasî ku qet nebûye zêde ye.

## Encamên qeyranê

Encamên rasterast ên ku vê qeyrana pergala dinyaya lîberal ew derxistine holê û em dikarin wê bi van her sê pêkhateyan re têgihî bikin, kana hîn kûrtirkirina qeyranê pêk tînin. Encama herî diyar û berbiçav, teko teko li welatan mihtemel li temamî dinyayê nekarîna berlêgirtina li bilindbûna neteweperweriyê û ji ber vê yekê jî, ji hêla dewletê ve li hemberî gelan bikaranîna cîhazên zorê yên bi awayekî aktîf e. Nemaze dewletên hegemonîk ên li Rojava ji bo ku li dijî hatina kom bi kom a penaberan xwe bihêvişînin, sînorên xwe zexim û xurt kirin. Yek ji encamên rasterast a bilindbûna neteweperweriyê jî li dijî pergala civakî ya raserparêz a nijadperest, lezdarbûna berxwedana kesên ne spî û koçberan e.

Pergala kurewî ya lîberal li deverên mayî yên dinyayê jî li nav sînorên netewedewletê pergaleke aştiyê ya hiyerarşîk a ku xwe dispêre nijadê/etnîsîteyê, asayî kiribû. Ew angaşta ku pergala dinyayê ya lîberal cudahiyên çandî bi wesîteya netewedewletan diparêze, ji hêla ramanwerên lîberal ve tim hat parastin (Wek mînak, Reus-Smit, 2021). Lê li vir kêşeya sereke ew e ku sînorên bi neteweperweriyê hatine xêzkirin an jî ew binyaddarbûna hiyerarşîk a ku li dawiya projeyên homojenîzasyon û modernizasyonê yên li qadên navxweyî yên netewedewletan pêk hat, bû sedema çêbûna jenosîda çandî.

Ev sîstema ku wek pergala Westphaliayê tê vegotin, di heman demê de ji hiyerarşiya nijad an jî netewetiyê re ku di nav dewletan de geşe bi xwe da, zirxa serweriyê çêkir (Búzás, 2021). Lê belê jihevdeketinên û di navenda pergala lîberal de û tevgerên li dijî raserparêziyê li welatên dorhêlê û nîvdorhêlê jî endîşeyeke ewlehiyê ya ontolojîk afirand. Vê rewşê hanê li welatên mîna Tirkiye, Rûsya û Îranê, kir ku aqilê dewletê yê rastgir ê ku bi cîhana Rojava re di nav berberiyê de bû û jixwe bi awayekî adetî hebû, xurt û hêzdar bibe.

Encameke din jî, qelsbûna taybetmendiya referansbûna "civaka navneteweyî" ye ku ew wek referansekê dihat nîşandan. Gava civaka navneteweyî tê gotin, pergala dinyayê ya hegemonîk a li ser bingeha DYA û NATO'yê û şertên aştiyê yên ku bi awayekî dîrokî di nav wê de tên aşopîkirin û bi şeran rêlibergirtina lihevxistinan, tê qestkirin. Ji lew re hêzên ku xwedî hêza sepandina norman bûn, bi piranî ev bûn. Lê belê keşeyên nijadperestiyê yên mezin ên li nav wan welatên li navenda civaka navneteweyî, ketina rewşeke wisan a mirovan ku tim bi xizaniyê tên terbiyekirin û li deverên mayî yên dinyayê ji dîktatoriyan re nîşandana misamehayê û karkirina bi wan re, bûn sedem ku pergala lîberal di astên civakî yên cuda de hêza xwe ya bûna referansê winda bike. Faktoreke din a li gel vê jî ew e ku nemaze girêdayî hêza hevkêşeya ku xwastina meydanê ya jeoekonomîk û jeopolîtîk ew guherandiye, kiriye ku êdî di asta kurewî ya siyasî de bi awayekî cidî bikirên menzûmeya prensîpan a tercîhkirî û vesînorkirî ya aîdî pergala dinyaya lîberal, kêm bibin. Em dikarin mînaka vê ya herî aşkera di wan têkiliyên hanê de bibînin ku Yekîtiya Ewrûpayê bi hikûmeta Tirkiyeyê re daniye.

Rehendeke din jî goçberî ye ku ew encama herî rasterast a pergala dinyaya lîberal e û ji kûrî ve bandor li wê qeyrana wê kiriye ku ew ketiya navê. Ji ber ku pergala hegemonîk a kurewî ya navend-DYA'yî binyadên otorîter destek kiriye yan jî xem nexwariye jî, komên cur bi cur ên civakî yan jî siyasî ku duçarî tehde, kedxwarî û vederkirinê mane, tevî hebûna nijadperestiya binyadî berdewamî da reva xwe ya ji bo cîhana Rojava. Tevî vê, bajarbûyîn, pîşesazîbûyîna mecbûrî û di pev vê re erzanbûna kedê jî bûn ji sedemên bingehîn ên koçê. Bi Taybetî li Tirkiyeyê divê bal li koçberiya ji ber krîza îqlîmê bê kişandin ku bi awayekî nispî zemîna wê ya nîqaşkirinê ya sînorkirî heye (Faist, 2019).

Wek a dawî encama ku divê cext lê bê kirin jî, rasteqiniya guherîna rê û rêbazên nihartina li siyaseta dinyayê ye ku bi awayekî gelek aşkera derketiye ber me (Anievas û Nisancioglu, 2017; Zarakol, 2010). Têkiliyên navneteweyî, di analîzên sîstema dinyayê de bi piranî rêbazeke ku xwe dispêre awarteparêziya navend-Rojava û Ewrûpayê bi pêş xist. Li gorî vê ferasetê çavkaniyên herî sereke yên bilindbûna Ewrûpayê ya ji sedsala 15'an pê de eleqedarî wan taybetmendiyên wekî kapasîteya mirovî, jêhatîbûn, mercên guncayî yên dînî û exlaqî yên ku Ewrûpa xwedî wan bûn û ew şertên siyasî, civakî û

aborî bûn ku wan ev yeka hanê mimkin dikir. Xebatên marksîst jî, ji bo ku diyardeyan rave bikin gava analîzên jêrxaneyî dikirin, li ser mijara watedarkirina têkiliyên mîna siyasî, çandî, civakî û aborî, ku ew tevahiyeke kurewî pêk tînin, têra xwe ne xwazyar bûn, wan tenê qîma xwe bi analîzên pêvajoyên hegemonîk ên navend-Ewrûpayê anî (Hobson, 2012). Hal we ye ku bilindbûna Çînê bi awayekî pir aşkera bi me nîşan da ku teşeyên bandordarbûna civakekê ji civakeke din û dibe ku ya jê hîn giringtir jî ew analîza daxilkirina bivênevê ya hemû civakan a li dinyayeke hevpar a li tora têkiliyên kurewî yên pêkhatî ye, ku ew li cihekî hîn giring radiweste (Frank, 1998: 26-28). Çawan ku cihê pergala hegemonîk a dinyayê ya navend Çîn, Moxol û Osmanî hegemonyaya bi navenda xwe Ewrûpayê girtibe, ew veguherînên ku ji niha de çêdibin mimkin e dîsan wekî pêvajoyeke veguherîna hegemonîk bê xwendin. Lê belê ev veguherîn ji wê pêvajoya hanê zêdetir ku dê ji îroj heta sibehê pêk were û di maweyeke kurt de dê kesên qazanc kirine û winda kirine derxe rastê, eger ew wek pêvajoyeke wisan bê dîtin ku dê ew di maweyên kurt, navîn û dirêj de, di dawiya hevbandoriya aktorên siyasî û civakî yên cuda û têkoşîna hêzê de zelal bibe, hîn tiştekî rastîbîn e. Ji bo fehmkirina vê, mirov divê ne parçe teko teko lê tevahiya ku parçeyan tînin pê analîz bike.

Em dikarin bi palpiştiya analîzeke bi vî cureyî ya pergala dinyaya lîberal wiha bibêjin: Wesifê diyarker a salên 2010'an, ew veguherîna hegemonîk a kurewî ye ku krîzekê derdibe. Veguherîna hegemonîk a kurewî ne ew pêvajo ye ku hîn bi dawî nebûye yan jî têkbirê xwe yê qethî îlan kiriye, berevajî vê pêvajoyeke welê ye ku bi tevahî tundiya xwe didome. Lê belê çendî hîn bi dawî nebûbe jî ev qeyran bi xwe li deverên din ên mayî yên cîhanê dibe sedema çêbûna encamên cidî. Ev encam jî dîsan têra xwe bandor li vê qeyranê dike. Ji ber ku ev rewş hîkarî li lihevxistin û aştiya navxweyî ya civakan û yên navcivakî dike, di asta normatîf a çêkirina aştiyê de jî qeyranekê derdibe. Eger ev veguherînên li Rojhilata Navîn di serî de yên ji ber serhildanên ereban û encamên wan û vebeyînên vê yekê yên li qada siyasî ya kurdî di konteksta berfireh a kurewî de neyê rûniştandin, dê watedarkirina wan têra xwe kêm bimîne.

# Veguherînên herêmî: Serhildanên ereban û jê wêdetir

Li salên 2010'an di veguherînên herêmî de serhildanên ereban rola kilîdî leyîst ku wan di sala 2011'an de dest pê kiribû, lê bi awayekî dîrokî ji sedsala 19'an ve bi pêş de çûbûn.[28] Pêla protestoyê ya ku di meha Kanûna Pêşîn a sala 2010›an de li Tûnisê firoşyarekî kuçeyan ji ber ku gendelî û miemeleya xerab a polîsan protesto bike xwe şewitandibû û wisan dest pê kiribû, di demeke kurt de pêşî li Cezayîr, Misir, Urdun, Libya, Yemen û li dawiyê jî Sûriye di serî de li hemû herêmê belav bû, yanî bi hilweşîna dîktatoriyên ku bi dehan salan serweriya xwe didomandin an jî bi qelsketina wan a bi rêjeyeke cidî wekî nimûneya Sûriyeyê, bi encam bû. Bi taybetî gava nimûneyên wekî li Misirê piştî ketina ji ser text a Husnu Mubarek, hatina ser destihilatê endamê Îxwan Mursî û ji desthilatê ketina wî, li Libyayê piştî xistina ji desthilatê ya Qedafî û berdewamkirina şerê navxweyî ya heta roja îroj, nemaze li Sûriyeyê û Iraqê derketina holê ya DAÎŞ›a sepînera wehşetê û dewamkirina şerê navxweyî ku îroj jî bi hin rehendên xwe ve didome, li pêş çav bên girtin ji bo herêmê serhildanên ereban ji nû ve roleke damezirîner leyîst. Pêla vê serhildanê, ji ber duçarbûna wê ya li şideta dewletê û ji ber ku piştî rûxan û wêraniyên mezin ên civakî û siyasî wan şêwînên desthilatê şekilê birêvebirinê neguhart, di dehsaliya xwe de îroj hema bibêje di rewşeke vemirî de ye. Lê wan mercên ku ji van serhildan û îsyanan re re vekiriye bi rêjeyeke mezin ew rojanetiya xwe dihêvişînin.

Em dikarin sê faktorên pêwendîdarê polîtîk-ekonomî ku wan mimkin kiriye serhildanên ereban derkevin holê wiha xulase bikin. A yekem, di encama sepanên ekonomîk ên neolîberal de, bi rêjeyeke cidî belavbûna aboriya geşepêder ku bi berdewamiya sedsala 20'î bi pêşengiya dewletan dihat meşandin û xizanîbûna bi awayê kûrane ya ku vê yekê ew afirand. A duyem, zêdekirina tehde û pêkutiya li ser gel e ku di encama kampanyayên antî-terorê de (ku di beşa duyem a vê xebatê de hat nîqaşkirin) mekanîzmayên dewletê yên heyî bi awayê siyasî qels etibûn û ji ber ambargoyan jî dîktatoriyên ku jixwe aboriya wan qels bûbû jî, kapasîteya wan a belavkirina rantê jî kêm bûbû. A sêyem jî hatina krîza aborî ya sala 2008'an e ku bi ser van hemûyan de hatbû û di encama wê bandora rasterast de li tevahiya welatên Rojhilata Navîn giranbûna şertên jiyanê ye (Matin, 2018).

---

[28] Li vir li şûna kirina analîza dîrokî ya bi awayê kûrane, em dikarin qîma xwe bi dayîna referansa avakirina Rojhilata Navîn a kêşedar bînin ku di beşa yekem a vê xebatê de hatibû nîqaşkirin. Dîsan ji ber ku dê rêzbendiya bûyeran a kronolojîk ji sînorê xebatê derkeve, di vê nîqaşê de ku li vir bê kirin, em tenê dikarin qîma xwe bi wê yekê bînin bê ka kîjan mercan ev yek mimkin kiriye û bê ka kîjan encam jê derketine.

Tevî vê yekê, sîstema netewe-dewletê ya herêmî ku wek pergala Westphaliayê tê binavkirin, ji hêla dewletên Rojava ve heta salên 2010'an tim hatin destekkirin. Lê hal we ye ev dewlet gişt jixwe li ser pêkvetiyên/bihevretiyên civakî yên têra xwe bêhêz hatibûn avakirin (Bozarslan, 2014: 16). Di van sîstemên dewletê de, li gel ku komên berjewendiyê yên di rewşa kêmar de mekanîzmayên birêvebirinê yên siyasî bi temamî kontrol dikin jî, lê kontrola pihêt a binyadên birêxistin ên ku girseyên mezin temsîl dikin, ew asteng dikirin da beşdarî li pêvajoyên girtina biryaran bikin (Hinnebusch, 2013: 34). Yek ji sedemên herî giring ên wan serhildanên qewimî yên li salên 2010'an, dikare ku di dînamîkên vê rejîma dîktatoryel de lê bê gerandin.

Bi gotina Bozarslan fatigue sociale yanî westabûna civakî ku veguherînên dîrokî yên van rejîman ew afirandiye, dîsan yek ji wan faktorên sereke ye ku bûye sedema qewimîna van serhildanan. Bi ya me feyde tê de heye mirov balê bikşîne ser du pêvajoyên sereke yên ku di nav serpêhatiya veguherîna Rojhilata Navîn de hene ku me di beşa yekem de bi hûrgilî ew vekola. (1) Serpêhatiya modernbûnê ya ji jor ve li jêr tê sepandin ku rê ji çêbûna dîktatoriyan re vedike, di heman demê de ji raçînka civakî re alerjîk dihat. Em dikarin vê di nav dînamîka civakî ya îslamî û dijbera cîhana Rojava ya li hemberî neteweperweriya sekuler bixwînin. (2) Li gel salên 1970'yî nemaze îslamîbûna ji nû ve ku wê di çarçoveya pêngavên antî-Sovyetan de geşe bi xwe daye, dîktatoriyên li herêmê bi rabêjiya îdeolojîk a modernbûyîna îslamî ji nû ve aşop kirin. Lê belê çavkaniyên meşrûiyetê yên bi formên dînî, mezhebî û neteweperwer ên dîktatoriyan, rê ji cemserbendbûna li dijî hev a komên cuda yên civakê re vedikir. Van cemserbendiyan jî kêşeyên bingehîn ango dîktatorî nexuyane dikirin. Gava ev rewşa "kêmar"bûnê yan jî statuyê di her merheleya krîtîk de ji nû ve li mizakerekirinê dihat zêdekirin, pirsgirêk hîn bêhtir kûr dibûn û diketin rewşeke wisan ku derketina ji nav wan zehmet dibû (Bozarslan, 2011: 10–11; Halliday, 2005: 86–90). Di kana westabûna civakî de, ew çeşîdiya civakî ya ku bi awayekî timî li dijî hev tê sorkirin û têkiliya aloz a ku van bi desthilatê re daniye heye. Divê li bingeha serhildana ereban a ku di salên 2010'an de dest pêkiriye ev westabûna civakî ya sosyolojîk a dîrokî bê bicihkirin.

## Encamên herêmî yên serhildanên ereban

Encama pêşî ya herî mezin a vê pêla serhildanê, li gel bêrîkirin û vîna veguherîna civakî ya mezin berdewamîtiya şekilgirtina desthilata dijşoreşger e. Piştî serhildanan deh sal bi şûn de mimkin e ev bê diyarkirin: Wek mînak, hem misiriyên ku Mubarek ji desthilatê xist hem misiriyên ku Mursî hilbijart hem jî misiriyên ku Sîsî destek dikin, wan ji xwe re şoreşger digot. Gelo kîjan ji wan şoreşeke "rasteqîn" e û referansa vê çi ye? Çendî ne gengaz be bersiveke zelal ji vê re bê dayîn jî, em dikarin bibêjin ku ne mimkin e behs ji guherîneke esasî ya di mekanîzmaya sereke ya birêvebirina dewletê

de ya ku di encama van pêvajoyên li dû hev de derketiye holê û di serweriya elît a di vir de were kirin. Em vê rewşê bi gotina Gramsci dikarin wek şoreşa ne şoreş bi nav bikin (Brownlee û Ghiabi, 2016). Lê belê, li vir pirseke din tê rastê: Ma ew dînamîkên serhildanê ku di civakê de çêbûn tune bûn çûn? Her şoreşa ku bi bidestxistina desthilatê û bi pêkanîna serweriya/raseriya xwe sînorkirî ye, bi qasî bi desthilatê re canêcanê bibe li dijşoreşekê dadigere. Bi gotineke din, her şoreşa ku veguherîna civakî ji xwe re nake armanc li dijşoreşekê dadigere û li dijî xwe dînamîkên serhildana nû dicivîne. Lê di serhildanên ereban de, li şûna texeyuleke civakî û siyasî û amadehiya pratîkê ya li gorî wê ya ji bo piştî qelaptina rejîmê, wekî Îxwan ku ew xwedî wê mebestê bû desthilatê bi dest bixe û rejîma xwe damezraweyî bike, serweriya binyatên siyasî yên mîna wê pêk hat. Di vê çarçoveyê de bicihkirina analîza encama Bihara Ereban, ji bo analîza qada siyasî ya kurdî ku dê ji niha bi şûn de bê kirin, giring e. Ji lew re taybetmendiya sereke ya ku Şoreşa Rojava ji van pêvajoyan vediqetîne, tevî hemû kêmasiyên wê, ew e ku eleqedarî paşî wê texeyuleke veguherîna civakî û rêxistîbûneke siyasî ya ku dê vê pêk bîne, ji xwe re dikir armanc.

A duyem, bêyî guman derketina holê ya DAÎŞê ye ku şidetê di asta pornografîk de bi kar tîne, bi vê rêyê beşa mayî ya dinyayê dixe nav qurf û hêbê û ku ji ber vê jî wek "şeytanê kurewî" hatiye ragihandin. Em dikarin ji sê pêvajoyên dîrokî behs bikin ku wan şertên derketina holê ya DAÎŞ'ê pêk aniye: Bi rêya mieyîdeyên ku DYA'yê lê pêşengî dike belavkirina sîstema dewlet û aboriyê ya Iraqê, piştî dagirkirina 2003'yan bi şûn de avakirina ji nû ve ya siyaset û civakê li ser bingeha mezhebî û ji êrîşa aboriya neolîberal re vebûna herêmê ye. (Ji bo analîza bikitekit binêrin li beşa 2'yan.)

Di encama dînamîka şoreşeke timî-ya dijşoreşê ya ototkratîk de "îslama mitedil" jî tê de, qelsketina binyadên siyasî yên din an jî piştî bi awayekî temamî nemana wan re DAÎŞ ket rewşeke navendî ya wisan ku hêrsa wan beşên civakê yên ku radîkal dibûn û eleqeya wan, ew bi rê xist (Matin, 2018). DAÎŞ, piştî bi desteka rasterast an jî çavlêgirtina wan dewletên di tewereya îslama sunî de hîn zêde mezin bû, bi feraseta xwe ya cîhadê bi ser ket ku bikare hedefên van dewletan ên siyasî-jeopolîtîk bi awayekî bike yek. Piştî ku DAÎŞ'ê di serî de kurd, zehf êrîşên bêhejmar û tund ên dozaj zêde yên li ser gelek beşên civakê yên ku wê ew li derveyî îdraka xwe ya îslamê bi cih kirine û hemû hêzên ku jê re serî netewandine pêk anîn, hêzên HSD (Hêzên Sûriyeya Demokratîk) û koalîsyona ku DYA serkêşiyê lê dike di sala 2017'an de paytexta DAÎŞ'ê Reqa azad kir û di sala 2020'î de rêxistin ji nav xakên dawî yên ku di destê wê de mabûn jî hat derxistin. Çendî hebûna wê ya terîtoryal ji navê hatibe hildan jî, lê ew şertên ku derketina holê ya DAÎŞ'ê dabîn dikin, hîn bi rêjeyeke zêde hebûna xwe didomînin. Ji ber vê yekê, ew bêsînoriya wan tiştên ku îslama cîhadker dikare bike û ew qas radîkal dibe, dê li herêmê tim wek hêmaneke civakî û jeopolîtîk bimîne. Ev rewş, ne tenê ji

ber awayê bikaranîna şidetê, di heman demê de ji ber ku pergala Sykes-Picot ji bo maweyekê ji holê rakiriye, êrîşên li dijî Rojava li xwe vedihewîne, bêçaretiya dewletên li herêmê ya li hemberî vê binyadê nîşan dide û ji ber ku kapasîteya destekkirin an jî çavlêgirtina hin dewletên li herêmê yên li vê tund û tûjiyê wê aşkera kiriye jî, divê bê nirxandin. Yanî bi kurtasî ev dikare bê gotin: Rasteqîneya DAÎŞ’ê bi vî yan jî bi wî awayî dê tim li ser herêmê û ji aliyekî ve jî li ser siyaseta kurewî wek hêmaneke tehdîdê mayîna xwe berdewam bike. Em dê eleqeya vê ya rasterast a bi kurdan û bi pozîsyona siyaseta kurdan a kurewî re li jê rê bi awayekî kûrane vekolin.

A sêyem, ew diyardeya ku bi serhildana eraban sînorên dewletan hat testkirin û careke din hat fehmkirin ku bergindeke wan a carî nîn e lê nehatiye hilweşandin. Li gelek mecrayên akademîk nîqaş hatin kirin ku dê serhildanên ereban dawî li pergala Sykes-Picot bîne yan jî aniye (Fawcett, 2017: 794). Lê belê divê di dehsaliya serhildanan de bê diyarkirin ku mekanîzmayên dewletê yên otokratîk sînorên xwe hêvişandin û hêzên xwe jî ji nû ve konsolîde kirin. Nimûneya herî dramatîk a vê ji sala 2017’an pê de rejîma Esad pêk tîne. Hem ew qas bêparastinmayîna dewletan a li dijî midaxeleyên derveyî hem jî qelsbûna kapasîteya temsîlkirina wan a civaka wan bi xwe, kir ku ew his û hest çêbe ku ev dewletên hanê her kêlî dikarin hilweşin. Vê rewşê di asteke diyar de tevgerên serhildanê motîve kirin û nemaze wekî gelê kurd, ew gelên ku bi salan e têkoşîn dikin, bi qasî ku qet nebûye kir ku hêvîdar bibin. Lê belê divê cext lê bê kirin ku hatina dijberî hev a hegemonîk a li ser herêmê, di nav şertên heyî de destek dide berdewamiya van sîstemên dewletan. Ji lew re DYA û hevalbendên wê çendî nermbûna siyasetên dewletan hêvî bikin jî lê ew ji alî berdewamiya sîstemên dewletan ên heyî ne. Çinku di bin wan mercên hanê de ku hatina dijberî hev a hegemonîk a kurewî ew ava kirine, ev rewş potansiyela bêîstiqrariyê û rîskên mezin ên pir cidî li xwe digire. Li aliyê din, Rûsya û Çîn di serî de, ew hêzên li herêmê têkoşîna hegemonîk dimeşînin jî dîsan ji ber ku ji vê sîstema dewletan sûdwer dibin û ji bo li gorî karaktera xwe ne mafên civakî û takekesî lê berêtiyê didin berjewendiyên xwe yên jeopolîtîk û jeoekonomîk, ev sîstem ji bo wan kêşeyeke zêde mezin çênake. (Katz, 2020: 149-150). Veberhênanên enerjiyê yên Çînê ku li Îranê kirine an jî desteka Rûsyayê ya ji bo Esad, delîlê vê yekê yên herî berbiçav û şênber in. Bi awayekî kurtasî, her çendî piştî serhildanên ereban formên desthilatê yên otorîter hilneweşiyabin jî lê têra xwe hejikîn û ji ber vê yekê têkiliya civak û dewletê halê hazir niha ji nû ve tê mizakerekirin. Ev tiştekî qethî ye ku sînor neguherîn û konsolîdasyoneke otokratîk a nû hat pêkanîn. Lê ew çavkaniyên binyadî yên bilindbûna meydanxwastina civakî ya li dijî rejîman hîn weka xwe li cihê xwe sekinandî ne. Ka gelo ew mekanîzmayên berxwedanê yên civakî dê li kîjan aliyî veguherin û qeyrana hegemonyaya global dê encameke çawan çêke, ev gişt faktorên wisan in ku dê rasterast tesîr li ser dahatûya rejîman û sînorên wan bike

Encama çarem a serhildanên ereban ew e ku wê ji rabêjiya awarteparêziyeke nû ya Rojhilata Navîn re rê daye. Di wan dewrê hanê de ku çalakî çêbûn, bi angaşta ev îsyan ji bo demokrasî (ya lîberal) û mafên mirovan e gelek nivîs hatin nivîsîn û analîz hatin kirin. Lê belê gelek aliyên kêşedar ên van analîzan hebûn. Wek mînak, rola medyaya civakî wisan hat pirolekirin (mibalexekirin) ku bi gotina Tarak Barkawi "eger em li reklama pirolekirî ya vê medyaya civakî binêrin, tu dê bibêjî qey li Misirê yê Mubarek ji text xistiye ne gelê Misirê lê Newala Sîlîkonê bû."[29] Em dikarin vê rabêjiya siyasî di nav sîstema dinyayê ya navend-Ewrûpayê de, di "tişt"kirina dînamîkên şoreşger ên rabêjiyeke dijşoreşger de bibînin: Li gorî Azeez di kana vê de ew pêşqebûl heye ku li derî cîhana Rojava, ji cîhana Rojava serbixwe eger şoreşeke ku bûyîna wekî ya Rojava ji xwe re neke armanc dê pêk neyê. Ev tiştekî pir kêşedar e. Ji lew re potansiyela şoreşger û teserifên (revolutionary agency) wê dimarêze û çavkaniya wê girêdayî derve dike. Yan jî her veguherîneke şoreşger a ku dikare li derî cîhana Rojava pêk were tenê lê bi tenê wisan derpêş dike ku ew dikare bi qasî kapasîteya teqlîdkirina Rojava xurt be (Azeez, 2016). Rabêjiya awarteparêziyê ku xwe dispêre paşxaneyeke wiha îdeolojîk, du mijarên sereke yên ku heman aqil van ji bo vê wek nimûne nîşan dide jî ew bidawîbûna serhildanên ereban a bi konsolîdasyoneke otokratîk û derketina holê ya DAÎŞ'ê wek "şeytanê kurewî" ye. Ev rabêjiya awarteparêziyê ya di bingeha wê de ew îdraka hanê heye ku Rojhilata Navîn li hemberî veguherînê ling dide erdê û ne guncayî demokrasiyê ye, berhemeke aqilê stratejîk a navend-ewrûpî bû û di serî de cîhana ereban, li ser nemimkiniya guherîna Rojhilata Navîn hatibû avakirin. Vê rabêjiyê di pey kodkirina "Bihara Ereban" re di têgihîkirinên kognîtîf ên mîna "Zivistana ereban" an jî "Zivistana îslamî" de ji xwe re bergind dîtin. Em dikarin behs bikin ku vê rewşê ji bo qada siyasî ya kurdî du encam derxistine holê. Ya yekem, di nav nîqaşa "awarteya awarteyê" ya nû de sekinîna li ser Rojava, ya duyem jî ji aliyê binyaddarbûnên desthilatên li herêmê pozîsyona din a ontolojîk a subjektîvîteya siyasî ya kurdî ye.

Encama pêncem jî ya di asta herêmî de derketiye holê ew e ku ji bo wan herêmên hanê, yên hîn berê bi serweriya dewletan ve hatine girêdan û bi rehendên diyar duçarî şidetê mane lê ji hêla civakî û siyasî ve ji dewleta navendî cudahîtiyên wan hene, xuyabûna îhtimaleke azadiyê ye. Dînamîka herî domînant a ku rê ji vê re vekiriye, ew lihevxistinên navxweyî ne ku serhildanên ereban bûye sedema qewimîna wan an jî ew nakokî ne ku ji bo maweyekê be jî wan ev rejîmên hanê qels xistine. Ji bo van, dibe mirov bikare nimûneyên qada siyasî ya li Iraq û Sûriyeyê, Herêma Sîrenaykayê ya Libyayê û Yemena Başûr bide (Ahram, 2018). Em analîza têkildarî kurdan bihêlin ji sernavekî din re û bi kurtasî em dikarin vê bibêjin: Dînamîkên lihevxistinê yên

[29] *Bnr*. https://www.versobooks.com/blogs/442-don-t-believe-the-hype-al-jazeera-s-tarak-barkawi-denounces-the-role-of-technology-and-the-westernization-of-revolution (gihîn: 30.10.2021).

heyî hîn bêhtir kûr bûne, bi taybetî li Yemenê şerekî bêrehm dest pê kiriye ku mirov ji birçînan diqelin, li Libyayê jî gurahiya şerê navxweyî hîn bêhtir kûr bûbû.

## Piştî serhildanên ereban şekilgirtina jeopolîtîk

Serhildanên ereban ji aliyê şekilgirtina jeopolîtîk a herêmî ve jî hin rewşên nû derxistin holê. Li vir em dê ji bo çar dewletan ku analîzeke kûrane ya qada siyasî ya kurdî vedihewîne ji sernaveke din re bihêlin û em tiştekî sûdwer dibînin ku bi awayekî kurtasî behs ji binyada jeopolîtîk a di çapana herêmê de bikin. Berî her tiştî wek diyarkera hegemonîk hewce ye ku binê vê rewşê bê xêzkirin. Hêzeke domînant a ku hemû herêmê di bin kontrola xwe de digirt, bi salên 2010'an re êdî nebû, sedema bingehîn a vê yekê ew bû ku DYA bi dewra duyem a Obama re dest pê kir ji Rojhilata Navîn vekişiya û bi awayekî rasterast ev jî bi qeyrana pergala dinyaya lîberal re pêwendîdar e ku li jorê hat nîqaşkirin. Gava kêmbûna hegemonyaya DYA'yê û reqabetkariya Çîn û Rûsyayê ya ku her diçû zêde dibû, bi serûbinbûnên civakî û siyasî yên li herêmê bi yek bûn, îcar sîstemeke nû ya ewlehiyê û mistewiyeke jeopolîtîk derket holê (Fawcett, 2017: 807).

Ji wan hêmanên sereke yên bûne sedema vekirîbûna jeopolîtîk a cidî ku serhildanên ereban li herêmê ew pêk anîbûn, bi rêjeyeke cidî qelsketina Misir, Sûriye û Iraqê heye ku wek kevneşopî kapasîteya wan a diyarkirina têkiliyên herêmî hebû lê ji ber serhildan û lihevxistinên çekdarî lawaz bûn. Dîsan pêvajoyeke jeopolîtîk a paralelî vê ji bo hebûna vê valahiya hanê ji bo xwe bikin firsend, warê xwe yê kartêkeriyê berfireh bikin û bi armanca ku bi vê rêyê mijarên eleqedarî ewlehiya xwe li wî aliyê sînor pêşwazî bikin, ji hêla Tirkiye, Îran, Mîrgehên Erebî yên Yekbûyî, Qeter û Erebistana Siûdî ve li gorî berjewendiya xwe pêşkêşkirina zemînên normatîf ên alternatîf in. Lê belê van hewldan ji bo cihgirkirina van pêşniyazên normatîf li aliyekî wan kir ku li herêmê krîzên nû hîn kûrtir çêbin, rê da qewimînên şerên sîvîl ên nû yan jî yên heyî hey car kûr kirin û li herî dawiyê bêîstiqrariya li herêmê zêde kir (Hazbun, 2019). A rast li dawiya salên 2010'an pê de hevkariya Qeter û Tirkiyeyê, ku wan dest pê kiribû li herêmê bazirganiyeke normê bikin, piştî serhildana ereban bi destekkirina hikûmetên îslamî ev kar da berdewamkirin. Lê ev hewldan piştî derbeya li Misirê ya 2013'an sekan bû. Piştî vê demê bi şûn de, bi taybetî jî bi sala 2015'an re li herêmê pozîsyona herî bingehîn a Tirkiyeyê li ser wê yekê damezirîbû ku nehêle kurdên li Sûriyeyê tu destkeftiyekê bi dest bixin. Wê bi dayîna hin cure tawîzan di serî de ji bo DYA û bi taybetî ji bo Rûsyayê û li gel ku pozîsyona wê ya li NATO'yê hejikand jî, ev rewş domiya.

Bi taybetî wekî di nimûneya Şerê Yemenê de jî hat dîtin, bi berdewamiya 2010'an dijberiya Îran û Erebistana Siûdî ku berjewendiyên xwe li dijî hev nişte dikirin, di asta herêmî de tesîrdar bû. Nakokiyên li navbera xeta sûnî ya ku bi berdewamiya salên

2000'î re xuya bûbû û DYA û siûdiyan pêşengî lê dikir û aksa berxwedanê ya navend-şiî ku Îranê lê pêşengî dikir, dewam kir. Bi taybetî ew bandora Îranê bi milîsên girêdayî xwe li Sûriye, Iraq û Libnanê çêkiribû, di serî de ew xanedaniyên li Kendavê, ku wan ev bandora hanê ji bo xwe wek gefek dît, hêzên din ên li herêmê nekarîn jê re bibin asteng (Postel, 2021). Rola herêmî ya Îranê, bi qasî ku li dijî Kendava di bin pêşengiya Siûdî de aşopî kir, li dijî cîhana Rojava jî, ku wan pest li Îranê kir da bernameya xwe ya nukleerê rawestîne, li ser bingeha mistewî ya jeopolîtîk rûdinişt. Lê belê rola Îranê ya ku bi taybetî li Sûriyeyê mezin dibû, di serî de ji bo Îsraîl û Erebistana Siûdî, ji bo hêzên din ên li herêmê jî li endîşeyeke ewlehiyê ya pir esasî dadigeriya. Piştî li DYA'yê serokatî ji Obama derbasî Trump bû, vê birêzbûna jeopolîtîk li dijî Îranê bi desteka DYA'yê cihê xwe ji zêdekirina hewla bandora herêmî ya Erebistana Siûdî û Mîrgehên Erebî yên Yekbûyî re hişt (Hazbun, 2019). Lê îcar piştî hilbijartina Biden bi şûn de hewla destpêkirina mizakereyên nukleer, ji vî aliyî ve piçek be jî kir ku destê Îranê xurt bibe.

Wek encam em dikarin vê bibêjin: Destpêkirina hilweşîna pergala normatîf a di bin hegemonyaya DYA'yê de û hewlên dewletên herêmî û binyadên derî dewletê da ku vê rewşê li gorî berjewendiyên xwe bi kar bînin, roleke diyarker di niştebûnên wan ên jeopolîtîk ên salên 2010'an de leyîst. Nemaze bi şerê Sûriyeyê re bi awayekî hîn xurt daketina qadê ya Rûsyayê û di asta navneteweyî de jî kirina piştvanekiya wê ya li Sûriyeyê, ne mimkin e li derî qeyrana pergala dinyaya lîberal bê xwendin (Hinnebusch, 2016: 574). Serhildanê ereban, ku wan ev şert mimkin kirin, dîsan binyaddarbûnên desthilatê yên nû ku wan hêz kir dest xwe, ji ber wan ji bingehî ve destûr neda veguherînekê, loma bi qonaxa demê re vemirîn.

# Qada siyasî ya kurdî: Rejîmên ku qels dikevin û derfetên dîrokî

## Dewlet û siyasetên kurdan

### *Îran*

Îran, tevî hilbijartin û guherîna pêşewatiyan jî ji ber domînantiya rejîma îslamî, pê re guherîneke cidî çênebû. Lê ew rêkeftina der barê bernameya nuklerê de bi wan welatên hanê re yên ku DYA›ya di bin rêvebirina Obama de serkêşiya wan dikir îmza kiribû, bi hilbijartina Trump re ji holê hat hildan û piştî ambrgo û mieyîde lê hatin xurtkirin bi şûn de, ku gelên Îranê jixwe ji aliyê aborî ve têra xwe di rewşeke dijwar de bûn hîn bêhtir ketin rewşeke zor û vebeyîna vê ya rasterast jî bi salên 2010›an re bû livdariyeke civakî ya ku her diçû radîkal dibû. Ev çalakî wekî Qûmê, bajarên herî mihafezekar û alîgirên rejîmê jî tê de, hema bibêje li hemû bajarên welêt bi awayekî

binavber domiyan. Kurdên li Îranê jî bi awayekî çalak beşdarî li van çalakiyan kir, ji lew re li wan cihên ku xizanbûna aborî û tesîra rasterast a ambargoyê bi awayekî herî giran dihat hisandin, bajarên kurdan bûn. Li gel vê yekê, damara kurdistanî ya li Îranê pir xurt bû û beşdariya li van çalakî û kiryarên ku bi vê armancê pêk dihatin, tim bi awayekî gur çêbû. Tiştekî pêkan e mirov vê hem li Başûr hem jî li Rojava di parastina li dijî DAÎŞê de û wekî di gelek warên din de bibîne.

Bipêşketina kurdan a di asta herêmî de şax ji xwe berdide, kir ku rejîm der barê kêşeya xwe ya kurdî de dest bi hildana tedbîrên hîn sert bike. Di nîvê pêşî yê salên 2010'an de, kêşeya kurdî ya li Iraqê formeke otonomiyê ya nêzî serxwebûnê bi dest xistibû. Li Sûriyê piştî şoreşa Rojava xwebirêvebirinek çêbûbû û li Tirkiyeyê jî ji bo ku kêşeya kurdî çareser bike pêvajoyeke çareseriyê dewam dikir. Yanî wek herêmî, çendî realîteyeke kurdî ya ku di her warî de bi pêş diket hebû jî, lê Îran wek dewleteke ku ji kêşeya xwe ya kurdî re çareseriyek nedîtiye dê bimaya. Tevî vê yeka hanê, pêvajoya çareseriyê ya ku li Tirkiyeyê didomiya û ji ber hikûmeta AKP'yê di serî de bi PDK'yê re bi îdareya Başûrê Kurdistanê re jî di nav têkiliyên baş de bû, îtifaqa osmanî û kurdan a ku di sedsala 16'an de li dijî sefewiyan çêbûbû, dianî bîra Îranê. Hebûna hêza gerîla ya cidî ya PJAK'ê, ku bi sala 2011'an re pê re di nav lihevnexistineke qismî de bû, ji vî aliyî ve endîşeya ewlehiyê ya rejîma Îranê zêde dikir (Sinkaya, 2018: 855). Lê ji ber pêvajoya çareseriyê li Tirkiyeyê qediyabû; xeta dijminiyê ya ku koalîsyona dewletê ya AKP û MHP'yê ya eleqedarî vê li dijî Rojava bi pêş xistibû û hema bibêje ew bi Tirkiyeyê re bi awayekî koordîneyî li dijî referandûma serxwebûnê ya li Başûrê Kurdistanê derketibû, kir ku Îran di warê siyaseta xwe ya kurdî de bibe xwedî pozîsyoneke wisan da ku wê hinekî rihet bike. Rejîma Îranê, bi awayekî giştî xwedî meyleke wisan e ku dibe îhtimala qewimîna meseleyên ji ber siyaseta wê ya derve vebeyîn li ya hundir, loma dixwaze tavil li wan warên pêkhatî çareser bike, li Iraqê ber bi salên 2010'an ve li dijî wan serhildanên ku dê li kuçe û kolanan çêbin, li Sûriyeyê li hemberî hemû mixalefetê û bi awayekî giştî jî li dijî kurdan xeta destekkirina rejîman bi pêş xist (Postel, 2021).

### *Tirkiye*

Mimkin e mirov salên 2010'an di du dewran de bixwîne ku rê ji veguherîna dramatîk a Tirkiyeyê re vekiriye: Dewra pêşî ya pênc salî ku AKP'yê li ser dewlet û sîstemê kontrola xwe peyitandiye û konsolîdasyona xwe ya tam a li ser girseya xwe pêk aniye û dewra din jî ew e ku neçar maye hevkariyê bi rêxistineke paramîlîter re bike ku koka dîrokî ya dewletê pêk aniye, bi MHP'yê re di nav koalîsyonê de neteweperest bûye û polîtîkayên dewleta ceberût bisepîne. A rast, AKP ku li dawiya referandûma makeqanûnê ya sala 2010'an bi rêjeyeke mezin kontrola xwe pêk anîbû, heta sala 2013'an hêza xwe bi temamî konsolîde kir. Di sala 2013'an de li ser meseleya dersxaneyan bi cemaeta Gulen re ku şirîkê wê bû ketibû nav pevçûnê û di dawiya

vê yekê de nelirêtiyên wê yên cidî li rastê belawela bûbûn. Dîsan heman sal, bi protestoyên Parka Geziyê re, bi mixalefeteke cidî ya civakî û siyasî re rû bi rû ma ku ev yek li dijî pratîkên wê yên siyasî yên ku çavkaniyên vê rejîma oterîter a niha pêk tine, qewimîbûn (Yegenoglu, 2013). Ji vê demê bi şûn de, ji bo AKP'yê ku wê dest pê kiribû siyaseta cemserîkirinê sepandibû, jê re ew rêya hilbijartinê vebû ku di sala 2015'an de li meclisê piraniyê ji dest bide. Di vê navberê de hevdîtinên aştiyê ku bi PKK'yê re didomiyan, ji bo ku dê li herî dawiyê çîteya demokratîkbûyînê bilind bikiraya, ya rast bi vê siyaseta cemserîkirinê re ne hevahengdar bû. Piştî hilbijartinên Hezîrana 2015'an, di encama gelek êrîşên terorîstî de ku bi awayekî qismî ji ber çavlêgirtina dewletê û/yan jî ji ber destekkirina wê karîn pêk werin û ji hêla DAÎŞ'ê bên birêxistinkirin, di hilbijartinên Çiriya Paşîn de civak bi hezeyanên neteweperest li sindoqan hatin kanalîzekirin û her cure mixalefet bi tehde û gefan hat qutifandin û wisan ew derbasî dewreke nû bûbûn. Di nîvê duyêm ê salên 2010'an de "Tirkiyeya nû" ya Tayyîp Erdogan ji hêla "dewleta berê" ve bi temamî li bin kontrolê hatibû hildan. Tirkiye di nav rewşeke giran a pêkutiyê de, bi kûrbûna cemserîbûnê ya civakî ku jixwe ji berê ve hebû, bi awayekî qedemeyî ketina rewşa halê xerab a aboriyê û bi neteweperestiyê dînamîtkirina îhtimala pêkvejiyana gel heta roja îro hat (Jongerden, 2018b, 2018a; Tansel, 2018).

Siyaseta kurdî ya hikûmeta AKP'yê bi mizakereyên ku ji destpêka salên 2010'an didomiya îdraka demokratîkbûn û vegerînê çêkir û ya rast Tirkiye dikir nav rewşeke demokratîk a wisan ku hîç ew çend çênebûbû. Lê belê bi destê koalîsyona dewletê ya ku di nîvê duyem ê salên 2010'an de çêbûbû, mihtemel yek ji dewrên herî tarî yên dîroka Tirkiyeyê hat jiyandin (û çendî nîşaneyên qelsbûnê bide xuyakirin jî hîn jî ev yek berdewam e). Di nîvê pêşî yê salên 2010'an de ew siyasetkarên ku mixatabê çareseriyê bûn, cezakirina wan a di nîvê duyem ê heman deh salî de, girtina sazî û damezirawеyan an jî ketina wan a rewşa ku nikarin bixebitin, li şûna şaredarên ku hatine hilbijartin tayînkirina qeyûman û li bajarên kurdan bi awayekî temamî hildana ji holê ya sîstema demokrasiya bihilbijartin, xistina wekîliya parlamenteran û girtina hinek ji wan, di nav pêvajoyên tarî de pêkhatina cinayetên siyasî ku em hîn jî detayên wan bi awayekî têra xwe zelal nikarin bizanin, ew çêbûna rewşa îdarekirina bi zordariya leşkerî ya gund û bajaran û bi operasyonên bi navê terorê ku li her derî bi awayekî dêwasa tên kirin ku bêhn li civakê çikandine, taybetmendiyên herî diyarker ên vê dewrê ne.[30] Sepanên herî giring ên polîtîkayên herêmî yên koalîsyona AKP û MHP'yê, tevî ku tu gefekê li dijî wan çênake jî, li herêma Rojava ew midaxeleyên wê

[30] Ji bo detayên tehde û pestên siyasî *bnr* Human Rights Watch (HRW), Turkey: Crackdown on Kurdish Opposition. 20.03.2017, https://www.hrw.org/news/2017/03/20/turkey-crackdown-kurdish-opposition (gihîn: 25.05.2017).

yên leşkerî û bombardimanên timî û li nav sînorên dewleta Iraqê ew operasyonên wê yên li dijî hêzên PKK'yê ne ku bi agahdarî û desteka veşarî ya birêvebirina Başûrê Kurdistanê tên kirin ku pê re pêwendiyên wê yên aborî û stratejîk hene. Birêzbûna li dû vê siyasetê ya mixalefeta ku li derveyî HDP'yê maye, di puxteya xwe de xizmeta rolekê ya ji bo berdewamiya AKP'yê leyîst. Dikare bê gotin ku di esasê xwe de dijberiya kurd û konsepta ewlehiyê ku piçek be jî ji ber dijatiya cemaeta Gulen tê meşandin, di nîvê duyem ê salên 2010'an de xwedî wê armancê bû ku bi temamî civakê çok bide şikandin û bi awayekî zêde bi ser ket û ev yek kir. Li Tirkiyeyê HDP û xeta çep a radîkal ne tê de, tevahiya mixalefeta siyasî jî bi desthilatê re der barê neteweperestî û dijminiya bi kurdan re çendî ne bi qasî heman yekê be, heta wekî mijarên koçberiyê, helwestgirtina wan a pozîsyona neteweperest a ji desthilatê bêhtir, a rast kir ku temenê koalîsyona dewletê ya AKP û MHP'yê dirêj bike. Wekî di warên din de, di polîtîkaya derve de jî hilweşîn û têkçûna sazûmaniyê, îrrasyoneliya van siyasetên wan ên Sûriye û Iraqê ku ev têkçûn pir aşkera tê çavdêrîkirin û ji bilî neyartiya wan a tûj a bi kurdan re, ku bi tu sedemeke din nikare were ravekirin û ji ber mixalefetê jî heta sala 2012'an çekê vekirî daye vê siyasetê, koalîsyona dewletê emirê xwe dirêj kir. Di vê dewra hanê de ku ev rêzik tê de hatin nivîsîn, di çavkaniya helwesta mixalefetê de ku hin şanên guherînê xwe dide nîşandan, hesabên hilbijartinê û hebûna diyardeya amrazîkirina kêşeya kurdî, rê li ber xwedîkirina hêviyên eleqedarî dahatûyê jî digire.

***Sûriye***

Di salên 2010'an de qada ku herî veguherînên dramatîk lê qewimîn Sûriye bû. Lingê serhildanên ereban ê Sûriyeyê ku di serê pêşî de bi pêşengiya komîteyên koordînasyonê yên cihkî dest pê kir, di encama siyaseta serkutkirina bi şidetê, li mixalefeteke çekdar dageriya (Phillips, 2013). Hewla rejîma Esad ya ku dixwast vê lihevxistinê bike şêweyeke mezhebî û gavavêtina wê ya stratejîk ku kir cîhadkeriya xwe dispêre şideta kor mimkin bibe û meşrûiyeta mixalefeta berfireh bihejikîne, ji wan taktîkan bû ku li hundirû bi vê îsyanê bilî bibe. Li derve jî, bi awayekî herêmî ji Îranê û wek kurewî jî ji Rûsyayê destek stand û karî li dijî mixalefetê serkeftineke leşkerî bi dest bixe û li herî dawiyê li dijî mixalefetê jî bi ser ket ku konsolîdasyona rejîmê pêk bîne (Fawcett, 2017: 800). Ji aliyê din ve mixalefet jî her çû cîhadî bû, ji lew re ew mixalefeta ku bi awayekî nispî hîn mitedil bû û bi desteka Tirkiye, Kendav û di destpêkê de bi ya DYA'yê tev digeriya, gava bi domana demê re qada xwe ya kartêkeriyê winda kir îcar binyadên cîhadker wek alternatîfên hîn hêzdar xuya bûn. Di nîvê duyem ê salên 2010'an de hêzên mixalefetê yên sekuler û hîn bêhtir li milê çepê bûn, bi temamî tune bûbûn, xeta bi awayekî hîn mitedil a di nav xeta Îxwan de ku bi tenê karîbû li salonên civînên li Cenevre û Stenbolê bixuyin, li meydanê hema bibêje bi tevahî cîhadker peyda dibûn.

Şêweya eleqedarbûna rejîma Sûriyeyê ya bi kêşeya kurdî re, di esasê xwe de piştî serhildanên ereban vebehiyan Sûriyeyê, bi awayê xwe hildana bin kontrola rejîmê bû ku têra xwe qels bûbû. Rejîmên dîktatoriyê yên din ên li herêmê ku yeko yeko hildiweşiyan, mimkin bû ku rewşeke mîna wê li Sûriyeyê jî biqewimiya. Rejîma Esad di vê nuqteyê de stratejiya desthilatê ya sedsalan sepand û navend hêvişand û piştî ku hêza xwe xurt û zeximand bi şûn de berê xwe da qadên arîşedar. Biryara vekişîna ji Rojava berhema ramaneke wiya ya leşkerî-stratejîk bû. Eger em berbiçav bikin, (1) Heleb û Şam di serî de, li dijî mixalefeta çekdarbûyî hêvişandina deverên ku giringiya wan a stratejîk heye û piştre bi armanca ku berê xwe bide herêmên kurdan tev geriya; (2) li gorî xwe «kurdên pêwendîdarên PKK›yê», bi hikûmeta AKP›yê re rû bi rû hişt û wisan xwast ku AKP›yê ceza bike ku wê li dijî rejîmê destek dida mixalefetê; (3) di serî de bi berdana cîhadkerên di girtîxaneyan de, bi gelek hemleyên stratejîk, li gorî xwe du dijminên xwe, ango hewl da ku cîhadker û kurdan bi hev bide şikandin (Guneş û Lowe, 2015; ICG, 2014; Spyer, 2013). Lê belê di nîvê duyem ê salên 2010›an de Birêvebirina Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, ku di pêşengiya kurdan de hatibû avakirin, di bingeha xwe de ew meseleya ku dê bibe xwedî kîjan statuyê hîn jî yek ji wan mijarê herî germ ên di rojevê de ye. Tevî rejîmê, mixalefeta rewteka sereke jî bi qasî rejîmê li ser xeta neteweperest a erebî bû û der barê statuya kurdan û mafên wan de helwesteke biryardar nîşan da ku di van waran de gav neavêje. Ev jî yek ji wan sedemên bingehîn e ku wê kir kurd siyaseta rêya sêyem bidin ber xwe û pê de herin.

***Iraq***

Di salên 2010'an de Iraq têra xwe xwedî dîmeneke belawela bû, ji lew re tevî hemû destek, hêvişandin û kapasîteya beralîkirina DYA'yê jî, li dawiyê têr nekir ku siyaseteke navendî ya ku dixebite pêk were. Ew dema ev yek bi awayekî herî zelal û aşkera derket hole, ew dewr e ku gava DAÎŞ'ê Mûsil wergirt. Tevî 30 hezar leşker û ew çend jî hêza polîsan ku li Mûsilê bi cih bûbûn, DAÎŞ'ê bi qasî 1500 şerkerên xwe ve êrîşî Mûsilê kir, ji ber firarkirina leşkeran, di dawiya şeş rojan de herêma Mûsilê bi temamî hilda bin kontrola xwe. Artêşa Iraqê ku bi salan li ber destê leşkerên DYA'yê perwerde bûbû û ji hêla cebilxane û çekan ve jê qat bi qat raser û serdest bû, bêyî berxwedaneke cidî bike herêm radestî DAÎŞ'ê kir, di heman demê de yek ji nîşaneyên berbiçav a têkçûna pratîka avakirina dewletê ya DYA'yê bû. DAÎŞ bi wergirtina desteka ji erebên sûnî yên ku wan piştî dewra Sedam pozîsyona xwe winda kiribû û bi alîkariya çekên bi menşeyên NATO'yê jî, di salên pişt re dê sînorê Iraq û Sûriyeyê bêmehne bikira. Hikûmeta navendî ya Iraqê, bi alîkariya DYA, Îran û milîsên Heşdê Şebî yên ku bi Îranê ve ne, dê bi qonaxa demê re li Iraqê DAÎŞ'a ku qels ketibû bi awayekî merheleyî biqedanda. Lê belê ew xizaniya ku lihevxistinên etnîk û mezhebî kirbû ew bi awayekî qismî nexuyane bibebe, nemaze bi sala 2019'an re dê di dîroka welêt de bibûya sedema çêbûna yek ji tevgerên gelêrî yên herî mezin. Ev tevgera ku dê wek serhildana

Tişrînê ango Çiriya Pêşîn bihata navandin, li ser daxwaza sîstemeke nû ya civaka ku hatibû xizankirin û bêhêzkirin, di serî de ya ciwanan a piraniyê hatibû avakirin û di maweyeke kurt de bi şêweyeke lezdar li herêmên navend û başûr berbelav bû (Postel, 2021: 8). Çendî encamên wan nebûbe sedema guherîneke mezin jî, ev tevgera gel a ku li herêmên başûr ên bi gurahiya şêniyên xwe ve şiî ne, da nîşandan ku tesîra cudahiyên mezhebî û ew lihevxistinên ji ber vê yekê diqewimin ên ku hêzên li desthilatê rewa dikin, wekî berê bi qasî kêşeyên berbiçav ên aborî, siyasî û civakî ne xurt in.

Siyaseta kurdî ya hikûmeta navendî ya Iraqê jî dîsan ji ber hebûna DAÎŞ û DYA'yê ve dihat şêwandin. Kêşeyên di navbera Herêma Kurdistanê û hikûmeta navendî de, di vê serdemê de, ji bilî çêbûna girjiya (tansiyona) budçeyê ku dihat xwastin petrola Iraqê di ser Tirkiyeyê re bifiroşin piyaseya navneteweyî (Hoffmann û Cemgîl, 2016: 17), heta referandûma serxwebûnê, di rewşeke wisan de bû ku bi awayekî nispî dikaribû bihata kontrolkirin. Mercên civakî û siyasî yên ku DAÎŞ'ê ew afirandibûn, li ser vê yekê roleke diyarker leyîst. Lê belê wekî ez dê li jêrê hîn bêhtir bikitekit bikim, piştî hêzên kurdan Kerkûk ji DAÎŞ'ê azad kir û li wir kontrol pêk anî, ne Îran ne Tirkiye ne jî hikûmeta navendî ya Iraqê ji vê kêfxweş û razî bû. Lê tiştên ew bikarin di pratîkê de bikin sînordar bûn. Piştî referandûma Serxwebûna Kurdistanê ya sala 2017'an, ku bi rêjeyeke zêde bêdestek mabû, hikûmeta navendî ya ku piçekî xurt bûbû, bi hêzên Heşdê Şebî re bi awayekî koordîneyî bêyî leqayî berxwedaneke cidî ya hêzên kurdan bibin ev der xistin bin kontrola xwe.

Birêzbûnên jeopolîtîk ên herêmî yên dewletên li qada siyasî ya kurdî, bi şêweyeke qismî pêwendîdarê kêşeyên kurdî bûn. Ji aliyê Îranê ve, ku ev demek bû hewl dida ewlehiya korîdora şiî dabîn bike, destekdana wê ya li rejîmên Iraq û Sûriyeyê ku ew hîn bêhtir nêzî wê bûn, wek polîtîkayeye bingehî domiya. Ji ber nebûna çalakiyên leşkerî yên aktorên siyasî yên kurdên nav xwe jî dikir ku ev mimkin bibe. Tirkiye ji destpêkê ve li wan dewletên hanê ku potansiyala wan binyadên siyasî yên li ser xeta Îxwan hebû bên ser desthilatê, polîtîkayeke wisan şopand ku desteka tam pêşkêşî serhildanên ereban dikir. Çendî ev polîtîka bi taybetî li Misirê piştî qelaptina Mursî pir ketibe zorê jî Tirkiye bi vê rêyê hewla xwe ya bandorkirina li herêmê heta dawiya vî deh salê hanê da domandin. AKP, ku li Sûriyeyê jî bi heman armancê tev geriya, bi koalîsyona dewletê ya ku piştre bi MHP'yê re honandibû, dijberîtiya bi kurdan re ji xwe re kir tiştekî esasî. Ji bilî vê, ji ber Tirkiyeyê şerkerên biyanî yên bipereyan ku yek ji encamên rasterast ên şer e, tevî Sûriyeyê li Ermenistan û Libyayê jî bi kar anîn, vê rewşê kir ku dînamîkeke nû derkeve rastê. Ji aliyê Sûriye û Iraqê ve meseleya sereke ew bû ku di bin van hemû şertan de ev rejîm li ser lingan bimînin û bi hêzên herêmî û kurewî re bikarin van têkiliyan bi pêş bixin (Guneş, 2019; Hoffmann û Cemgil, 2016; Kabalan, 2013; Postel, 2021).

## Vegerînên li qada siyasî ya kurdan

Em dikarin ji pênc pêvajoyên sereke behs bikin ku di salên 2010'an de bandor li dagerînên li qada siyasî ya kurdî kirin: Şoreşa Rojava, pêvajoya çareseriyê ya li Tirkiyeyê, referandûma serxwebûnê ya li Başûrê Kurdistanê, jenosîda êzdiyan a li Şengalê, midaxeleyên koalîsyona AKP-MHP'yê ya li Başûr û Rojava û veguherînên li Rojhilat. Ev her yek ji pêvajoyên hanê ku bi awayekî rasterast encamên serhildanên ereban û hem jî pekhateyên krîzeke hegemonyaya kurewî ne, li salên 2000'î du kampên îdeolojîk-polîtîk yên ku di qada siyasî ya kurdî de derketibûn hole, hîn bêhtir xuyane kirin.

***Şoreşa Rojava***
Bêguman ji aliyê qada siyasî ya kurdî ve veguherîna ku bi awayekî herî aşkera salên 2010'an diyar dike şoreşa Rojava bû. Şerê Sûriyeyê, pê ve pêwendîdar şoreşa Rojava, yek ji wan mijarên herî giring ên li pêş hem ê rojeva herêmî hem jî ya kurewî bû. Di hemû hevpeyvînên xwe yên kirî de aktorên siyasî yên kurdan ji bo qewam û bipêşketinên eleqedarî qada siyasî ya kurdî nirxandineke Rojava kir. Şoreşa Rojava, piştî rejîma Esad di 2021'an de bi mebesta li hemberî mixalifên xwe pozîsyonek wergire ji herêma kurdan a li bakur vekişiya, hêzên li ser xeta îdeolojîk a Ocalan ku bi dehan salan li heman herêmê çalakîtiya wan û birêxistinbûna wan hebû, bi îlankirina xwe-birêvebirinê ya li ser bingeha sê kantonan pêk hat. Em dikarin şertên ku şoreşa Rojava mimkin kirin hem bi palpiştiya hevpeyvînan hem jî bi awayekî qismî bi palpiştiya lîteratûrê di sê rehendan de binirxînin: Vebeyîna qeyrana hegemonyaya kurewî ya li Sûriyeyê, qeyrana mayîna li ser lingan a rejîmên ku serhildanên ereban bûbû sedema wê û amadehiya îdeolojîk û polîtîk a aktorên siyasî yên kurdan.

Bi salên 2010'an re, ku ya rast DYA ji zû de dest bi vekişîna ji Rojhilata Navîn kiribû, Beşar Esad bi navê zexm û xurtkirina berdewamiya rejîmê dest pê kir bi Rûsyayê re têkiliyên xwe bi pêş xistin. Ango di wê dewra hanê de ku serhildanên ereban dest pê kir bû, vebeyîna krîza hegemonyaya kurewî ya li qada Sûriyeyê, di navbera bandora Rojava ya di bin pêşengiya DYA'yê û ya Rûsyayê de ku ew her diçû li herêmê mezin dibû, bi awayê reqabeteke jeopolîtîk bû (Trenin, 2016). Ji aliyê DYA'yê ve vekişîn hem ji aliyê maliyetên aborî yên mayîna li vir hem jî ji aliyê stratejîk ve, dikare wek êdî xwedî giringiyeke kêm bê ravekirin, ji lew re ev rewş dê ji nîvê duyem ê salên 2010'an pê de hîn bêhtir aşkera û zelal bibûya (Gerges, 2013). Ji hêla din ve, ji bo Rûsyayê giringiya stratejîk a mayîna li vir dibe ku bi mebesta hewldana destekkirina sîstema dewletê û aboriya wê ve ya ku li dor teknolojiya leşkerî bi pêş dikeve bê xwendin. Ev qada ku di şoreşa Rojava de faktoreke giring e û hêzên hegemonîk li serê leqayî hev dibin, yek ji wan şertê giring bû ku derî ji şoreşê re vedikir. Ji lew re eger bi tenê DYA bibûya serwer,

bi awayekî mihtemel dê welatên Kendavê yên xwedî pozîsyona kevneşopî û tevî Tirkiyeyê hêzên mixalif ên rejîmê destek bikira û dê di nav hewldaneke wisan de bûya ku li ber bipêşketineke di bin pêşengiya hêzên siyasî yên kurdan de bibûya asteng. Lê eger bi tenê Rûsyaya bibûya serdest, bi awayekî mihtemel bi mebesta ku serweriya rejîma Esad bi temamî qewî bike îcar dê hewl bida ku rê li ber her cure bipêşketina dibe li bakurê Sûriyeyê çêbibûya, bigirta. Hatina pêşberî hev a her du hêzên ku li dû hegemonyayê bûn, bi êrîşên terorîst ên li Rojava yên cîhadkeriyê re, îcar vekirîbûneke jeopolîtîk afirand. Hêzên leşkerî yên li Rojava, ku wan li dijî hêzên cîhadker têkoşîneke kartêker dimeşand, ev rastîhevhatina hêzên hegemonîk bi awayekî nispî be jî di leha xwe de bi kar anî û ew bi ser ketin ku şoreşê bidomînin. Ev rewşa qeyrana hegemonyaya kurewî li faktoreke wisan dageriya ku rasterast tevî qada siyasî ya kurdî bû.

Wekî li jorê jî hat nîqaşkirin, şertê duyem ê ku kir şoreşa Rojava pêk were ew yeka hanê bû ku ji ber rejîma xwe ya di encama vebeyîna serhildanê ereban a li Sûriyeyê de bi awayekî zêde qels ketibû hilde bin kontrolê, vekişîna wê ya ji bakur bû.

Mitemel veguherîna herî giring a sêyem a ku kir hem şoreşa Rojava mimkin bibe hem jî di pratîkê de pêk were, ew veavabûna siyasî ya kurdî ye ku ev yek di encama pêşengiya siyasî û îdeolojîk a van salên dawî ya PKK'yê de çêbûye ku bi salan li herêma Rojava belave bûbû. Gava mercên şoreşê çêbûn, pêwîstiya herî lezgîn hebûna wê kapasîteya ku bikare van şertan di pratîkê de li şoreşê dagerîne û hebûna hêzeke siyasî û leşkerî ya xwedî vê rêxistinbûnê û dîsan hebûna îradeya şoreşê bû. Wekî di her du beşên berê de bi awayekî hûrgilî hat nîqaşkirin, ji salên 1980'yî pê de PKK, ku di serî de li Kobanî û Efrînê di nav kurdên Rojava de xwe bi rêxistin kiribû, piştî Ocalan ji Sûriyeyê hat derxistin bi şûn de, birêxistinbûna xwe ya li nav gelê li vir berfireh kiribû û nemaze bi Serhildana Qamişloyê ya sala 20004'an re jî hêza xwe nîşan dabû. Li hêla din, çendî partiyên Kurdistanî yên din bi taybetî li Qamişloyê, ku ya rast ew xwedî pozîsyona navendî ya herêmê bû, hîn bêhtir xurt bûn jî kadroyên wan ên leşkerî yên bikarin şoreşê bikin an jî amadehiyên wan ên siyasî yên ji bo vê yekê nebûn (Guneş û Lowe, 2015). Tevî vê yeka hanê, ya rast "ji sala 2004'an ve partiyên siyasî yên kurdan ên li Rojava xwastibû ji bo ku bikarin tim li dora danûstandinekê û rojeveke hevpar tev bigerin, lê xebitîbûn da li hev bikin û PYD û PDK-Sûriyejî tê de gelek hêzan rîayetî vê kiribû" (Milaqet, Qamişlo-online, 28.10.2021). Lê belê, ji ber aciliyeta rewşê û ji ber PYD li gorî partiyên din bêhtir xwedan amadehî bû, van yekan dehf da PYD'yê ku siyaseteke yek alî û ya xwedî terza navendî bike. A di bin van mercan de, şoreşa Rojava ku pêşengiya wê ya siyasî PYD û pêşengiya wê ya leşkerî jî YPJ û YPG dikir, çêbû.

Bi qasî van şertên behsa wan tê kirin, stratejiya siyasetê ya ku li Rojava di bin

pêşengiya PYD'yê de hat şopandin jî kir ku şoreş di pratîkê de çêbe. Ev stratejiya ku di konteksta şertên manendî wê de li Tirkiyeyê hat pratîzekirin, ji aliyê cihbicihkarên wê ve wek rêya sêyem hat binavkirin. Ev stratejî, stratejiyeke wisan bû ku di navbera rejîma Beasê ya ku ew bi armanca desthilata xwe timî bike û bi awayekî civakî konsolîde bike tev digeriya û mixalefeta rewteke sereke de ya ku bi mebesta wê wergerîne û li şûna wê desthilata xwe damezirîne, ji her duyan jî serbixwe lê bêyî bi her duyan re jî diyalogê qut bike, pêkanîna azadiyê ji xwe re dikir armanc. Di vê xalê de diyardeya diyarker ew bû ku hem rejîm hem jî mixalefeta rewteka sereke meseleya kurdî nas nedikir û wan berdewamî dida rabêjiya neteweperweriya erebî ya nerîtî. Ango di wê pergala siyasî de, ya ku li dawiya serhildanan bi qazanckirina mixalefetê yan jî piştî rejîmê serhildan serkut kirin bi şûn de, dê (ji nû ve) were damezirandin, di serî de kurd, tu texeyuleke eleqedarî mafên jinan û gelên ne ereb nebû. Li Sûriyeyê di şer û pevçûnên ji bo bidestxistina desthilatê de, ku ji roja pêşî ya destpêka serhildanan ve dest pê kiriye, hem rejîm hem jî mixalefet hewl da ku birêxistîbûna siyasî ya gelê kurd amrazî bike. Wek nimûne, rejîmê xwast bi soz û wehda ku welatîbûnê bide nifûsa kurdên welatîbûna wan ji dest wan hatiye standin, lê mixalefeta rewteka sereke jî hewl da ku vê mijarê tevî nav lîsteya wan tiştan bike ku dê piştî şoreşê bi wan re mijûl bibe. Lê belê, wek mînak ne mimkin bû ew mijara guhartina navê wê yê fermî, ango Komara Erebî ya Sûriyeyê were nîqaşkirin. Di navbera van her du sîstemên înkarê de, wan hêzên ku li Rojava pêşengî dikir, bi armanca avakirina xweparastin, xwebirêxistinkirin û çêkirina pergaleke meclisa ku ji jêr ve ber bi şor ve bixebitin, tev geriya. Tevî ku di nav xwe de xwedî arîşe û pirsgirêkên cidî ye jî, ev stratejiya rêya sêyem, bû stratejiya siyasî ku karî li Rojava soreşê pratîze bike (Sunca, 2021: 120–121).

Li gel van yekan, em dikarin wan şertên hanê, tevî hemû kêşe û kêmasiyan ku wan kiriye berdewamiya şoreşê pêk were û heta îroj were jî, di bin çar sernavan de bicivînin ku ew di hevpeyvînan de derketine holê. A yekem, bidestxistina rewatiya di asta kurewî de ya şerê ku li dijî cîhadkariyê hatiye kirin. Ji rojên destpêka şoreşê ve, têkoşîna li dijî binyadên cîhadker ên mîna bereya El Nusrayê, nemaze ji sala 2013'an ve ya ku li dijî DAÎŞ'ê hatiye kirin, li dawiya sala 2014'an de bi şerê/parastina Kobaniyê re gihîşt gopîtkê û kir ku di asta kurewî de jî rewatiya şoreşê çêbe. Di serî de li DYA û Ewrûpayê, li gelek deverên dinyayê pêkhatina çalakiyên piştgiriya bi Kobaniyê re û çêbûna xuyabariya van a di medyayê de, li herî dawiyê jî koalîsyona li dijî DAÎŞ'ê ya di bin pêşengiya DYA'yê de bi awayê koordînasyona bi YPG/YPJ'yê û piştre bi HSD'yê re, rê li ber wê pêvajoyê vekir ku ew heta nehiştina hebûna terîtoryal a DAÎŞ'ê çû. Vê rewşê ji aliyê leşkerî ve, qebûl û naskirinek çêkir.

Mijara duyem jî ew e ku xeta îdeolojîk û polîtîk a şoreşa Rojava di asta kurewî de bi her beşan re kelecaneke cuda çêkiriye. Jixwe di destpêkê de nêzikiyeke derdorên hîn

çep, anarşîst, femînîst û ekolojîst pê re hebû (wek nimûne. Saeed, S., 2017). Derketina pêş a şoreşê ya wekî şoreşa jinan, bi taybetî di perspektîfa oryantalîst û cîhana Rojava ya têra xwe kêşedar de (Dirik, 2014), rê li ber îdraka awarteyeke awarteyê vekir. Hewla şoreşê ya ji bo jiyandina pêkveyî ya di nav aştiyê de ya nasnameyên cuda yên etnîk û dînî, nemaze kir ku ew wek projeyeke aştiyê ya li ser bingeha hebûna gelên ermen û suryanî bê pejirandin (mînak. Duman, 2016). Ji ber şoreşê armanc nedikir sînoran biguherîne û ji destpêkê de jî xwe di nav Sûriyeyê de wek birêvebirina xweser didît, çendî hîn encameke berbiçav dernexistibe rastê jî, di asta rabêjiyê de rê li pêşiya gelek êrîşkariyan girt.

Rehenda sêyem a giring ku kir berdewamiya şoreşê pêk were, bêguman li gel her tiştî hema ji bo demekê be jî ew pêkanîna biyekkirina qada siyasî ya kurdî ye. Mimkin e em vê yekê bi awayekî pir zelal di beşdariya wan şerkaran a di parastina leşkerî ya Rojava de, ku ji her çar parçeyên Kurdistanê çûne da ku li dijî DAÎŞ'ê şer bikin, di wan çalakiyên mezin de ku li Bakur û Rojhilat nemaze di dema şerê Kobaniyê de pêk hatine[31] û di temînkirina alîkariya leşkerî ya birêvebirina Başûr de bibînin ku ji bo parastina Kobaniyê axa Tirkiyeyê jî bi kar anîn û wisan derbasî wê derê bûn.

Faktora çarem û bi awayekî mihtemel di dahatûyê de jî dibe bibe ya herî diyarker ew e ku şoreşê bi dayîna hin tawîzan kariye şertên jeopolîtîk ên diqewimîn di leha xwe de bi kar bîne. Wek mînak, tevî wan rexneyên ku wê şerê wekaletê yê DYA'yê meşandiye jî rêvebirinê bi saya îtifaqa ku bi koalîsyona DYA û ya dijberê DAÎŞ'ê re daniye, kariye hêza DAÎŞ'ê ya di asta leşkerî û terîtoryal de, ku ew ji bo herêma Rojava gefeke rasterast çêdike, bişikêne. Lê belê DYA û Rûsyayê, li hemberî midaxeleya Tirkiyeyê ya sala 2018'an a li Efrînê û di sala 2019'an de li Girê Spî û Serê Kaniyê birêvebirina xweser bi tenê hiştiye. Tevî vê yekê, divê ku çawan dervekariya Rûsyayê bi rejîma Sûriyeyê re û DYA jî bi Tirkiyeyê re tim birêvebirina xweser wek kozekê li hemberî hev bi kar tînin, di nav vê dînamîka jeopolîtîk de bê xwendin. Ev rewşa ku li gelê herêmê wek dagirî û şer vedibeye, dike ku dewletan jî bixe nav cendereyeke ceribandina hev a bi kurdan re ku qet naqede.

Ew xala ku her kesê di çarçoveya vê xebatê de min dîdar li gel wan pêk anî li serê hevpar dibû ew bû ku veguherînên civakî yên bi şoreşê re çêbûn, heta şerê 2014'an ê Kobaniyê kelecaneke cidî çêkiriye. Faktorên ku li vê bi awayekî rasterast bandor kiriye ew xurtbûna îhtimala têkçûna rejîma Beasê, piştî bi dehan salan kêmbûna tehdeyan û bi ragihandina kantonan pê de jî çêbûna zêdehiya hesta azadbûnê ye. Lê belê yek

---

[31] Gava min ji aktîvîstekî rojhilat giringiya şoreşa Rojava ya ji bo Rojhilat pirsî bersiva ku da "Kobanî" bû (Milaqet-1, Almanya 28.06.2021).

ji xalên hevpar ên wan çavdêriyên ku piştî sala 2014'an hatine kirin, ew rastî ye ku ew kelecana heyî ya şoreşê ya destpêkê êdî wekî berê ne serdest e. Sedema pêşî ya vê bêguman ew amborgo ye ku tim bi awayekî berdewam didome. Ev ambargo hem li rojhilat ji aliyê birêvebirina Başûrê Kurdistanê ve hem jî ji aliyê rejîmên Tirkiye û Sûriyeyê ve hat sepandin û li dawiyê bû sedema bipaşketineke aborî ya gelek cidî. Ambargoyan bi xwe re aboriyeke qaçaxtiyê jî anî û encamên rasterast a vê jî ew bihayên zêde bûn. Tirkiye bi taybetî ji sala 2015'an ve ku debiya ava Ferêt bi wesîteya bendavan kêm kir û av kir wek çekekê bi şûn de, li herêmê ku ew wek "embara dexilê ya Sûriyeyê" dihat zanîn, yekser hîkarî li çandiniyê kir. Piştî îcar ev bi midaxeleyên leşkerî yên Tirkiyeyê re bi yek bû, nemaze ji 2015'an pê de, vê kir ku heyecan bi rêjeyeke cidî kêm bibe.

Dîsan di çarçoveya vê xebatê de ew jina siyasetkar ku min pê re hevdîtin kir û wê di nav partiyên siyasî yên kurdan de mizakereyên ji bo yekîtiya neteweyî dimeşandin, awayê îfadekirina wê ya kêşeyên ku li Rojava di asta civakî de derketine holê, ya rast hema bibêje bi awayekî ew hemû hevdîtinên ku min kiribûn xulase dikirin. Bi kurtasî, behs kir ku ji Şoreşê pê de Rojava ji du aliyan ve bûye şantiyeyeke dêwasa: A yekem, bi mehneya xwe ya bera ji ber wêraniyê şer avabûna fîzîkî ya ji nû ve ye, ya din jî avakirina qada civakî û siyasî ya ji nû ve ye ku ew hem ji ber texrîbata rejîma Sûriyeyê ya ku bi salan pêk hatiye hem jî ji ber hilweşîn û kaviliya rewşa civakî û siyasî ye. Ji bo pêkhatina ya yekem pêwîstî bi çavkaniyeke cidî ya aborî hebû. Ji bo ya duyem jî hewce bi vîzyoneke civakî û siyasî bi wan kadroyan heye ku vê pêk bînin. Ji lew re civak xwedî wê meylê bû ku bi rêbazên ji rejîma Beasê mabûn berdewamî bi jiyana xwe bide. Em dikarin van meylên serwer ên ku di civakê de hene û bi îdiayên şoreşê re rasterast di nav têkiliyê de ne, di bin sê sernavan de bicivînin: Dejenerebûna siyasî ya di pêvajoyên birêvebirinê de û kleptokrasî; neteweperwerî, dîndarî û mezhebparêziya ku ketiya nav mûhrekên civakî û bi awayekî timî çêkirina wan a gefê; û ew zayendparêziya ku pozîsyona jinan tune dihesibîne. Ji bo pêkanîna veguherînan van, bi awayekî neçar hewce bi pêşengiya civakî heye. Dîsan ji bo pêkanîna azadiya jinan û ji bo veguherîna binyada zayendparêz a ku gelek aliyên wê yên kêşedar hene, pêwistî bi pêşengiya jinan heye. Ev gişt ew war bûn ku ew kadroyên pêşengiyê li şoreşê dikin ji veguherîna xwe berpirs bûn. Lê ev bûn sedema qewimîna nakokiyên şoreşê jî.

Şoreşa Rojava kokên xwe yên îdeolojîk ji pêvajoyên veguherînê yên PKK›yê werdigire û ev jî ji tecrubeyên tevgerên dijberî sîstema kurewî diqewime. Li vir xeta herî sereke ew e ku gel bikin îradeya birêvebirinê, ango bikin ku di yekeyên herî cihkî de ew xwe bi xwe îdare bikin. Vê mijarê çendî di konteksta azadiya jinan de dagerîn û veguherînên cidî çêkiribin jî lê ji aliyê pratîkên birêvebirinê yên giştî ve, di nav de herî kêm du çerxa sêr (daîreyên fasîd) hene. A yekem, ji bo pêkanîna xeta xweseriya

demokratîk ku li vir tê pratîzekirin, pêwîstiya parastina vê ya li dijî wan hêzan e ku dixwazin wê hildin bin kontrola xwe, wek nimûne li dijî binyadên eşîrî, li dijî aktorên siyasî yên ku ew hemleyên ji bo desthilata xwe dikin an jî li dijî hêzên derveyî ku zorê li wan dikin da wan mecbûrî xwe bikin. Lê ev hêza ku dê bikare vê parastinê bike, ji ber di nav mercên heyî de otorîteya xwebirêxistineke xwedî navend-kadroyî yên leşkerî xurt dike, loma ev rewş bi aşopiya îdeolojîk a vê projeyê re, ku ew xwe ji cihkî rasterast xwe dispêre binyadên demokratîk, naokokiyekê çêdike (Sunca, 2020: 11). A çerxa sêr a duyem jî nakokiya enternasyonalîzm û antî-emperyalîzmê ye. Şoreşa Rojava ku wek tevgereke enternasyonalîst û ya pêvajoyeke ku di nav de gelek dilxwazên enternasyonalîst ên ji deverên cuda yên cîhanê hatine şer dikin û canê xwe didin, ji aliyekî ve ji bo bikare hebûna xwe bidomîne bi hemdê xwe yan jî bêyî hemdê xwe, di serî de DYA neçar ma ku bi gelek hêzan re bixebite. Vê jî ziyan gihand perspektîfa şoreşê ya enternasyonalîst hem jî tesîreke neyînî li nêrîna kesên ku ji derve ve lê dinêrin hem jî li cem hêzên mihraq ên li herêmê neyîniyek çêkir.[32]

Di qada siyasî ya kurdî de, destkeftiya herî giring a salên 2010'an, bêguman çendî hîn jî bi awayekî siyasî nehatibe naskirin, avabûna xwebirêvebirinekê ye. Kurd ku li ser axa xwe ya lê dijîn wek biyanî hatibûn pênasekirin û ji nav sîstemê hatibûn vederkirin, li Sûriyeyê di serî de li dijî DAÎŞ'ê, di encama berxwedaneke cidî de bi ser ketin ku formeke xweseriyê damezirînin. Vê xweseriyê şêwe û teşeyeke wisan derxist holê ku li herêmê nasnameyên ew bi hev re dijiyan veder nake, xeta azadiya jinan derdixe pêş, xwe dispêre piştgiriyeke xurt a enternasyonalîst û (çendî hîna sînordar be jî) bi xemxuriyên ekolojîk tev digere. Ev rewş di qada siyasî ya kurdî de bû tecrubeyek ku wê karî sepandina xeta konfederala demokratîk a ku ji salên 2000'î ve dest pê kiribû xuya dibû, pêk bîne. Xêza rêya sêyem li vir wek xeta berxwedana çekdar bi pêş ket û xweparastina vê xweseriyê jî aşopî kir û xuyatir bû. Her wisan, di serî de partiyên di xeta PDK'yê de partiyên din ên li vir li şûna bibin parçeyekî sîstema ku li vir hatiye avakirin, hewla wan a ji bo standina parê ji desthilatê kir ku ew der di navbera xeta konfederal a demokratîk û xeta neteweperwer a klasîk de bibe qada berberiyê (qayîşkêşiyê). Ev rewş jî li pêşiya aktorên siyasî yên kurdan li astengeke cidî dageriya ku nekarîn li dor ajandeyeke hevpar tev bigerin.

***Pêvajoya çareseriyê ya li Tirkiyeyê û HDP***

Gava tevî şoreşa Rojava bê fikirandin, ji bo ku pêvajoya çareseriyê ya li Tirkiyeyê ji xeta konfederal a demokratîk re qebûlbariyeke cidî û zemîna rewatiyê daye qazanckirin, her wiha bi awayekî mihtemel di hemû qada siyasî ya kurdî de hem ji aliyê jeopolîtîk

[32] Ev, ne ji bo şerkarên enternasyonalîst ên ku bi awayekî dilxwaz beşdarî şoreşê bûne, lê ji bo partiyên komunîst ên cîhana Rojava ku xwedî têgihîştina purîtanîzmê ne, kêşeyeke cidî ye (Milaqet, Brighton, Nîsan-2019).

hem jî ji aliyê civakî ve bandoreke wisan a ku bi paş ve nayê standin afirandiye, em dikarin wê di salên 2010'an de wek bipêşketineke duyem a herî giring bi nav bikin (Ozkahraman, 2017; Savran, 2020; Sunca, 2016). Wan şertên destpêkirina pêvajoyê minkin kiriye, ku bi giranî di hevpeyvînan de û dîsan di lîteraturê de tê nîqaşkirin, dibe ew di bin çar sernavan de bên vekolan: Veguherînên li herêmê, hewla AKP'yê ya ji bo mayîna li desthilatê ku li jorê bi hûrgiliyên diyar hat nîqaşkirin, devjêberdana PKK'yê ya ji armanca serxwebûnê ya piştî veguherîna îdeolojîk û aşkerabûna nemimkiniya çareseriya leşkerî.

Veguherînên li herêmê, di esasê xwe de dikare di nav dînamîkên otonomiya li Başûrê Kurdistanê ku nêzikî serxwebûnê ye û di yên şoreşa Rojava de bên têgihîştin. Xuyabariya siyasî ya kurdî ya di asta herêmî de, ku bi salên 2000'î re ber bi bilindbûnê ve çû, di serî de hikûmeta AKP'yê, di aqilê dewleta Tirkiyeyê de ranêzikiya li vê mijarê ya li ser bingehê feydeyên jeopolîtîk hîn hêhtir maqûl nîşan dida. Ew dema ku berjewendiyên jeopolîtîk hîn bêhtir bi awayekî şênber berbiçav bûn, ew dem bû ku aqilê dewletê bi armanca pêvajoyên jeopolîtîk hilde bin kontrolê tev digeriya û ew nîqaşên dîrokî yên ji bo îtifaqa "kurd û tirkan" bû ku di navbera salên 2013-2015'an de hatin kirin. Lê hikûmeta AKP'yê ku ji aliyekî ve bi siyaseta kurdan re mizakere dimeşand, wek mînak heta di Sebata 2015'an de bi îdareya leşkerî ya Rojava re bi awayekî koordîne birina Tirbeya Suleyman Şah a li cihekî hîn ewledar û car carina hevkariya leşkerî dikir, ji aliyê din ve mixalefeta Sûriyeyê jî, ya ku çi qas diçû cîhadî dibû û bi kurdan re pev diçû, bi armanca da ew midaxeleyê li nav Sûriyeyê bikin destek dikir, a ev yek ji bo pêvajoya çareseriyê wek nakokiyeke cidî xuya bû. Ji lew re, tevî El Nusra yan jî DAÎŞ'ê, ku wan bi kurdan re rasterast şer dikir, hema di her rengê mixalefeta Sûriyeyê de xeteke cidî ya neteweperwer a erebî serdest bû. Di encamê de, li Tirkiyeyê yek ji pêkerên herî giring ên aqilê dewletê dişêwand ew hewl bû ku diyalogekê bidin destpêkirin da ew îhtimala potansiyel a şoreşa Rojava bikare tesîrê li Bakur jî bike, hilde bin kontrolê.

Faktora herî giring ku ev pêvajo ji aliyê siyaseta kurdî ve mimkin kir jî ew bû ku bi taybetî piştî bi PKK'yê re veguherîneke îdeolojîk û polîtîk çêbû bi şûn de terka armanca dewleta neteweyî ya serbixwe û biyekbûyî ya mezin da û ji bo bide nîşan ew ji aliyê çareseriyeke mizakerekirî ne, tim mesaj dan û giraniya têkiliyên navneteweyî li dora vê rabêjiya aştiyê honand. A rast ev rabêjî li dawiya salên 80'yî hatibûn destpêkirin û li salên 90 û 2000'î jî bi ragihandina agirbestên yekalî ev yek domandibû û herî dawî nemaze ji nîvê duyemê yê 2000'î pê de jî ev li tercîha sereke ya siyasî dageriyabû. Dîsan peralelî vê, di encama derbasbûna çil salên bişer û pevçûn de, ji aliyê leşkerî ve bûbû vebijêrkeke tek. Hem ji bo dewletê hem jî ji bo PKK'yê diyardeya diyarker jî ew bû ku êdî çareseriya leşkerî ne mimkin e, dewletê nekarîbû bi awayê

leşkerî PKK biqedîne, PKK jî heta salên 2000'î nekarîbû serxwebûnê pêk bîne û piştî salên 2000'î bi şûn de jî nekarîbû ew forma otonomiyê ya armanckirî jî bi cih bike. Di van şertan de, alternatîfa herî sereke ya derket holê ew bû ku bi mizakereyan encamek bê bidestxistin. Vê rewşê kir ku siyaseta parlamenter a legal jî derkeve pêş.

Di vê merheleyê de feyde bi nirxandina şertên derketina holê yên HDP'yê û ya pêşengiya siyasî ya kurdan nemaze şopandina siyaseta wê ya rêya sêyem a di dema protestoyên Parka Geziyê û piştî wê de, heye. Di wexta protestoyên Parka Geziyê de tevgera siyasî ya kurdî di nav xwe de yek ji wan bêqerariyên herî cidî jiya. Ji lew re, ji aliyekî ve ji bo çareseriya kêşeya kurdî ya ku ji qirnekê zêde bû didomiya pêvajoya diyalogê dimeşand ji aliyê din ve partiya desthilatê AKP ku li ser navê dewletê ev pêvajo dimeşand û Erdogan ê ku serkêşê wê bû, bi mixalefeteke pir cidî û mafdar re rû bi rû mabû (Wallerstein, 2013). Di çavkaniya vê rewşa dudiliyê ya tevgera kurdî de, asêbûneke wê ya di navbera mizakereya bi AKP'yê re û bi mixalefeta civakî re hebû ku dixwast bibe parçeyekî wê mixalefetê. Çendî ji nav tevgera kurdî beşdariyeke cidî li Geziyê çêbûbû jî, lê biryargirên siyasî yên kurd xwedî wê endîşeyê bûn ku dê ev protesto ji aliyê aqilê dewletê yê kemalîst ve li bin kontrolê bên hildan (Milaqet, Bruksel, 11.05.2014). Ji îhtimaleke wiha ya bê ka ev dê çi qas rast be bêhtir, hebûna vê endîşeyê li ser çêkirina pozîsyona dudiliya tevgera siyasî ya kurdî xwedî bandor bû. Li herî dawiyê ev bêbiryariya hanê, bi midaxeleya Ocalan, ku wî di 29 Tebax 2013'an de hevdîtin bi Heyeta Îmraliyê re ya ku ji meşandina pêvajoya çareseriyê erkdar kiribû, hinek be jî çareser bû. Ev rewş dê bi awayê "Me li Geziyê şaşî kir" vebeyiya gotinên yek ji kadroyên pêşeng ên PKK'yê Cemîl Bayik (Hamsîcî, 2013). Ji vê bi şûn de, ji bo pêvajoya çareseriyê xeta meşandina hem têkoşînê hem jî mizkareyê ya di heman demê de, hîn bêhtir şênber û berbiçav bû. Di bingeha vê xetê de feraseta xêzkirina rêya sêyem hebû da ji teşebusên amrazîkirina mixalefeta siyasî ya birêxistî ku kurd jî tê de, xizmetê ji AKP û aqilê dewletê yê klasîk re neke ku ew ji bo avakirin an jî domandina desthilata xwe di vê çarçoveyê de tev digeriyan. HDP tam jî li ser zemîneke wiha ya civakî û siyasî bi armanca mixalefeta civakî di çarçoveya herî berfireh a pevretiyan de bi rê bixe, hat aşopîkirin (Burç, 2019; Kaya, 2019). Partî, ku dê tecrubeya xweseriya demokratîk a ku di pêşengiya Kongreya Civaka Demokratîk (KCD) de hewl dihat dayîn bê organîzekirin di nav sîstema dewletê de temsîliyeta wê pêk bîne, bi xwebirêxistinkirinên mîna HDK'yê jî îcar bi îdiaya ku beşên civakê yên herî berfireh temsîl bike, dê tev bigeriya. Piştî vekirîbûna demokratîk a nispî ya ku pêvajoya çareseriyê ew mimkin kiribû, bi feraseta kirina siyaseta dînamîk re bi yek bû, ku HDP'yê ew ji berxwedana Geziyê wek mîras wergirtibû, pêşî di hilbijartinên serokkomariyê yên sala 2014'an de û paşê jî di hilbijartinên giştî yên Hezîrana 2015'an de, HDP gihîşt asteke bilind. Lê belê ya esas HDP, ku ew li gorî şertên lihevnexistin û mizakereyan hatibû sêwirandin, li dijî lihevxistinên leşkerî yên giran ên ku piştre qewimîn û li dijî tehde û pestên koalîsyona

dewletê, xwedî repertuwareke berxwedanê ya sînorkirî bû.

Pêvajoya çareseriyê ji ber berxwedana li dijî wê ya di nav dewletê de, pêla neofaşîst a neteweperwer a kurewî û li dawiya veguherînên herêmî bi dawî bû. Di serî de, beşeke cidî ya ku di nav dewletê de bi awayekî qismî bi binyada fethulahî re di nav koordînasyonê de bû, li dû tedbîrên hîn sert bû. Di serî de, wekî li Parîsê kuştina sê siyasetkarên kurd ên jin, mimkin e mirov vê di gelek pratîkan de yên wekî wan kiryarên ku bi mebesta xerakirina pêvajoyê hatine kirin, bibîne. Bi taybetî di sala 2014'an de, têkiliya ku hikûmeta AKP'yê bi "dewleta berê" re piştî hevdîtinên bi girtiyên doza Ergenokonê re -ku piştre wan beraet kiribû- danîbû, çawan kir ku di nîvê duyem ê salên 2010'an de koalîsyona dewletê ya neteweperest bê avakirin, yek ji encamên herî sereke yên bidawîhatina pêvajoya çareseriyê bû.[33] Di hilbijartinên Hezîrana 2015'an de piştî AKP'yê li meclisê piranî ji dest da û teweciheke cidî ji HDP'yê re çêbû, dibe ku ev yek li cem AKP'yê wek sedema pratîk a qedîna pêvajoya çareseriyê were dîtin. Ji lew re berdewamkirina pêvajoyeke ku dê AKP'yê li desthilatê nehêle, ji bo AKP'yê tu bergindeke wê tune bû. Tevî vê yekê, ji aliyê AKP'yê ve, ew hewla hildana bin kontrolê ya vebeyînên pêla neteweperest a li Tirkiyeyê, ku di asta kurewî de bi pêş diket û wê dixwast desthilata xwe bidomîne, dabaşa mijarê bû û koalîsyona dewletê ya çêkirî jî ji qeyrana hegemonyaya global sûd wergirt û heta dawiya salên 2010'an bi rêjeyeke zêde karî vê bi ser bixe. Di Hezîrana 2015'an de teqîna bombayên di mitîngên hilbijartinê yên HDP'yê de, di encama êrîşa bombeya zindî de ya ku di Tîrmeha 2015'an de li dijî ciwanên sosyalîst ên dixwast alîkariyê ji Kobaniyê re bibin hatibû kirin û 34 ciwan hatibûn kuştin û 104 kes jî hatibûn birîndarkirin, li Çiriya Pêşîn a 2015'an di encama êrîşa bombaya zindî de ku li Enqereyê li dijî mitîngeke aştiyê katibû kirin û 102 kes hatibûn kuştin û ji zêdetirî 500 kesî hatibûn birîndarkirin, ji bilî van li kuçe û kolana bi destê hêzên dewletê nemimkinkirina meşandina mixalefeta siyasî, ew pêngavên sereke ne ku wan kir pêvajoya çareseriyê di pratîkê de biqede, di hilbijartinên Çiriya Paşîn de AKP ji nû ve li meclisê piraniyê bi dest bixe û vê rejîma ku em tê de ne jî amade bike.

Yek ji hêmanên sereke ku bûye sedema bêencambûna pêvajoyê jî, avanekirina mekanîzmeyeke çavdêriyê ya siyasî ye. Çendî der barê vê de hin daxwaz û şirove hatibin kirin ku DYA yan jî YE dikare bi vê rolê rabe jî, lê di encamê de ev yek pêk nehat. A rast ji aliyê cîhana Rojava ve, eger lihevxistinên li Tirkiyeyê bigihîşta çareseriyekê dê ji wan re rihetiyekê çêkira. Ji lew re DYA di serî de ku ew bi hêzên

---

[33] Ez vê deranînê dispêrim daxuyaniyên siyasetkarekî kurd ê ku ew bi xwe rasterast beşdarî pêvajoya çareseriyê bûbû ku min di Tîrmeha 2019'an de li Almanyayê pê re hevpeyvînek kiribû. Jixwe heman siyasetkarê ku berî niha di demên berê de daxuyaniyên mîna vê yên ku ji raya giştî re kiribûn hîç nehatin redkirin.

kurdên li sînorên başûr ên Tirkiyeyê re di nav têkiliyeke hevalbendiyê de dixebitin, ji bo hêzên cîhana Rojava çarserbûna kêşeya kurdî ya li Tirkiyeyê dê di radeya yekem de xizmetê ji berjewendiyên Rojava re bikira. Lê ev yek ji ber binyada navxweyî ya koalîsyona dewletê ya li Tirkiyeyê, hewla Erdogan a ku dixwast bi çi awayî be li desthilatê bimîne û avrasyayî di serî de çêkirina îtifaqa bi xetên neteweperest ên kemalîst re, ev yek mimkin nebû. Di serî de "krîza penaberan", ji ber gelek mijaran ku DYA û YE'yê di şexsê Erdogan de tim tawîz dan vê koalîsyonê jî, roleke wisan leyîst ku wê hem krîza xwe hem jî krîzên li Tirkiyeyê kûrtir kir.[34]

Li gel vê, ya rast hema bibêje ji ber ev pêvajo bi temamî di nav aktorên siyasî de hatiye sêwirandin û ji ber ku daxiliya gelan, grupên siyasî û beşen civakî yên cuda, bi awayekî sînorkirî hatiye hiştin jî, vê yekê kir ku pêvajoya çareseriyê ji aliyê civakî ve bêparastin bimîne (Sunca, 2016). Ji lew re ji bilî wan elîtên siyasî yên ku li jorê mizakere dimeşand bê ka çi diqewime, haya pir kêm kesan hebû. Ango asta beşdariya ku dê parastina pêvajoyê dabîn bike, di tu dewra pêvajoyê de nehat dîtin. Di vê dewrê de bêyî ku PKK li dijî dewletê dev ji têkoşînê berde û ji bo ku armanca vê têkoşînê bi aştiyeke rûmetdar û bi azadiyê aşopî bike hewl dida da ku terazeke mizakereyê çêke. Sedema hewldana PKK'yê ku lê dixebitî têkoşîn û mizkereyê di heman demê de aşopî bike û di etaba pêşî de bi tenê mizakere û di ziviranoka dawî de jî bi taybetî di pey îlankirina xwebirêvebirinan re, bi giranî di xeta têkoşînê de bimîne, dîsan ji ber yek ji wan faktorên giring bû ku pêvajo bi awayekî li ser rêya xwe bi cih nedibû. Nemaze bi dawiya sala 2015'an re ew ragihandina qedexebûna derketina kuçeyan û bi îlankirinên xwebirêvebirinê re, birina lihevxistinan a li navendên bajaran, kir ku dewreke pir tarî çêbe ku di wê dewrê de bi sedan sivîl hatin kuştin, bi deh hezaran mirov ji cih û warên xwe hatin kirin û navendên bajaran bi topan hatin hingaftin.[35]

Pêvajoya çareseriyê û piştî wê, di qada siyasî ya kurdî de encamên ku qada civakî jî bişêwîne çêkirin. Ew awayê pêkhatina li qada siyasî ya kurdî ya westabûna civakî, ku me li jorê ew wek çavkaniya demdirêj a dînamîkên serhildanê yên li giştiya herêmê nîqaş kiribû, bi pozîsyona "kêmar"a kurdan ku ew tim wek kêşeyekê dihat îfadekirin û bi awayekî giştî bi mizakerekirina wê ya bi şidetê ve eleqedar bû. Ev yek rasterast

---

[34] Di hinek hevpeyvînan de, ku min bi kesên nêzî PKK'yê re kirî, bi taybetî bi palpiştiya vê xala dawî, anîna ser zimên a mijareke tekrarbûyî tiştekî sûdwer e. Li gorî vê ranêzikiyê, DYA û YE, di serî de Tirkiye bi awayekî dîrokî tim helwesta wan a çaresernekirina kêşeya kurdî hebû. Çendî ne pêkan be ku nîqaşa vê tesbîtê li vir bi awayekî kûrane bê kirin jî, hewce ye bal li vê rewşa bê kişandin ku di siyaseta kurdî de bandoreke wê ya qismî ya avaker heye.

[35] Ji bo raporên li ser binpêkirina mafên mirovan *bnr.* TIHV, 16 Ağustos 2015 – 20 Nisan 2016 Tarihleri Arasında Sokağa Çıkma Yasakları ve Yaşamını Yitiren Siviller. 2016. https://tihv.org.tr/16-agustos-2015-20-nisan-2016-tarihleri-arasinda-sokaga-cikma-yasaklari-ve-yasamini-yitiren-siviller/ (erişim: 23.06.2016).

wek westabûneke şer vebehiya kurdan. Pêvajoya çareseriyê, piştî pêvajoya Osloyê bi dawî bû bi şûn de, piştî gurbûna lihevxistinên di navbera gerîlayên PKK'yê û leşkeran de, nemaze yên li salên 2011 û 2012'an, hinek jî bi awayekî surprîz hat ragihandin. Vê îhtimala qedîna şer, tevî şoreşa li Rojava ku xuyabariya kurdan a herêmî û cîhanî derxist gopîtka herî jor û bipêşketina HDP'yê bendewariyeke mezin, kelecan û hêviyek çêkir. Hevdîtinên ku sê salan dewam kir, ji ber li Bakur kalîteya jiyanê û ewlehiyê bi qasî ku berê qet çênebûye hîn xweştir kir, li gorî alternatîfên din bû sedem ku çareseriyeke hatiye mizakerekirin bibe vebijêrkek. Ji ber diyalog tam negihîştibû merheleya mizakereyê û atmosfera siyasî jî xeternak bû, tim îhtimala qedîna pêvajoya çareseriyê hebû loma dikare bê gotin ku vê yekê wekî şer qediyabe di asta civakî û siyasî de rehawetek çêkir. Bêguman çendî di pêkhatina vê rihetiyê de wê îradeya siyasî, ya ku her du aliyan bi kar aniye, rola domînant leyîstibe jî, di mehneya berteng de saziyên civaka sivîl û di mehneya berfireh de tevger û beşên sivîl jî di vê dewrê de (ji bilî hin awarteyan) tenê bi nivîsîna raporan û bi organîzekirina civînên bi siyasetkaran re sînordar man. Ji ber vê yekê, ew texrîbata li Bakur a lihevxistinên ku ji nû ve qewimîbûn, herî hindik bi qasî hêviya ku îhtimala aştiyê ew çêkiribû, mezin bû.

Wek encam em dikarin diyar bikin ku ji ber pêvajoya çareseriyê di qada siyasî ya kurdî de tecrubeyek çêkiriye, nîşan da îhtimala aştiyê ya di nav sînorên Tirkiyeyê de bi xwe jî, ku herî kêm nîvê nifûsa kurdan a li herêmê lê dijî, hem ji ber pozîsyona Tirkiyeyê ya herêmê hem jî ji ber pozîsyonên dîrokî, îdeolojîk û polîtîk ên têkoşîna azadiyê ya li vir dê bikaribe veguherînên pir cidî pêk bîne. Wekî di salên 2000'î de, di salên 2010'an de jî bi teknolojiya aştiya lîberal a serlêdayî çareseriya lihevxistinê dîsan bêencam ma. Lê belê ev diyalog bû pêvajoyeke wisan ku ji du aliyan ve raserast encam hilberand. A yekem, ji ber xeta konfederal a demokratîk beşên cuda yên civakî û siyasî li cem hev hiştin û hewl da ku xeta aştiyê bihone, loma ev bû dewreke wisan ku xeta enternasyonalîst a qada siyasî ya kurdî xurt bû. Ya duyem jî stratejiya rêya sêyem ku ji aliyê tevgera kurdî ve dihat sepandin (ji xeta berxwedanê ya li Rojava bi awayekî cuda), wek stratejiya pêkanîna azadiyekê ya li ser esasê diyalogê bilind bû. Lê belê tundiya şerê ku ji nû ve dest pê kir û bi Bakur sînorkirî nema, sînorên vê stratejiyê jî nîşan dan. Bi taybetî ji nîvê duyem ê salên 2010'an pê de çêbûna nîvenga (rewşa) pest û tehdeyan, cezakirin, qetliamên komelî yên li bodrûmên avahiyan, bi rêbazên zordarane yên wekî tayînkirina qeyûman û hildana parêzbendiyê, elemînekirina hilbijartiyan û gelek pratîkên mîna wan, kir ku di navbera qadên siyasî û civakî de mesafe zêde be.

***Referandûma serxwebûnê ya Birêvebirina Herêmî ya Kurdistanê***

Birêvebirina Herêmî ya Kurdistanê di meha Nîsana 2017ân de ragihand ku dê referandûma serxwebûnê pêk bîne. Di referandûmê de ku di meha Îlona heman salê de çêbû, piraniyeke zêde ya bi rêjeya %92 di leha serxwebûnê de deng bi kar anî. Lê

belê ber bi dawiya meha Çiriya Pêşîn li hemberî hêzên Heşdê Şebî ji destdana Kerkûkê ku berê ji DAÎŞ'ê hatibû azadkirin, di encama vê de ji ber ku di navbera PDK û YNK'yê de nakokî derketin û di encama helwesta tund a aktorên kurewî yên li dijî vê, encamên referandûmê hatin îbtalkirin.[36] Îradeya demokratîk a gelek zêde ku ji bo serxwebûnê derketibû holê, dawiya dawî bêencam ma. Encamên referandûma serxwebûnê, ji ber bertekên li dijî vê çêbûn û ji ber van bertekan jî têra xwe peşk li yekîtiya ku li hundir jixwe tune bû xist, kir ku di qada siyasî ya kurdî de bandorên mayînde bên çêkirin.

Bi palpiştiya hevpeyvînên min kirî, di rêya çûna ber bi referandûma serxwebûnê de ez dikarim ji sê vekirîbûnên siyasî yên sereke behs bikim. A yekem û mihtemel a herî giring ew baweriya serdest a li meheleya kurdan û tevgera siyasî ya xwedî xeta neteweperwer a hebûna vekirîbûnekê ye ku kurd gava di şerê li dijî DAÎŞ'ê de derketin pêş, wan xwast encamên têkoşîna xwe ya hem li Başûr hem jî li Rojava bi serxwebûnê tacdar bikin (Milaqet, Silêmanî, 22.09.2019). A duyem, bi taybetî bi bandora referandûma katalanan ku di heman demê de hat kirin, îqnabûna birêvebirina Başûrê Kurdistanê ya bi wê vekirîbûnê ku ew di asta kurewî de jî heye.Ya sêyem, bi taybetî Mesûd Barzanî ji bo rê li asêbûna xwe ya siyasî veke, li gel ku bi binpêkirina qanûnên xwe yên navxweyî jî dixwast berdewamî bide serokatiya xwe, amrazîkirina bêrîkirina serxwebûnê ya kurdan e. Ew serxwebûna ku kurdan ji qirnekî zêdetir e ji bo çareserkirina pirsgirêkê xwe wek çareyek didît, li herî dawiyê bi van her sê faktoran re gihîşt hev û bi her beşê re wê îdrakê xurt kir ku divê êdî ev yek pêk were. Lê di demeke kurt de hat fehmkirin ku ne di mistewiyeke jeopolîtîk de ne jî ji aliyê amadehiyên sazûmanî û civakî ve, zemîneke vê heye.

Di çarçoveya têkiliyên aktorên siyasî yên Başûrê Kurdistanê yên bi der ve re, dikare bê gotin ku "têkiliyên baş ên PDK'yê bi Tirkiyeyê re û yên YNK'yê jî bi Îranê re hene. Her wiha welatîtiya îngilîzî ya beşeke mezin a birêveberên xuyanî yên YNK'yê û welatîtiya DYA'yê ya qisimekî cidî ya birêveberên PDK'yê heye. Ev, rewşeke pir giring e ku têkiliyên di navbera wan de nîşan dide" (Milaqet, Silêmanî, 24.09.2019). Lê belê, li gel van têkiliyan jî, serxwebûna li ser mistewiya jeopolîtîk, ji bo her çar dewletên qada siyasî ya kurdî ne rewşeke qebûlbar e. Ji lew re ew helwesta ku koalîsyona AKP-MHP'yê û rejîma îslamî ya Îranê, bi taybetî hemen piştî referandûmê û di pey wê re, li dijî birêvebirina Başûrê Kurdistanê nîşan da ev yek bi awayekî aşkera da xuyakirin. Tevî vê, ew hêzên Heşdî Şebî yên pêwendîdarê Îranê û bi birêvebirina navendî ya Iraqê

[36] Li vir divê cext lê bê kirin ku gerîlayên PKK'yê jî tê de gelek hêzên leşkerî çûbûn alî parastina Kerkûkê û ji ber ev rewş dê ji aliyê afirandina ruhê kurdistanî ve bibûya fetiloneke pir cidî lê wek firsendeke jidestdayî ma. Çendî beşek ji pêşmergeyên YNK'yê di nav zincîra emir û komutayê de vekişîbin jî lê wek rêje beşeke kêm ji wan li gel gerîlayên PKK'yê ji bo demeke kurt be jî berxwedanek kir.

re koordîne ne, gava Kerkûk û Şengal dorpêç kirin û li encamê bêyî rastî berxwedaneke mezin werin kontrola van deran xistin bin destê xwe jî, rasterast bi vê ve eleqedar e. Dîsan di mistewiya jeopolîtîk de (ji bilî desteka rabêjiyî ya Îsraîlê), di serî de DYA û Rûsya, tu hêzek ne alîgirê dabeşbûna Iraqê bû. Her wiha, ew binyada dumendî ya birêvebirina li Başûrê Kurdistanê, ku me di beşa borî de bi kitekit ew nîqaş kir, dabeşiya kûr a di navbera herêmên PDK û YNK'yê de û ew rewşa pêşmergeyan a ku di navbera du hêzan de hatî dabeşkirin, jixwe dida nîşandan ku li hundirû ji aliyê leşkerî, civakî û siyasî ve zemîna pêkhatina vê tune ye. Bi birêveberina Başûrê Kurdistanê re, ku di rêya bi armanca serxwebûnê pê de çûbû erd ji dest dabû, çendî piştre hewl da bi dewletên dorhêlê re têkiliyên xwe tamîr bike û ji xwe re rêya çareyê peyda bike jî, hem di asta civakî hem jî di ya siyasî de bipaşketineke cidî lê rûda. Li gel van yekan, divê bê diyarkirin ku di serî de li Bakur, gelek aktorên siyasî yên kurd li dijî awayê meşandina siyaseta serxwebûnê ya li Başûr rabûn. Ev rewş, bi vî awayî di gotinên aktîvîstekî de, ku li Hewlêrê min pê re hevdîtin kiribû, xwe dida der: "Feraseta ku Kürdistan ji Başûr mezintir e giring e û xeteke sereke ye ku divê cihgir bibe. Gava [Başûrê Kurdistanê ya xwedî nifûsa] 5 milyonî azad be nabe [gelê kurd ê xwedî] 40 milyonî bi awayekî kole bijî. Divê baş bê zanîn ku ew her du malbatên [serdestê] 5 milyonî nabe derbe li azadiya Kurdistanê bixin" (Milaqet, Hewlêr, 11.10.2019).

Di wê demê de gava pêşnimaya ewilî ya vê xebatê dihat amadekirin, zêdetirî sê hezar mirov ku piraniya wan kesên ji Başûrê Kurdistanê bûn, hewl didan ji ser sînorê Belarûs û Polonyayê wek penaber derbasî nav axa Yekîtiya Ewrûpayê bibin. Ma ev çawan dibû ku mirov lê dixebitîn ji Başûrê Kurdistanê birevin ku tecrubeya wê ya sî salî ya azadbûyînê hebû. Koçberekî kurd ê ku li ser sînor bi rojnameger Kamal Chomani re der barê vê de dipeyivî digot ku «îdareya malbatên mafyayê ev sî sal e ku gelê me kiriye mehkûmî birçîbûnê. Em tim gava ji bo mafên xwe derketin kuçe û kolanan em hatin girtin, em hatin qutifandin û melisandin, me lêdan xwar.»[37] Gava ev rewş didomiya, ji ber birîna bursa xwendekaran, ji Silêmaniyê bi slogana "ez şoreşa mîdeya vala me" protestoyeke mezin a xwendekaran dest pê kir û berbelav bû. Her du partiyên serwer ên li Başûrê Kurdistanê, ku der barê gelek mijaran de li hev nakin, lê der heqê bi şidetê serkutkirina protestoyên xwendekaran de li hev kir û di medyaya bin kontrola xwe de, dîsan bi xwendekarên pêwendîdarê xwe re civîn li dar xistin û wan hewl da ku dîmeneke demokratîk a nîqaşê bidin nîşandan. Lê bi şêweyeke îronîk, di heman demê de li derve protestoyên xwendekaran didomiyan. Wexta ev li pêş çav bên girtin dê bê dîtin ku ew "westabûna şoreşger" di analîzên salên 2000'î de dihat nîqaşkirin êdî cihê xwe daye neguheriyeke cidî û di asta civakî de jî cihê xwe ji bêhêvîtiyekê

[37] *Bnr*. https://newlinesmag.com/reportage/why-are-iraqi-kurds-fleeing-to-europe/ (erişim: 23.11.2021).

re hiştiye. Bi awayekî herî xuya zemîna ku bêhêvîtî lê tê dîtin ew rewşa hanê ye ku mirov ketine halekî wisan, qerisîn û cemidîna ji ber sermayê jî didin pêş çavê xwe û ji Başûrê Kurdistanê direvin. Awayê tepeserkirina tevgerên li kolanan jî, ji ber rê li ber îhtimalên veguherînê dixitimîne, yek ji wan sedemên herî sereke ye ku em dikarin vê di çavkaniya bêhêvîtiyê de bi cih bikin ku ew dibe sedema koçkirinê. Ew rêgeha ku Tevgera Goran xêz kiriye ji vê yekê re nimûneyeke aşkeraker e bê ka guherîna vê rewşa hanê ya bi rêya siyaseta demokratîk a temsîlî çi qas zor e. Tevgera Goran ku di sala 2009'an de xurt û mezin bû, di bin pêşewatiya Newşîrvan Mistefa de hat damezirandin ku wî di hilbijartinên pêşî de li berxwedana li Başûr jî pêşengî kir û ew YNK'yiyê berê û ji aliyê gel ve jî yekî naskirî û hezkirî bû. Di esasê xwe de ew li ser gendelîtiya zêde û rexneya li nakokiyên pergala du partiyî ya li Başûr mezin bû. Çendî di hilbijartinên 2014'an de serkeftineke nispî nîşan dabe jî “der barê gendelîtiyê de sozên ku dê nikaribe bîne cih da”, lê belê bi taybetî di sala 2017'an de piştî mirina Newşîrwan Mistefa “bû parçeyek sîstema ku lê rexne digirt û bi rêjeyeke mezin hêza xwe ji dest da” (Milaqet, Silêmanî, 24.09.2019). Ev rewşa li Başûrê Kurdistanê, di wê rêya hanê de ya ku bi armanca azadbûyînê lê dihat kudandin, di mercên Rojhilata Navîn de gumanên zêde yên ku bê ka elîtên birêveber ên serwerê dewletê dê çi qas bikarin bibin demokrat û dê çi qas bikarin berjewendî û endîşeyên gel jî, vedibeyîne.

Wek encam em dikarin diyar bikin ku hedefa serxwebûnê ya statuya siyasî ya li Başûrê Kurdistanê hatiye bidestxistin, tevî rastî û şaşiya xwe, xêr û gunehê xwe ku ew berhema têkoşîna zêdetirî sed salî ye, herî dawî li wê blokaja jeopolîtîk asê bû ku înşaya dîrokî û siyasî ya herêmê ew afirandibû û qet nebe heta vebûna deriyekî firsendê bêencam ma. Ango “referandûma serxwebûnê tetikeke wisan kişand ku hemû aktorên siyasî yên li herêmê li dijî kurdan bûn yek” (Milaqet, Silêmanî, 24.09.2019). Ev yek ji salên 2000'î pê de ji bo nîşandana sînorên jeopolîtîk ên xeta neteweperwer a kurdî ya klasîk tiştekî hînker bû ku ev yek ji du xetên diyarker ên îdeolojîk-polîtîk ên qada siyasî ya kurdî ye. Ji lew re lihevxistina neteweperweriya kurdî ya ku bi armanca netewe-dewletê tev digere, bi neteweperweriyên din re, bi taybetî neteweperweriya parçeyî ya mîna Başûrê Kurdistanê ku hepsî bejahiyê (ku li deryayê venabe) bûye, sînorên bêrîkirinên wê yên siyasî nîşan dan. Li gel vê, ew binyada siyasî ya ku li Başûrê Kurdistanê li ser serweriya du binemalan hatiye damezirandin, di nav xwe de bi gelek pirsgirêkên ku ji ber refah û azadiya welatiyên wê diqewime, mijûl dibe.

***Dagirkirina Şengalê û jenosîda êzdiyan***

Êrîşa li Şengalê ku ji aliyê DAÎŞ›ê ve hat kirin, ji ber li qada siyasî ya kurdî hem jenosîd û koletî ji nû ve da jiyandin hem jî ji ber ku piştre di navenda nakokiyên mezin ên siyasî de rol wergirt, yek ji bûyerên herî sereke yên salên 2010›an bû. Piştî pêşmergeyên PDK›yê di encama fermaneke navendî de, ji ber teşebusa dagiriya

Şengalê ya DAÎŞ›ê ya di Tebaxa 201›an de ji herêmê vekişiyan, ev yek bû pêngaveke wisan ku wê rê ji jenosîdê re vekir. Li Şengalê ku tu mekanîzmaya wê ya xweparastinê nemabû, di dawiya teşebusa jenosî de ku mêr hatibûn kuştin û jin jî wek kole hatibûn desteserkirin, li herêmê cih û warê êzdiyan ket rewşeke gelek biçûk. Bi êrîşên pêşî re, nifûseke nêzî 50 hezarî ku xwe avêtibûn Çiyayê Şengalê jî, bi saya korîdora ku gerîlayên PKK, YPG û YPJ›yê ew vekiribû, bûn xwedî şansekî wisan ku bikarin derbasî Rojava bibin. Di 2017'an de, di encama operasyona leşkerî ya hevpar a gerîlayên PKK'yê û pêşmergeyan de, piştî ku DAÎŞ ji Şengalê vekişiya rehendên wêraniyê hîn bêhtir xuya bûn: Bi hezaran zarok û jinên hîn jî winda, gorên tomerî yên ku tên vedîtin û civakeke ku bi rêjeyeke mezin ji cih û warên xwe hatiye derkirin. Aktîvîstekî êzdî yê ku li Almanyayê mezin bûbû û di 2019'an de bi heyeteke ku ji Almanyayê hatibû û jê berpirs bû hewl dida biçe Şengalê, ev rewş wiha derdibirî: "Ku miletê êzîdî nizanibe xwe biparêze, tu kes wan naparêze", ango eger gelê êzdî nizanibe xwe biparêze/vê hîn nebe, kes jî wan naparêze. Ew her sê teşebusên me yên ji bo çûna Şengalê, ji aliyê PDK, Hikûmeta Navendî û hêzên bi ser Heşdê Şebî ve hatin astengkirin, ku gava jenosîd dihat kirin ew ne li wir bûn. Ji ber ku hêzên PKK'yê bi armanca yekîneyên xweparastinê li Şengalê çêkin li wir bi cih bûn û PDK jî li dij vê rabû, vê rewşê kir ku ev der bibe cihê çêkirina desthilatekê. Bi taybetî Tirkiye gava ku DAÎŞ'ê li vir jenosîd pêk dianî tu gavek jî neavêt, lê bi mebesta PKK'yê ji van herêman paqij bike tim serî li gefên leşkerî dida û car caran bi balafirên şer ên leşkerî û dronanan ev der bombardiman dikir, ji bo birêvebirina PDK'yê jî wek mazeret hat nîşandan ku divê PKK ji van deran derkeve. Beşên raser ên êzdiyan, ku wek civakî tebeqeyî bûne hîn bêhtir bi PDK'yê re di nav têkiliyan de ne, lê beşa rajêr ku ew bêhtir bi awayekî rasterast duçarî jenosîdê bûne îcar ji ber rola PKK, YPG û YPJ'yê ya di parastina Şengalê de, hîn bêhtir nêzî vê xetê disekinin.

Wek encam, ew tecrubeya tehl a ku li vir derket rastê, giringiya xweparastinê ya di nav qada siyasî ya kurdî de xwe bi awayekî aşkera careke din nîşan da. Ji lew re kurdan di nav van şertan de, di encama jenosîdeke biêş û tehl, koletî û devjêberdana warê xwe de dît ku ne bi hêzên herêmî û kurewî ne jî bi elîtên siyasî yên kurdên ku bi awayekî bi wan re di nav têkiliyên pêgiriyê de ne, bawerî bi wan tê. Tevî vê, piştî Şengal hat azadkirin bi şûn de ew berberiya ku di navbera PDK û PKK'yê de xuya bû, ev yek bû yek ji îxtilafên giring ên qada siyasî ya kurdî.

***Midaxelekeriya Tirkiyeyê, Rojava û Başûr***

Di salên 2010'an de, yek ji faktorên herî sereke jî ku dînamîkên qada siyasî ya kurdî diyar dike midaxelekeriya Tirkiyeyê ye. Ev midaxele, di dereceya pêş de ne li dijî PKK an jî tevgerên kurdî yên ku ew difikire bi PKK'yê re pêwendîdar in û ew wan ji xwe re dijmin dihesibîne, bi wateya berfireh gelek îşaretên hene ku nîşan didin ew li dijî qada

siyasî ya kurdî ye.

A rast divê li çavkaniya vê midaxelekeriyê polîtîkaya derve ya herêmî ya Tirkiyeyê bê bicihkirin ku ew bi AKP'yê re guherî. AKP, hin cure referansên ku ji serdema Ozal dewr wergirtibû, di xeta osmanîtiya nû de bi yek kirin û eger li herêmê nebe hegemonyayek jî ket nav hewldana da ku bikare nifûzekê çêke. Rehenda rabêjiyî ya vê hewlê, wekî di beşên din de jî hat nîqaşkirin, çendî di nuqteya zindîkirina baqiyeya osmanî û bipêşxistina têkiliyên baş ên bi binyadên vir re bû jî, lê di pratîkê de ya rast teqabulî projeyeke neo-emperyal dikir. Qada siyasî ya kurdî jî bi awayekî siruştî ji vê yekê ne serbixwe bû. Bi palpiştiya hevdîtinên ku min bi siyasetkarên mensûbî partiyên cuda kiribûn, ez wisan difikirim ku dikarim vê midaxalekeriyê di du dewrên dîrokî de vekolim. Ev midaxelekerî bi taybetî di salên 2000'î de hîn bêhtir bi hêza nerm, di nîvê duyem ê salên 2010'an de jî rasterast bi rêbazên leşkerî hat domandin. Çendî rêbazên pêkanîna vê projeya neo-emperyal, di dewra yekem de, nemaze di çarçoveya Başûrê Kurdistanê de hîn zêde bi rêyên dîplomatîk û bazirganiyê bûn jî, lê di dewra duyem de bi taybetî bi azadbûna Rojava û li Tirkiyeyê jî bi avabûna koalîsyona dewletê ya neteweperest re ev yek rasterast li midaxeleyên leşkerî dageriyan.

Ji salên 1980'yî pê de di çarçoveya Başûrê Kurdistanê de, bi navê operasyonên li dijî PKK'yê midaxeleyeke timî dabaşî mijarê bû, lê belê ji nîveka salên 2010'an pê de ev rewş gihîşt wê nuqteyê ku êdî qereqol û xalên leşkerî bên avakirin. Ango li herî dawiyê, ne tenê li dijî PKK'yê, di heman demê de em dikarin ji hebûneke timî ya leşkerî behs bikin ku dikir ziyan bigihîje hem can hem jî malê gelê li herêmê, teraza ekolojîk xera bike û şewatan jî wek amraz bi kar bîne. Kargêriya Başûrê Kurdistanê jî, ji ber asêbûna xwe ya aborî û siyasî û her wiha nemaze ji ber têkiliyên baş ên ku birêveberên PDK'yê bi AKP û bazirganên nêzî wê re bi pêş xistine, ne di rewşeke wisan de bû ku bikare li dijî vê yekê rabe.

Ji ber Rojava ya rast midaxele, di serî de DAÎŞ bi rêya rasterast an jî bi çavlêgirtina li hêzên cîhadker bi kirina alîkariyan, ji şoreşa Rojava pê de tim hebûn. Lê belê piştî li Tirkiyeyê pêvajoya çareseriyê qediya û ji nîvê duyem ê salên 2010'an pê de jî ku şoreşa Rojava dest pê kir sazî û dameziraweyên xwe bi cih kirin, koalîsyona dewletê ku li Tirkiyeyê îslama siyasî û neteweperestan ew çêkir, dest avêt kirina midaxeleyên li dijî Rojava. Bi taybetî koalîsyona dewletê ya di navbera nîşandana helwesteke nelihevkirî ya DYA'yê ya ji ber siyaseta bêîstiqrar a Trump û ji ber hewla Rûsyayê ya ku her firsend bi kar dianî da ku Tirkiyeyê ji NATO dûr bixe, çi gava firsend bi dest xist bi rêbazên leşkerî dest bi kirina midaxeleyan kir. Tirkiye tevî desteka aşkera yan jî ya sergirtî ku dida hêzên cîhadker ên li Sûriyeyê û bombardimanên bi çapanên biçûk, du herekatên mezin pêk anîn. A pêşî di mehên Kanûna Paşîn û Adara 2018'an de herekata li dijî

Efrînê, ya din jî di Çiriya Pêşîn a sala 2019'an de li Serê Kaniyê û Girê Spî pêk anî ku heta 30 km'yî ket kûrahiya van herêman.

Li gel van yekan, di nav vê hemû pêvajoyê de faktorekeke din a ku bi awayekî aşkera tê çavdêrîkirin ew e ku DYA ji aliyekî ve bi Birêvebirina Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê re di nav têkiliya hevalbendî ya leşkerî de tev digeriya li aliyê din jî li Başûr di nav pozîsyoneke wisan de bû ku her cure operasyona leşkerî ya li dijî PKK'yê ya destek dikir yan jî îmkan dida wê operasyonê. Ev rewş di nav têkiliya DYA'yê ya bi Tirkiyeyê re wek qadeke nakokiyê dixuya, ji lew re li bal dilê Tirkiyeyê Birêvebirina Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dirêjekeke PKK'yê bû. Stratejiya li vir a DYA'yê ew bû ku PKK û damezirawîbûna xwebirêvebirinê ya li Sûriyeyê ji hev cuda bike. Ji aliyê rabêjiya xwe ve ku Rojava û PKK du vebeyînên cuda yên heman perspektîfa îdeolojîk in, çendî ne di nav têkiliyeke organîk de bin jî, ev helwesta dumendî ya ku rasterast ji DYA'yê tê, di nav xwe de jî nakokdar bû. Li gorî PKK'yiyan; ew Rojavaya ku bêyî PKK'yê hatiye hiştin ji bo DYA'yê alternatîfeke wisan bû ku dikaribû bihata tercîhkirin û pêvajoya ku hîn jî bi vê armancê didome yek ji kêşeyên herî sereke yên hem PKK'yê hem jî yên Birêvebirina Xweser pêk dianî. Bi kurtasî, nemaze di pêvajoya referandûma serxwebûnê de, gava ev yek tevî helwesta ku Tirkiyeyê wergirtiye bê fikirandin dê bê dîtin ku armanca sereke ya vê midaxelekeriyê ne PKK lê tevahiya qada siyasî ya kurdî bû.

***Rojhilat: Berxwedana sivîl a ku tûj dibe, aktorên siyasî yên ku bêdeng dibin***

Bi palpiştiya hevpeyvînan dikare bê gotin ku di salên 2010'an de li parçeyê Rojhilat ji aliyê destkeftiya berbiçav ve veguherîneke cidî çênebûye lê belê di nav civakê de ew pêla protestoyê ya bilindbûyî mezin bûye. Ew protestoyên ku li qadên wekî ekolojiyê jî li tevahiya Îranê berbelav bûye (mînak, Hassaniyan, 2021), beşdariya herî gur a ku li wan deran çêbûye, di serî de bajarên kurdan in. Ev protesto hem ji ber ku bedêlên aboriya bi sedema ambargoyê her diçû qels diket bi beşên berfireh ên civakî dihat dayîn hem jî bi wateya hîn berteng ji ber ku kesên ji bo mafên kurdan xebatek dikir dihat îdamkirin, li dijî vê yekê dihatin lidarxistin. Li dijî protestoyên pir mezin û li her derî belave dibûn, ji şideta ku rejîmê ew bi kar dianî kurd jî têra xwe bandordar bûn. Gava ev protesto hîn jî didomiyan, di encama pêvajoyên jeopolîtîk de ew hêviya têkildarî dagerîn û veguherînên siyasî ku dê derketa holê, ji wan faktorên sereke bû ku wê protesto motîve dikirin.

Aktorên siyasî yên kurd jî li gorî salên 2000'î pirekî pir di pozîsyoneke bipaşdeketî de ne. Halê hazir partiyên ku di xeta neteweperweriya nerîtî de tev digerin li kampên xwe yên li Başûrê Kurdistanê bi çalakiyên leşkerî û rêxistinî yên sînordar mijûl in ku tesîreke zêde çênakin. Di çarçoveya vê xebatê de, ku min cudahiya di navbera Komala û binyadên cihê yên ji koka PDK-Îranê de pirsî, bi qasî ku aktîvîstekî berê yê endamê

Komalayê diyar kir a rast di navbera van binyadan de hema bibêje tu ferqek nîn e (Milaqet-2, Almanya 28.06.2021). Her wisan, tu projeyeke şênber a ji bo gelê Rojhilat û tu stratejiyeke azadbûnê jî ya van binyadên hanê ku pêşkêş bike nîn e. Di destpêkê de car carinan PDK-Îranê yekîneyên kiryariyê bi rê xistin û li Rojhilat teşebusên wan ên kiryariyên leşkerî pêk hatin, lê belê ev gişt bi îmhabûna yekîneyên şandî bi encam bûn û li têkoşîna azadbûnê jî tu alîkariyeke wan çênebû. Lê belê heman aktîvîst li şiroveya xwe zêde kir ku ji bo ev rewş di çarçoveya dameziraweya şahadetê de berê gelê Rojhilat ber bi xwe de bikişîne û ya rast ku PDK-Îranê dev ji têkoşînê bernedaye, berevajî vê ji bo xurtkirina rabêjiya ku ew ji bo azadbûna kurdan amade ne şehîd bibin, ev yek tên kirin (Milaqet-2, Almanya, 28.06.2021). Eger mirov ji encamên wê bi awayekî rast binirxîne, mimkin e mirov bibêje ev şirove rast e, ji lew re ev partiyên esil-rojhilatî ku li Başûrê Kurdistanê asê bûne û ji ber bêkiryariyê ji aliyê siyasî ve her ku çûye bêqîmet bûne, wisan hinek mimkin dixuye ku ev çalakiyên xwekujiyê/întiharê ku bi awayekî kûrane hatine nîqaşkirin û di pratîkê de ji ber nebûna sepana stratejiyên siyasî û leşkerî ev teşebus hatine kirin.

Tevî vê yekê, bêçalakîtiya PJAK'ê ya ku ji sala 2011'an ve didome, li gel hin oprasyonên sînordar ên mihafizên şoreşê yên Îranê û kiryarên gerîlayên PJAK'ê yên sînordar, bi rêjeyeke mezin berdewam dike. Gava min têkildarî vê mijarê ji siyasetkarî pirsî, diyar kir ku jixwe halê hazir xeta siyasî ya di pêşengiya KCK'yê de hem li Bakur hem jî li Rojava di serî de li dijî Tirkiyeyê li hemberî gelek hêzan di rewşa berxwedanê de ye, li Rojhilat jî vekirina bereyekê dê pir zor be û jixwe dê ev yek ne tiştekî realîst be (Milaqet, Belçîka, 22.07.2021). A rast bi taybetî divê bal lê bê kişandin ku DYA ji bo rejîmê bişehitîne jixwe teşwîqeke wê ya wiha heye. Li gel vê yeka hanê, li gorî salên 2000'î di salên 2010'an de li nav gel çalakîtiyeke siyasî ya PJAK'ê ya ku kêm dibe heye û raseriya rabêjî û rêxistinî ya ku xeta konfederal a demokratîk li Bakur û Rojava bi pêş xistiye di salên 2010'an de li Rojhilat hîn bêhtir bi aktorên siyasî yên kurdên li wir re bi awayê reqabetê derdikeve pêş (Milaqet-1, Almanya 28.06.2021). Gava seyra reqabetkar a xeta ocalanî ya ku li qadên din bi pêş dikeve li ber çav bê girtin, ev yek jî tiştekî femdarî ye.

Li herî dawiyê ji bo Rojhilat mimkin e ji berxwedanake sivîl bê behsikirin ku ew her diçe tûj dibe û li nav paraleliyeke tevgerên protestoyê yên giştiya Îranê geşe bi xwe dide û di esasê xwe de yan ji nebûna stratejiyê (wekî di mînaka PDK-Îranê de) yan jî ji ber sedemên stratejîk (wekî di mînaka PJAK'ê de) bê behskirin ku aktorên siyasî yên kurdan nikarin berginda vê bidin.

Wek encam mimkin e nirxandineke wisan bê kirin ku ji bo qada siyasî ya kurdî di asta civakî de ew hêviya ku zêde bûye û ew tevgerên azadbûyînê yên ku di nîvê duyem ê salên 2010'an de bilind bûne, bi taybetî di nîvê duyem ê heman dehsalê de cihê xwe

hêdî hêdî bi asteke diyar ji bêhêvîtiyê re hiştiye. Bêguman sedema herî sereke ya vê ew rasteqîniya şerê gur e ku hemû qada siyasî ya kurdî tê re derbas bûye. Ji ber di nav şertên şer de, çar dewlet û hêzên derî herêmê li gorî çarçoveya rojeva xwe lê dixebitin ku kurdan beralî bikin û tevgera siyasî ya kurdî jî ajandayeke hevpar çênekiriye, ev rewş di bêmoraliya asta civakî de xwedî dike. Ew faktorên ku di salên 2010'an de aktorên siyasî yên kurdan anîne cem hev  ji hev û din dûr xistine, dibe li nav çarçoveya tehdîdên ku hevpar dibin û berjewendiyên ku ji hev cuda dibin, bên xwendin. Ew mijarên ku aktorên siyasî yên kurdan anîne ba hev, bi piranî bi îdraka gefa hevpar re eleqedar in. Me rewşa vê yekê ya ku bi awayekî herî berbiçav derketiye holê, di biyekbûna li dijî êrîşa DAÎŞ'ê de ya li ser Rojava dît. Dîsan rewşeke mîna vê, her çendî bi awayekî pir cidî bi têkçûn û xemgîniyê bi encam bûbe jî, di xeta parastina Kerkûkê de çêbû ku di destpêkê de PDK, YNK û PKK'yê anîbû cem hev û din. Li gel van yekan divê cext lê bê kirin ku eger rewşeke wisan hebûya ku aktorên siyasî yên kurdan di milê hev de tê dikoşiyan bi awayekî mihtemel dê jenosîda êzdiyan a li Şengalê çênebûya.

Tim hewla aktorên siyasî yên kurdan hebû ku bên ba hev û din. Lê belê ev hewl di salên 2010'an de hîn bêhtir zêde û gur bûn. Nemaze hevdîtin û dîdarên kongreya neteweyî ya kurdî çendî encamek çênekiribe jî wek hewleka cidî xuya bû. Nakokiya sereke ya li vir, a rast çendî lihevkirina li ser mişterekên esxerî ya PKK û YNK'yê û gelek aktorên pêwendîdarên wan an jî ne pêwendîdarên wan dabaşî mijarê bû jî, tevlinebûna PDK'yê ya li vê lihevkirinê ye. Li vir ji sê sedemên sereke yên ku di milaqetan de derketine pêş dikare bê behskirin: (1) Hewla PDK'yê ya çêkirina ji nû ve ya serweriyê ya piştî jenosîda li Şengalê ku di destpêkê de wê biryareke stratejîk hilda vekişiyabû, lidijrabûna vê yekê ya hêzên xweparastinê yên pêwendîdarê PKK'yê û bi behaneya hebûna PKK'yê bi awayekî timî di bin gefan de hiştina van herêman a ji aliyê Tirkiyeyê ve, bû yek ji qeyranên navendî ya qada siyasî ya kurdî. Dînamîkeke mîna vê, nemaze ji nîvê duyem ê salên 2010'an pê de dikare di rabêjiyên manendî hev ên PDK û AKP'yê de bê çavdêrîkirin ku ew dibêjin hewce ye PKK ji Qendîlê derkeve ku ev e hema nêzî çil salî ye PKK li wir bicihbûyî ye. (2) Em dikarin cext li ser rewşeke mîna wê ya hatina wana hemberî hev ji bo Rojava jî bikin, ji lew re rojeva sereke ya ENKS'yê ya pêwendîdarê PDK'yê ew bû ku li Rojava çareseriya fifty-fifty wek şert dida pêş û birêvebirina xweser jî ev aktorên hanê vedixwendin da beşdarî li pergala civakî-siyasî ya ku li Bakurê Sûriyeyê hatiye damezirandin bikin. (3) Ji ber tu mercî nexwastina şehitandina têkiliyên baş ên ku birêveberên PDK'yê bi Tirkiyeyê re danîne û ravekirina vê yekê jî bi nîşandana sedema ku Başûrê Kurdistanê di nav bejahiyê de asê bûye (ji ber ku li deryayê venabe), dîsan dikare yek ji wan astengên herî giring ên li ber nehatina cem hev û din, bê dîtin.

Li gel van yekan salên 2010'an, wekî di beşa berê de hat nirxandin, şertên wisan çêkirin ku ji bo kurd bi gelên û dewletên din re bikare pêkve bijî formula du ferasetên cuda yên avakirina aştiyê hatin testkirin. Çareseriya federatîf a li ser binyada neteweperweriyê, di wê rêya hanê de ku di esasê xwe de bi armanca dewleta serbixwe dabû ser wê, rastî astenga hêzên herêmî û kurewî hat û mimkin nebû ku beşeke kurdan bi wesîteya netewe-dewletê tevî nav rejîma aştiyê ya kurewî bibe. Sîstema siyasî ya navxweyî ya ku xwe dispêre kontrola tam a du binemalan jî, piştî qelibîna rejîma Sedam bi şûn de wisan dixuye ku ziyan gihandiye aştiya navxweyî ya ku li Başûr piçek be jî pêk hatiye. Li aliyê din ew feraseta ku li jêr di nav komên civakî de bi wesîteya temsîla siyasî ya wan a bi şêweya pêkvejiyana di nav aştiyê de tev digere jî, li Rojava û Bakur bi awayekî qismî hat testkirin. Siyaseta rêya sêyem a ku li Bakur bi rêbaza mizakereyê, li Rojava jî bi rêbaza xweparastinê hat aşopîkirin, dibe ku wekî stratejiya siyasî ya vê feraseta aştiyê bê dîtin. Ji ber ku li Bakur diyaloga bi dewletê re vegeriya şer û li Rojava jî ji ber şertên ambargo û şer sîstem tam rûnenişt, ev li pêşiya bipêşketina vê ferasetê wek astengên dixuyin.

# Encam

Hêza hegemonîk a DYA'yê ku lawaz dibe, hêza bazirganî ya reqabetê ya Çînê ku bi vê re di nav hevbandoriyê de zêde dibe û hebûna jeopolîtîk a Rûsyayê ku di asteke sînordar de be jî dikare vê bixebitîne, her yek ji wan wek faktorek e ku di nav veguherînên pêvajoyan de hîkarî li hev dikin û van pêvajoyan diyar dikin, ew li pêşberî me radiwestin. Me şêweya vê ya ku di asta kurewî de derketiye holê di nav qeyrana pergala kurewî ya lîberal de nîqaş kir. Me bandora rasterast a qeyrana di asta herêmî de ya li veguherînên jeopolîtîk a piştî serhildanên ereban, nîqaş kir. Di qada siyasî ya kurdî de jî zemîna ku bi awayekî aşkera lê derketiya holê, mimkinkirina şoreşa Rojava ye. Em êdî ji hêzeke tekane ya domînant a ku di asta herêmî de terazan di dest xwe de digire nikarin behs bikin, li şûna wê em behs ji DYA'yeke (û YE'yeke) (neo)lîberal-emperyalîst ku hêza wê ya hegemonîk qels bûye û ji Rûsyaya otokratîk-emperyalîst a ku çi qas diçe xurt dibe û ji qada leyîstikê ya Çînê ya teşebusên hegemonîk ên beranberî hev dikin. Rojhilata Navîn ji van yekan re ne biyan e, tam berevajî vê heta salên dawî yên Şerê Sar jî ku wê şertên heyî mimkin dikirin, qadeke mîna vê ya hatina hemberî hev bû. Lê belê ji salên dawî yên 1970'yan ve ew terazên ku hatibûn duristkirin vediguherin. Divê binê vê bê xêzkirin ku gelek komên siyasî, bi qasî îqnakirina civakên xwe yên ku ew ji nav wan rabûne, dê bikarin hebûna xwe bihêvişînin.

Mimkin e mirov bikare ji bo veguherînên di asta herêmî de vê diyar bike. Di cîhana ereban de sedema derkeketina holê ya serhildan ne şêlû û ne feraseteke azadiyê

ya bê ka ew çi ye, ew şertên civakî yên şênber in ku dikin jiyana mirovan mimkin nebe. Di navbera azadiyên civakî û nebûna nanê xwarinê de, pêwendiyeke rasterast heye. Ravekirina wan serhildanên ku di asta kurewî de qewimîne ne bi pergala civakî, siyasî û aborî ku ew bi xwe bûye sedama çêbûna serhildanan, lê ravekirina wan a bi qeyranên ku rejîm bûne sedema wan tim bû xetayeke wisan ku ew ketine navê. Ango kêşeyên ku ji aşopiya sîstemî bi xwe qewimîne nîşandana wan a wek kêşeya mekanîzmayek e ku ji ber wê nekariye sîstemê baş bixebitîne, çawan bi kêrî çareserkirina kêşeyê nayê her wisan perspektîfa mirov jî berteng dike û qeyranan jî kûr dike. Di vê çarçoveyê de em dikarin diyar bikin ku di encama van serhildanên salên 2010'an de serweriya dewletan bi rêjeyeke cidî derbe xwar û hejikîn, tovên nû yên serhildanê li nava gel hatin reşandin û ji ber vê jî bi şêweyên desthilatê re şertên aştiya civakî û ya nav civakan jî ji nû ve dest pê hat kirin ku bên mizakerekirin.
Lê belê ev tiştekî vebir e ku ev sîstemên dewletan çendî hîn nehatibin rûxandin jî çavkaniyên binyadî yên meydanxwastina di civakan de ya ku li dijî rejîman zêde dibe mîna xwe hîn li rastê ne. Ji lew re ew midaxeleyên emperyalîst ên ku ji derveyî herêmê tên, sîstemên dewletan ên otokratîk ku bi ser ketine xwe ji nû ve cihgir kirine, ew feraseta siyaseta ku cudahiyên etnîk, dînî û mezhebî yên di civakê de hene li dijî hev û din cemserî dikin û ku hêvî dikin ji van ferasetan her carê feyde bi dest bixin çendî di şêweya pêşewatiyên siyasî de, di xuyanga wan a derveyî de, di navên wan de û di stratejiyên wan de yên ku ew bi kar tînin guherdetî çêbin jî, lê ruhiyeya wan wekî xwe li rastê ye.

Mimkin e rewşeke mîna vê rasterast bi kêşeya kurdî re jî bê girêdan. Pênasekirina kurdan a bi awayê ku bi tenê ew gel li dijî şideta dewletê di nav hewla avakirina dewleta xwe de ye, xwedî wê heman wateyê ye ku mirov bi encamên sîstema dewletparêz a dîktatoryal bibile û der barê sedemên bingehîn de tu tiştî nebêje, yan jî bi gotineke din qebûla têrnekirina hêza pê û razîbûna bi başê ji xeraban e. Loma di vê çarçoveyê de divê ku kêşeya kurdî wekî parçeyekî necudabar a Rojhilata Navîn bê dîtin.

Eger em hîn bêhtir berbiçav bikin, DYA û hevalbendên wê yên YE'yê, çendî wisan bixuyin ku ew ji alî nermbûna pratîkên siyasî yên dewletan in jî, lê di esas de ew ji alî berdewama sîstema heyî ya li herêmê ne. Hêzên ku li herêmê ketine pêşbaziyeke hegemonîk an jî Rûsya, Çîn û hêzên din ên ku li herêmê berjewendiyên wan hene û xurt dibin, pirsgirêkeke wan bi sînorên heyî û bi sîstemên dewletan re nîn e. Ji lew re qet nebe ji sîstema li vir, ji qadên wekî petrol û îhaleyan sûdwer dibin. DYA ku naxwaze herêmê ji Îranê re ku Rûsya destekê didê biterikîne, mirov dikare ji rewşeke wisan behs bike ku leza vekişîna wê ya ji herêmê bi vê dînamîkê ve girêdayî ye.

Ji bo salên 2010'an em dikarin bibêjin ew dewreke wisan e ku nakokiyên di navbera du xetên îdeolojîk-polîtîk ên qada siyasî ya kurdî de kûr bûne. Eger em bi tesbîta Hamît Bozarslan bibêjin, dînamîka sereke ya salên 2010'an ew e ku çendî dewlet lawaz bûbin jî lê aktorên siyasî yên kurdan nehatine cem hev da bikarin li dor ajandayeke hevpar tev bigerin. Çunkî ew nakokiya îslamparêz-sekuler a ku di nav dewletên herêmê bi xwe de hatiye holê yan jî ew nakokiyên çînî (sinifî) û mezhepî ku jixwe di nav civakan de hebûn, ne ew faktor bûn ku wan qada siyasî ya kurdî rasterast diyar dikir (Bozarslan, 2014: 17–20). Lê belê ew nakokiyên navxweyî yên aktorên siyasî yên kurdan, li ber biyekbûna wan bûn asteng. Lê ev bi xwe jî jixwe ne rewşeke nû ye, berevajî vê ev encama rasterast a pêkanîna azadiya xwe ya kurdan e ku bi awayekî dîrokî wan li qadên ji manîpulasyona hêzên serwer re vekirî ev hewl dida. Li gorî vê, li salên 2010'an mimkin e mirov ji sê pratîkên siyasî behs bike ku van her du xetên îdeolojîk-polîtîk ew diyar dikir: Başûrê Kurdistanê ya ku xeta neteweperwer a kevneşopî lê serwer û serxwebûna wê ji aliyê dînamîkên jeopolîtîk ve hatiye astengkirin; forma xweseriyê ya li Rojava, ku li ser xeta xweparastina leşkerî bi pêş dikeve û ew xwebirêvebirinek e ku hîn bi awayekî fermî nehatiye naskirin; siyaseta mizakereker a li Bakur, ku wê çendî li ser zemîna siyaseta legal hin destkeftî bi dest xistibin jî, lê paşê bi şerê çêbûyî wê bi awayekî dewrî ev destkeftî winda kirin.

# ENCAM Û PÊŞNIYAZ

Eger me salên 2010'an bi gotineke tenê xulase bikira dê tercîha min "kaos" bûya. Ev bêjeya ku koka wê bi yûnaniya kevn e, valahiya berî afirînê derdibe. Di bikaranînên wê yên bi fransizî û îngilîzî de jî rewşa bêpergaliya mitleq tê teswîrkirin. Di tirkî de, ji ber ku ji fransiziyê derbasî wê bûye, ew bi wateya bêpergalî, bêrêzikiyê (bêqaydetiyê) tê bikaranîn. Ango ji ber ku ji aliyekî ve valahiya berî afirînê ji aliyê din ve jî bêpergaliyê dide zanîn, bi awayekî siruştî di nav xwe de ji wê ya ku dê piştî wê were, palpiştiyê çêdike. Li her kaosekê, yanî li her valahiyekê yan jî bêpergaliyekê, rewşa hebûnekê yan jî pergalek ew taqîb dike. Salên 2010'an ên Rojhilata Navîn, ew wêraniyên ku di dîrokê de kêm car mirov rast li wan tê, ew jicihkirina mirovan a ji cih û waran, qelîştên civakî yên kûr û ji ber berjewendiyên elîtan ew hevkêşeyên siyasî û aborî yên dijwar ên ku mirov nikare ji nav van derkeve û ew rewşa ku hêzên kurewî tim ji jor ve midaxele li wan dikin û ew rabûna wan a li dijî hev û din, li xwe vedihewîne. Sîstema siyasî, civakî û aborî ya li herêmê, ku li dijî serhildanên ereban û awayên berxwedanên yên bi dû wan re hejekeke cidî lê ket, çendî konsolîdasyoneke otorîter a nû pêk anîbe jî ew şertên ku di destpêka salên 2010'an de bûne sedema serhildanan, hema bibêje bi tevahî li cihê xwe disekinin. Di heman demê de li vê rewşê daxwazeke cidî ya veguherînê, îradeyeke civakî ya ku vê daxwazê bi awayên cuda derdibe û li dijî dewletan, patriyarkayan, formên cuda yên kedxwariyê, axayên şer, hêzên emperyalîst û artêşan li gel hemû bêçaretiyan û heciran radiweste, hevaltiyê dike. Ango ew demên em tê re dibihurin, ji bo giştiya Rojhilata Navîn, şer û pevçûna kevn a ku di ber ruh de ye û ya nû ye ku hîn nikare biwelide.

Nûya ku hewl dide çêbe dê wan rojên herî xweş ên ku hîn nehatine jiyandin bi awayekî bêgelemşe pêşkêşî me neke, tam berevajî vê dê nakokiyên navxweyî, formên xwe yên çewisandin û îstismarê, têkiliyên xwe yên hêzî jî bi xwe re bîne. Ango her nû, ne mecbûr e ku ya "baş, xweş û exlaqî" bîne. Tam berevajî vê yekê, dê ya xwe ya xerab, sik û bêexlaq jî bi xwe re bîne. Ji vî aliyî ve, kirina romantîzma nû tenê bi fehmnekirina pêvajoyên civakî ve eleqedar e.

Gava kêşeya kurdî bibe dabaşa mijarê ew nûya ku hewl dide biwelide, eynî wekî heta niha çawan çêbûye, dê di encama vê hevbandoriyê de ya ji ber hatina pêşberî hev a hegemonîka kurewî, serûbinbûna herêmî û berberiyên li qada siyasî ya kurdî çêbe. Ji vî aliyî ve pêvajoyên kurewî û serûbinbûnên herêmî tenê ne aliyekî/rehendeke qada siyasî ya kurdî, ne tenê sedemeke wê yan jî tenê encameke wê ye, parçeyekî van ê neveqetînbar e. Ango

hevbandoriya di navbera van her sê rehendan de, tenê ne wek korelasyon an jî têkiliya sedem û encama ku yekalî dişixule, berevajî vê divê mirov wan wisan îdrak bike ew wek pêvajo hev ji kûr ve û bi awayekî beranberî diyar dikin. Salên 2000 û 2010'an têra xwe ji bo vê yekê dane pêşkêşî me dikin.

Di vê çarçoveyê de armanca sereke ya vê xebatê ew bû ku ji dema meseleya kurdî derketiye holê pê de, bide nîşandan ku her tim ew kêşeyeke herêmî bûye û di nav şert û hecirên herêmî yên wan dînamîkên navxweyî yên teko teko dewletan de çêbûye û derketiye holê. Ji vê wêdetir, ev derfet û hecir ne tenê bi têkiliyên navxweyî yên herêmê lê belê bi pêvajoyên kurewî yên serdest ve eleqedar e ku ew têkiliyên hanê hîn bêhtir berfireh û aloz/girîft in. Ango kêşeya kurdî ya li Tirkiyeyê ku mirov wê ji aliyê siyasî ve watedar bike, wek mînak ne tenê divê mirov fehm bike bê ka rejîma li Îranê yan jî ya li Sûriyeyê çi dixwaze, divê mirov sînorên aktorên civakî û siyasî wan rejîman jî bizane, li gel van divê mirov seyra vê veguherîna têkiliyên hêzên mîhwerên cuda yên di asta kurewî de jî li pêş çav bigire. Ev xebat, ji lixwegirtina van hemû têkiliyan dûr e û jixwe bi angaşteke wiha jî nehat amadekirin. Qet nebe bi wateya berteng hewl da ku vê perspektîfa hanê siyasetên dewletên li qada siyasî ya kurdî û sosyolojiya dîrokî û siyasî ya aktorên siyasî yên kurdan watedar û pêşkêş bike

*

Li qada siyasî ya kurdî, dikare li bin roniya wan nîqaşên ku bi berdewamiya xebatê hatine kirin û gurahiya xwe daye ser bîst salên dawî, di konteksta sînor, zêhniyet û têkoşînan de ku eleqedarî dîmena destpêka salên 2020'î ya warên herî sereke yên pirsgirêkên pêkvejiyana di nav aştiyê de ne, nirxandinek were kirin.

**Sînor**

Ji bo qada siyasî ya kurdî bêguman faktora herî sereke ya diyarker ew sînor in ku wan ev qad kiriye çar parçe. Ev sînorên hanê, ku di serdema împaratoriyan de xuya bûne, di pey Şerê Cîhanê yê Yekem re realîze bûne û piştî hêzên mandater ên li herêmê vekişiyane bi şûn de bûne sînorên netewe-dewletan, çendî di salên 2010'an de bi awayekî cidî sehîtiya wan hatibe kirin jî, hîn hebûna xwe didomînin. Destpêka salên 2000'î çendî ew dem bûn ku sînorên

dewletên serwer bi zor û şidetê hatibin berdewamkirin jî, lê di destpêka salên 2010'an de ev dewletên serwer ketin rewşeke wisan ku bi awayekî zêde qels bûne. Tirkiye û Îran di dîroka xwe de bi qeyranên herî kûr ên civakî, siyasî, dîplomatîk û ya herî giring jî yên aborî ve mijûl in. Iraq û Sûriye jî gava hêzên nav herêmî û der herêmî yên ku ji par re destekê didin wan nebin, dikevin rewşeke wisan ku nikarin xwe li ser lingan bigirin. Helbet ev rewş nayê wê mehneyê ku dê ev dewlet hilweşin, lê belê ev çend qelsketina wan, bi xwe re endîşeya ewlehiya ontolojiyeke cidî jî tîne. Ango kêşeya van dewletan a mayînê/beqayê, di perspektîfa elîtên birêveber an jî ya rejîman de bûye rewşeke wek endîşeya herî sereke.

Li gel vê, tevgerên siyasî yên kurdan di dîroka xwe ya sed salî ya dawî de firsendeke wisan bi dest xist ku kêm caran ew bi dest dikeve. Li Başûr otonomiyeke nêzî serxwebûnê, li Rojava çendî hîn bi awayekî fermî nehatibe pejirandin jî xwebirêvebirinek hat çêkirin. Çendî li Bakur piştî pêvajoya diyalogekeke diyar bipaşketinek pêk hatibe jî, lê dikare ji hebûneke siyasî ya kurdî bê behskirin ku wê hêza xwe bi rêjeyeke cidî hêvişandiye. Li Rojhilat tevî qelsiya pêşengiya siyasî û mijara xeta leşkerî û her wiha şideta bêrehm a rejîmê, em dikarin ji tevgereke protestokirinê ya gel behs bikin ku ew li dijî kêşeyên aborî û siyasî yên heyî tê dikoşin. Yanî ne tenê serûbinbûnên di asta herêmî de, ew kêşeyên ku rejîm di nav de ne û rewşa siyasî ya aktîf a herêmên kurdan jî, gef li wan sînorên mental û fîzîkî yên ku netewedewletan ew kişandine dixwin.

### Zêhniyet

Ew zêhniyetên ku qada siyasî ya kurdî diyar dikin û xwedî çêbûne dîrokî ne, ku mirov tesbîta bê ew ji aliyê nêrîna aktorên siyasî yên kurdan ve daketine du vebijêrkan, dê ne şaş be. Neteweperweriya nerîtî, rizgarîxwaziya neteweyî ya marksîst-lenînîst û îslamiyetparêzî ku bi berdewamiya sedsala 20'î ve çêbûne, di pratîkê de piştî salên 2000'î bi wan re veguherîn çêbûn ku kokên wan di nav dînamîkên Şerê Sar de ne. Li gorî vê, wekî di mînakên Başûr û Rojhilat de, neteweperweriya nerîtî rengên rizgarîxwaziya neteweyî jî li xwe kirin suxme û xuyane bû.

Eşîrgiriya li vir ku bi awayekî zêde li gorî cudahîtiyên herêmî ya neteweperweriya nerîtî dihat piştgirîkirin, wekî di nimûneya Başûr de xeta

îslamiyetparêz bêyî ku pê re veguherîneke mezin çêbe di asta parlamentoyê de jî temsîliyet bi dest xist û hîn jî hebûna xwe dide domandin. Her wiha ev neteweperweriya nerîtî dîsan li Rojava û Rojhilat jî bi xeta konfederal a demokratîk re di nav têkoşînê de ye ku ew xeteke din e. Li Bakur ew xeta ku bi pêşengiya PKK'yê berê bi xeta rizgarîxwaziya neteweyî dest pê kiribû lê piştre her çû wek demokrasiya radîkal û konfederalîzma demokratîk berceste bû, hîn jî xetekeke serwer û serdest e. Ev xet çendî li Rojhilat di van salên dawî de hinek bi paş ketibe jî hîn hêzeke cidî ye û li Rojava tevî hemû şeran, gefên derveyî yên berdewam, pirsgirêkên aborî yên dêwasa yên ku gel di nav de dijî û li gel wan nediyariyên jeopolîtîk ên ku li xwe digire, serkeftineke mezin bi dest xist û bû hêza serwer. Li Bakur tevî ku eşîretgiriyê bi awayekî zêde giringiya xwe ji dest dabe jî lê hîn jî binyadên civakî yên ku doza eşîriyê dikudînin, bi piranî li cem dewletê cih girt. Li Rojava êdî wekî berê eşîretparêzî ne xurt e û ew binyadên heyî jî di nav xwebirêvebirina wê derê de bicihbûyî ne.

Ji aliyê aktorên din ên navend-dewletê yên di nav qada siyasî ya kurdî de mimkin e ev bê diyarkirin. Ji bo her dewletê dikare ji binyadeke civakî ya ku her diçe neteweperwer dibe behs bê kirin ku ew wek encama rasterast a qeyraneke civakî, siyasî û aborî ya ku her diçe kûr û dibe, pêk tê. Ev neteweperwerî di heman demê de bi taybetî li Tirkiye û Sûriyeyê, li gel vê bi awayekî hîn sînordar be jî li Îran û Iraqê, hewl dide ku dîndariya di asta civakî de heye hilde bin kontrolê. Nemaze Îran piştî şoreşê û Tirkiye jî ji derbeyê pê de, ji vê mihafezekarbûna hanê re ku bi destê dewletê ev yek mimkin bûye, ji lidijrabûna civakî û ji çêbûna serûbibûnên siyasî re avis in.

**Têkoşîn**

Tevahiya têkoşînên di nav qada siyasî ya kurdî de, navberên kurt ne tê de, di nava mîlîtarîzasyona rapir (mifrîd) de bihurîn. Di pêvajoya dawî ya bîst salan de hem ji hêla dewletan ve hem jî ji hêla aktorên siyasî yên kurdan ve ew mîlîtarîzasyona ku dewrî guherî û pratîkên şer hene. Li Rojhilat tevgerên kurdan ji destpêka salên 2010'an pê de neketin nav çalakiyeke leşkerî ya cidî, li Rojava li dijî dagirî û êrîşan bi awayekî timî rewşeke berxwedanê yan jî amadehiya ji bo berxwedan û berhingariyê heye. Çendî li Başûr çêbûna hatinên hemberî hev ên leşkerî yên bi hikûmeta Navendî ya Iraqê re biqewimin jî lê şerekî cidî pêk nehat, li Bakur jî bi rehendên diyar û ji ber

tesîra Rojava jî fealiyeteke leşkerî ya ku têra xwe kêm bûye, dabaşî mijarê ye. Lê li her yek van qadên hanê îhtimala ku her kêliyê şer biqewime heye. Li gel vê yekê, Rojhilat ne tê de, li her sê qadên din li hemberî teşebûsên qetliamên ku DAÎŞ'ê kirine nemaze li Rojava û Başûr kampanyayeke cidî ya li dijî DAÎŞ'ê hat kirin. Her wiha dîplomasiya bi dewletan re jî bû yek ji wan rêbazên din ên têkoşînê ku aktorên kurd ew bi kar anî, lê belê dahatên vê yên di rewşa heyî de têra xwe sînordar man. Encamdana vê yekê ya di salên 2010'an de wekî eleqedarî destpêkirina pêvajoyeke diyalogê ya nû ya li Bakur, ji aliyê navneteweyî ve çêbûna qebûlbûna Birêvebirina Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, pêkhatina demokratîkbûneke nispî ya li Başûr û nermbûna pestên/pêkutiyên li Rojhilat dixuye.

Lê belê tevî vê yekê jî divê bal li westabûneke ji ber şer bê kişandin ku di nav giştiya kurdan de, bi awayekî aşkera di asta civakî de derketiye holê. Çendî şer bi berdewamiya sed salî nakokiyeke neguherbar a rasteqîn be jî, êrîşên DAÎŞ'ê û midaxeleyên neo-emperyal ên Tirkiyeyê yên li Başûr û Rojava, di deh salên dawî de pir gur bûn. Vê rewşê, bi taybetî li Başûr ji ber ku elîtên birêveber ji bilî berjewendiyên malbatî projeksiyonekê çênakin, li Rojava xizanî û westabûn civakî ya ku bi ambargoyan zêde dibe û li Bakur û Rojhilat jî di bin şertên şideta dewletê ya berdewambûyî û bêrehm de têra xwe xuyane dibe û ji ber ku kurd di nav xwe de li hev nakin, loma ew valahiya siyasî ya heyî ya kurdan, îhtimala hebakirina vê da pêş çavên me.

*

Hewce pê heye ku bi awayekî kurt cext li ser wan encaman bê kirin ku di pêvajoya bîst salî de derketine holê û her wiha bi yên din jî ku di esasê xwe de eleqedarî niştebûnên jeopolîtîk ên qada siyasî ya kurdî ne. Dibe di esasê xwe ev wek mijarên wisan bên dîtin ku divê ew ji aliyê wateya pêkvejiyana di nav aştiyê de ya ji bo qada siyasî ya kurdî û bidestxistina perspektîfeke dekolonyal, bên nîqaşkirin.

Ji bo watedarkirina kêşeya kurdî ya ji nû ve hewce ye ku di bin şertên nû de mirov ji pênasekirinên bi palpiştiya desthilat an jî hêza hegemonîk wêdetir here. Bicihkirina meseleya kurdî ya di nav konteksta "daxwaza avakirina dewleta xwe" de ku ev di îdraka dewletên serwer de heye, li hemberî encamên şideta dewletê rasteqîniya kurdan bêdeng dike ku kûrahiya şidetê ya dîrokî

heye û bi awayên cuda derdikeve holê û di pêvajoyên civakî de jî ji nû ve tê hilbirandin, ku kurd jî hewl didin li dijî wê îradeyekê bi pêş bixin. Ango ev perspektîfa ku zemîna rewa ya rabûna li dijî pest û tehdeya aşkera û kedxwariyê nabîne, bi koda ku "niyeta esas a kurdan xerakirina yekîtiya dewletê" ye, ji bo çewsandin û kedxwariyê rewatiyê çêdike. Ev rewş, bi perspektîfeke lîberal a navend-ewrûpî pir dişibe wê feraseta ku serhildanên ereban wek "bêrîkirina demokrasiyê" vedibeyîne û lêgerînên ji bo edalet û azadiya civakî ya ku di esasê van serhildanan de hene, bêdeng dike. Di vê çarçoveyê de fehmkirina ji meseleya kurdî, hewceyî nêrîneke hîn kûrane ye ku ew ji pozîsyona hêzê hatiye bidûrxistin.

Ji aliyê aktorên siyasî yên kurdî ve kêşeya herî sereke ya qada siyasî ya kurdî, tim wek biyeknebûn an jî qet nebe tevnegerîna kurdan a di çarçoveya rojeveke hevpar de hat nîqaşkirin. Divê em hemen diyar bikin ku di nav van şertên berbiçav de biyekbûna aktorên siyasî yên kurdan mimkin xuya nake. Jixwe ev rabêjiya biyekbûnê ya ku di esasê xwe de xwe dispêre perspektîfeke neteweperwer, yek ji tengasiyên sereke yên wan neteweperweriyan e ku ew bi destê dewletên derî Ewrûpayê hatine bipêşxşistin û li herî dawiyê jî li hemberî dijminekî, hevparbûna civakî û siyasî pêwîst dike. Lê belê di nav van mercên heyî de "dijmin" ne yek bi tenê ye û asta siyasî û civakî jî di zêhn û texeyulê de parçetiyek çêdike. Ji ber vê yekê, bi wateya rast a bêjeyê, "biyekbûn" ne mimkin e. Ji ber ku dîsan ev rabêjiya biyekbûnê wan pirsgirêkên hanê yên di çarçoveya pêkvejiyana di nav aştiyê de li xwe vedihewîne jî mijara nîqaşeke berfireh e, ez dê li vir behs ji wan nekim. Tevî vê yekê, eger endîşeya ewlehiyê ya ontolojîk a sereke ya dewletan û rejîman ji hebûna kurdan (û komên civakî yên din ên ku di rewşa mîna vê yekê de ne) biqewime, di asta mişterek de be jî hereketkirina tevgerên siyasî yên kurdan a li dor ajandayeke hevparkirî cuda cuda li gorî berjewendiya her parçeyî ye û wek tiştekî bivênevê xuya dike. A rast di parastina Rojava de piçek be jî ev derket holê, lê belê pir dûrî rewşeke koordîneyî û demdirêj bû. Eger ev rewşa tevgerîna koordîneyî ya li dor rojeva hevpar çêbibûya, mesela jenosîda li Şengalê dikarî bihata berastengkirin.

Li gel vê yekê ew pêvajoyên veguherînê yên ku aktorên siyasî yên kurdan pêşengî li wan kirine yan jî wan ew anîne holê, di perspektîfa cîhana Rojava de têgihîştina wek "awarteya awarteyê" ji bo ku ev perspektîf helwesteke eleqedarî van qadan kêşeyî dike têra xwe arîşedar e. Rabêjiya awarteparêziya Rojhilata Navîn di esasê xwe de, ji van yekan diqewime ku ya yekem ji ber

aqilê lîberal ê navend-ewrûpî herêmê fehm nake, ya duyem ji ber xwe li nedîtina wan kêşeyan datîne ku ew bûye sedema wan û ya sêyem jî ji ber ku di pozîsyoneke hêzê de ji ya ku naşibe (nikare bişebe) wê, bi rê dikeve. Rewşa ku kurd wek awarteya awarteyê tên îdrakkirin jî di bingeha xwe ya herî sereke de ji ber baweriya ku hîn bêhtir dişibe wê bi xwe dertê holê. Ango ev rewş cextê li heyraniya têkoşînên kurdan ên zêdetirî sed salî nake, cextê li amrazîkirina bi perspektîfa navend-ewrûpî ya vê têkoşînê dike. Her cure gavê ku bi palpiştiya perspektîfeke wiha bê avêtin, li dawiya dawî di serî de kurd wekî dê çawan ziyanê bigihîne tevahiya gelên li herêmê, dê wek hevkêşeyeke wisan bimîne da ku mekanîzmayên çewisandinê yên dewletan û rejîman xurt û xwedî bike. Ji lew re du nimûneyên herî berbiçav ên vê yekê, ji bo wê feraseta her du îdeolojîk-polîtîkên ku li qada siyasî ya kurdî serdest in jî, bi awayên cuda cuda hatin tecrubekirin. Tevî hemû danîna wan têkiliyên baş ên bi cîhana Rojava re, desteknekirina serxwebûna Başûr û ji hêla DYA'yê ve ji midaxeleya Tirkiyeyê re hiştina Birêvebirina Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, ku ev li dijî DAÎŞ'ê partnera wê ya leşkerî ye, di qada siyasî ya kurdî de ev yek dê tim wek dersên ku divê neyên jibîrkirin di hişan de bimîne. Divê ji hiş neyê derxistin ku ev rewş têkildarî dînamîkên qada siyasî ya kurdî ye ku di tehlîla herî dawî de ev dînamîk di navbera hebûna ontolojîk a dewletan, hêzên emperyalîst ên derveyî herêmê û têkoşîna kurdan a dîrokî de şekil girtine.

Tevî vê mijareke din a ku divê bê zelalkirin jî ew mijara pêkanîna terazê ya di navbera helwesta sert û sekter a antîemperyalîzmê û wan têkiliyan de ye ku pêvajoyên jeopolîtîk ên li herêmê ew mimkin kirine. Rabêjiya sert a antîemperyalîst, di serî de di rabêjiya dewletan a pozîsyona hêzê de, ew teserifên siyasî yên kurdan bi awayê niştekirina di "xulamiya emperyalîzmê" de dertê holê. Hevparîbûna serdemî yên bi hêzên derveyî herêmê re jî ku pêvajoyên jeopolîtîk vê yeka hanê mecbûrî dike di texeyulên kurdan ên civakî de li sawînekê û li neteweperweriyeke kêşedar a ku ew xwe li dijî gelên din nişte dike, dadigere. Ev rewş herî zêde li Başûr û bi awayê ku hîn hindiktir e li herêmên din tê çavdêrîkirin. Gava rejîm an jî binyadên mixalifên wan bi hêzên derveyî herêmê re têkiliyan bi pêş dixin ew di çarçoveya antîemperyalîzmê de nayê nîqaşkirin, lê gava aktorên siyasî yên kurdan vê dikin çêkirina îmaja "xwefiroş/kurdênxiyanetkar" eleqedarî raseriya serdestiyê ye ku dewletan ew çêkiriye. Tesbîtkirina çêbûna vê rabêjiyê ya ji bo rejîmên cuda cuda yên her dewletê û dîsan ji bo hemû teşekulên siyasî yên mixalifên her rejîmê lê ku neteweperweriya dewletê dikin, dê ne tiştekî şaş be. Li Tirkiyeyê hilbijêrên

CHP'yê yên kemalîst jî tê de, ev niştekirina zanîndariyî (kognetîf) ya ku li ser binyadên rastgir heta yên hinên çepgir ên mixalif jî serdest e, çendî di nav xwe de nakokdar be jî, gava vedibeye taxa/kolana kurdan, dibe ku bikeve nav teşeyeke neteweperest. Siyaseta rêya sêyem ku di bingeha xwe de li dijî vê çêbûye, tevî hin çareseriyên berbiçav pêşkêş dike jî, divê wan têkilîdanînên ku ji ber mecbûriyetên jeopolîtîk pêk tên paşguh neke.

Paralelî van yekan, bi taybetî di nav kurdên li Tirkiyeyê ev mijar di pênc salên dawî de bi jargoneke gur a dekolonîzasyonê tê biyekkirin û nîqaşkirin. Lê hal we ye divê binî bê xêzkirin ku çendî dekolonîzasyon divê pêvajoyeke wisan be ku di serî de li dijî pergala cîhanê ya di formeke navend-ewrûpî de bê şixulandin, lê kirina vê ya bi neteweperweriyê bi xwe, re-kolonîzasyonek e. Ango ew nijadperestiya li dijî kurdên li nav çar sînorên dewletan, divê tim di hiş de bê girtin ew rastiyeke wisan e ku di bingeha xwe de çêbûneke rabêjiyî ya dewletan e û bi wan rejîmên heqîqetê yên dewletan ew çêkirine jî tecrubeyên pêkvejiyana gelan tên manîpulekirin. Berevajî vê, eger mirov asêyî xwendineke nijadperestiyeke gewherî bibe îcar ew xetereya ku mirov dibe negihîje rastiya ku ev bi destê dewletê hatiye çêkirin. Ev ne înkarkirina nijadperestiyê ye, tam berevajî vê, ranêziyeke wisan e ku berêtiyê dide qebûlkirina vê ya bêşert û tevî vê yekê jî çavkaniyên wê yên siyasî zelal û aşkera dike. Hilberandina siyasetê ya li gorî serwextbûna ji cudahiya di navbera çavkaniyên nijadperestiyê û çêbûna şêweyên wê de, yek ji palpiştên herî sereke yên pêkvejiyana di nav aştiyê de ye.

*

Ev xebat, herî dawî dê ji aliyê însiyatîfên sivîl û aktorên ku li Tirkiyeyê bi hewl û armanca pêkvejiyana di nav aştiyê de tev digerin da nîqaşekê bide kirin û pêşniyazan li wan bike û ji aliyê perspektîfa dahatûyê ve jî da ku ev yek li ser hîmên dekolonyal bên rûniştandin û ji bo vê jî nexşerêyên ku dikarin bên xêzkirin çêke, dê giring be.

(1) Di serî de nîqaşa herî sereke kêşeyîtiya (problematîka) înîsiyatîfên sivîl û aktoran bi xwe ye. Li vir qesta ji civaka sivîl, bi awayekî misoger û qethî ne tenê ew binyadên hanê ne ku xwe bi komele kirine, di çarçoveyeke hîn firehtir de, ji bilî aktorên siyasî ew binyadeke xwebirêxistî ye ku di nav civakê de bergindeke wan heye. Çendî dîrok û detaya nîqaşa eleqedarî hecirên civaka

sivîl kevn û berfireh be jî, li vir bi xulase li gel dubare bê kirin jî, sê mijarên sereke hene ku divê cext li ser wan bê kirin. A yekem, civaka sivîl divê xwe bi parêziya Saziya Civaka Sivîl (SCS) bi sînor neke û divê bi hemû komên dînî, mezhebî û etnîk re, bi binyadên jinan ên cuda re, bi xwebirêxistinkirinên ciwanan re û bi înîsiyatîfên sivîl re û bi her binyadên ku li qada sivîl çalak in, di nav danûstandin û koordînasyonê de pêvajoyê bi pêş bixe û hewce ye bi formên ku bikare rê li ber manewrayên manîpulatîf ên siyasetê bigire geşe bi danîna têkiliyan bide, êdî ji bo her cure pêvajoyê tiştekî bivênevê ye. Ya duyem, dîsan divê civaka sivîl bi tenê bi nava welêt sînorkirî nemîne û pêwîst e bi hemû herêmê re têkilî daîne û ji bo pêkanîna pêkvejiyana di nav aştiyê de kanalîzekirina van têkilî û pêwendiyan jî ew çend giring e. Ya sêyem, di vê nuqteyê de ew înîsiyatîf û dameziraweyên/saziyên ku li Tirkiyeyê xebatên binyad-aştiyê dimeşînin divê giraniya ramanî ya xebatên xwe ji îdraka dinyayê ya navend-ewrûpî wêdetir û texeyul û sêwiranên xwe yên polîtîk jî ji perspektîfa aştiyê ya naven DYA û YE'yê wêdetir aşopî bikin ku ev yeka hanê di nav şertên heyî de yek ji wan mijarên herî giring e. Înîsiyatîfên sivîl, dikarin navenda giraniya têkiliyên xwe li herêma ku lê dijîn çêkin û ew pencereyên firsendê yên ku ji ber qeyranê pêk hatine li pergaleke aştiyê ya mayînde dagerînin, dikarin pêşniyazan bi pêş bixin

(2) Serweriyên dewletên li herêmê ku xwe dispêrin pratîkên desthilatê yên zordar, di nav pêvajoyên bîst salên dawî de hejikîn lê hilneweşiyan. Yek ji sedemên vê yê herî aşkera û zelal ew daxwaza azadiyê û têkoşîn in ku ew di navbera "Rojavaya hegemonîk" û "Rojhilata nerîtî" de asê bûne. Wekî di nav bîst salên dawî de, di serî de emperyalîzm û têkoşînên gelek hêzan ku ji serdemên dawî yên osmanî heta roja îroj bêyî navber domiyane, bi rêjeyeke cidî hîkarî li veguherîna li herêmê kir. Civakîtiya herêmê ya bi midaxeleyan şekil girtiye, ji ber pratîkên ku bi awayê qismî xwe bi xwe oryantalîze kiriye li xwe vedihewîne, dînamîkên lihevxistinê yên li herêmê û bêçareserîtiya meseleyan kûrtir kirin. Aktorên siyasî jî ku têra xwe xwedî kapasîteya kontrola qadê yan jî manîpulekirina wê ne, bi awayekî gur û zêde stratejiyeke siyasî ya ku endeksî destûrnedana her cure alternatîfa azadbûyînê ya li derveyî wan e, şopand. Gelek nakokiyên ku ji ber vê sedema sereke qewimîne, texeyulên azadbûyînê jî têra xwe asê kirine: Ew texeyulên azadiyê yên ku di nav cemserên rizgariyê de asê bûne, wekî yan rizgariyeke lîberal a di çarçoveya modernbûna cîhana Rojava ya pêşverû de yan jî rizgariya di çarçoveya rastiyên nerîtî yên herêmê de ya bi awayê vegerîna li esilê xwe.

Lê belê ya pêşî ku ew pergala heyî ya emperyal-oryantalîst û kedxwariya nijadperest didomîne lê ya duyem jî wek xeteke radîkal û li dawiya dawî wekî ku çeşîdiya civakî tune dihesibîne/dike, xuya dibe. Di vê çarçoveyê de, di serî de qada siyasî ya kurdî ji bo kîjan avakirina pêkvejiyana aştiyane dibe, ji bilî avakirina mistewiyeke nû ya ku mirov bikare xwe ji texeyulên azadiyê yên ku di nav du cemseran de asê bûne xelas bike, tu alternatîf nîn e. Beravajî vê rewşê, binyadeke civakî û siyasî ya ku dibe çêbe dê kartêkerî li dînamîkeke din a lihevxistinê ya bi cureyekî din bike. Gavê pêşîn ê wê yekê jî ew e ku divê hewlên pêkvejiyanê di nav perspektîfa dekolonyal a li ser hîmê azadiyê de, bên bicihkirin.

(3) Lihevxistinên ku li herêmê hene tenê bi kar û barên dewletekê ve ne eleqedar in, bi piranî lihevxistinên xwedî karakterên sînorbihur in. Jixwe bi awayekî siruştî perspektîfên çareseriyê jî bi tevlikirina vê karaktera sînorbihur û van dînamîkan dikare bê nîqaşkirin. Li Tirkiyeyê di pêvajoya çareseriyê de hema her teşekul û înîsiyatîfa ku alî veguherîneke aştiyê bû rojeva wan a sereke veguherîna siyasî (û çendî sînordar be civakî) ya di nav sînoran de bû. Her wekî di vê xebatê de jî bi kitekitên xwe ve hat nîqaşkirin, hem di destpêka pêvajoya çareseriyê hem jî di dawîhatina wê de ku ew di navbera salên 2013 û 2015'an de domiya, yek ji diyardeyên herî domînat eleqedarî wê yekê bû ku Tirkiyeyê ew bipêşketina pêvajoyên li derveyî sînorê xwe vebeyandibû têkiliyên hêzê yên li nav Tirkiyeyê. Loma di vê çarçoveyê de, eger ji niha bi şûn de pêvajoyeke diyalogê dest pê bike, di sêwirana vê de li serî aktorên siyasî û civakî yên din ên qada siyasî ya kurdî divê her aktorê ku dibe hem bi awayekî erênî hem jî neyînî bandor li pêvajoyê bike li pêş çav bê girtin. Li vir mebest jê ew e ku yên destek didin pêvajoyê ew lê bên daxilkirin, ew ên ku potansiyela rabûna wan a li dijî pêvajoyê heye jî ji bo kêmkirina ziyangihandina wan a li vê yekê divê rê û rêbaz bên zelalkirin. A rast di pêvajoya diyalogê de, ku wek bîranîneke xweş di hişê me de maye lê di encamê de ew bi awayekî pir tehl qediya, aktorên siyasî têra xwe ji diyarkeriya pêvajoyên polîtîk haydar bûn û hema hema hemû gavên ku hatibûn avêtin jî di serî de Rojava bi hişmendiya veguherîn û dagerînên herêmî dihatin avêtin. Lê belê bi aktorên sivîl re yên ku wan li Tirkiyeyê xebata aştiyê dikir, ev perspektîfa herêmî ya qet tune bû yan jî tiştên ku wan bikaribûya der barê vê de bikirina sînordar bûn. Lê hal we ye, wek nimûne di wê demê de çaxa Salih Mislim ji aliyê hikûmetê ve ji bo Enqereyê dihat vexwendin, eger înîsiyatîfek bihata bipêşxistin ku ji Rojava aktorên sivîl (grûpên dînî û mezhebî, aîdiyetên

etnîk ên cuda, binyadên jin û ciwanan û hwd.) dawetî Tirkiyeyê bihata kirin û ev hem bi civînên ku ji raya giştî re vekirî ne hem jî bi nîqaşên girtî/veşarî bihata minaqeşekirin bê ka ev bi çi awayî dikare li nav perspektîfeke aştiyê bê bicihkirin, dibû ku tesîreke erênî bikira. Di çarçoveya kêşeya kurdî de, li gorî ku nîqaşkirina aştiyê êdî tenê bi nava sînoran re ne eleqedar e, li gel hemû rîskên siyasî û hiqûqî, avêtina gavê yê di valahiyeke herî biçûk a jeopolîtîk a li pêşiya me de divê yek ji mebestên berêtîdar be.

(4) Qeyrana pergala dinyaya lîberal di nav xwe de gelek rîskên mezin vedihewîne. Yek ji parametreyên herî sereke ya vê qeyranê tevî kêmasî û şaşiya wê daşorîna pergala normatîf a kurewî ye. Tevî hemû kêşe û gelşên wê di pergala dinyaya lîberal de, pergala wê ya kurewî ya bi palpiştiya çewisîn û hiyerarşiyê piçek be jî ji ber zemîna hiqûqî ya neteweyî û navneteweyî ya ku wê sînordar dike; qetliam, jenosîd, şerên mezin û wêranî û kaviliyên mîna wê ne rewa bûn. Lê belê ew hêza hegemonîk a berê ku qels dikeve û qadên hatina hemberî hev ên hêzên nû yên xwedî armanca hegemonyayê ku her diçe xurt dibin, dikare bibe sedema pelçiqîna çîmenan ku gava fîl serê li hev dixin ev rewş pêk tê. Bi ser de ew ên ku vê yekê pêk tînin, îhtimal pir zêde ye ku ew çîmenên ji aliyê fîlan ve hatiye pelçiqandin/an jî pelçiqandina wan tê berdewamkirin dibe ku strîmişk bin ku ji çîmenan pir mezintir in. Ango di nebûna pergala normatîf a hegemonîk de, hêzên herêmî yên ku dizanin ew dê tehemulî encameke vê yekê nekin, dibe ku ji bo çareserkirina kêşe û arîşeyên xwe serî li rêya bikaranîna şideteke pir merzin bidin. Jenosîda ku li dawiya êrîşa DAÎŞ'ê ya li ser Şengalê çêbû, yan jî gava Tirkiye ket Efrînê ew bi sed hezaran mirovên ji cih û warên xwe hatin kirin, kan û çavkaniyên hatin talankirin û ew pratîkên kolonyalîzmê yên niştecihî ya ku wekî xwe bixe nav çavên mirovan îsbata vê yekê yên zindî ne ku ev yek hîn rîskeke berdewam e û nabe biçûk bê dîtin. Divê cext li ser wê rasteqînê bê kirin ku ev hem ji aliyê qada siyasî ya kurdî ve hem jî ji aliyê wan aktoran ve ku projeya/planê wan ê pêkvejiyana di nav aştiyê de heye, tim di hiş de bê girtin.

(5) Dîsan rewşeke din a ku rasterast bi vê qeyrana hegemonî re têkildar e problematîka kêşeya "beqa"yê ya dewletan an jî rejîman e û ew diyardeya hanê ye ku sînorê tiştên ew dikarin bikin ji bo vê bikin pir fireh e. Me di nîvê duyem ê salên 2010'an de çavdêrî kir ku desthilata AKP'yê di salên 2014 û 2015an de li cihekî meqes guhart û berdewamiya desthilata xwe jî bi beqaya dewletê re kir rewşeke peralel. Em dikarin (herî hindik) ji du faktorên behs

bikin ku ev yek mimkin kir. A yekem, li gel xetayên wê jî îslama siyasî û hêza sermayeya nû ya ku li ser vê bingehê çêbûye ji bo mayîna li desthilatê destek da AKP'yê û Erdogan. A duyem jî, di encama serhildanên herêmî de ew rejîma sînorên herêmî ya ku temelê wê di Rêkeftina Sykes-Picot de ye û bi qeyrana hegemonîk a kurewî re ketiye nava hev û din, bi awayekî pir cîdî hat testkirin, ku heta car caran hat îlxakirin, lê belê li dawiyê gava ji ji nû ve hat avakirin îcar ji aliyê aqilê dewletê ve hildana planê pêşîn a pirsgirêka beqayê ye, ku ev aqil miheselaya aktorên siyasî ya serwerê dewletê ye. Rejîma van sînoran wek nimûne di protestoyên 6-8'ê Çiriya Pêşîn de, bi derbasbûna ji sînoran a kurdên bakurî re ku (hewl dan) çûn Kobaniyê bi awayekî cidî hatibû testkirin an jî li sînorê Iraq û Sûriyeyê ew ji hêla DAÎŞ'ê ve ji bo maweyekê bi şekilê de facto ji holê hatibû rakirin. Divê cext lê bê kirin ku yek ji wan faktorên sereke kir li Tirkiyeyê koalîsyona dewletê bê avakirin, ev e. Gava mirov piçek be jî ji sûcdarkirinê heranberî hev ên rojane û sernixamtî û ji wan nîqaşên hanê yên xwedî armanca pêdayîna bedeleke siyasî bi dûr bikeve û bi perspektîfeke hîn berfireh li "şerên bajaran» an jî li «berxwedanên xwebirêvebirinê» binêre, em dê vebeyîna kêşeya beqayê ya dewletê û ya qeyrana ku di asta herêmî de kûr bûye, çawan gihîştiye Tirkiyeyê bibînin. Di vê çarçoveyê de divê îhtimala çêbûna qetiamên girseyî yên ku dibe ji niha bi şûn de jî biqewimîn di hiş de bigire û rê li ber wan pêvajoyên hanê yên ku dibin sedemê çêbûna van yekan bigire. Piştî ku lihevxistana çekdar dest pê kir bi şûn de, rola înîsiyatên sivîl bi awayekî siruştî sînordar e. Lê belê meseleya esas ew e ku berî pêvajo bigihîje wê merheleyê, divê ew xemxurî û hesasiyeta pêwîst bê çêkirin.

(6) Tevî vê rîska mezin, divê bal lê bê kişandin ku hatina pêşberî hev a hegemonîka kurewî jî hin cure pencereyên firsendê vekirine. Eger pergala normatîf cihê xwe ji ya nediyar re bihêle, ew a ku dê vê diyar bike ew binyadên siyasî yên halê hazir in ku xwedî armanca avakirina desthilatê ne û ew dînamîkên têkoşînê ne ku di nav civakê de bi pêş dikevin û miheseleya aloz a texeyulên wan in. Hîpoteza ku her binyadeke civakî pêvajoyeke aktuel/carî ya veguherîna pêvajoyên berî wê ne, ev xebat jî tê de hîpoteza her cure xebateke dîrokî yan jî ya sosyolojîka siyasî ye. Di vê çarçoveyê de ew binyadên civakî û siyasî ku dê ji niha bi şûn de pêk werin jî dîsan mecbûr e ku ew encama miheseleyeke wiha bin. Lê belê bi taybetî eger bi tenê analîza têkiliyên hêzan ên di navbera aktorên siyasî de li navendê bê hildan, dê bibe sedema paşçavkirina teserifên siyasî yên din ku ji nav civakê der ketine û geşe bi xwe dane. Di kêliyên krîzên wiha de, civak bi awayekî wisan e ku bi

berdewamî alternatîfên xwe çêdike. Li vir berpirsiya sereke ya ku dikeve ser milê her aktor an ji înîsiyatîfa bi mebestên aştiyane tev digere ew e ku divê dînamîkên civakî kanalîzeyî pratîkên ji bo pêkvejiyana aştiyane bike. Ji bo xurtkirina îhtimala pêkvejiyanê û di nav qeyrana hegemonîk a heyî de bicihkirina alternatîfên wê yên siyasî û nîqaşkirina wê, berpirsiya sereke ya înîsiyatîfên sivîl ên li Tirkiyeyê ne ku divê berêtî û pêşikiyê bidin vê yekê.

# Çavkanî

Abbas Zadeh, Y. û Kirmanj, S. (2017). The Para-Diplomacy of the Kurdistan Region in Iraq and the Kurdish Statehood Enterprise. *The Middle East Journal,* 71(4), 587–606.

Adler-Nissen, R. û Zarakol, A. (2020). Struggles for Recognition: The Liberal International Order and the Merger of Its Discontents. *International Organization,* 611–634. https://doi.org/10.1017/S0020818320000454

Agnew, J. (1994). The territorial trap: The geographical assumptions of international relations theory. *Review of International Political Economy*, 1(1), 53–80.

Agnew, J. (2005). *Hegemony: The New Shape of Global Power*. Temple University Press.

Ahram, A. I. (2018). On the Making and Unmaking of Arab States. *International Journal of Middle East Studies*, 50(02), 323–327. https://doi.org/10.1017/ S0020743818000211

Akkaya, A. H. û Jongerden, J. (2010). The PKK in the 2000s. Continuity through breaks? M. Casier û J. Jongerden (amd.), ji nav *Nationalisms and Politics in Turkey: Political Islam, Kemalism and the Kurdish Issue* (r. 143–162). Routledge.

Álvarez, R. û Chase-Dunn, C. (2019). Forging a diagonal instrument for the global left: The vessel. *Globalizations*, 16(7), 1027–1042. https://doi.org/10.1080/14747731.2019.1654284

Anderson, B. (1991). *Imagined Communities: Reflections on the Origin and Spread of Nationalism.* Verso.

Anievas, A. û Nisancıoğlu, K. (2017). How did the west usurp the rest? Origins of the great divergence over the longue durée. *Comparative Studies in Society and History*, 59(1).

Anievas, A. û Nisancıoğlu, K. (2015). How the West Came to Rule: *The Geopolitical Origins of Capitalism*. Pluto Press.

Azeez, G. K. (2016). Beyond Edward Said: An Outlook on Postcolonialism and Middle Eastern Studies. *Social Epistemology*, 30(5–6), 710–727.

Aziz, S. (2017). The Economic System(s) of the Kurdistan Regional Government, Iraq. G. Gurbey, S. Hoffman û F. Ibrahim Seyder (amd.), ji nav *Between State and NonState: Politics and Society in Kurdistan-Iraq and Palestine* (r. 103–122). Palgrave Macmillan US.

Bajalan, D. R. (2009). Pan-Kurdish Nationalism: *Theory or Praxis? Association for the Study of Ethnicity and Nationalism (ASEN) Conference.*

Bajalan, D. R. (2016). Princes, pashas and patriots: The Kurdish intelligentsia, the Ottoman Empire and the national question (1908-1914). *British Journal of Middle Eastern Studies*, 43(2), 140–157. https://doi.org/10.1080/13530194.2016.1138 639

Bila, F. (2007). *Komutanlar Cephesi*. Detay Yayıncılık.

Bozarslan, H. (1997). *La Question Kurde:* États *et minorités au Moyen-Orient*. Presses de Sciences Po.

Bozarslan, H. (2003). Le nationalisme kurde, de la violence politique au suicide sacrificiel. *Critique Internationale*, 4(21), 93–115. https://doi.org/10.3917/crii.021.0093

Bozarslan, H. (2013a). *Histoire de la Turquie*. Texto.

Bozarslan, H. (2013b). L'espace kurde entre unité et diversité. *Herodote*, 1(148), 23–32.

Bozarslan, H. (2014). Les Kurdes et l'option étatique. *Politique* Étrangère, Eté (2), 15. https://doi.org/10.3917/pe.142.0015

Bozarslan, Hamit. (2011). *Sociologie politique du Moyen-Orient*. La Découverte.

Brownlee, B. J. û Ghiabi, M. (2016). Passive, Silent and Revolutionary: The 'Arab Spring' Revisited. *Middle East Critique*, 25(3), 299–316. https://doi.org/10.1080/19436149.2016.1177919.Passive

Burç, R. (2019). One state, one nation, one flag—One gender? HDP as a challenger of the Turkish nation state and its gendered perspectives. *Journal of Balkan and Near Eastern Studies*, 21(3), 319–334. https://doi.org/10.1080/19448953.2018.1 497755

Búzás, Z. I. (2021). Racism and Antiracism in the Liberal International Order. *International Organization*, 75(Spring), 440–463. https://doi.org/doi:10.1017/S0020818320000521

Cardoso Rosas, J. û Rita Ferreira, A. (2013). Left and Right: Critical Junctures. J. Cardoso Rosas û A. Rita Ferreira (amd.), ji nav *Left and Right: The Great Dichotomy Revisited Edited*. Cambridge Scholars Publishing. https://doi. org/10.1136/bmj.282.6279.1875-a

Černy, H. (2014). Ethnic Alliances Deconstructed: The PKK Sanctuary in Iraqi Kurdistan and the Internationalization of Ethnic Conflict Revisited. *Ethnopolitics*, 13(4), 328–354. https://doi.org/10.1080/17449057.2014.888213

Chomsky, N. (2003). Wars of Terror. *New Political Science*, 25(1). http://www.ncbi.nlm.nih.gov/pubmed/24724183

Clement, M. (2016). The 2010s: Ji nav *A Decade of Riot and Protest. A People's History of Riots, Protest and the Law* (r. 179–215). Palgrave Macmillan. https://doi.org/10.1057/978-1-137-52751-6_7

Conversi, D. (2007). Homogenisation, nationalism and war: Should we still read Ernest Gellner? *Nations and Nationalism*, 13(3), 371–394. https://doi.org/10.1111/j.1469-8129.2007.00292.x

Çubukçu, A. (2011). On Cosmopolitan Occupations: The Case of the World Tribunal on Iraq. *Interventions*, 13(3), 422–442. https://doi.org/10.1080/1369801X.2011.597599

Çubukçu, A. (2018). *For the Love of Humanity: The World Tribunal on Iraq*. University of Pennsylvania Press.

Daher, J. (2019). *Syria After the Uprisings: The Political Economy of State Resilience*. Pluto Press.

Danewid, I. (2018). *Race, Capital, and the Politics of Solidarity: Radical Internationalism in the 21st Century*. London School of Economics and Political Science.

Dirik, D. (2014, October 29). Western fascination with 'badass' Kurdish women. *Aljazeera*. https://www.aljazeera.com/opinions/2014/10/29/westernfascination-with-badass-kurdish-women

Dodge, T. (2006). The Sardinian, the Texan and the Tikriti: Gramsci, The comparative autonomy of the Middle Eastern State and regime change in Iraq. *International Politics*, 43(4), 453–473. https://doi.org/10.1057/palgrave.ip.8800165

Duman, Y. (2016). *Rojava: Bir Demokratik* Özerklik *Deneyimi* (1. baskı). İletişim Yayınları.

Dumitru, S. (2014). Qu'est-ce que le nationalisme méthodologique? Essai de typologie. *Raisons Politiques*, 54(2), 9–22. https://doi.org/10.3917/rai.054.0009

Durkheim, É. (2007). *De la division du travail social*. Presses universitaires de France.

Dussel, E. D. (1994). *El Encubrimiento del otro: Hacia el origen del mito de la modernidad*. Abya-Yala.

Eagleton, W. (1963). *The Kurdish Republic of 1946*. Oxford University Press.

Ehteshami, A., Hinnebusch, R., Huuhtanen, H., Raunio, P., Warnaar, M. û Zinti, T. (2013). Authoritarian Resilience and International Linkages in Syria and Iran. S. Heydeman û L. Reinould (amd.), ji nav *Middle East Authoritarianisms: Governance, Contestation and Regime resilience in Iran and Syria* (Issue January, s. 222–242). Stanford University Press.

Ellis, M. H. (2015). Over the Borderline? Rethinking Territoriality at the Margins of Empire and Nation in the Modern Middle East (Part II ). *History Compass*, 13(8), 423–434.

Entessar, N. (2014). Between a Rock and a Hard Place: The Kurdish Dilemma in Iran. D. Romano û M. Gurses (amd.), ji nav *Conflict, Democratization, and the Kurds in the Middle East* (r. 211–224). Palgrave Macmillan US. https://doi.org/10.1057/9781137409997_11

Evans, P. (2012). Counter-Hegemonic Globalization. G. Ritzer (amd.), ji nav *The Wiley-Blackwell Encyclopedia of Globalization* (p. wbeog114). John Wiley and Sons, Ltd. https://doi.org/10.1002/9780470670590.wbeog114

Faist, T. (2019). *The Transnationalized Social Question*. Oxford University Press.

Falk, B. (2010). From Berlin to Baghdad: Learning the "wrong" lessons from the collapse of communism. G. Lawson, C. Armbruster û M. Cox (amd.), The Global 1989: Ji nav *Continuity and Change in World Politics* (r. 243–270). Cambridge University Press.

Fawcett, L. (2017). States and sovereignty in the Middle East: Myths and realities. *International Affairs*, 93(4), 789–807. https://doi.org/10.1093/ia/iix122

Ferguson, Y. H. û Mansbach, R. W. (2004). *Remapping Global Politics: History's Revenge and Future Shock*. Cambridge University Press.

Frank, A. G. (1998). *ReORIENT: Global Economy in the Asian Age*. University of California Press.

Gago, V. (2020). *Feminist International. How to Change Everything*. Verso.

Gauthier, J. (2005). Les événements de Qamichlo: Irruption de la question kurde en Syrie. *Etudes Kurdes*, 7, 97–114.

Gerger, H. (2006). *ABD Ortadoğu Türkiye*. Ceylan Yayınları.

Gerges, F. A. (2013). The Obama approach to the Middle East: The end of America's moment? *International Affairs*, 89(2), 299–323. https://doi.org/10.1111/1468-2346.12019

Gills, B. K. (2010). Going south: Capitalist crisis, systemic crisis, civilisational crisis. *Third World Quarterly*, 31(2), 169–184.

Gramsci, A. (1971). *Selections from the Prison Notebooks of Antonio Gramsci* (Q. Hoare û G. Nowell-Smith, amd.). International Publishers.

Grosfoguel, R. (2011). Decolonizing Post-Colonial Studies and Paradigms of PoliticalEconomy: Transmodernity, Decolonial Thinking, and Global Coloniality. *Transmodernity*, 1(1).

Güneş, C. (2019). *The Kurds in a New Middle East*. Palgrave Macmillan. https://doi.org/10.1007/978-3-030-00539-9

Güneş, C., û Lowe, R. (2015). *The Impact of the Syrian War on Kurdish Politics Across the Middle East* (Issue July, r. 1–20). Chatham House. https://doi.org/10.1107/S0108270195011760

Halliday, F. (2005). *The Middle East in International Relations*. Cambridge University Press.

Hamsici, M. (2013, August 29). Cemil Bayık: "Gezi'de yanlışlar yaptık." *BBC Türkçe*. https://www.bbc.com/turkce/haberler/2013/08/130828_cemil_bayik_3_gezi_cemaat.shtml

Hardt, M. û Negri, A. (2000). *Empire*. Harward University Press.

Harvey, D. (2014). *Seventeen Contradictions and the End of Capitalism*. Oxford University Press.

Hassaniyan, A. (2021). The environmentalism of the subalterns: A case study of environmental activism in Eastern Kurdistan/Rojhelat. Local Environment, 1–18. https://doi.org/10.1080/13549839.2021.1933927

Hazbun, W. (2011). The Middle East through the Lens of Critical Geopolitics: Globalization, Terrorism, and the Iraq War. M. Bonine, M. Gasper û A. Amanat (amd.), ji nav *Is There a Middle East?* (r. 207–230). Stanford University Press.

Hazbun, W. (2019). In America's Wake: Turbulence and Insecurity in the Middle East. A. Jamal û M. Lynch (amd.), ji nav *POMEPS Studies 34*: *Shifting Global Politics and the Middle East*.

Hinnebusch, R. (2013). Globalization, the highest stage of imperialism: Coreperiphery dynamics in the middle east. S. Stetter (amd.), ji nav *The Middle East and Globalization: Encounters and Horizons* (Issue January 2013, s. 21–39). Palgrave Macmillan. https://doi.org/10.1057/9781137031761

Hinnebusch, R. (2016). State de-construction in Iraq and Syria. *Politische Vierteljahresschrift*, 57(4), 560–585. https://doi.org/10.5771/0032-3470-2016-4-560

Hobson, J. M. (2012). *The Eurocentric Conception of World Politics: Western International Theory, 1760-2010*. Cambridge University Press.

Hoffmann, C. û Cemgil, C. (2016). The (un)making of the Pax Turca in the Middle East: Understanding the social-historical roots of foreign policy. *Cambridge Review of International Affairs*, 29(4), 1279–1302. https://doi.org/10.1080/09557571.2015.1119015

Hroch, M. (1985). *Social Preconditions of National Revival in Europe: A Comparative Analysis of the Social Composition of Patriotic Groups among the Smaller European Nations*. Cambridge University Press.

ICG. (2014). *Flight of Icarus? The PYD's Precarious Rise in Syria*. International Crisis Group. http://www.crisisgroup.org/en/regions/middle-east-north-africa/ egypt-syria-lebanon/syria/151-flight-of-icarus-the-pyd-s-precarious-rise-insyria.aspx

Insel, A. (2015). *La nouvelle Turquie d'Erdogan: Du rêve démocratique à la dérive autoritaire*. La Découverte.

Jongerden, J. (2018a). Conquering the state and subordinating society under AKP rule: A Kurdish perspective on the development of a new autocracy in Turkey. *Journal of Balkan and Near Eastern Studies*, 00(00), 1–14. https://doi.org/10.1080/19448953.2018.1497751

Jongerden, J. (2018b). From containment and rollback to escalation: Turkey's Kurdish issue under the AKP. *Europa Ethnica*, 40–48.

Jung, C. (2020). Global Crises and Popular Protests: Protest Waves of the 1930s and 2010s in the Global South. J. Rayner, S. Falls, G. Souvlis û T. C. Nelms (amd.), ji nav *Back to the '30s?* (r. 237–256). Palgrave Macmillan.

Kabalan, M. (2013). Syrian-Turkish Relations: Geopolitical Explanations for the Move from Conflict to Co-operation. R. Hinnebusch û O. Tur (amd.), ji nav *Turkey-Syria Relations Between Enmity and Amity*. Ashgate.

Kajo, S. û Sinclair, C. (2011). *The Evolution of Kurdish Politics in Syria*. Middle East Research and Information Project. https://merip.org/2011/08/the-evolutionof-kurdish-politics-in-syria/

Karataşlı, Ş. Ş. (2014). World Hegemonic Crises and Rising Tides of Secessionism. *Trajectories*, 26(1), 85–89.

Karataşlı, Ş. Ş. (2015). The Origins of Turkey's "Heterodox" Transition to Neoliberalism: The Özal Decade and Beyond. *Journal of World-Systems Research*, 21(2), 387–416.

Karataşlı, Ş. Ş. (2019). The Twenty-First Century Revolutions and Internationalism: A World-Historical Perspective. *Globalizations*, 16(7), 306–320. https://doi. org/10.5195/jwsr.2019.951

Karataşlı, Ş. Ş. û Kumral, S. (2017). Territorial Contradictions of the Rise of China: Geopolitics, Nationalism and Hegemony in Comparative-Historical Perspective. *Journal of World-Systems Research*, 23(1), 5–35. https://doi. org/10.5195/ jwsr.2017.591

Katz, M. N. (2020). Incessant Interest: Tsarist, Soviet and Putinist Mideast Strategies. *Middle East Policy*, 27(1), 141–152. https://doi.org/10.1111/mepo.12480

Kaya, M. (2019). The potentials and challenges of left populism in Turkey: The case of the peoples' Democratic Party (HDP). *British Journal of Middle Eastern Studies*, 1–16. https://doi.org/10.1080/13530194.2019.1634398

Kennedy, D. K. (2016). *Decolonization: A very Short Introduction*. Oxford University Press.

Lawson, G. (2006). The promise of historical sociology in international relations. *International Studies Review*, 8(3), 397–423. https://doi.org/10.1111/j.1468-2486.2006.00600.x

Leezenberg, M. (2006). Urbanization, Privatization, and Patronage: The Political Economy of Iraqi Kurdistan. F. 'Abd al-Jabbār û D. Hosham (amd.), ji nav *The Kurds: Nationalism and Politics* (r. 151–179). Saqi books.

Levett, A. (1994). Work and Unemployment in Post-Industrial Times. *Labour, Employment and Work in New Zealand*. https://doi.org/10.26686/lew.v0i0.948

Luizard, P.-J. (2015). Conflits et religion: Les cas de l'Irak et de la Syrie. *Les Champs de Mars*, 26(1), 46–58.

Malešević, S. (2008). The Sociology of New Wars? Assessing the Causes and Objectives of Contemporary Violent Conflicts. *International Political Sociology*, 2(2), 97–112. https://doi.org/10.1111/j.1749-5687.2008.00038.x

Matin, K. (2013). *Recasting Iranian Modernity: International Relations and Social Change*. Routledge.

Matin, K. (2018). Lineages of the Islamic State: An international historical sociology of State (de ) formation in Iraq. *Journal of Historical Sociology*, 31(1), 6–24.

Matin, K. (2020). Liminal Lineages of the "Kurdish Question." *Middle East Report*, 295(Summer). https://merip.org/2020/08/liminal-lineages-of-the-kurdish-question/?fbclid=IwAR1JH_8eatYQUTQFBhj9nh2BYZBGKkQKnbr71EkGNhYMlRsd8Qur9W3-Lfk

McDowall, D. (1996). *A Modern History of the Kurds*. I. B. Tauris (Reprinted in 2007).

Mignolo, W. D. (2009). Who Speaks for the "Human" in Human Rights? *Hispanic Issues On Line*, 5(1), 7–24.

Miley, T. J. (2018). The nation as hegemonic project. *Journal of Political Ideologies*, 9317, 1–22.

Özkahraman, C. (2017). Failure of Peace Talks between Turkey and the PKK: Victim of Traditional Turkish Policy or of Geopolitical Shifts in the Middle East? *Contemporary Review of the Middle East*, 4(1), 50–66. https://doi.org/10.1177/2347798916681332

Özoğlu, H. (2001). "Nationalism" and Kurdish Notables in the Late Ottoman – Early Republican Era Author. *International Journal of Middle East Studies*, 33(3), 383–409.

Pham, Q. N. (2018). *Politics beyond Dominance: Subaltern Power and World Making*. University of Minnesota.

Phillips, C. (2013). *The Civil War in Syria: The Variety of Opposition to the Syrian Regime*. IE Mediterranean Yearbook.

Postel, D. (2021, July 7). Iran's Role in the Shifting Political Landscape of the Middle East. *New Politics*, 34.

Primakov, Y. (2009). *Russia and the Arabs: Behind the Scenes in the Middle East from the Cold War to the Present*. Basic Books. https://en.wikipedia.org/wiki/Yevgeny_Primakov

Quijano, A. (1992). Colonialidad y modernidad/racionalidad. *Perú Indígena*, 13(29), 11–20.

Rao, R. (2010). *Third World Protest: Between Home and the World*. Oxford University Press.

Reus-Smit, C. (2021). The end of global pluralism? *European Journal of International Relations*. https://doi.org/doi.org/10.1177/13540661211017273

Richards, A., Waterbury, J., Cammett, M. û Diwan Ishac. (2008). *A Political Economy of the Middle East*. Westview Press.

Richmond, O. P. (2008). *Peace in International Relations*. Routledge.

Robinson, W. I. (2014). *Global Capitalism and the Crisis of Humanity*. Cambridge University Press.

Robinson, W. I. (2018). Accumulation Crisis and Global Police State. *Critical Sociology*, 1–14.

Robinson, W. I. (2019). Global capitalist crisis and twenty-first century fascism: Beyond the Trump hype. *Science and Society*, 83(2), 155–183. https://doi.org/10.1521/siso.2019.83.2.155

Rosenberg, J. (2006). Why is there no international historical sociology? *European Journal of International Relations*, 12(3), 307–340. https://doi.org/10.1177/1354066106067345

Rosenberg, J., û Boyle, C. (2019). Understanding 2016: China, Brexit and Trump in the history of uneven and combined development. *Journal of Historical Sociology*, 32(1), e32–e58. https://doi.org/10.1111/johs.12217

saed (2017). From the October Revolution to Revolutionary Rojava: An Ecosocialist Reading. *Capitalism, Nature, Socialism*, 28(4), 3–20. https://doi.org/10.1080/10455752.2017.1409403

Saeed, S. (2014). *The Kurdish National Movement in Turkey: From the PKK to the KCK*. Doctoral Thesis.

Saull, R. (2010). One world, many cold wars: 1989 in the Middle East. G. Lawson, C. Armbruster û M. Cox (amd.), ji nav *The Global 1989: Continuity and Change in World Politics* (r. 179–197). Cambridge University Press.

Savran, A. (2020). The Peace Process between Turkey and the Kurdistan Workers' Party, 2009–2015. *Journal of Balkan and Near Eastern Studies*, 22(6), 1–16. https://doi.org/10.1080/19448953.2020.1801243

Schoen, D. E. û Kaylan, M. (2014). *The Russia-China Axis: The New Cold War and America's Crisis of Leadership* (First American edition). Encounter Books.

Sinkaya, B. (2018). The Kurdish question in Iran and its effects on Iran-Turkey relations. *British Journal of Middle Eastern Studies*, 45(5), 840–859. https://doi. org/10.1080/13530194.2017.1361315

Soğuk, N. (1993). Reflections on the "Orientalized Orientals." *Alternatives: Global, Local, Political*, 18, 361–384.

Spyer, J. (2013). Fragmented Syria: The Balance of Forces as of Late 2013. *Middle East Review of International Affairs (Online)*, 17(3), 9.

Stahl, R. M. (2019). Ruling the Interregnum: Politics and Ideology in Nonhegemonic Times. *Politics and Society*. https://doi.org/10.1177/0032329219851896

Sunca, Y. (2016). *Infrastructures for Peace in Turkey. A Mapping Study*. Berghof Foundation.

Sunca, Y. (2020). The bifurcated trajectory of nation formation in Kurdistan: Democratic confederalism, nationalism, and the crisis of capitalist modernity. *Nations and Nationalism*, 26(4), 979–993. https://doi.org/10.1111/nana.12609

Sunca, Y. (2021). The Revolution in Rojava and the International. S. Holtgreve, K. Preuss û M. Albert (amd.), ji nav *Envisioning the World: Mapping and Making the Global* (r. 105–126). Transcript.

Tansel, C. B. (2018). Authoritarian Neoliberalism and Democratic Backsliding in Turkey: Beyond the Narratives of Progress. *South European Society and Politics*, 23(2), 197–217. https://doi.org/10.1080/13608746.2018.1479945

Tejel, J. (2009). *Syria's Kurds. History, Politics and Society*. Routledge.

Tejel, J. (2017). Le Rojava: Heurs et malheurs du Kurdistan (2004-2015). *Anatoli*, 8, 133–149.

Traverso, E. (2016). *Left-wing Melancholia: Marxism, History and Memory*. Columbia University Press.

Trenin, D. (2016). *Russia in the Middle East: Moscow's Objectives, Priorities, and Policy Drivers* (r. 6). Carnegie Moscow Center.

Ünlü, B. (2018). *Türklük Sözleşmesi: Oluşumu,* İşleyişi *ve Krizi*. Dipnot Yayınları.

Ünver, H. A. (2016). Schrödinger's Kurds: Transnational Kurdish geopolitics in the age of shifting borders. *Journal of International Affairs*, 69(2), 65.

Vali, A. (1998). The Kurds and Their "Others": Fragmented Identity and Fragmented Politics. *Comparative Studies of South Asia, Africa and the Middle East*, 18(2), 82–95. https://doi.org/10.1215/1089201X-18-2-82

van Bruinessen, M. (1992). *Agha, Shaikh and State. The Social and Political Structures of Kurdistan*. Zed Books Ltd.

van Bruinessen, M. (2019). Tribes and ethnic identity. F. A. Jabar û R. Mansour (amd.), ji nav *The Kurds in a Changing Middle East: History, Politics and Representation* (r. 141–170). I.B. Tauris.

Wallerstein, I. (2003). *The Decline of American Power: The U.S. in a Chaotic World*. The New Press.

Wallerstein, I. (2013, July 15). *Turkey: Dilemma of the Kurds*. https://www.iwallerstein.com/turkey-dilemma-kurds/

Wallerstein, I. (2014). Antisystemic Movements, Yesterday and Today. *Journal of WorldSystems Research*, 20(2), 158–172.

Weiss, J. C., û Wallace, J. L. (2021). Domestic Politics, China's Rise, and the Future of the Liberal International Order. *International Organization*, 75(Spring), 635–664. https://doi.org/doi:10.1017/S002081832000048X

Yeğen, M. (2007). Turkish nationalism and the Kurdish question. *Ethnic and Racial Studies*, 30(1), 119–151. https://doi.org/10.1080/01419870601006603

Yeğenoğlu, M. (2013). Smells Like Gezi Spirit: Democratic Sensibilities and Carnivalesque Politics in Turkey. *Radical Philosophy*, 182.

Yetkin, M. (2004). *Kürt Kapanı:* Şam'dan İmralı'ya Öcalan. Remzi Kitabevi.

Yuval-Davis, N. (2015). Situated Intersectionality and Social Inequality. *Raisons Politiques*, 58(2).

Zarakol, A. (2010). After Defeat: How the East Learned to Live with the West. Ji nav *After Defeat*. Cambridge University Press.




*VESER - 1: Komên etnîk ên li Rojhilata Navîn.*
*Çavkanî: M Izady, Atlas of the Islamic World and Vicinity (New York, Columbia Univ., 2006-present)*
*@gulf2000.columbia.edu/maps.shtml*




*VESER – 2: Kompozîsyona dînî ya Rojhilata Navîn.*

*Çavkanî: M Izady, Atlas of the Islamic World and Vicinity (New York, Columbia Univ., 2006-present) @gulf2000.columbia.edu/maps.shtml*




*VESER – 3: Kompozîsyona dînî ya Kurdistanê.*
*Çavkanî: M Izady, Atlas of the Islamic World and Vicinity (New York, Columbia Univ., 2006-present)*
*@gulf2000.columbia.edu/maps.shtml*




*VESER– 4: Dabeşiya kurdî û zaravayên wê.*

*Çavkanî: M Izady, Atlas of the Islamic World and Vicinity (New York, Columbia Univ., 2006-present) @gulf2000.columbia.edu/maps.shtml*

## Yasîn Sunca

Di sala 1986'an de li Qersê hatiye dinyayê, heta sala 2017'an li cem cur bi cur dameziraweyên Yekîtiya Ewrûpayê tevî hin Saziyên Civaka Sivîl û partiyan di çarçoveya Rojhilata Navîn, Tirkiye û Kurdistanê de xebat kirin. Di sala 2013'an de li Zanîngeha Azad a Brukselê (ULB - Université Libre de Bruxelles) lîsansa xwe ya bilind a Zanista siyasetê qedand. Di sala 2020›î de jî li Zanîngeha Gent (Bruksel) û Zanîngeha Bielefeldê (Almanya) di warên zanista siyasetê û sosyolojiyê de dereceya hevpar a doktorayê wergirt. Li ser mijarên neteweperwerî, siyaseta kurewî û dîroka şoreşan di asta lîsans û lîsansa bilind de ders dan. Hîn jî li Zanîngeha Bielefeldê wek lêkolerê piştî doktorayê di çarçoveya pêkvejiyana hevpar, neteweperwerî û mêtîngehkariyê de li ser Kurdistan, Chiapas, Sahraya Rojava û Welatê Tamîlan lêkolînekê dike. Lêhûrbûna xebatên wî bêhtir li ser warên mîna di nav siyaseta kurewî de Rojhilata Navîn û kêşeya kurdî, neteweperwerî û enternasyonalîzm, netewedewlet û tengasiyên wê û dîroka şoreşan e.

© Truth Justice Memory Center, 2022

Beyî giringiya bê ka em bi kîjan perspektîfê li kêşeya kurdî dinêrin, tevî ku ew kêşeyeke herêmî ye, ew tim bi awayekî bêawarte wek meseleyeke navxweyî ya dewletan hat dîtin. Di hewldanên ji bo daxilkirina dînamîkên herêmî de jî, ew kêşeya ku der barê wê de fikir li ser hatiye ajotin, bi "tesîra derve ya li hundirû" sînordar ma. Gava rehendên dîrokî, sosyolojîk û kurewî yên mijarê tevî berxwedana li dijî têkoşînên hêzê yan jî tevî aktorên siyasî yên ku wek xwediyên desthilatê daxilî wê bûnê, were nirxandin, nîqaşkirina "qada siyasî ya kurdî" jî mecbûr dike. Ev xebat, dawiya dawî bi mebesta ku dînamîkên navxweyî yê vê qada siyasî û paşxaneya kurewî û herêmî ya veguherîna van dînamîkên hanê yên di bîst salên dawî de analîz bike, bandora wê ya li ser îhtimalên çareseriya kêşeya kurdî ya xwedî asta herêmî xuyane bike, hatiye nivîsîn.